



K. T.

**ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

Teza Lîsansa Bilind

**FERHENGA BERHEVKARÎYÊ YA DEVOKA
SERHEDÊ
(Di Mînaka 5 Berhemên Kurdên Kafkasyayê de)**

Hüseyin KOÇUK

20711006

Şêwirmend

Prof. Dr. Hayrullah ACAR

MÊRDÎN-2023

K. T.
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

FERHENGA BERHEVKARÎYÊ YA DEVOKA
SERHEDÊ
(Di Mînaka 5 Berhemên Kurdên Kafkasyayê de)

Hüseyin KOÇUK

20711006

Şewirmend

Prof. Dr. Hayrullah ACAR

MÊRDÎN-2023

KABUL VE ONAY

Hüseyin Koçuk tarafından hazırlanan **Ferhenga Berhevkarîyê ya Devoka Serhedê (Di Mînaka 5 Berhemên Kurdên Kafkasyayê de)** adındaki çalışma, 07/09/2023 Tarihi tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak **oybirliği** ile kabul edilmiştir.

[Prof. Dr. Tahirhan AYDIN] (Başkan)

Dr. Öğr. Üy. Mehmet YONAT

Doç. Dr. Hayrullah ACAR

ETİK BEYAN

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;

- Tez içindeki bütün bilgileri etik davranış ve akademik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tez çalışmasının hazırlık, bilgi, belge, veri toplama, analiz ve bilgilerin sunumu olmak üzere tüm aşamalarda bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun davrandığımı,
- Tez çalışmada kullanılan tüm eserlere eksiksiz atıf yaptığımı ve kullanılan tüm eserlere kaynaklar/kaynakçada yer verdiğimi,
- Tez çalışmasının özgün olduğunu,

Tez çalışmasının Mardin Artuklu Üniversitesi tarafından kullanılan “bilimsel intihal tespit programı” ile tarandığını ve hiçbir şekilde “intihal içermediğini” beyan eder, aksinin ortaya çıkması durumunda her türlü yasal sonucu kabullendiğimi bildiririm.

Hüseyin KOÇUK

20/10/2023

KURTE

Teza Lîsansa Bilind

FERHENG A BERHEVKARÎYÊ YA DEVOKA SERHEDÊ

(Di Mînaka 5 Berhemên Kurdên Kafkasyayê de)

Hüseyin KOÇUK

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstitûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

162 rûpel

Her zimanek xwedîyê dîyalekt û devokên cuda ye. Zimanê kurdî jî wekî her zimanî di erdnîgarîya fireh a Kurdistanê de xwedîyê gelek dîyalekt û devokên cuda ye. Li gor her dever û herêmekê jî devokên zimanê kurdî yên cuda peyda bûne. Bo mînak devoka Botanê, devoka Serhedê, devoka Behdînanê, devoka Torê, devoka Xorasanê û hwd. Her devokek jî ji aliyê dengnasî, morfolojîk, hevoksazî û peyvdankî (gencîneya peyvan) ve mexsûsê xwe ye. Devoka Serhedê jî ji wan yek devokên kurmancîya jorîn e ku ji hin alîyan ve ji devokên kurdî yên din cudatir e. Di vê xebatê de me ji berhemên nivîskî yên aîdê de vera Serhedê gelek peyv, biwêj û gotinên pêşyan ên resen ku aîdê vê devokê peyda kirin. Me dora hezar madeyan peyv dan ji xêncî vê jî, her madeyek herî kêr bi du mane û varyantan hatin dayîn. Bi vî awayî di vê ferhengê de dora çar hezar peyv berhev bûne. Bi vê xebatê ve em dibînin ku devoka Serhedê ji aliyê peyvdanka (gencîneya peyvan) xwe ve ji devokên kurdî yên din cudatir e û devokeke serbixwe ye. Ev xebata me dê devoka Serhedê di nav civata xwende ya kurdî de zêdetir ‘eyan (xuyanbar) bike. Herwiha em di wê bawerîyê de ne ku ev xebata me dê di qada zimannasîya kurdî de ji bo xebatên ferhengnûsîyê û xebatên li ser devoka Serhedê bibe çavkanîyeke sereke ya bîbîografîk û pêşîn.

Peyvên Sereke: Ferheng, Ferhengnasîya Kurdî, Ferhengnûsîya Kurdî, Devok, Devoka Herêma Serhedê.

ÖZET

Yüksek Lisans Tezi

SERHAT YÖRESİ AĞZI DERLEME SÖZLÜĞÜ

(Kafkas Kürtlerine Ait 5 Eser Örneğinde)

Hüseyin KOÇUK

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Kültürü ve Dili Anabilim Dalı

162 sayfa

Her dil, farklı lehçe ve ağızlara sahiptir. Kürt dili de geniş Kürdistan coğrafyasında diğer dillerde olduğu gibi birçok lehçe ve ağızlara sahiptir. Her bir bölgeye göre de Kürt dilinin farklı lehçe ve ağızları oluşmuştur. Örneğin: Botan ağızı, Serhat ağızı, Behdinan ağızı, Tori ağızı, Horasan ağızı vb. Her ağız da fonetik, morfolojik, cümledizimi ve kelime hazinesi açısından kendine mahsustur. Serhat ağızı da Yukarı Kurmanca’nın ağızlarından biridir ki bazı özellikleriyle Kürtçenin diğer ağızlarından farklıdır. Bu çalışmada Serhat yöresine ait bazı yazılı eserlerden kelime, deyim ve atasözlerinden oluşan bir sözlük derledik. Biz bin dolaylarında madde girişi yaptık, bunun haricinde her madde en az iki anlamıyla birlikte ve varyantlarıyla verildi. Böylelikle bu sözlükte dört bin dolaylarında kelime derlendi. Bu çalışmada görülüyor ki Serhat Ağızı kelime dağarcığı yönüyle Kürtçe’nin diğer ağızlarından farklıdır ve bağımsız bir ağızdır. Bu çalışmamız, Serhat Ağızı’nı Kürt entelektüel camiasında daha çok görünür kılacak. Bununla birlikte bu çalışmamız Kürtçe Dilbilimi’nde sözlükbilimi çalışmaları ve Serhat Ağızı üzerine yapılacak çalışmalar için başvurulacak bibliyografik ve başlıca kaynak görevinde olma iddiasındadır.

Anahtar Kelimeler: Sözlük, Kürtçe Sözlük Bilimi, Kürtçe Sözlükçülüğü, Ağız, Serhat Bölgesi Ağızı.

ABSTRACT

Master Thesis

A Compilation Dictionary of Kurmanji Kurdish's Serhed Dialect (From 5 Caucasian Kurdish Books)

Hüseyin KOÇUK

Mardin Artuklu University

Institute of Living Languages in Turkey

The Department of Kurdish Language and Culture

162 pages

Every language has different dialects and subdialects. The Kurdish language has many dialects and subdialects in the wide geography of Kurdistan like in other languages. According to each region, different dialects and subdialects of the Kurdish language have been formed as Botan subdialect, Serhed subdialect, Behdinan subdialect, Tori subdialect, Khorasan subdialect etc. Each subdialect has unique features in terms of phonetics, morphology, syntax and vocabulary. The subdialect of Serhed is also one of the subdialects of Northern Kurdish (Kurmanji), which differs from other Kurmanji subdialects with some features. In this study, we have compiled a dictionary consisting of words, idioms and proverbs from some written works belonging to the Serhed subdialect. We entered about a thousand items, apart from this, each item was given with at least two meanings and variants. Thus, around four thousand words were compiled in this dictionary. In this study, it is seen that Serhed Subdialect is different from other Kurdish subdialects in terms of vocabulary so it is an independent subdialect of Kurmanji. This work is going to make Serhed Subdialect more visible in the Kurdish intellectual community. However, this study claims to be the bibliographic and main source to be consulted for lexicography studies in Kurdish Linguistics and studies on Serhed Subdialect.

Keywords: Dictionary, Kurdish Lexicology, Kurdish Lexicography, Subdialect, Serhed Subdialect.

PÊŞGOTIN

Di zimannasîyê de yek ji wan karên wextxwer amadekirina ferhengan e. Bi taybetî jî amadekirina ferhengên devokan, wext û kedeke mezin dixwaze. Bo mînak *dîyarkirina mijarên berhevkarîyê, dîyarkirina qada berhevkarîyê û dîyarkirina metn yan jî kesên çavkanî* hinek ji wan astengîyên amadekirina ferhengên devokan in.

Di xebatên ferhengan de du cure berhevkarî hene ku ferheng pê dihên sazkin: *berhevkarîya sehayî û berhevkarîya ji berhemên nivîskî*. Me di vê xebata xwe de rêbaza *berhevkarîya ji berhemên nivîskî* bijart û ew berhem ku nivîskarên wê ji herêma Serhedê yên wekî Erebe Şemo, Hecîyê Cindî, Sehîdê Îbo, Elîyê Evdilrehman û Egîdê Xudo ne.

Di warê ferhengnûsîya kurdî de li ser zaravayan kêma xebat hene ku yekser li ser dever û zaravayekî raweste. Ango ferhengên ku hatine amadekirin bi taybetî li ser devoka herêm û deverê ne, zêdetir ferhengên giştî ne. Bi vê teza xwe ve em dixwazin ku balê bikişînin giringîya li ser xebatên devokan û bi taybetî devoka Serhedê. Me ji berhemên nivîskî peyv, biwêj û gotinên pêşîyan berhev kirin û di vê xebata xwe de bi cih kirin.

Devoka Serhedê ji gelek alîyan ve ji devokên kurdî yên din cuda ye. Bo mînak ji alîyê fonolojîk, morfolojîk, sentaksî û peyvthankî (gencîneya peyv) ve taybetîyên xwe yên xweser heye. Ev xweserî û xusûsiyetên wê jî rê li ber xweş kiriye ku bibe devokeke cuda.

Ber bi dawîya sedsala nozdehem li Elmanyayê bi tevî xebatên li ser zimên, du binbeşên zimannasîyê ên giring ên wekî zaravanasî û ferhengnasî derketin pêş. Her ku çû ev herdu binbeşên zimannasîyê, xebatên li ser ferhengê pêşdatir birin û sistematîk kirin. Di roja îroyîn a ku em tê de ne di nav civata xwende a kurdî de serdestîya zimanê standart ê kurdî heye. Bi vê xebatê ve yek ji wan armanca me ew e ku em dixwazin hişmendîyek peyda bibe ku gelek devok û dîyalektên kurdî hene û hêjayê lêkolînê ne. Em di wê bawerîyê de ku ev xebata me dê devoka Serhedê di nav civata xwende a kurdî de zêdetir ‘eyan (xuyanbar) bike.

Wexta min di dema lîsansa kurdî de dixwend, yek ji wan dersên me yên ji qonaxên edebîyata kurdî; dersa Qonaxa Edebîyata Kurdên Kafkasyayê bû. Ev

qonaxa edebî ya kurdî cihêkî xwe yî giring heye. Gelek ji wan nivîskar û helbestvanên kurd yên Sovyetê ji herêma Serhedê koçî wir kirine. Ev nivîskar û helbestvan bi devoka Serhedê ve berhemên xwe dane. Di wê dema me ya xwendinê de min gelek caran dibihîst ku hevalan digot em ji van berheman fehm nakin, ev devok peyvên xwe yên xweser hene. Ev tişt bû sedem ku ez wek Serhedîyek li ser wê devokê bi awayeke hûrgilî bixebitim.

Helbet xebata li ser devokekê tenê ji aliyê kesekî ve bihê kirin ev karekî ne hêsan e, wextekî zêde digire. Lêgerîn û peydakirina çavkanîyan, sînorkirina mijara xebatê, analîzkirin û danîna pîvanên xebatê hin ji wan wek zehmetîyên lêkolînê derdikevin pêşberî me.

Herwekî hûn jî dizanin xebatên pêşîn, bi zehmetî û kêmasîyên xwe ve hene. Bi zehmetîyên xwe ve hene lewra pêşnûma û pêşxebateke berê tunebe. Bi kêmasîyên xwe ve hene lewra xebatên ku ji piştî wê bihên kirin dê ji wê kamiltir û kêmqusûrtir bibe. Bi tevî ku kêmasîyên vê xebatê hene lê ne heq e ku em di vir de nefsbîçûkîyê bikin; divê bihê gotin ku di vê xebatê de gelek ked û emeg heye ew jî bi qebareya xwe ve Serhedîyan negotî ‘eyan e.

Ez dixwazim di serî de spasîyên xwe pêşkêşî şêwirmendê xwe mamoste Prof. Dr. Hayrullah Acar bikim ku bi nêrîn û şîroveyan xwe rê li ber min xist. Dîsa spasîyên xwe pêşkêşî mamoste Prof. Dr. Tahirhan Aydın û End. Hînd. Dr. Mehmet Yonat dikim ku beşdarîya wan a jûrîyê û rexneyên wan di xebata min de kêrhatî bû.

Herwiha sînerjî û motîvasyanên hevalên min ên hêja jî di qedandina vê tezê de kêrhatî bû. Ji ber vê spasîyên xwe pêşkêşî hevala xwe ya ezîz Fatma û Xalid, Zana, Welat, Evdillah, Yasemîn û Mûrad Bedirxan dikim.

Ev xebata min ji bo dayîka min a ezîz Seyranê...

Hüseyin KOÇUK

Mêrdîn-2023

NAVEROK

| | |
|---|-----------|
| KABUL VE ONAY..... | I |
| ETİK BEYAN | II |
| KURTE..... | IV |
| ÖZET | V |
| ABSTRACT | VI |
| PÊŞGOTIN | VII |
| NAVEROK..... | IX |
| FÎHRÎSTA NÎŞAN Ê KURTEBÊJEYAN..... | XI |
| ALFABEYA NAVNETEWYÎ YA FONETÎK (IPA)..... | XIII |
| DESTPÊK | 1 |
| <i>Ferheng</i> | 2 |
| <i>Cureyên Ferhengan</i> | 3 |
| <i>Fonksiyonên Ferhengan</i> | 9 |
| <i>Wek Zanistek Ferhengnûsî (Leksîkografî), Ferhengnasî(Leksîkolojî) û Dîroka Ferhengnûsîyê</i> | 10 |
| 1. FERHENGNÛSÎ Ê FERHENGNASÎYA KURDÎ | 16 |
| 1.1. Qonaxa Destpêkê ya Ferhengnûsîya Kurdî (Sedsalên 17-19em)..... | 16 |
| 1.2. Di Qonaxa Tevgera Neteweyî de Ferhengnûsîya Kurdî (Sedsala 20em)..... | 23 |
| 1.3. Qonaxa Ferhengnûsîya Geş a Kurdî (Sedsala 21em)..... | 31 |
| 2. ZIMANÊ KURDÎ Ê DEVOKA SERHEDÊ | 41 |
| 2.1. Erdnîgarîya Kurdan | 41 |
| 2.2. Zimanê Kurdî | 42 |
| 2.3. Herêm û Devoka Serhedê | 45 |
| 2.4. Taybetîyên Devoka Serhedê ji Alîyê Fonolojîk û Morfolojîk ve..... | 47 |

| | | |
|----------------------|--|------------|
| 2.4.1. | Ji alîyê dengsazîyê (fononolojîk) ve | 47 |
| 2.4.2. | Ji alîyê morfolojîyê ve | 51 |
| 2.5. | Xebatên Ferhengî û Akademîk yê li ser Devoka Serhedê | 55 |
| 3. | FERHENG A DEVOKA HERÊMA SERHEDÊ | 61 |
| ENCAM | | 137 |
| ÇAVKANÎ | | 139 |

FÎHRÎSTA NÎŞAN Û KURTEBÊJEYAN

| | |
|---------------|--------------------|
| b.n.b. | : Berhema nav borî |
| bş. | : Baneşan |
| bwj. | : Biwêj |
| BZ. | : Berî zayînê |
| d. | : Daçek |
| DD. | : Dê û Dêmarî |
| end. | : Endam |
| g. | : Gihanek |
| g.n.b. | : Gotara nav borî |
| gp. | : Gotinên pêşîyan |
| h. | : Hoker |
| h.b. | : Heman berhem |
| h.g. | : Heman gotar |
| hînd. | : Hîndekarî |
| HW. | : Hewarî |
| j. | : Jimare |
| KR. | : Kurdê Rêwî |
| l. | : Lêker |
| m. | : Mê |
| MR. | : Morof |
| n. | : Nêr |
| nd. | : Navdêr |
| nt. | : Nêtar |

| | |
|--------------|-------------------|
| prof. | : Profesör |
| r. | : Rûpel |
| rd. | : Rengdêr |
| ŞK. | : Şivanê Kurmanca |
| wer. | : Wergêr |

ALFABEYA NAVNETEWEYÎ YA FONETÎK (IPA)

- A: /ɑ:/
- B: /b/
- C: /d͡ʒ/
- Ç: /t͡ʃ^h/ Ev “ç”ya hilmî ye.
- Ç: /t͡ʃ/ Ev “ç”ya ne hilmî ye.
- D: /d/
- E: /ɛ/
- E’: /eː/ Ev deng bergindê eyna erebî ye.
- Ê: /e:/
- F: /f/
- G: /g/
- H: /h/ Ev dengekî glottal e.
- H: /ħ/ Ev deng faringeal e ango “h”ya ji gewrîyê ye.
- I: /i/
- Î: /i:/
- J: /ʒ/
- K: /k/ Ev “k”ya ne hilmî ye.
- K: /k^h/ Ev “k”ya hilmî ye.
- L: /l/
- M: /m/
- N: /n/
- O: /o:/
- P: /p/ Ev “p”ya ne hilmî ye.

P: /p^h/ Ev “p”ya hilmî ye.

Q: /q/

R: /r/ Ev “r”ya normal e.

Řř: /r/ Ev “r”ya lertzok e

S: /s/

Ş: /ʃ/

T: /t/ Ev “t”ya ne hilmî ye.

T: /t^h/ Ev “t”ya hilmî ye.

U: /u/

Û: /u:/

V: /v/

W: /w/

X: /x/

X: /ɣ/

Y: /y/

Z: /z/

DESTPÊK

Her devok bi taybetî û xusûsiyetên xwe ve xweser e. Devoka Serhedê jî bi taybetî û xusûsiyetên xwe yê xweser ve derdikeve pêşberî me. Devoka Serhedê ku beşek ji devokên Kurmancîya Jorîn e bi taybetîyên xwe yê fonolojîk, morfolojîk û peyvthankî (ji alîyê korpûsa xwe ya peyvan ve) ji devokên kurdî yê din cudatir e. Di devoka Serhedê de di peyvan de hin caran deng dikevin, hin caran deng lê zêde dibin û hin caran jî deng diguherin.

Di vê xebatê de armanca me ew e ku em rasterast ferhenga devoka Serhedê çê bikin. Ji bo berhevkirina peyvên devokekê du rêbaz hene: *rêbaza berhevkarîya sehayî* û *rêbaza berhevkarîya ji berhemên nivîskî*. Me di vê xebata xwe de *rêbaza berhevkarîyê ya ji berhemên nivîskî* bijart.

Bi qasî ku me bi dest xistiye di qada ferhengên devokan de berhevkarîya ferhengên devokan kê in. Du xebatên serbixwe û xweser hene em dikarin wekî mînak bidin: *Ferhenga Devoka Herêma Semsûrê* ya Mehmet Oncu û *Ferhenga Botanê* ya Bahadîn Robar in. Xebatên devok û ferhengnasîyê di warê zimannasîyê de yek ji wan mijarên bingeîn in lê di warê zimannasîya kurdî de li ser ferhengnûsiya devokan xebatên serbixwe û xweser kê in.

Heta niha li ser devoka Serhedê hin xebatên qebarebiçûk ên ferhengokî wekî listeya peyvan hatine kirin hene lê ev xebatên hanê rasterast ne bi armanca ferhenga vê devokê hatine kirin. Ev xebata me yekcar armanca wê çêkirina ferhenga devoka herêma Serhedê ye. Ji ber îmkana û derfetan me tenê 5 berhemên kurdên Kafkasyayê bijartin ku ev nivîskar jî ji herêma Serhedê çûne alîyê Ermenistanê. Ev berhem *Şivanê Kurmanca* ya Erebê Şemo, *Hewarî* ya Hecîyê Cindî, *Kurdê Rêwî* ya Sehîdê Îbo, *Morof* a Elîyê Evdirehman û *Dê û Dêmarî* ya Egîdê Xudo ne. Sedema bijartina van berheman ev e ku ev berhem gelek gotinên resen û yê kêmnas ku aîdê devera Serhedê ne di xwe de dihewînin. Herwekî Rohat Alakom jî dibêje: “Kurdên Kafkasyayê (Ermenistanê) jî beşek ji kurdên Serhedê ne, helbet edebîyata wan û zargotina wan jî dê beşek ji ya devoka Serhedê be”.¹

¹ Rohat Alakom, *Torin: Arîstokratên Serhedê*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2009, r. 18.

Me her peyvên kêmnas, biwêj û gotinên pêşîyan ên ku peyda kirin bi hevokekê ve mînak dan ku ev hevok jî rasterast ji wan berheman bi xwe bûn ji bo ku di konteks û wateya xwe de baştir bihê fehmkirin. Hevokên mînak, bi awayê îtalîk hatin nivîsîn û pirtûkên wekî çavkanîya vê ferhengê bi kurtenavên xwe ve hatin nîşandin. Bo mînak ji bo *Şivanê Kurmanca* ŞK, ji bo *Hewarî* HW, ji bo *Kurdê Rêwî* KR, ji bo *Morof* MR, ji bo *Dê û Dêmarî* DD hat destnîşankirin. Peyvên ku wekî made hatin dayîn, bi varyant, homograf, heteronym, wateyên xwe yên yekem, duyem û zêdetir ve hatin dayîn.

Di vê beşa destpêkê de em dê bi awayeke hûrgilî li ser pêname, cure û fonksiyonên ferhengan rawestin. Herwiha di vê beşê de em li ser cudahiya ferhengnûsî (leksîkografî) û ferhengnasîyê (leksîkolojî) û kurtedîroka ferhengnûsiya cihanê jî rawestîyan.

Ferheng

Berî ku em li ser ferhengnasîyê rawestin divê pêşîyê em li ser pênameyên ferhengê rawestin. Ji ber ku ev teza me beşek ji ferhengnasîyê ye, em dê piştî pênameyên ferhengê bi awayeke berfireh li ser ferhengnasîyê rawestin.

Peyva *ferhengê* di her zimanekî de dihê wateyên cuda, lê ev cudahî ewqasî zêde nîn in lewra peyva ferhengê di zimanên cur bi cur de wateya *bêje/peyv+name* girtiye ser xwe. Li gor zimannas Husein Muhammed ferheng di zimanên Navend/Bakurê Ewrûpayê de dihê wateya *peyv+pirtûk* ku bi elmanî *wörterbuch*, bi holendî *woordenboek*, bi danmarkî *ordbog*, bi norwecî *ordbok*, bi swêdî *ordbok*, bi finlandî *sanakirja*, di zimanên welatên Başûr/Rojavayê Ewrûpayê de jî bi fransî *dictionnaire*, bi îtalî *dizionario*, bi portugalî *dicionário* û bi spanî *diccionario* ye. Di van zimanan de jî ferheng dihê wateya *axaftingeh*. Lewra di van zimanên Başûr/Rojavayê Ewrûpayê de peyva ferhengê ji peyvên *diction* (axaftin) û *arium* (cih) pêk dihê ku ew jî di wateya *axaftingehê* de ye.²

Dîsa li gor zimannas Husein Muhammed ferheng, di zimanên welatên rojhilatê Ewrûpayê de: bi bulgari: *речник* (*rěčnik*), bi sirbokroatî: *реџник / rěčnik*, bi çekî:

² Husein Muhammed, “**Okyanûsa Giştgir Anku Derbarê Navlêkirinên Ferhengê**”, <https://zimannas.wordpress.com/category/ferhengsazi/> (10.07.2021)

slovník, bi polonî: *słownik*, bi rûsî: *словарь* ye. Di van zimanan de jî ferhengê, wateya *peyvvan/peyvkar* girtiye ser xwe. Di zimanê tirkîya Tirkîyeyê de jî beramberê ferhengê *sözlük* e ku dihê wateya *peyvdankê*. Di zimanê ermenîkî de jî beramberê ferhengê *բարան* (bararan) e ku ew jî dîsa dihê wateya *peyvdankê*.³

Di zimanê erebî de jî beramberê ferhengê peyvên قاموس (qamûs) û معجم (mu'cem) dihên bikaranîn. Li gor Ferhenga Online ya Farsî (abadisê) di farsî de wateya yekem a peyva *ferhengê* kultur û çand e, herwekî ku bêjin kesê ku kultûra wî tune be, *ferhenga* wî jî tune ye! Di vê ferhenga online de wateya duyem *ferheng* bixwe ye.⁴ Bi tevî vê jî di farsî de beramberê ferhengê peyvên vajename (واژه نامه), lûxet (لغت) û qamûs (قاموس) jî dihên bikaranîn.

Di kurdî de jî tevî ku berbelavtir peyva *ferhengê* ji bo ferhengê dihê bikaranîn herwiha kurdên Sovyêta Berê peyva *xebernameyê* jî bi kar diînin. Bo mînak navê ferhenga Çerkes Xudoyêviç Bakayêv, *Xebername Kurmancî-Rusî* ye ku di sala 1957an de li Sovyêta hatiye çapkirin.⁵

Zimannas Husein Muhammed dest nîşan dike tevî ku peyva *ferhengê* berbelavtir e herwiha di kurdîya kurmancî de *peyvname* û *bêjename* û di kurdîya soranî de *wîşenname* jî dihên bikaranîn. Ji van pênasayan jî dihê fehmkirin ku ferheng pirtûka peyv û bêjeyan e.

Ji piştî pênasayên ferhengê, zanista ferhengê ya ku li ser esas, rê û rêbaz û damezrandina ferhengan radiweste -ferhengnasî- dihê. Em dê di beşa bihê de bi berfirehî li ser ferhengnasîyê rawestin.

Cureyên Ferhengan

Senifandina cureyên ferhenga li gor gelek krîteran dihê kirin. Ferheng li gor krîterên *amedekirin*, *bikaranîn* û *armanca ferhengê* û *taybetîyên naverokî* ji hev cihê dibin û bi xalên *amadekirina mebesta ferhengê*, *şewaz* û *rêbaza ferhengê* ve senifandin û dabeşkirina wan pêk dihê. Ji gelek alîyan ve û bi krîterên cur bi cur

³ Husein Muhammed, “**Okyanûsa Giştgir Anku Derbarê Navlêkirinên Ferhengê**”, <https://zimannas.wordpress.com/category/ferhengasazi/> (10.07.2021)

⁴ “فرهنگ”, <https://abadis.ir/fatofa/فرهنگ/> (13.07.2021)

⁵ Husein Muhammed, g.n.b., <https://zimannas.wordpress.com/category/ferhengasazi/> (13.07.2021)

vesenifandina ferhengan çê dibin. Em dê di vê beşê de bi çend serenavan ve cureyên ferhengan dest nîşan bikin:

Li gor senifandina ferhengan a Kocaman, dabeşkirin û cureyên ferhengan ên sereke bi vî awahî ye:⁶

1. Ferhengên Şayesandinî
2. Ferhengên Hevedemî
3. Ferhengên Giştî/ Teknîkî
3. Ferhengên Bo Fêrbûnê
4. Ferhengên Yek/Du an jî Pirzimanî

Senifandineke din a ji aliyê *amadekirina mebesta ferhengê, şêwaz û rêbaza ferhengê* ve jî ya Dogan Aksan e ku dabeşkirina wî ya cureyên ferhengan wiha ye:⁷

a. Li gor hejmara zimanên di ferhengê de heyî:

1. Ferhengên Yekzimanî
2. Ferhengên Pirzimanî

b. Li gor rêza alfabetîk:

1. Ferhengên Alfabetîk
2. Ferhengên Têgihan

c. Li gor wesf û çawanîya bêjeyan:

1. Ferhengên Giştî
2. Ferhengên Zaravanasîyê
3. Ferhengên Bêjeyên Hevwate, Hevdeng û Dijwateyan
4. Ferhengên Dîrokî
5. Ferhengên Rehnasîyê (Etîmolojî)
6. Ferhengên Qada Pisporîyê (Ferhengên Têgînan)
7. Ferhengên Çepel (argo)
8. Ferhengên Biwêj û Gotinên Pêşîyan
9. Ferhengên Watenasîyê

⁶ Nadir İlhan, “Sözlük Hazırlama İlkeleri, Çeşitleri ve Özellikleri”, *International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, 2019, r.537.

⁷ Servet Karçıga, “Görsel Sözlükler ve Kelime Ağları”, *IBAD Uluslararası Bilimsel Araştırmalar Dergisi*, 2016, r.12.

10. Ferhengên Deq û Hunermendan
11. Ferhengên Peyvên ku bi Şaşî Dihên Bikaranîn
12. Ferhengên Berevajî û cureyên din

Ji xêncî senifandinên Aksa û Kocaman, hin senifandinên din jî hene. Nadir Îlhan jî li gor krîterên *çavkanîya ferhengê, cihê tomar û parastinê û şêwaza nivîsîna ferhengê* dabeşkirineke wiha dike:

a. Li gor çavkanîya ferhengê:

1. Ferhengên Zimanê Nivîskî
2. Ferhengên Devokan

b. Li gor cihê tomarkirina ferhengê:

1. Ferhengên Çapkirî
2. Ferhengên Online

c. Li gor şêwaza nivîsînê ferheng:

1. Ferhengên Menzûm (Helbestkî)
2. Ferhengên Pexşanî

Em van sernavan hinekî zelal bikin ta ku em bikaribin cihêbûn, ciyawazî û taybetîyên wan ji hev der bixin:

Li gor Çavkanîya Ferhengê

Ferhengên Zimanê Nivîskî:

Her zimanek, bi zimanê axaftinê û zimanê nivîskî yê xwe heye. Zimanê nivîskî, her wekî ji navê wê jî dikare bihê têgihîştin ku ew ziman e ku di deqên edebî de dihê bikaranîn û bi piştgirîya dezgehên dewletê jî piştevanîya wê dihê kirin Zimanê nivîskî, ji aliyê her endamê civaka wî zimanî ve bi heman awayî dihê têgihîştin. Lewra zimanê nivîskî, zimanekî yekgirtî ye ku di dezgehên hukmî ên dewletê de dihê bikaranîn. Ferhengên zimanê nivîskî jî, li ser vî zimanê ku rêzik û qaîdeyên wê dîyar in ava dibin. Ev rêzik û qaîde jî di berhemên nivîskî de ne ku ji bo ferhengên zimanê nivîskî dibin çavkanîyeke sereke.

Li gor agahîyên me bi dest xistine di zimanê kurdî de cara yekem ferhenga zimanê nivîskî ji aliyê Ehmedê Xanî ve hatiye nivîsîn ku navê ferhenga wî Nûbihara

Biçûkan e.⁸ Ev ferheng, ferhengeke menzûm e. Ehmedê Xanî ev ferheng, bi mebesta têgihên dînî yên erebî bo fêrî zarokên kurd bike amade kiriye. Dîsa ferhengeke menzûm a giring jî ya Şêx Merûfê Nodeyî ye ku navê berhema wî Kitabû Ehmedîye ye. Ev berhem nêzikî ji pîştî sedsalekê ya Ehmedê Xanî hatiye nivîsîn.

Dîsa em dikarin ji wan ferhengên pêşîn ên kurdî, ferhenga Maurizio Garzonîyê Îtalîya Rêziman û Ferhenga Zimanê Kurdî (*Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda*) wek mînak nîşan bidin. Garzonîyê keşîşê îtalî ev berhema xwe di sala 1787an de amade kiriye ku di gera xwe ya li Amêdîyê de berhev kiriye.⁹

Ji wan ferhengên pêşîn, Dictionnaire Kurde-Français (Ferhenga Kurdî - Fransî) ya Alexander Aguste Jaba hêjayê bibîranînê ye. Di vê ferhengê de dora 15000 peyv hatine berhevkirin û ferheng jî 463 rûpelan pêk dihê.¹⁰

Ferhengên Devokan

Ev ferheng in ku li serzaravayekî ku di nav sînorên herêmeke biçûk a dîyar de dihê axaftin de radiweste. Devok, awayên axaftinê ya ziman û zaravayekî ji zimanê standart cuda û di nav herêmeke nişînê ya biçûk de dihê axaftinê ye.¹¹ Bo mînak devoka Serhedê, Botanê, Behdînan, Hekarîyê hwd.

Her ziman, xwedî devokên cur bi cur in. Ev curbicurî jî dikare bibe astengek li pêşîya ragihandinê. Ji bo têgihîştin û ragihandineke baş ferhengên devokan dikarin bihên amadekirin. Ferhengên devokan, li gor hin rêzik û prensîban ava dibin. Nurettin Demir, ferhengên devokan li gor hin rêzikan polîn dîke:

1. *Ferhengên Devokan yên ji ser Herêmi û Ferhengên Giştî yên Devokan:* Ev ferheng, ji aliyê sînorên herêma ku kereste jê hatine girtin ve dihê polînkirin.

2. *Ferhengên Devokan ên Herêmên Berfireh:* Ev ferheng, keresteyên herêmên berfireh di xwe de dihundirînin.

⁸ Kadri Yıldırım, *Ehmedê Xanî Külliyyatı IV- Dîwan*, Avesta, 2014, İstanbul, r. 18.

⁹ Salih Akin, “Nivîskarîya Ferhengê ya Kurdî (Ferhengnûsîya Kurdî)”*Lêkolînên Zimannasîya Kurdî*, Avesta, Stenbol, 2013, r. 58.

¹⁰ Seyfettin Aykaç, “*Mela Mehmûdê Tîruwayî û Ferhenga Wî Ya Menzûm*”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnekirî, Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Zindî, Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî, Çewlik, 2016, r. 4.

¹¹ Nurettin Demir, “Ağz Terimi Üzerine”, *TürkbiligDergisi*, 2002, r. 107.

3. *Ferhengên Devokan yên Herêmên Teng*: Ev cure ferheng jî keresteyên li herêmên teng ên wekî parêzgeh, navçe, gund û gundik di xwe de dihundirîne.

Em dikarin ferhengên devokan li gor cureyên keresteyên hundurîn ên ferhengê jî polîn bikin: “Ferhengên devokan yên giştî, ferhengên gotinên pêşîyan yên devokî, ferhengên biwêjan yên devokî, ferhengên nifiran yên devokî ferhengên duayan yên devokî û ferhengên taybet yên devokî”.¹²

Di warê ferhengên devokî yên kurdî de bi qasî ku dihê zanîn kêma xebat hatine kirin. Yek ji wan xebatên devokî ya serbixwe, berhema Mehmet Oncu ye ku navê berhemê *Ferhenga Devoka Herêma Semsûrê* ye. Dîsa em dikarin berhema Ferhenga Botan ya Bahatîn Robar û teza lîsansa bilind ya Abdurrahman Yilmaz ku navê wê *Zazakî-Tirkî Qisêbend (Luekê Darêyêni-Çolig)* ango Ferhenga Zazakî-Tirkî (Herêma Darahênî û Çewlikê) wekî mînak dikarin bidin.

*Li gor Cihê Tomarkirina Ferhengê
Ferhengên Çapkirî*

Ew ferheng in ku bi awayê pirtûk û li ser kaxizan hatine duristkirin. Ev ferheng ji ber ku bi hebûneke fîzîkî ya xwe hene dibe ku ji ferhengên online gelekî mesrefdar bin. Lewra ev cure ferheng parastin, çapkirin û veguhaztina wan zehmet in. Herwiha guherînên li ser van ferhengan jî mesrefdar in. Lewra eger guherîn yan jî lêzêdekirinek bihê xwestin ku li ser van ferhengan bihêkirin encax bi çapên nû ve ev kar dikare bihêkirin. Di qada ferhengên çapkirî de mînaka Ferhenga Oxfordê dikare bihê dayîn ku ev ferhengeke navdar û bihêz e.

Ferhengên Online

Ferhengên online, ji navê wê jî diyar e ku di qada înternetê de xwedî cih e. Di vê ferhengê de guherîn û lêzêdekirin bi awayeke hemaheng dikare bihêkirin. Ev tişt jî pirsgirêkên ferhengên çapkirî ji holê radike. Herwiha ev cure ferheng ji ferhengên çapkirî ergonomîktir in. Û ev ferheng, berbelavtir in him jî erzantir in. Dîsa em dikarin ji bo ferhengên online Ferhenga Oxfordê ya Online (<https://www.oxfordlearnersdictionaries.com>) mînak bidin.

¹² Nadir İlhan, g.n.b., r. 542.

Li gor Şêwaza Nivîsînê Ferheng

Ferhengên Menzûm (Helbestkî):

Ew ferheng in ku bi awayê helbestkî hatine nivîsîn. Ev ferheng, zêdetir ji bo jiberkirina helbest û mijarên fêrkarîyê (dîdaktîk) hatine bikaranîn. Di van ferhengan de ji ber awayê helbestbûna wan, hunerên edebîjî henin. Ev cure ferheng zêdetir di edebîyata klasîk de hatine bikaranîn, ji bo fêrkirina arûz û agahîyên dînî û hwd. Di edebîyata farsî, erebî û kurdî ya klasîk de gelek mînakên van ferhengan hene. Bo mînak: bi qasî ku dihê zanîn cara yekem ferhengeke menzûm ji aliyê Reşîduddîn Vatvat (M.1182) ê îranî ve hatiye nivîsîn. Ji ereban jî Îbnî Malîk (M.1274) ferhenga menzûm a bi navê *Kitabul-Elifîye* berhemeke ji 1000 beytan pêk dihê, nivîsîye. Û herwiha berhema Ebu Nasrê Ferahanî (M.1221) ya bi navê *Nisabus Sibyan* a erebî-farsî ji ferhengên menzûm ên herî pêşîn û navdar in.¹³

Di qada kurdî de jî ferhengên menzûm henin. Bo mînak, ferhenga Ehmedê Xanî ya Nûbihara Biçûkan ferhanga menzûm a kurdî ya yekem e û di heman demê de ev ferhenga kurdî ya yekem e jî.¹⁴Ji piştî Ehmedê Xanî xwendekarê wî Îsmailê Bazidî(1655-1710) jî ferhengeke menzûm a kurdî bi navê *Gulzar* nivîsîye. Lê ev berhem di roja îroyîn de li ber destan nîn e, ango negihîştîye me.¹⁵Di sala 1912an de jî Şêx Mihemed Kerbelayî bi navê *Mîrsadu'l-Etfâl ew Şahrahê Kûdekan* ferhengeke menzûm a kurdî ji bo fêrkirina farsî bo zarokên kurd û birazîyê xwe nivîsîye. Di beyta jêrîn de jî ev armanca xwe wiha destnîşan kiriye:

Li ser Etfâl û ewladê di Kurdan
Lîsanê Farisî û meqsedê wan¹⁶

Herwiha Şêx Me'rûfê Nodeyî jî di sala 1790î de bi navê *Luxetnâme-yê Ehmedî* ferhengeke menzûm a kurdî nivîsîye. Wî jî ji bo erebî fêrî kurê xwe yê bi navê

¹³ Nadir İlhan, g.n.b., r. 548.

¹⁴Mustafa Öztürk, "Manzum Sözlüklerden Sübha-i Sıbyân İle Kürtçedeki İlk Manzum Sözlük Nûbehara Biçûkan Arasında Bir Karşılaştırma"*The Journal of Mesopotamian Studies*, c.1/1, 2016, r. 6.

¹⁵ Mustafa Öztürk, h.g., r. 6.

¹⁶ Nusrettin Bolelli & Nurettin Ertekin, "Ferhengên Menzûm Di Edebîyata Kurdî De", **Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi**, Yıl:3, Cilt:3, Sayı:5, Haziran 2017, r. 28.

Ehmed bike nivîsiye. Navê berhemê jî ji ber wê *Luxetnâme*yê *Ehmedî* ye. Di beytên jêrîn de armanca nivîsîna vê ferhengê wiha dîyar kiriye:

Ta kî ferzendem Ehmed bê te'eb
Şewed danayê luxatê 'ereb¹⁷

Ferhengên menzûm yên kurdî yên din jî ev in: ya Mela Ebdulkerîm Muderris *Duruştêyê Mirwarî*, ya Dilbikulê Cizîrî *Nûbihara Mezinan*, Ebdusettar Rêkanî *Nûbehara Mizgefta Sîriyê* û ya Mela Mehmûd Tîruwayî jî bi navê *Ferhenga Qur'anê* ye.¹⁸

Ferhengên Pexşanî

Ew ferheng in ku ji derveyê şewaza menzum in. Ango hemû ferhengên ji derveyê şewaza menzum dikevin vê komê. Di van ferhengan de hunerên edebî tune, bi awayeke rasterast wateyên peyvên û hin caran jî bilêvkirin, kok û mînakên wan di nav hevokan de dihên dayîn. Em dê di beşên bihê de bi berfirehî li ser bîbliyografiya ferhengên kurdî yên pexşanî rawestî.

Fonksiyonên Ferhengan

Ferhengnivîsîn, ji pêdiviyên wekî dînî, bazirganî, çandî û perwerdehîyê derketiye.¹⁹ Ji ber vê hindê di qadên jîyanê yên curbicur de ferheng xwedî giringîyekê ye. Di serdema kevin a welatê Çînê de ferheng ji bo jêfêhmkirina berhemên klasîk dihatin amadekirin.²⁰ Di serdema kevn a Hîndistanê de jî ji bo hînkirina oldaran ji nivîsarên dînî yên Vedîk peyvên ku wateyên wan nedihat zanîn, wek ferheng hatibûn çêkirin. Dîsa di serdema kevn a Hîndistanê de ferheng ji bo jîberkirina peyvên bi awayeke menzum dihatin amadekirin. Yek ji wan welatan ê ku ferhengnivîsî lê geş bû, Erebia bû. Di serdema derketin û piştî dînê îslamê de karê ferhengnivîsînê pêş ket. Li vê derê jî çawa ku ji bo fêrbûna oldarên dînê Vedîk ferheng hatibûn amadekirin, ji bo oldarên dînê muslimantîyê jî ferhengên curbicur hatin amadekirin. Ev ferheng zêdetir ji bo jêfêhmkirina Qur'an û Hedîsan dihatin

¹⁷ Nusrettin Bolelli & Nurettin Ertekin, g.n.b., r. 30.

¹⁸ Mustafa Öztürk, g.n.b., r. 7.

¹⁹ Pelin Kocapınar, "Sözlüklerin Ortaya Çıkışıyla İlgili Teoriler Üzerine Bir Değerlendirme", **Gazi Türkiyat Dergisi**, 2015, r. 130.

²⁰ Pelin Kocapınar, h.g., r. 131.

çêkirin. Wisa xuya ye ku di warê pêşketin û geşbûna ferhengan de rist û rola dîn gelek e.²¹

Faktora bazirganîyê jî di pêşketina karê ferhengnivîsînê de xwedî roleke giring e. Qeydkirina navên riwek û keresteyên firoşkarîyê bi awayeke sirûştî ferheng derxistine holê. Di serdemên kevn de firoşkar û bazirganan navên gelek riwek û keresteyên firoşkarîyê qeyd kiribûn. Ev tişt jî rê li ber karê ferhengnivîsînê xweş kiriye.

Di serdema Yewnanistan a Kevn dexebatên li ser zimanî jî karê ferhengnivîsînê pêş xistiye. Bo mînak, berhema Arîstophanesî ya *Lekseis* an jî *Glossai*, berhema Neoptolemos a bi navê *Ferhenga Homeros*, xebatên wekî *Ferhengên Aîolîa* û *Li Ser Ferhengan* yên Antîgognos dikare bihên dayîn.²²

Ferheng, dikarin li ser rehnaşîya peyvan jî bihên amadekirin, di serdema Romayê de Marcus Terentius Varro di berhema xwe ya bi navê *De Lingua Latina* (*Li Ser Zimanê Latîni*) de li ser rehnaşîya wî zimanî rawestiyaye. Herwiha berhema wî ya *De Origine Linguae Latinae* (*Li Ser Rehê Zimanê Latîni*) heye ku ev berhem winda ye.²³

Wek Zanistek Ferhengnûsî (Leksîkografî), Ferhengnasî (Leksîkolojî) û Dîroka Ferhengnûsîyê

Ji piştî pênasîyên ferhengê, cureyê wan û fonksîyonên wan em dê di vê beşê de li ser cudahîya ferhengnûsîn (leksîkografî) û ferhengnasîyê (leksîkolojî) û dîroka ferhengnûsîyê rawestin. Gelek caran ev her du têgih di dewsa hevdu de bi awayeke şaş dihên bikaranîn. Sedema şaş bikaranîna van herdu têgihan, ji ber qada wan a heman e. Lewra ev her du zanist jî li ser ferhengê radiwestin. Lê divê em bizanibin ku pêvajoya sazîkirin û nivîsîna ferhengê tişteke e û zanista rêzik û prensîbên ferhengsazîkirinê tişteke din e. Em dikarin bêjin ku qada xebatê ya di pratîkê de

²¹ Pelin Kocapınar, h.g., r. 131-137.

²² Pelin Kocapınar, h.g., r. 137.

²³ Pelin Kocapınar, h.g., r. 138.

ferhengnûsî (lexicography), qada giştî ya xebata teorîk jî *ferhengnasî (lexicology)* ye.²⁴

Peyva *lexicography*ê ji aliyê etîmolojîk ve ji peyvên zimanê yewnanî ya kevn ên *lexikón (ferheng) û gráphein (nivîsîn)*ê pêk dihê ku jipêkhatina van, peyva hevedudanî ya *lexicography (ferhengnûsî)* durist bûye.²⁵ Wisa jî peyva *lexicology*ê jî bi heman mantiqî saz bûye ku ji peyvên zimanê yewnanî ya kevn *lexikón (ferheng) û logía (zanîn, nasîn, lexicology)* ferhengnasî saz bûye.²⁶

Li gor zimannas Dogan Aksan jî cudahîya ferhengnasîyê ji ferhengnûsîyê ew e ku ferhengnasî rasterast li ser rêbazên amadekirina ferhengan radiweste û di pratîkê de bi sazkirina ferhengê re mijûl nabe.²⁷ Em dikarin bêjin karên amadekirin û pêvajoya sazkirina ferhengê *ferhengnûsî (lexicography)* ye û karên qada teorîk jî *ferhengnasî (lexicology)* ye.²⁸

Rasterast armanceke ferhengnasîyê a sazkirina ferhengê tune, tenê bi agahîyên teorîk û hin rêbazan ve piştgirîya pêvajoya ferhengnivîsînê dike.²⁹ Zimannas Franz Josef Hausmann jî ferhengnûsîyê wek *pêvajoya nivîsîn û sazkirina ferhengê* dibîne û wisa jî pênase dike.³⁰

Di ferhenga navdar a Redhouseê de jî peyva *lexicology*ê bi erebî wek “ilmê lûxatê” û *lexicography* jî wek “karê sazkirina ferhengê” hatiye pênasekirin.³¹

Herçendî ji ber şaşbikaranîna van peyvan sergêjîyek hebe jî em dikarin xwe bispêrin etîmolojîya van peyvan û ji bo herdu zanist û karan têgihîştineke hevpar çêbikin. Ji bo ev herdu zanist û karê ferhengsazîyê bihê têgiştin divê dîroka wê jî bihê zanîn.

²⁴ Emrah Özcan, “Sözlükbilim ve Sözlükçülük Terimlerinin Kullanımı Üzerine”, **YILDIZ Journal of Educational Research**, 2018, r. 8.

²⁵ Fırat Erikli, “Leksikografi Nedir? Terimin Uygulama ve Kuram Temelli Türkçe Karşılıkları ve Bu Karşılıkların Kapsamları”, **Hacettepe Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Dergisi**, Haziran/June, 2019, 36 (1), 1-10, r. 2.

²⁶ Şükrü Haluk Akalın, “Sözcük Bilimi ve Sözlükçülük”, **Türk Dili ve Edebiyat Dergisi**, 2009, r. 167.

²⁷ Emrah Özcan, g.n.b., r. 9.

²⁸ Şükrü Haluk Akalın, g.n.b., r. 164.

²⁹ Fırat Erikli, g.n.b., r. 9.

³⁰ Fırat Erikli, g.n.b., r. 5.

³¹ Şükrü Haluk Akalın, g.n.b., r. 166.

Di dírokê de bi qasî ku dihê zanîn xebata ferhengî a pêşîn, li welatê Çînê berhema bi navê *Shizhou* ye. Lê ev berhem ne li ber destan e. Herwiha li Çînê xebatên ferhengî hêj BZê bi destê Xanedanîya Xan(漢朝: *Hàn Cháo*), ferhengên bi navên *Erya* û *Shuōwén Jiězi* ji bo têgihîştina berhemên klasîk hatine amadekirin.³²

Li welatê Hîndistanê jî xebatên pêşîn ên ferhengî hêj di salên 1000î ên BZê de dest pê kirine. Ji bo têgihîştina nivîsarên dînê *veda* yê hindî berhevoka bi navê *Nighantu* û zanista *Niruktayê* dikare wek xebatên pêşîn ên ferhengî li Hindistanê bihê jimartin.³³ Kevintirîn xebata ferhengî ya hindî jî bi navê *Amarakosha* ye ku tê de peyvên hevwater hatine rêzkirin.

Herçendî li nav şaristanîyên cur bi cur de xebatên ferhengî yên pêşîn hebin jî li gor hin çavkanîyan wek ferhenga pêşîn a cîhanê *Urra Hubullu* dihê jimartin. Ev ferhengeke bi duzimanî (sumerî û akadî) ye û ya babîlan e. Di vê ferhengê de navên amûrên bi deryayê re têkildar, ajal, gîha û stêrkan hene.³⁴ Ya rastî yekembûna vê ferhengê jî cihê dudilîyê ye lewra eger li gor prensîba *ferhenga duzimanî ya pêşîn* be ev ferhenga *Urra Hubullu* dibe ya yekem lê eger li gor prensîba *ferhenga yekzimanî ya pêşîn* be wekî me berê jî dest nîşan kiribû di nav civata Çîn û Hîndistanê de mînakên ferhengan dikarin wek ferhengên pêşîn bihên jimartin.

Li erdnîgarîya Rojava jî karên ferhengnûsî û sazkarîya ferhengê di demên BZê de dest pê kirine. Di Yewnana Antîk de civateke rewşenbîrîyê ya filozofan hebû. Vê civatê serkêşîya karên ferhengnûsîyê kirine û qîmet dane berhemên edebî. Ji bo têgihîştina berhemên edebî û di nivîsîna berhemên de alîkarîya helbestvanan bike, ferheng saz kirine. Bi taybetî jî xebatên li ser zimannasîyê û xebatên nasîna rehên peyvên rê li ber ferhengnûsîyê xweş kirine.³⁵ Yek ji wan ferhengên pêşîn jî ferhenga *Lexicon* ya Aristophanes e ku wî di heman demê de serokatîya pirtûkxaneyê Îskenderîyeyê dikir. Wî di vê ferhengê xwe decih daye peyvên kêmnas û kêmbikarhênan yên zimanê yewnanî.³⁶ Dîsa di serdema Helenîstîk de *Ferhenga*

³² Pelin Kocapınar, g.n.b., r. 131.

³³ Pelin Kocapınar, g.n.b., r. 132.

³⁴ Pelin Kocapınar, g.n.b., r. 136.

³⁵ Pelin Kocapınar, g.n.b., r. 137.

³⁶ Zekerîya Bingol, "Sözlük ve Sözlükçülük Üzerine Bir Araştırma", *Akademik Bakış Dergisi*, 2007, r. 200.

Homeros ya Neoptolemosî û berhemên Antigonos yên bi navên *Peri Lekseos* (*Li Ser Ferhengan*) û *Aiolia* jî xebatên giring in.³⁷

Di cîhana latînî de jî karên ferhengnûsîyê hêj di serdemên berê de (BZ. ss.1.) dest pê kiribû. Bo mînak xebata Verrius Flaccusî ya bi navê *De Verborum Significatuone* (*Li Ser Wateyên Peyvan*) dikare bihê dayîn. Ev ferheng, wek yekem ferhenga cîhana latînî dihê jimartin.³⁸

Li erdnîgarîya Rojhilata Navîn jî karê ferhengnûsîyê pêş ketiye. Bo mînak bi derketina dînê îslamê re ji bo têgihîştina Quran û hedîsên pêxemberê dînê îslamê gelek berhemên ferhengî hatin duristkirin. Bo mînak di cîhana erebî de xebatên ferhengî yên pêşîn bi berhemên bi navên *Xarîbû'l-Kur'an* ya Atâ b. Ebu Rebâh, *El-Lugat fi'l-Kur'an* ya İbn Abbas û *Mesâilü Nâfi b. El-Ezrâk* ya Nâfi b. Ezrâk ve dest pê dikin.³⁹ Bi tevî van zêdetir jî xebatên ferhengî yên tematîk hatine amadekirin. Ev ferheng, mijarên xwe ji jîyana rojane girtine, herwekî navên cureyên xurmeyan, zeytûnan û riwekan. Bo mînak berhemên bi navên *Kitâbu'l-Haşerât*, *Kitâbu'l-Hayl*, *Kitâbu'l-ibil*, *Kitâbu'l-Matar*, *Kitâbu'l-Xalqi'l-İnsan* dikare bihên dayîn.⁴⁰

Bêguman em dikarin gelek mînakên ferhengan yên pêşîn bidin lê ji ber ku ev tişt derveyê sînorê xebata me ye, me tenê mînakên ferhengan yên pêşîn yên şaristanîyên curbicur dan. Herçendî dîroka ferhengnûsîyê kevn be jî wek zanistek ferhengnûsî hê jî nû ye û gelek caran bi zanista ferhengnasîyê ve ji hev nahê derxistin û bi şaşî dihê fehmkirin. Wek awayeke teorîk pênasekirina ferhengnûsîyê cara yekem ji alîyê zimanzanê elmanî Kuhn ve hatiye kirin ku wî ferhengnûsî wek *teorîya karê ferhengnivîsînê* pênase kiriye.⁴¹ Lê pîranîya zimanzanan ji derveyê vê pênaseyê, ferhengnûsîyê wek *karê pratîk ê sazkirina ferhengê* pênase dikin.

³⁷ Pelin Kocapınar, g.n.b., r. 137.

³⁸ Yusuf Akçay, "Doğuda ve Batıda Sözlükçülüğün Gelişimi ve Osmanlı Dönemi Sözlük Metinlerine Genel Bir Bakış", *Dil ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi*, 2011, r. 283.

³⁹ Yusuf Akçay, h.g., r. 285.

⁴⁰ Pelin Kocapınar, g.n.b., r.134.

⁴¹ Fırat Erikli, g.n.b., r. 2.

Henne jî karê ferhengnûsîyê dabeşî sê qonaxan kiriye: wek *pêvajoya nivîsîna ferhengê*, *wek berhema vê pêvajoyê: ferheng bi xwe û rê û rêbazên berhevkirina yekeyên ferhengê*.⁴²

Di salên 80yî de xebatên li ser teorî û pênaseyên ferhengnûsî û ferhengnasîyê zêdetir bûne. Zimanzanê elman Franz Josef Hausmann jî ferhengnûsî wek *pêvajoya nivîsîna ferhengê* pênase kiriye û destnîşan kiriye ku divê binbeşeke vê zanista ferhengnûsîyê wek bi navê *metaleksikografîyê* bihê avakirin. Wî *metaleksikografî* (serferhengnûsî) wek her xebata lêhûrbûn û lêkolîna ser çêkirina ferhengê ya bêyî ku armanc çêkirina ferhengê be pênase kiriye.⁴³ Ev pênaseya wî bi rastî jî kêşe ye û derveyî mantiq e. Bi pênaseyeke zelal *metaleksikografî*, li ser pêvajoyên wekî *lêkolînên bikaranîna ferhengê*, *lêkolînên rexneya ferhengê*, *lêkolînên diroka ferhengnûsîyê* û *lêkolînên ferhengê yên sistematîk* radiwest e.⁴⁴

Ji piştî salên 90î ve êdî qonaxe din a ferhengnûsîyê dest pê kiriye ku ferheng li ser onlineyê cihê xwe girtine. Bi saya teknolojîyê em roja îroyîn bi aweyeke hemaheng ji ferhengên online sûd werdigirin ku di nav çirkeyekê de ji zimanekî bo zimanekî din ji me re wergêranê dike. Yan jî hema bi tikandinekê ve peyva ku em lê digerin derdixe pêşberê me. Herwiha di vê qonaxa ku em tê de ne, ferheng ne bi tenê di karê rêzimanasîyê de dihê bikaranîn, herwisa jî ferhengên elektronîk di qada zanistên cur bi cur de dihê bikaranîn: bo mînak, ferhengên elektronîk di qadên *endazyariya zimanê siruştî (natural language engineering)*, *zîrekîya bidestçêkirî: destkarî (artificial intelligence)*, *wergêrana bi makîneyan (machine translation)* û bi makîneyên teknolojîk ve di *pevgîhandina peyv û axaftinê (speech synthesis)* de ji bo robotan dihê bikaranîn.⁴⁵

Ji piştî vê beşê em dê niha jî bi serenavekê ya beşek serbixwe cih bidin ferhengnûsî û ferhengnasîya kurdî. Di vê beşa bihê de em dê li ser kurtedîroka

⁴² Fırat Erikli, g.n.b., r. 3.

⁴³ Fırat Erikli, g.n.b., r. 5.

⁴⁴ Dilber Zeytinkaya, “Sözlük Kullanımının Yabancı Dilde Sözcük Öğrenimine Etkisi”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnekirî, Marmara Üniversitesi Eğitim Bilimleri Enstitüsü, Yabancı Diller Anabilim Dalı Fransız Dili Eğitimi Bilim Dalı, İstanbul, 2014, r. 55.

⁴⁵ Özgür Aydın, “Sözcükbilim ve Sözlükçülük”, https://acikders.ankara.edu.tr/pluginfile.php/18170/mod_resource/content/0/sozlukbilim_izlek06.pdf (24.12.2021)

ferhengnûsîya kurdî û cureyên ferhengên kurdî, herwiha mînakên sereke yê ferhengên kurdî bidin.

Ev teza me ji destpêk û sê beşan pêk dihê. Em di beşa *Destpêkê* de li ser pênase, cure û fonksiyonên ferhengan rawestîyan. Herwiha di vê beşê de em li ser cudahiya ferhengnûsî (leksîkografî) û ferhengnasîyê (leksîkolojî) û kurtedîroka ferhengnûsîya cîhanê rawestîyan.

Em di beşa yekem a bi sernavê *Ferhengnûsî û Ferhengnasîya Kurdî* de jî li ser bîbliyografyaya ferhengên kurdî - ji destpêkê (*Nûbihara Biçûkan* ya Ehmedê Xanî) heta roja îroyîn - (*Ferhengî Ferhengekan* ya Lijney Bîbliyografyay Ekdîmyay Kurdî ku di sala 2023an de hat weşandin) rawestîyan. Dîsa di beşa yekem de me ferhengnûsîya kurdî li gor dabeşkirina *Qonaxên Ferhengnûsîya Kurdî* ya Salih Akinî kir.

Me di beşa duyem a bi sernavê *Zimanê Kurdî û Devoka Serhedê* de jî bi awayeke giştî behsa zimanê kurdî, devok û zaravayên wê, herêmên zaravayan bi taybetî sînorên devoka herêma Serhedê, taybetiyên devoka Serhedê yê fonolojîk û morfolojîk, xebatên ferhengî û akademîk yê ku li ser devoka Serhedê kir.

Me di beşa sêyem a *Ferhenga Devoka Herêma Serhedê* de jî peyv, biwêj û gotinên pêşîyan yê ku peyda kiribûn tê de bi cih kir. Ev beş, beşa esasî ya teza me ye ku em bi temamî li ser rawestîyan. Di vê beşê de me her made bi maneyên wan ên cu bi cur ve dan. Û herwiha me her made bi alfabeya navneteweyî ya fonetîkî (IPA) ve jî dan lewra hin dengên kurdî hene ku ji bo wan tîp nehatine destnîşankirin, ev tişt jî pêdivî pê anî ku em her madeyan bi IPAyê binivîsin.

1. FERHENG NÛSÎ Û FERHENG NASÎYA KURDÎ

Em dê di vê beşê de bi awayeke giştî ji destpêkê heta roja îroyîn bi rêza kronolojîkê li ser dîrokçeya ferhengnûsî û ferhengnasîya kurdî rawestin. Ji bo nivîsîna dîrokçeya ferhengnûsîya kurdî jî em dê ferhengan li gor senifandin û dabeşkirina qonaxan ya Salih Akinîrêz bikin. Salih Akin, ferhengnûsîya kurdî dabeşê sê qonaxan dike: *Qonaxa Destpêkê (Sedsalên 17-19em)*, *Qonaxa Di Dema Tevgera Neteweyî de Ferhengnûsî (Sedsala 20em)* û *Ferhengnûsîyeke Geş (Sedsala 21em)*.

1.1. Qonaxa Destpêkê ya Ferhengnûsîya Kurdî (Sedsalên 17-19em)

Herwekî me di beşa yekem de jî destnîşan kiribû di zimanê kurdî de cara yekem ferhenga kurdî bi destê Ehmedê Xanî hatiye amadekirin ku navê ferhenga wî *Nûbihara Biçûkan* e.⁴⁶ Ev ferheng di sala 1683yan de bi mebesta têgihên dînê îslamê fêrî zarokên kurd bike hatiye amadekirin. Ev ferheng bi awayê nezmê hatiye amadekirin ku ji 220 malikan û 13 qit'eyan pêk dihê û maneyên bergindên 1000 peyvên erebî bi kurdî hatine daîn.⁴⁷

Herçendî ji aliyê mebesta amadekirina ferhengê ve ferhenga yekem Nûbihara Biçûkan a Ehmedê Xanî be jî, ji aliyê kronolojîk ve xebata ferhengî ya kurdî ya yekem listeya peyvên ango ferhengoka Ewliyayê Çelebî ye ku di salên gera wî ya bo Kurdistanê a 1655an de hatiye nivîsîn ku ev dîrok jî berî nivîsîna ferhenga Nûbihara Biçûkan (1684) e. Ewliya Çelebî di berhema xwe ya bi navê *Seyahatnameyê* de ji geşta xwe ya Kurdistanê peyvên kurdî berhev kiriye û di cildên 4em û 5em yê wê berheme de bi cih kiriye. Martin van Bruinessen, Ewliyayê Çelebîyî ji ber xebatên wî yê li ser civata kurdî wek kurdologê yekem dihesibîne.⁴⁸

Li gor Ferhad Pîrbal destnîşan dike di sala 1700î de ferhengokeke tirkî-kurdî(kurmancî) hatiye amadekirin ku di pirtûkxaneyê *Darel Seddam lil Mextûtat* a li Bexdayê de ye û ji 42 rûpelan pêk dihê û bi hejmara 19936an ve dihê parastin. Dîsa

⁴⁶ Nusrettin Boleli, Nurettin Ertekin, "Ferhengên Menzûm Di Edebîyata Kurdî De", **Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi**, 2017, r. 23.

⁴⁷ Mustafa Öztürk, g.n.b., r. 6.

⁴⁸ Martin Van Bruinessen, "Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebi'nin Notları", **Studia Kurdica**, 1985, r. 31.

di vê pirtûkxaneyê de ferhengoke farsî-kurdî (kurmancî) a 20 rûpelan bi hejmara 20518an ve dihê parastin.⁴⁹ Dîsa li gor ku Ferhad Pîrbal dîyar dike di sala 1772yan de ferhengeke bi navê *Zewahîr Ellûxeta* farsî-kurdî ji aliyê Mela Mihemedê Ciwanroyî ve hatiye amadekirin. Ev ferheng jî ji 73 rûpelan pêk dihê û dîsa di heman pirtûkxaneyê *Darel Seddam lîl Mextûtat* a li Bexdayê de bi hejmara 19988an ve dihê parastin.⁵⁰

Herwiha ji bo vê qonaxa ferhengnûsîyê em dikarin hin ferhengên kurdî yê menzûm mînak bidin ku hêjayê bibîranînê ne. Ji piştî Ehmedê Xanî xwendekarê wî Îsmailê Bazidî (1655-1710) jî ferhengeke menzûm a kurdî bi navê *Gulzar* nivîsîye. Lê ev berhem di roja îroyîn de li ber destan nîn e, ango negihîştîye me.⁵¹ Herwiha Şêx Me‘rûfê Nodeyî jî di sala 1790î de bi navê *Luxetnâme-yê Ehmedîye* ferhengeke menzûm a kurdî nivîsîye. Wî jî ji bo erebî fêrî kurê xwe yê bi navê Ehmed bike nivîsîye. Navê berhemê jî ji ber wê *Luxetnâme-yê Ehmedî* ye. Di beytên jêrîn de armanca nivîsîna vê ferhengê wiha dîyar kiriye:

Ta kî ferzendem Ehmed bê te’eb
Şewed danayê luxatê ‘ereb⁵²

Piştî van xebatên destpêkê yê ferhengnûsîya kurdî, çar lêkolînên giring yê xwedî mebestên cuda li pey dihên. Ev xebat, ên zanayên bîyanî ne ku ji bo rêziman û gencîneya peyvên kurdî bidin nasîn wan ji ger û serdanên xwe yê eyaletên Kurdistanê dane hev. Kesê yekê ji van zanayan, keşîşê katolîk Maurizio Garzonî ye ku di sedsala 18an de Romayê ew şandiye Mîrnişîna Bahdînan. Garzonîyê ku 20 salan li bajarê Amêdiyê maye, daneyên xwe di berhema xwe *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda* de berhev dike ku di sala 1787an de li Romayê wê diweşîne. Di vê berhema 288 rûpelî de, bi qasî 6700 peyv bi kurdî û beramberî wê

⁴⁹ Nurullah Alkaç, Kürtçe Gökten Mi İndirildi, <https://www.indyturk.com/node/92386/türkiyeden-sesler/kürtçe-gökten-mi-indi-2> (02.06.2023)

⁵⁰ Yusuf Taştan, “**Dîroka Wergerê û Xebatên Wergera Kurdî**”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnekirî, Zanîngeha Van Yuzuncu Yilê Enstîtuya Zimanên Zindî, Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Wan, 2019, r. 31.

⁵¹ Mustafa Öztürk, g.n.b., r. 6.

⁵² Nusrettin Bolelli & Nurettin Ertekin, g.n.b., r. 30.

bergîndên wê yên zimanê îtalî hatiye dayîn.⁵³ Herwiha hêjayê gotinê ye dîsa di sala 1787an de di bin hîmayeya hukumdara rûsî Katerîna Mezin de ji aliyê endamê Akademîya Zanistî ya Rûsî Peter Simon Pallas ve ferhengeke mezin a pirzimanî ya cîhanî (*Linguarum Totius Orbis Vocabularia Comparativa*) hatiye amadekirin ku 276 peyvên kurdî jî tê de heye.⁵⁴ Her çendî ev berhema Akademîya Zanistî ya Rûsî qebarebiçûk bejî ji xebatên pêşîn ên qada kurdnasîyê ye, ji ber vê giringî pê heye. Wekî tê zanîn xebatên kurdnasîyê bi destê Rûsyayê hatiye destpêkirin. Ev xebata ferhengî ya Peter Simon Pallas berîya Garzonî hatiye destpêkirin lê ji ber temamkirina qebareya wê ya mezin ji piştî ya Garzonî di sala 1791an de hatiye çapkirin.

Johan Anton Güldenstädt, di sala 1787an de di berhema bi navê *Reisen durch Russland und im Caucasischen Gebürge* de cih daye peyvên kurdî ku ev peyv di navbera rûpelên 545-558an de ye.⁵⁵ Ev listeya peyvên hêjayê bibîranînê ye, lewra yek ji wan listeyên pêşîn a peyvên kurdî ye.

Zimanzan û oryantalistê elman Julius Klaproth, di sala 1814an de bi navê *Kurdisches Wörterverzeichnis, mit dem Persischen und anderen verwandten Sprachen verglichen* (Berawirdkirina Peyvên Kurdî bi Farsî û Zimanên Din) ferhengokek amade kiriye û li Vîyanayê çap kiriye. Ev ferhengok, bi qasî qebareya 9 rûpelan e.⁵⁶

Zimannasê ermenî Xaçatur Abovyan ku di derbarê kurdan de xebatên wî yên curbicur hene di sala 1840an de ferhengeke kurmancî-zazakî bi navê *Kurmanji-Zaza Dictionary* amade kiriye û ev ferheng di sala 1848an de çap kiriye.⁵⁷

Kurdologê rûs Peter J. A. Lerch (Peter Ivanovich Lerch), di sala 1858an de di nav berhema xwe ya bi navê “Исследования об иранских курдах и их предках

⁵³ Salih Akin, g.n.b., r. 58.

⁵⁴ Burcu Özdemir & Ayna Askeroğlu Arslan, “Rusya’nın Kürdoloji Çalışmaları (1787-1947)”, *İnsan & İnsan*, Yıl/Year 5, Sayı/Issue 17, Yaz/Summer 2018, 194-213, r. 196.

⁵⁵ Johann Anton Güldenstädt, *Reisen durch Russland und im Caucasischen Gebürge*, <http://elib.shpl.ru/ru/nodes/25532-bd-2-1791#mode/inspect/page/552/zoom/4> (11.06.2023)

⁵⁶ Sacha Alsancaklı, “The Early History of Kurdish Studies (1787–1901)”, *Die Welt des Islams*, Brill, Vol. 56, Issue 1 (2016), pp. 55-88, 2016, Paris, r. 67.

⁵⁷ Ayhan Yıldız, “Lîteratura Manaşî ya Rêzimanîya Kurmancî û Zazakî û Rista Wê”, *Kurdiyat Dergisi*, Yıl/Sal/Year: 2021 Sayı/Hejmar/Issue: 4, r. 72.

северных” (Xebatên li ser Kurd û Xeldanîyên Bakurê Îranê yên Bavûkalên Kurdan) de ferhengoke kurdî-rûsî amade kiriye ku tê de zaravayên kurmancî û zazakî herwiha zimanên îranî bi awayeke berawirdkî hatiye dayîn. Evberhem bi alfabe ya latînî, erebî û kirîlî li St. Petersburgê hatiye çapkirin.⁵⁸ Di vê ferhengê de îdyom, peyv û cureyên lêkerên zazakî û kurmancî hene.

Mela Mehmûdê Bazidî ferhengoke kurdî-tirkî di salên 1860î de amade kiriye ku ji bo balyozê Rûsyayê yê Erziromê Aleksander Jaba fêrî kurdî bike. Ev ferhenga wî di nav destxeta Aleksander Auguste Jabayî ya bi navê *Risale-yi Tuhfetu'l-Hillan Fî Zimani Kurdan* de cih digire. Ev ferhenga Mela Mehmûdê Bazidî ji 50 rûpelî pêk dihê û her wiha 1428 peyvyan dihewîne.⁵⁹

Zimannas û etnologê Awisturyayî Friedrich Müller, di sala 1864ê de di kovara *Orient und Occident* de bi navê *Kurdisches und Syrisches Wörterverzeichnis* (Ferhenga Kurdî û Suryanî) ferhengokek amade kiriye û ji 208 peyvyan pêk dihê.⁶⁰ Herwiha Friedrich Müller, dîsa di sala 1864an de du ferhengokên din yên zaravayên kurdî (kurmancî, zazakî) amade kiriye. Ya yekem bi navê *Beiträge zur Kenntniss der Neupersischen Dialekte: Kurmângi Dialekt der Kurdensprache* (Hevkarî ji bo Nasîna Dîyalektên Farsî ya Nû- Zaravayê Kurdî ya Kurmancî) ye.⁶¹ Ya duyem jî bi navê *Beiträge zur Kenntniss der Neupersischen Dialekte-Zaza Dialekt der Kurdensprache* (Hevkarî ji bo Nasîna Dîyalektên Farsî ya Nû - Zaravayê Kurdî ya Zazakî) ye.⁶²

A. Clémentê frensî, di sala 1866an de di kovara *Le Globe* de bi navê *Vocabulaire Kourde* ferhengokeke frensî-kurdî amade kiriye. Ev ferhengok, ji 16 rûpelan pêk dihê. Ev ferhengok, navên hejmaran, rojên hefteyê, silavdayîn û

⁵⁸ Ümit Işık, “**Xebatek Li Ser Ferhengên Kurdî**”, Teza Lîsansa Bilind a Çapbûyî, Zanîngeha Mûş Alparslan Enstîtûya Zanîstên Cîvakî Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Mûş, 2017, r. 83.

⁵⁹ Mustafa Öztürk, g.n.b., r. 4-5.

⁶⁰ Friedrich Müller, “Kurdisches und Syrisches Wörterverzeichnis” **Orient und Occident**, Verlag der Dieterichschen Buchhandlung, Göttingen, 1864, r. 104-107.

⁶¹ Friedrich Müller, **Beiträge zur Kenntniss der Neupersischen Dialekte - Kurmângi Dialekt der Kurdensprache**, In Commision Bei Karl Gerol's Sohn Buchhändler Der Kaiserlichen Akademie Der Wissenschaften, Wien, 1864.

⁶² Friedrich Müller, **Beiträge zur Kenntniss der Neupersischen Dialekte - Zaza Dialekt der Kurdensprache**, In Commision Bei Karl Gerol's Sohn Buchhändler Der Kaiserlichen Akademie Der Wissenschaften, Wien, 1865.

halpîrsîn û hin peyvên cur bi cur yên ji devera Kerkûk, Rewandiz û Silêmanîyê pêk dihê.⁶³

Elî Ekber Kurdistanî, di sala 1867an de bi navê *Beda'ul Luxat* ferhengeke kurdî(sorani)-farsî amade kiriye. Ev ferheng ji aliyê Jan Dost ve di sala 2010an de bi tîpên latînî hatine wergerandin û bi navê Ferhenga Kurdistanî dîsa hatiye çapkirin.

Mîsyonerê Emerîkî Samuel Audley Rhea, di sala 1869an de berhemeke gramêrî ya bi navê *Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District* nivîsîye ku tê de ferhengokeke kurdî-îngilîzî jî heye. Di vê ferhengokê de bi qasî 1600 peyv hene.⁶⁴

Zimannas û oryantalistê elman Ferdinand Justi, li ser kurdî hin berhem bi elmanî hinek jî frensî dane ku berhemeke wî bi navê *Les noms d'animaux en Kurde* (Navên Heywanan di Kurdî de) ye. Ev ferhengoka wî ji 32 rûpelan pêk dihê û navên heywanên cur bi cur dihewîne û di sala 1878an de li Parîsê çap bûye.⁶⁵

Berhemeke din a pêşîn û giring ferhenga balyozê Rûsyayê yê Erziromê Aleksander Auguste Jaba ye ku navê berhema wî *Dictionnaire Kurde-Français* (Ferhenga Kurdî - Frensî) ye. Ev ferhenga ku di sala 1879an delî ser fermana Akademîya Zanistê ya Împaratorîya Rûsyayê hatiye amadekirin, ji 463 rûpelî pêk dihê û 15000 peyvyan dihewîne. Di vê ferhengê de du alfabe hatine bikaranîn, peyvên kurdî berê bi alfabeya erebî hatine nivîsandin, pişt re bi alfabeya latînî li fransî hatine wergêran.⁶⁶ Ev ferhenga Aleksander Auguste Jabayî, bi destê Ferdinand Justi hatiye çapkirin.⁶⁷

Di sala 1880yan de Ferdinand Justi di nav berhema xwe ya rêzimanê ya *Kurdische Grammatik* de cih daye ferhengoke bi navê *Verzeichnis der Kurdischen*

⁶³ A. Clément, "Vocabulaire Kourde", *Le Globe*, Société de Géographie de Genève, tome:5, pp. 279-295, Genève, 1866, r. 279.

⁶⁴ Qanatê Kurdo, **Ferhenga Kurdî-Rûsî**, Neşîrxana Dewletê ya Ferhengêd Zimanê Miletêd Dereve û yê Sovêtîstanê, Moskova, 1960, r. 17.

⁶⁵ Ferdinand Justi, "Les noms d'animaux en Kurde", **Revue de Linguistique, et de Philologie Comparee**, Imprimerie Nationale, tome: 9, Paris, 1878, r. 1.

⁶⁶ Salih Akin, g.n.b., r. 59.

⁶⁷ Ümit Işık, "**Xebatek Li Ser Ferhengên Kurdî**", Teza Lîsansa Bilind a Çapbûyî, Zanîngeha Mûş Alparslan Enstîtûya Zanîstên Civakî Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Mûş, 2017, r. 87.

Verba (Lîsteya Lêkerên Kurdî). Di vê de dora 406 lêkerên kurdî bi bergindên elmanî hatine dayîn.⁶⁸ Herwiha Ferdinand Justi di berhema xwe ya *Kurdische Grammatikê* de li ser rêzimana kurdî, etîmolojîya hin peyvên kurdî û fonolojî û morfolojîya peyvên kurdî rawestiyaye.

Dîsa ji wan ferhengên pêşîn ferhenga Albert Houtum-Schindler a bi navê *Beiträge Zum Kurdischen Wortschatze* (Hevkarî bo Xezîneya Peyvên Kurdî) ye ku di sala 1884an de hatiye amadekirin. Ev berhem ji 75 rûpelan pêk dihê û 20 rûpelên pêşîn şîrovevên li ser rêzimanê ye, 55 rûpel jî ferheng bi xwe ye. Alber Houtum Schindler, peyvên vê ferhengê ji gera xwe ya rojhilatê Kurdistanê û Xorasanê berhev kiriye. Ji zaravayên kurdî yên curbicur (kurmancî, soranî, kelhorî û goranî) peyv di ferhengê de hene. Di vê ferhengê de agahiyên etîmolojîk jî hene.⁶⁹

Ferhengeke kurdî-farsî di sala 1885an de li Îranê hatiye çapkirin ku hem nav û hem jî nivîskarê wêne zelal e. Li gor etîketa li ser ve zeliqandî navê berhemê *لغت کردی* (Luxetê Kurdî) ye herwiha navê nivîskarê wê Abul Hasan Ardalan e. Lê çavkanîyeke din navê vê berhemê wek Ebûl Muhsîn û navê berhemê jî wek *Haza Kîtabü'l-Luxati-Kurdî* destnîşan dike. Ev ferheng bi zaravayê hewramî ye û ji 43 rûpel û 531 peyvên pêk dihê.⁷⁰

Oryantalîst û zimannasê Swîsreyî Albert Socin, di sala 1890î de bi navê *Kurdische Sammlungen: Erzählungen und Lieder in den Dialekten des Tûr 'Abdîn und von Bohtan* (Berhevokên Kurdî: Çîrok û Stranên bi Dîyalektên Tûr 'Abdîn û Botanê) berhemeke folklorîk li St. Petersburgê weşandiye. Di vê berhevokê de ferhengeke kurdî-elmanî jî heye. Di vê ferhengê de bi qasî dora 2000an peyv hene.⁷¹

Lêkolîner û etnolog Solomon Adamovich Egiazarov, di sala 1891î de ferhengeke kurdî-rûsî amade kiriye ku ev ferhengok dora 4000 peyvên dihewîne û di

⁶⁸ Ferdinand Justi, "Verzeichnis der Kurdischen Verba" *Kurdische Grammatik*, Commissionare der Kaiserlichen Akademie der Wissenschaften, St. Petersburg, 1880, r. 188.

⁶⁹ Husein Muhammed, "Ferhengeke Kurdî-Almanî ji Sala 1884", <https://zimannas.wordpress.com/2017/04/03/ferhengeke-kurdi-ji-sala-188/> (08.01.2022)

⁷⁰ Nurullah Alkaç, "Kürtçe Gökten Mi İndirildi 2", <https://www.indyturk.com/node/92386/türkiyeden-sesler/kürtçe-gökten-mi-indi-2> (01.06.2023)

⁷¹ Eugen Prym – Albert Socin, *Kurdische Sammlungen: Erzählungen und Lieder in den Dialekten des Tûr 'Abdîn und von Bohtan*, Commissionare der Kaiserlichen Akademie der Wissenschaften, St. Petersburg, 1890, r. 281-347.

sala 1891an de li Tiflisê çap bûye.⁷² Herwiha ferhengeke din jî dîsa bi destê wî rûsî-kurdî hatiye amadekirin ku 3000 peyvan dihewîne.⁷³ Ev ferheng, di nav berhema Notên Daîreya Kafkasê ya Komeleya Erdnîgarîyê ya Împeretoriya Rûsî de wekî beşeke bi navê “Краткий курманджийско-русский словарь” (Ferhengeke Kurt a Kurmancî û Rûsî) cih digire.⁷⁴ Tiştê ecêb ev e ku di sernavê ferhengê de peyva “Kurt” derbas dibe lê ev ferheng 4000 peyvan dihewîne.

Ferhengeke giring a din jî ya bi navê *El Hediyye-tu'l Hamîdiyye Fî'l-Luxati'l-Kurdîyye* ye ku amadekarê wê Êsiv Zîyaddîn Paşa ye. Wî ev ferheng di dema xweya wazîfeya qaimeqamtîya devera Mûtîkîyê de berhev kiriye û di sala 1892an de li Stenbolê çap kiriye. Ji ber ku ev ferheng bo siltanê Osmanî; Ebdulhemîdê 2em hatiye pêşkêşkirin, navê xwe ji wir girtiye.⁷⁵ Ev ferheng ji 5452 peyvan pêk dihê ku tê de li berginda peyvên kurdî maneyên wan bi erebî hatine danîn ango ferheng kurdî-erebî ye. Di vê ferhengê denavên gund û deverên li dora Bitlisê jî hene û herwiha behsa sînorên wan jî hatiye kirin.⁷⁶

Di sala 1896an dekesek ji malbata Bedirxanîyan destxetêke dora 542 rûpelî ji kurdnasê elman Martin Hartmann re dişîne ku tê de ferhengeke bi navê “*Gul Efsûn*” jî ye. Tê texmînkirin ku ev ferheng di sala 1746an de hatiye nivîsîn.⁷⁷

Oryantalîstê Awisturyayî Hugo Makas, di sala 1897an de di berhema xwe ya bi navê *Kurdische Texte im Kurmanji-Dialekte aus der Gegend von Mardin* (Metnên Kurdî bi Devokên Kurmancî yê Devera Mêrdînê) de cih daye ferhengeke kurdî-elmanî. Ev ferhengok dora 27 rûpel û 500 peyvan e.⁷⁸

⁷² Qanatê Kurdo, b.n.b., r. 18.

⁷³ Abbas Celalîyan, **Ferhengî Başûr**: Taybet be Nawçekanî Kirmaşan û Îlam û Luristan, Întişarê Porseman, Tehran, 1385/2006.

⁷⁴ С. А. Егназаров, “Краткий курманджийско-русский словарь”, **Записки Кавказского отдела Императорского русского географического общества**, Кн. 13. Вып. 2, 1891; <https://elib.rgo.ru/safe-view/123456789/213550/1/UnVQUkxJQjEyMDQ3OTAwLnBkZg==> (05.06.2023)

⁷⁵ Salih Akin, g.n.b., r. 59.

⁷⁶ Seyfettin Aykaç, b.n.b., r. 5.

⁷⁷ Nurullah Alkaç, “Kürtçe Gökten Mi İndirildi 2”, <https://www.indyturk.com/node/92386/türkiyeden-sesler/kürtçe-gökten-mi-indi-2> (02.06.2023)

⁷⁸ Hugo Makas, **Kurdische Texte im Kurmanji-Dialekte aus der Gegend von Mardin**, Imperial Academy of Sciences, St. Petersburg, 1897, r. 107-134.

1.2. Di Qonaxa Tevgera Neteweyî de Ferhengnûsîya Kurdî (Sedsala 20em)

Ji piştî Şoreşa Frensî tevgerên neteweyî di nav miletan de berbelavtir bûn ango fikra netew-dewletê bi şoreşa frensî li ser rûyê dinyayê şax veda û di nav miletên din de geş bû. Rewşenbîr û ronakbîrên miletan berê xwe dane çand û zimanê xwe û hewla avakirin û hişyarkirina miletî dan. Ev fikir di nav rewşenbîr û ronakbîrên kurd de jî reng veda û wan jî bi awayeke tebiî berê xwe dan ziman û çanda xwe û xebatên zimanî pêş de birin.⁷⁹ Di vê sedsalê de ferhengnûsîya kurdî, dîsa bi saya zanayên kurd û oryantalistan pêş ketiye.⁸⁰ Ferhengnûsî û ferheng sazî jî yek ji wan karên zimanî ye ku rewşenbîrên kurd pê de çûne. Di vê binbeşê de em dê mînakên ferhengên kurdî yênsereke û giring bi awayeke bîbliyografîk bidin:

Mehmûd Riza Kendûlayî ku di hin xebatên kurdî de alîkarîya Oskar Mannî kiriye herwiha ferhengeke kurdî(goranî)-farsî di sala 1902an de ji bo Oskar Mannî amade kiriye û di vê ferhengê de dora 750 peyv hene.⁸¹

Arkeolog û oryantalistê elman Albert Von Le Coq, di sala 1903an de bi navê *Kurdishce Texte* (Metnên Kurdî) de cih daye ferhengoke elmanî, zaravayên zazakî, babayî (sorani) loloyî (kurmançî). Di vê ferhengokê de bi sedan peyv û dîyalogên rojane bi awayeke berawirdkî bi elmanî, zazakî, sorani û kurmançî hatiye dayîn.⁸²

Zimannasê ermenî Hiraçya Açaryan di sala 1911an de bi navê *Recueil De Mots Kurdes en Dialecte De Novo-Bayazet* (Berhevkirina Peyvên Devoka Bazîda Nû) berhemek nivîsîye ku tê de cih daye ferhengoke bi navê *Lexique Kurde-Français* (Ferhenga Kurdî-Frensî). Ev ferhengok, dora 1500 peyv û 36 rûpel e.⁸³

Şêx Mihemed Kerbelayî di sala 1912an de bi navê *Mîrsadu'l-Etfâl ew Şahrahê Kûdekan* ferhengek nivîsîye. Ev ferhenga menzûm a kurdî ji bo fêrkirina farsî bo

⁷⁹ Salih Akin, g.n.b., r. 60.

⁸⁰ Sina Ahmedi & Hossein Hassani & John P. McCrae, "Towards Electronic Lexicography for the Kurdish Language", **Proceedings of eLex 2019 Conference**, Electronic lexicography in the 21st Century, Sintra-Portugal, 2019, r. 887.

⁸¹ Yusuf Taştan, b.n.b., r. 32.

⁸² Albert Von Le Coq, **Kurdische Texte**, Gedruckt in der Reichsdruckerei, Berlin, 1903.

⁸³ H. Adjarian, "Lexique Kurde-Français", *Recueil de Mots Kurdes en Dialecte de Novo-Bayazet*, **Memoires de la Société Linguistique**, Paris, 1911, r. 349-383.

zarokên kurd û birazîyê xwe nivîsiye. Di beyta jêrîn de jî ev armanca xwe wiha destnîşan kiriye:

Li ser Etfâl û ewladê di Kurdan
Lîsanê Farisî û meqsedê wan⁸⁴

Ji van berhemên pêşîn ên cur bi cur şunda em dê ferhengên jêrîn bi awayeke bîblîyografîk rêz bikin:

1. Ely Banniester Soane, *Grammar of the Kurmanji or Kurdish Language*, Luzac & Co, London, 1913. Di vê berhemê de bi qasî 116 rûpelan ferhengeke îngilizî-kurdî heye. Ji ber ku ev berhem di qada kurdnasîyê de ji yên pêşîn in, me giringî pê dît ku cih bidinê.

2. Li gor Kovara Kurdistanê ya ku di sala 1919an de li Stenbolê derdiket, ferhengeke Kurdî-Tirkî-Erebî-Farsî-Frensî ji aliyê Mehmed Mihrî Hîlav ve hatiye amadekirin ku ev ferheng negihîştîye roja îroyîn.⁸⁵

3. Ludvig Olsen Fossum, *A Practical Kurdish Grammar*, Published by The Inter Synodical ev, Lutheran Orient -Mission Society, 1919. Di vê berhema rêzimanî de ferhengoke kurdî îngilizî a 17 rûpelî heye.

4. Ely Banniester Soane, *Elementary Kurmanji Grammar*, Government Press, Baghdad, 1919. Ev berhema rêzimanê jî bi qasî 110 rûpelan cih daye ferhengeke îngilizî-kurdî.

5. Basil Nikitin, *Kratkii Russko - Kurdskaa Voennii Perevodchik* (Peyvên Leşkerî yên Rûsî - Kurdî) 1916. Ev ferheng, nehatiye weşandin.⁸⁶

6. Agha Petros Elow, *Assyrian-Kurdish- Yizidis Indexed Grammar an Vocabulary*, Printed at Government Press, Baghdad, 1920.

7. The Geographical Section of the Naval Intelligence Division, Naval Staff Admiralty-*Vocabularies English, Arabic, Persian, Turkish, Armenian, Kurdish*,

⁸⁴ Nusrettin Bolelli & Nurettin Ertekin, g.n.b., r. 28.

⁸⁵ Nurullah Alkaç, g.n.b., <https://www.indyturk.com/node/92386/türkiyeden-sesler/kürtçe-gökten-mi-îndi-2> (02.06.2023)

⁸⁶ Basil Nikitin, *Kratkii Russko-Kurdskaa Voennii Perevodchik*, Urmia Izd. Uprav, R. I.V. Konsul'stvom, v. Urmii, 1916, r. 72.

Syriac, by his Majesty's Stationery Office, London, 1920. Di vê berhemê de dora 2500-3000 peyvên kurdî hene.

8. Captain R. F. Jardine, *Bahdînan Kurmanji a Grammar of The Kurmanji of The Kurds of Mosul Division and Surrounding Districts of Kurdistan*, Printed at Government, Baghdad, 1922. Di vê berhemê de bi sernavê *Vocabulary ferhengokeke îngilizî-kurdî cih digire û dora 4000 peyvan dihewîne.*

9. Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Cerdoyê Gêncî, V. Pêtoyan, *Xebernama Fileyî (Ermenî)-Kurmancî*, Haypetrath, Erîvan, 1933. Dora 9000 peyv tê de hene.

10. Şakir Fetah, *Ferhengok-Little Lexicon* (English-Kurdish), Zarî Kurmancî, Rewanduz, 1934.

11. Hecîyê Cindî û hevalên wî, *Xebernema Têrmînologîyê* (ermenî-kurmancî), Neşra Hukumeta Ermenistanê, Yêrêvan, 1936.

12. Gîwî Mukriyanî, *Al-Murshid-Ferhengî Raber* (kurdî/soranî)-erebî), Çapxaney Kurdistan (Kurdistan Press), Erbîl, 1950.

13. Gîwî Mukriyanî, *Kolkezêrîne* (kurdî-erebî-farsî-frensî-îngilizî), Kurdistan Press, Erbîl, 1955.

14. Çerkez Xudoyêviç Bakayev, *Kurdsko-Russkij Slovar/ Xebernama Kurmancî-Rusî*, Akademija Nauk, Moskova 1957. (Ч.Х. Бакаев, Курдско-русский словарь. М.: Гос. изд-во иностранных и национальных)

15. Î. O. Farizov, *Ferhenga Rûsî-Kurmancî*, Neşîrxana Dewletê ya Ferhenge Xaricî û Miletîyê, Moskova, 1957.

16. Semend Elî Sîyabendov & Aramê Çaçan, *Xebernama Ermeni-K'urdî*, Haypêthrat, Erevan, 1957.

17. Îvan O. Farîzov, *Ferhenga Ūrisî-Kurmancî: Russko-Kurdskii Slovar*, Neşîrxana Dewletê ya Ferhengê Xaricî û Miletîyê, Moskova, 1957.

18. Muhammed Merdox Kurdistanî, *Ferhengî Merdox*, Tehran, 1955-1957.

19. Ernest N. Mc Carus, *A Kurdish Grammar: Descriptive Analysis of the Kurdish of Sulaimaniya*, American Council of Learned Societies Program in Oriental

Languages Publications Series B - Aids - Number 10. NewYork, 1958. Di vê berhema gramerî de jî ferhengokeke dora 21 rûpelan ya îngilizî-kurdî cih digire.

20. Emînê Evdal (АМИНЭ АВДАЛ), *Xebernama Kurdiye Rastnivîsandinê*, Neşreta Akademîya I'lmî ya Ermenistana Sovyêtê, Erîvan, 1958.

21. Qanatê Kurdo, *Ferhenga Kurdî-Rûsî*, Neşirxana Dewletê ya Ferhengêd ZimanêMiletêd Dereve û yê Sovêtîstanê, Moskova, 1960.

22. Cemal Nebez, *Hendîk Zarawey Zanistî*, Çapxaney Kameran, Silêmanî, 1960.

23. Şêx Muhammedî Xal, *Ferhengî Xal*, bergî yekem, Çapxaney Kamiran, Silêmanî, 1960.

24. Gîwî Mukriyanî, *Ferhengî Mehabad*, Çapxaney Kurdistan, Hewlêr, 1961.

25. Cegerxwîn, *Ferhenga Erebî-Kurdî*, Baghdad, 1962.

26. Eladîn Sicadî, *Destûr we Ferhengî Kurdî- 'Erebî-Farsî*, Çapxaney Me'arif, Bexda, 1962.

27. Muhammed Merdox Kurdistanî, *Ferhengî Merdûx*, Çapxaney Heyderî, Senendec, 1964.

28. Şêx Muhammedî Xal, *Ferhengî Xal*, bergî duyem, Çapxaney Kamiran, Silêmanî, 1964.

29. Joyce Blau & Kamiran Elî Bedîrxan, *Dictionnaire Kurde-Kurdish Dictionary*, Publications du Centre pour l'Étude, Publications du Centre pour l'Étude des Problèmes du Monde Musulman Contemporain 4, rue de Pascale, Bruxelles 4, 1965.

30. Taufîq Wahby & C.J. Edmonds, *A Kurdish-English Dictionary*, Oxford University Press, London, 1966.

31. Mûsa Anter, *Ferhenga Khurdî-Tirkî-Kürtçe Türkçe Sözlük*, Yeni Matbaa, İstanbul, 1967.

32. Sidîq Sefîzade (Borekeyî), *Ferhengî Kurdî Parsî (Arî)*, bergî yekem, Çapxaney Çîhr, Tahran, 1968.

33. Sidîq Sefîzade (Borekeyî), *Ferhengî Kurdî Parsî(Arî)*, bergî duwem, Çapxaney Çîhr, Tahran, 1969.

34. Celadet Elî Bedirxan, *Ferhenga Kurdî-Kurdî*, Akademîya Kurdî ya Bexdayê, Bexda, 1970. Ji piştî mirina Celadet Elî Bedirxan, keça wî Sînemxan berhevoka wî ya ferhenga kurdî di sala 1970an de ji Akademîya Kurdîya Bexdayê reji bo çapê şandîye, lê Akademîyê ev ferheng çap nekiriye.⁸⁷ Di vê ferhengê de dora şêst hezar peyv hene.⁸⁸ Ev ferheng di sala 2009an de li Stenbolê ji nav Weşanên Avestayê derçûye.

35. Mela Ebdulkerîmî Muderîs, *Ferhengî Erebî-Kurdî*, 1970, bi awayê manzûm e.

36. Sidîq Sefîzade (Borekeyî), *Ferhengî Pehlewî Kurdî*, Çapxaney Çîhr, 1971.

37. Ebdulqadir Berzincî, *Ferhengî Zanyarî*, Silêmanî, 1971.

38. Lijney Taybetî, *Ferhengokî Zaraway Parêzgay Silêmanî*, Erebî-Kurdî, 1971.

39. Sidîq Sefîzade, *Ferhengî Pehlewî-Kurdî*, Tehran, 1971.

40. Gîw Mukrîyanî, *Elif u Bêy Kurdî Wênedar be Tîpî Latînî Be Zarawekanî Soranî, Badînî, Feylî, Hewramî, Hewlêr*, 1972.

41. Me'rûf Qeredaxî, *Ferhengî Kiştûkall*, 1972/1973.

42. Kemal Celal Xerîb, *Ferhengî Zanyarî* (Erebî-Kurdî), bergî yekem, Çapxaney Kameranî, Silêmanî, 1974.

43. Muhemed Emînî Mîsrî Seyîdyan, *Ferhengokey Kurdî-Farsî-Erebî*, Mehabad, 197?

44. Me'ruf Qeredaxî Merdoxî, *Ferhengî Kişt û Kal*, Çapxaney Dar Elselam, Bexda, bergî I 1972, bergî II 1973.

⁸⁷ Oktay Altun, "Hawar Dergisinin Yazarları ve Kürt Edebiyatındaki Yerleri", Teza Lîsansa Bilind a Çapnekirî, Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, Diyarbakir, 2020, r. 36.

⁸⁸ Qanatê Kurdo, b.n.b., r. 20.

45. Margaret Kahn, *Kurmanji-English, English-Kurmanji Lexicon*, Ann Arbor: The University of Michigan, 1974.
46. Murad Awrang, *Ferhengî Kordî*, Tehran, 1967-1968.
47. Evdirehmanî Hacî Marif, *Lêksîkolojî Zimanî Kurdî*, Çapxaney Korî Zanyarî Kurd, Bexda, 1974.
48. Kemal Celal Xerîb, *Ferhengî 'Erebî-Înglîzî-Kurdî*, Bexda, 1975.
49. Şêx Muhammedî Xal, *Ferhengî Xal*, bergî sêyem, Çapxaney Kamiran, Silêmanî, 1976.
50. Ebdulrehman Muhemmed Emîn Zebîhî, *Qamûsî Zimanî Kurdî*, Çapxaney Korî Zanyarî, Bexda, 1977.
51. Kurdistan Mukriyanî, *Ferhengî Kurdî-Rûsî*, Dezgey Çapemenîy Zimanî Rûsî, Moskova, 1977.(Курдистан Мукриани, Учебный курдско-русский словарь, Издательство Русский язык, Москва, 1977.)
52. Hemîd Îzedpenah & Mehmûd Zamdar, *Ferhengî Lek û Lur*, Korî Zanyariy Kurd, Bexda, 1978.
53. Kemal Celal Xerîb, *Ferhengî Zanyarî 'Erebî-Înglîzî-Kurdî*, bergî duwem, Çapxaney Korî Zanyarî Kurd, Bexda, 1979.
54. Muhemed Mukrî, *Ferhengê Perendegan der Lehçehay Xerbê Îran (Lehçey Kordî) ve Tetbîqê an Namhayê Farsî ve Lehçehay Dîgerê Meheli Îran*, Emîr Kebîr, Tahran, 1979.
55. Maksîmê Xemo, *Ferhenga Îdyoman ya Kurdî-Rûsî*, Akademîya Zanistî ya Ermenistana Sovyêtê, Yêrevan, 1979.(Хамоян М.У. Курдско-русский фразеологический словарь, Изд. АН Армении, Ереван, 1979)
56. Kemal Celal Xerîb, *Ferhengî Zanyarî (Erebî-Îngilîzî-Kurdî)*, bergî duwem, Bilawkirawekanî Korî Zanyarî Kurd, 1979.
57. Şukrulla Baban, *Ferhengî Farsî-Kurdî*, Tahran, 1981.
58. Sidîq Safîzade Borekeyî, *Ferhengê Mad Kordî Be Farsî*, Moseseyê Megbûatî Agayî, Tehran, 1982.

59. M.S. Kara, *Ferhengî Farsî-Kurdî*, Sine, 1982.
60. Muhammed Mukrî, *Ferhenga Navên Çûkan Di Lehçeyên Rojavayî yên Îranê De-Lehçeya Kurdî û Berawirdkirina Wan Bi Navên Farsî û Lehçeyên Din yên Mehellî yên Îranê re*, Metbaayê Pakteçî, Tehran, 1361/1982)
61. Ehmed Reşwanî, *Ferhengî Helbest: Dêrr û Kopleşî'ri Helbijarde ye le Şî'ri Şa'îranî Kurd*, 1983.
62. Kemal Celal Xerîb, *Ferhengî Zanyarî*, Erebi-Îngilîzî-Kurdî, bergî sêyem, Bexda, 1983.
63. Qanat Kalaşevîç Kurdojev & Zara Aliyevna Yusupova, *Ferhengî Kurdî(Soranî)-Rûsî*, Dezgey Çapemenîy Rûsî, Mosko, 1983. (Kurdo, Курдоев К.К, З.А. Юсупова, Курдско-русский словарь (сорани). М.: Русский язык, 1983).
64. Ebdulsitar Şerîf Tahîr, *Qamûsî Derûnnasî*, Bexda, 1985.
65. Salam Abdulla, *Svensk-Kurdisk Ordista/Ferhengî Swêdî-Kurdî*, Binkey Çapemenîy Azad, Uppsala- Swêd, 1985.
66. Îhsan Fuad, Cemal Ebdul & Mehmûd Emîn Xefûr Hewramî, *Ferhengî Qutabî*, Bexda, 1985.
67. Elî Seydo Gewranî, *Ferhenga Kurdî Nûjen*, Şarîkat al-Şarq al-Awsa, Amman, 1985.
68. Sabir Gird 'Azabanî, *Qamûs Arî-Kurdî*, Bexda, 1985.
69. Gîw Mukrîyanî, *Ferhengî Nobere(Erebî-Kurdî)*, bergî yekem, Bexda, 1986.
70. Muhemed Cemîl Seyda, *Ferhenga Jîn/Qamûs el-Heyat Kurdî-Erebî*, Çapxana Emîral, Beyrût/Lubnan, 1987.
71. Ni'met 'Elî Saye, *Ferhengî Gewherî Germesêr* (Kurdî(Kelhûrî)-Erebî), Dezgay Roşinbîrî û Bilawkirdinewey Kurdî, Bexda, 1988.
72. Gîw Mukrîyanî, *Ferhengî Nobere* (Erebî-Kurdî), bergî duwem, Çapxaney El-Te'elîm El 'Alî, Hewlêr, 1900.
73. Mihemed Malmîsanij, *Zazaca-Türkçe Sözlük/Ferhengê Dimilkî-Tirkî*, Jîna Nû, Uppsala, 1987.

74. Hejar, *Henbane Borîne Ferhengî Kurdî-Farsî*, Çapxaney Puya, 1368 (mîl:1989) beşî yekem, beşî duwem 1369 (mîl:1990).
75. Gîw Mukrîyanî, *Ferhengî Nobere*. ‘Erebî-kurdî, Bexda, 1986 bergî yekem, bergî duwem 1990.
76. Hejar Mukrîyanî, *Henbane Borîne (Ferhengî Kurdî-Farsî)*, Întişaratê Sirûş, Tehran, hîc.1369: mîl.1990. («ههنبانه بۆرینه، فرهنگ فارسی-کردی»). (ویراستیار: محمدماجد مردوخ روحانی، تهران: انتشارات سروش، ۱۳۶۹، ۱۹۹۰)
77. Feryad Fazil Omar, *Kurdisch-Deutsches Wörterbuch (Kurmancî) Kurdische Studien*, 1992.
78. Mehmet Kemal Işık, *Ferhenga Torî*, Stenbol, Koral Yayınları, 1992.
79. Delîlo İzolî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Deng Yayınları, Köln, 1992.
80. Mihemed Malmîsanij, *Zazaca – Türkce Sözlük/ Ferhengê Dimilkî – Tirkî*, Istanbul, Deng Yayınları, 1992.
81. Feryad Fazil Omer, *Ferhenga Kurdî-Almanî /Kurdish-Deutsches Wörterbuch*, Kurdische Studien, Berlin, 1992.
82. Helkewt Hakim, *Ferhengî Kurdî-Ferensî*, Parîs, 1993.
83. Amîrxan, *Wörterbuch Kurdish-Deutsches/Kurdî-Almanî*, Hueber, 1992.
84. Mûnzûr Çem, *Ferhengê Kurdî (Zazakî)-Tirkî*, Stokholm, 1994.
85. Mihemed Teqî Îbrahîmpur, *Vajenameyê Kurdî-Farsî*, Intişaratê Qeqnûs, Tehran, 1994.
86. Mihemed Dehsiwar, *Ferhengî Mizgîn Wênedar Bo Minalan*, 1995.
87. Ali Ashraf Darvishyân, *Ferhengê Kordî ê Kirmanşahî*, Neşrê Sehand, Tehran, 1375/1996.
88. Mihemed Malmîsanij, *Ferhengê Kirdkî-Pehlevkî-Kurmanckî*, Apec, Stokholm, 1997.
89. Turan Erdem & Orhan Erdem, *Ferheng: Zazaki-Tırki, Tırki Zazaki*, Doz Yayınları, İstanbul, 1997.

90. Mesut Özcan, *Zazaca-Türkçe Sözlük*, Kaynak Yayınları, İstanbul, 1997.
91. Hamîd Dirudî & Hatem Menberî, *Ferhengî Soranî-Hewramî*, Stockholm, 1998.
92. Cemal, Ebdul, *Ferhengî Şewkar, Taybet Be Kîmya, Îng-Erb-Kr*, 1998.
93. Tahîr Sadiq, *Ferhengî Hawwatekanî Zimanî Kurdî*, Silêmanî, 1998.
94. Mehmûd Lewendî, “*Ferhengoka Şêxbizinkî*”, Kovara Bîrnebûn, 1998.
95. Dilşad Ebdulrehman, *Ferhengî Swêdî-Kurdî bo Wergêran*, Stockholm, 1998.
96. Hamîd Dirudî & Hatem Menberî, *Bêstûn: Ferhengî Soranî-Hewramî*, Stockholm, 1998.
97. Diktor Hîwa Emir Ehmed, *Ferhengî Heloy Pizişkî*, Silêmanî, 1998.
98. Îbrahîm Muhyaldîn, *Ferhengî Zewînasî/Dictionary of Geology (Îng-Kr)*, Çapxaney Bedirxan, Silêmanî, 1998.
99. Cemal Ebdul, *Ferhengî Kîmya(Îngilîzî-Erebî-Kurdî)*, 1999.
100. Selah Se'dilla, *Qamûsî Selahedîn*, 1998/ 1999/2000.
101. Gîwî Mukriyanî, *Ferhengî Kurdistan*, Dezgey Çap û Blawkirdinewey Aras, Hewlêr, 1999.
102. Aware Germiyanî, *Ferhengî Danîmarkî-Kurdî*, 1999.
103. Hesîb Rojbeyanî & Elî Lebrîz, *Ferhengî Pizişkî (Swêdî-Kurdî)*, Swêd, 1999.

1.3. Qonaxa Ferhengnûsîya Geş a Kurdî (Sedsala 21em)

Di vê qonaxê de ferhengnûsî geş bûye û ji her alî ve pêş ketine. Bi pêşketina alavên teknolojîyê, ferheng di warê online de jî cihê xwe girtine. Geşbûna ferhengan di vê qonaxê de ji aliyê hejmar û qebareyê ve jî zêdetir bûye. Li jêrê em berdewama bîblîyografyaya ferhengan didin:

104. Salah Saadallah, *Ferhenga Îngilîzî-Kurdî*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2000.

105. Şefîq Qezaz, *Ferhengî Şarezûr* (Îngilizî-Kurdî), Dezgey Aras, Erbîl, 2000.
106. Fetahî Kawyan, *Ferhengî Îngilizî Kurdî, Farsî, Silêmanî*, 2000.
107. Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2000.
108. Ebdulsitar Fetah Hesên & Enwer Mihemed Tahir, *Ferhenga Mamostay Bo Qonaxa Seretayî*, Çapxana Wezaretê Perwerdeyê, Hewlêr, 2000.
109. Hîwa ‘Umer Ehmed, *Ferhengî Hîwa: Holendî-Kurdî*, Bilawkirawekanî Binkey Çap û Bilawkirdinewey Yadewerî Hawrêyan Le Hollenda, 2000.
110. Harun Turgut, *Zazaca-Türkçe Sözlük*, Tij Yayınları, İstanbul, 2001.
111. Sidîq Sefizade (Borekeyî), *Ferhengî Borekeyî (Kurdî-Farsî)*, Întişaratê Pelîkan, Tahran, 2001.
112. Elî Nanewazade, *Ferhengî Herman*, Tevakkulî, Tehran 2001.
113. Kemal Cemal Xerîb, *Ferhengî Wênedar Giyandarekan*, Kurdî-Erebî-Îngilizî, 2001.
114. Ehmed Behrî, *Ferhengî Ballinde*, 2001, Dezgahî Çap û Bilawkirdinewey Aras, Hewlêr, 2001.
115. Emîr Emînî, *Ferheng Luxatê Aram* (Îngilizî-Kurdî-Farsî), 2001/2002
116. Kemal Celal Xerîb, *Keleferhengî Ruweke Aborîyekan*, Kurdî-Erebî-Îngilizî, Hewlêr, 2002.
117. Newzad ‘Umer Mihêdîn, *Ferhengî Fîzya(Fîzîkê)* (Îng-Erb-Kr), Silêmanî, 2002.
118. Josep Abrugovîç Orbelî, *Ferhenga Kurmancî-Rusî*, Erîvan, 2002.(И.А. Орбели, Курдско-русский словарь. Т. 2. Вып. 2. Ереван: “Zangak-97”, 2002.)
119. Abdurrahman Uçaman & Seid Veroj, *Ferheng-Vajnameyê Kurmancî-Hewramî-Dimilî-Senendajî*, Weşanên War, Stenbol, 2002.

120. Mela Xelîlê Mişextî, *Ferhenga Merg û Ji*, Dezgey Çap û Blawkirdiney Aras, Hewlêr, 2002.
121. Mahabad Qilorî & Nêçîrvan Qilorî, *Ferhenga Kurdî – Holendî (Woordenboek Koerdisch – Nederlands)*, Uitgeverij Bulaaq, Amsterdam, 2002.
122. Mes'ûd Xalid Gulî, *Ferhenga Gulî*, Spîrêz, Dihok, 2002.
123. Bextiyar Secadî, *Ferhengê Zarawey Edebî*, Kurdî-Îngilîzî -Kurdî, Silêmanî, 2002.
124. Reşîd Findî & Mihemed Nûrî 'Arif, *Ferhengê Zarawe: Zarawegeli Rageyandin û Kargêrî û Qutabxaneyî*, Korî Zanyarîy Kurdistan, Hewlêr, 2002.
125. Emîr Emînî, *Ferhengê Sê Zimaney Aso Kurdî-Farsî-Îngilîzî* 2002/2003.
126. Amanc Mîrdawelî, *Ferhengê Wênedarî Mîr*, Hewlêr, 2003.
127. Fazil Nîzamedîn, *Ferhengê Estêregeşe*, Çapxaney Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2003.
128. Michael L. Chyet, *Kurdish-English Dictionary/Ferhenga Kurdî-Îngilîzî*, Yale University Press, 2003.
129. Ewrehmanî Hacî Marif, *Ferhengê Zarawey Zimannasî*, Silêmanî, 2004.
130. Karim Karimpour & Khovar Halat: *Ferhengê Guyêşê Kordî ê Kalhorî (Kirmanşahî)*, Kordî-Farsî, Taqê Bostan, Sobhê Rowshan, 1382/2003.
131. Mehmet Aydar, *Zazaca-Türkçe Sözlük*, Doruk Yayıncılık, İstanbul 2003.
132. Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2004.
133. Hüseyin Çakmak, *Türkçe-Dersimce (Kırmancki/Dımılki/Sobê) Sözlük*, Kalan Yayınları, Ankara, 2004.
134. Muste'în Leylanî, *Etlesî Tiwêkarî Leşî Mirov* (Kurdî-Îngilîzî), Berêweberayeti Çapxaney Roşinbîrî, Hewlêr, 2004.

135. Sabîr Bekir Bokanî, *Ferhengî Saykolojî* (Îngilizî-Erebî-Kurdî), Silêmanî, 2004.
136. Huseyin Bektaş, *Ferhenga Anatomîya Bedena Mirovan*, Weşanên Deng, Stenbol, 2004.
137. Bextiyar Secadî & Mihemed Mehmûdî, *Ferhengî Şêwekaraney Zarawey Edebî* (Kurdî-Îngilizî), Dezgeh Çap û Bilawkirdinewey, Hewlêr, 2004.
138. Ebdulwehab Kanebî, *Ferhengî Îdyom Le Zimanî Kurdî Da*, Çapxaney Rûn, Silêmanî, 2005.
139. Elî Nanewazade, *Ferhengî Herman*, bergi yekem, Çapxaney Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2005.
140. Abbas Celalîyan, *Ferhengî Başûr: Taybet be Nawçekanî Kirmaşan û Îlam û Luristan*, Tehran: Porseman, 1385/2006.
141. Ehmed Herdî, *Ferhengî Qanûnî* (Erebî-Kurdî-Frensî-Îngilizî), Leblawkirawekanî Mektebî Bîr û Huşyarî, Silêmanî, 2006.
142. Selam Nawxoş, *Ferhengî Oksford* (Îngilizî-Kurdî-Îngilizî), Çapxaney Roşinbîrî, Hewlêr, 2006.
143. Kardo, *Ferhengî Zarawey Şanoyî*, Çapxaney Arabxa, Kerkûk, 2006.
142. Mustafa Gazî, *Ferheng: Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Amed, 2006.
143. Umîd Demîrhan, *Ferhenga Destî*, Sewad, Bazîd, 2006.
144. Macid Merdox Ruhanî, *Ferhengê Farsî-Kordî yê Danişgahê Kordistan*, Kitabê Mehrgan, Senendec, 2006.
145. Musa Canpolat, *Zazaca-Türkçe Sözlük*, Can Matbaacılık, İstanbul, 2006.
146. Rojan Nurî 'Ebdulla, *Ferhengî Zarawesazî*, Xaney Çap û Billawkirdinewey Çiwarçira, Çapî Yekem, Silêmanî, 2007.
147. Ferşîd Şerîf, *Ferhengî Zarawekanî Felsefe û Zaniste Komelayetîyekan* (Îngilizî-Farsî-Kurdî), Dezgey Çap û Pexşî Serdem, Silêmanî, 2007.

148. Îbrahîm Ehmedî, *Ferhengî Kînaye*, (Kurdî-Kurdî/Kurdî-Farsî), Danişgahê Kordestan, Senendec, 2007.
149. Sêfidîn Ehmed Ebdo, *Ferhenga Ronak*, Darul Zeman el-Neşir we el-Tuzî, Dîmeşq, 2007.
150. Selah Payanyanî, *Ferhengî Zarekî Mukriyan*, Hîwa, Mehabad, 2007. Ev berhem duwanzdeh berg e, berga duwanzdehan di sala 2021an de çap bû.)
151. Ebdulsetar Fetah Hesên, *Ferhenga Fermanberan*, Çapxana Meharet, 2007.
152. Heme Kerîm Arif, *Ferhengî Farsî Kurdî*, Tiwêjînewe û Bilawkirdinewey Mukriyanî, Dihok, 2007.
153. Lijney Ferheng, *Ferhengî Heraşan* (Kurdî-Kurdî), Bilawkirawey Korî Zanyarîy Kurdistan, Hewlêr, 2007.
154. Hejîr Ebdullapûr, *Ferhengî Hejîr* (Farsî-Kurdî), Çapxaney Xanî, Hewlêr, 2008.
155. Muhemed Teqî Îbrahîmpûr, *Ferhengî Kurdî-Îngilizî*, Neşrê Seha, Tehran, 2008.
156. Cemal Nebez, *Wîşenamey Etîmolojyay Zimanî Kurdî*, Malperî Kurdbûn, 2008.
157. Bêhzad Xoşhal, *Ferhengî Jiwan* (Farsî-Kurdî) Neşrê Panîz, Sine, 2008.
158. Zahîr Mihemed Reşîd, *Ferhengî Nevar* (Farsî-Kurdî), Neşrê Panîz, Tehran, 2008.
159. Hêmin Mela Kerîm Berzincî, *Ferhengî Kompûwter*, Bilawkirawey Xaney Çap û Bilawkirdinewey Çwarçira, Silêmanî, 2008.
160. Raber Pîrot ‘Ezîz, *Ferhengî Gîrfanî Zarawey Kîmya* (Rabar P. Aziz, Chemical Terms Dictionary), 2008.
161. Esed Qeredaxî, *Ferhengî Muzîk*, Swêd, 2008.
162. Abdurrahman Onen, *Ferhenga Erdnîgarîyê* (Kr-Tr-Fr-Al-Îng), Weşanên Doz, Stenbol, 2008.

163. Heme Salih Ferhadî, *Xerman: Ferhengokî Kiştûkalî Taybetmende*, Dezgey Çap û Blawkirdinewey Aras, Hewlêr, 2009.
164. Muhemed Merdox Kurdistanî, *Ferhengî Merdox*, Pirtewbeyan, Senendec, 2009.
165. Elî Ekber Kurdistanî, *Bedayul Elluxe: Ferhengê Kordî*, Kitabxaneyê Millî yê Îran, Tehran, 2009.
166. Te Mezher Mayî, *Ferhenga Mayî (Kurdî-Erebî)*, Spîrêz, Dihok, 2009.
167. Grûba Xebate ya Vateyî, *Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî/Kirmancca (Zazaca)-Türkçe Sözlük*, Weşanxaneyê Vateyî, Stenbol, 2009.
168. Ebdulwehab Şêxanî, *Ferhengî Şêxanî*, Çapxaney Xanî, Hewlêr, 2009.
169. Emîn Gerdigelanî, *Ferhengî Rêjge*, Çapxaney Xanî, Dihok, 2009.
170. Diktor Cemal Reşîd, *Ferhengî Pizişkî Dewen (Îngilizî-Erebî-Kurdî)*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2010.
171. Gîwî Mukriyanî, *Ferhengî Kurdistan (Kurdî – Kurdî)*, Çapa Duyem, Gun Matbaacılık, Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Amed, 2010.
172. Ehmed Şebanî, *Ferhengî Zanistî Siyasî (Kurdî-Farsî-Îngilizî)*, Kitêbî Kanî, Danişgahê Kordistan, Sine, 2010.
173. Ruslan Tsabolov (Ruslan Lazarevich Tsabolov), *Ferhenga Etîmolojîya Zimanê Kurdî*, Moskowa, 2010. Ev du berg in. (Цаболов Р.Л. Этимологический словарь курдского языка, в 2 т./Р.Л. Цаболов ; Ин-т вос-токоведения РАН. - М.: Вост, лит, 2010)
174. Cemal Hesîbellah Ferec, *Ferhengî Wişename (Horamî-Kurdîy Nawerast)*, Bilawkirawey Ekadîmyayî Kurdî, Hewlêr, 2010.
175. Çeko Kocadag, *Ferheng: Kirmanckî (Zazakî)-Kurmancî/Kurmancî-Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanên Komkar, Berlin, 2010.
176. Cemal Hesîbellah Ferec, *Ferhengî Werqul (Horamî-Soranî)*, Spîrêz, Dihok, 2010.
177. Ali Ekici, *Türkçe-Zazaca Sözlük*, Kardelen Yayıncılık, İstanbul, 2010.

178. Huseyin Deniz, *Ferhenga Aborîyê* (Tirkî, Îngilizî, Kurdî), Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Amed, 2010.
179. Ekadîmyayî Kurdî, *Ferhengî Teknolojyay Zanyarî*, Zanistperweranî Kurd, Hewlêr, 2011.
180. Awrehmanî Hacî Marif, *Ferhengî Mîdya*, Çapxaney Hacî Haşim, 2011, Hewlêr.
181. Newzad Ehmed Eswed, *Ferhengî Zarawey Edebî û Rexneyî*, Çapxaney Bînayî, Silêmanî, 2011.
182. Mihemed Nahîd, *Ferhengî Nahîd* (Kurdî-Farsî), Bilawkirawey Ekadîmyayî Kurdî, Hewlêr, 2011.
183. Sohrab Reza, *Ferhengê Gerus: Kurdî Gerus-Farsî Gerus- Soranî*, Danişgahê Kordistan, Senendec, 2011.
184. M. Emîn Bozarslan, *Ferhenga Kurdî*, Weşanên Deng, Stenbol, 2011.
185. ‘Elî Lîmoyî, *Wajenamikî Guêşî Kirmanşanî*, Tehran, 1389/2012.
186. Komeleyek Le Mamostayanî Zimanî Kurdî, *Ferhengî Herze*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2012.
187. Kemal Celal Xerîb, *Ferhengî Wênedarî Giyandaran*, Dezgey Çap û Blawkirdinewey Aras, Hewlêr, 2012.
188. M. Malmîsanij, *Ji Bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî* (Kurmançî)-Tirkî, Weşanên Rûpel, Stenbol, 2012.
189. Ebdulla Îbrahîmî, *Kawe: Ferhengî Kurdî-Farsî*, Çapxaney Aras, Hewlêr, 2012.
190. Aras Nûrî Mihemed, *Pênase û Reway Zarawekanî Kompîwter*, 2012.
191. Lijney Ferheng Le Ekadîmyay Kurdî, *Ferhengî Zarawey Kargêrî*, Bilawkirawey Ekadîmyay Kurdî, Hewlêr, 2012.
192. Fexredîn Amêdyan, *Ferhengî Şikarî Zarawekanî Komelnasî*, Şemîmî, Sine, 2012.

193. Ahmet Kasımoğlu, *Ferhenga Navên Nebatan a Kurdî* (Kurdî-Latînî-Tirkî), Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin, 2013.
194. Ebdulla Samedî, “*Ferhengokî Xişîl û Poşakî Jinanî Mukriyan*”, Govarî Mehabad, j.150, 2013.
195. Nazhad Abdulqader Shmqar, *Dictionary of Economics (English-Arabic-Kurdish)*, Bilawkirawekanî Kitêbxaney Zanyar, 2013.
196. Roşan Lezgîn, *Ferhengê Kurdî (Zazakî)-Tirkî û Tirkî-Kurdî(Zazakî)*, Weşanxaneyê Roşna, Diyarbakir, 2013.
197. Wezaretî Karûbarî Komelayetî, *Ferhengî Nabîstan*, Bilawkirawekanî Destey Serbexoy Mafî Mirov, Hewlêr, 2013.
198. Îlhan Uzun, *Ferhenga Termên Kîmyewî* (Kr-Tr-Îng), Weşanên Perî, Stenbol, 2013.
199. Mehmet Fırat, *Ferhenga Navên Rîwekên Bi Kurdî*, Sîtav, Wan, 2013.
200. Cemal Ebdul, *Ferhengî Zarawey Pêtrolekan*, Bilawkirawey Ekađımyayî Kurdî, Hewlêr, 2013.
201. Îlhan Uzun, *Ferhenga Termên Kîmyewî* (Kr-Tr-Îngilizî), Weşanên Perî, Stenbol, 2013.
202. Mehmet Fırat, *Ferhenga Navên Rîwekên Bi Kurdî*, Sîtav, Wan, 2013.
203. Mela Mehmûdî Gelaleyî, *Ferhengî Mamosta*, Kitêbxaney Aram, 2014.
204. Selah Payanyanî, *Ferhengî Cilûberg û Xişîlî Jinanî Mukriyan*, 2014.
205. Komîsyon, *Ferhenga Zaravên Teknikî*, TMMO, Ankara, 2014.
206. Roşan Lezgîn, *Türkçe-Kürtçe(Zazaki, Kurmanci) Hastane Terimleri Sözlüğü*, Diyarbakır, 2014.
207. Selam Nawxoş, *Ferhengî Zimanewanî*, Çapxaney Hêvî, Başûrî Kurdistan, 2014.
208. Ewrehmanî Hacî Marif, *Ferhengî Zarawey Zimannasî*, Dezgay Çap Billawkirdnewey Rojhelat, Çapî Duyem, Hewlêr, Kitêbxaney Awêr, Hewlêr, 2014.

209. Abdullah Kiran, *Ferhenga Zanistên Civakî* (Kr-Tr-Îng), Nûbihar, Stenbol, 2014.
210. Seydo Homan, *Ferhenga Tibê (Ferhenga Nûjdarîyê û Îngilizîya Nûjdarîyê)*, Çukurova Üniversitesi Yayınları, Adana, 2014.
211. Osman Aslanoğlu, Bedirhan İslamoğlu, Zeki Gürür, Hayrullah Acar, Evren Aslanoğlu, *Ferhenga Pirzimanî*, Nûbihar, Stenbol, 2014.
212. Zara Aliyevna Yusupova, *Li Ser Dîroka Ferhennûsîya Kurdî: Berhevkirin û Weşandina Wan*, Akademîya Zanistan ya Rûsî: Nauk, 2015. (З.А. Юсупова. *К истории курдской лексикографии: составление и публикация словарей*, Российская академия наук, 2015)
213. Ali Jawshani, *Ferhengî Kurdistanica/Kurdistanica Dictionary* (English-Kurdish-Persian), Mang Publications, Bane, 2015.
214. Dilawer Zeraq, *Ferhenga Termên Matematîkê* (Kr-Fr-Îng-Al-Tr) Weşanên Lîs, Amed, 2015.
215. Bahattin Gümgüm, *Ferhenga Termên Fenî-Fen Terimleri Sözlüğü*, İsmail Beşikci Vakfi Yayınları, Stenbol, 2015.
216. Abbas Sultan, *Shabaki-English Dictionary/Farhangi Shabaki –İnglizi*, Dar al-Mahaja al-Baydhaa, Beirut-Lebanon, 2016.
217. Navenda Çanda Nûdayê, *Ferhenga Gundewar a Wanê û Navçeyên Wê*, Weşanên Şaredarîya Mezin a Bajarê Wanê, Wan, 2016.
218. Roşan Lezgîn, *Ferhengê Îdyomanê Kirdkî(Zazakî)*, Weşanxaneyê Roşna, Diyarbekir, 2017.
219. Kamûran Yitik & Ramazan Çeper, *Ferhenga Mîtolojîya Kurdî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2017.
220. Seîd Veroj, *Ferheng: Kurmancî-Dimilî/Zazakî-Tirkî*, Weşanên Dara, Amed, 2018.
221. Sabir Ebdullahîzad, *Ferhenga Têgehên Hiqûqa Navneteweyî* (Îng-Kr-Tr-Fr), Sîtav, Wan, 2018.

222. Komxebata Hiqûqê, *Ferhenga Têgihên Hiqûqê*, Weqfa Mezopotamyayê, Amed, 2019.
223. Hacî Ozkal, *Ferhengê Kurdî: Zazakî-Tirkî/Zazaca-Türkçe*, Weşanên J&J, Diyarbekir, 2020.
224. Ali Beytaş, *Türkçe-Kirmanca(Zazaca) Sözlük*, Babek Yayınları, İstanbul, 2020.
225. Hasan Aslan, *Ferhenga Wergerê (Îng-Kr)*, Ar Yayıncılık, Stenbol, 2020.
226. Rod Harbottle, *Ferhenga Cihên Di Kitêba Pîroz De Derbas Dibin*, Weşanên Hoffnung und Leben, e.v. Komela Hêvî û Jiyan, Bielefeld-Germenîstan, 2020.
227. Ubeydullah Pilatin & Zubeyîr Çelik, *Ferhenga Perwerdeyê*, Çağaloğlu Yayınevi, İstanbul, 2020.
228. Shirzad Alkadhi, *Kurdish Military Dictionary*, 2021.
229. Alî Gurdilî, *Ferhenga Felsefeyê (Kr-Îng)*, Weşanên Na, İzmir, 2021.
230. Şaban Şenates, *Ferhengê Zazakî: Dimilî, Zazakî, Kirdî*, Nûbihar, Stenbol, 2022.
231. Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2022.
232. Roşan Lezgîn, *Ferhengê Termanê Edebî*, Roşna Yayınları, Diyarbekir, 2022.
233. Bahattin Gümgüm, *Ferhenga Kurt û Freh a Çarzimanî (Kurdî-Tirkî-Îngilizî-Pehlewî)*, Doz Yayınları, İstanbul, 2022.
234. Osman Aslanoglu, *Ferhenga Çapemenîya Kurdî*, Nûbihar, Stenbol, 2022.
235. Ekadîmyay Kurdî, *Ferhengê Ferhengekan*, Lijney Bîblîografyay Ekadîmyay Kurdî, Hewlêr, 2023.

2. ZIMANÊ KURDÎ Û DEVOKA SERHEDÊ

2.1. Erdnîgarîya Kurdan

Kurd qewmekî kevn û mezin in di erdnîgarîya Rojhelata Navîn de di bin banê hindek dewletan de perçekirî ne. Ji bo erdnîgarîya ku kurd lê dijîn jî Kurdistan dihê gotin. Kurdistan erdnîgarîyek berfireh e ku di nav xwe de vediqete gelek herêmên cuda.

Rojhelat û başûrê rojhelatê Tirkîyeyê wek axa kurdan dihên zanîn, li gor vê yekê rojhelatê axa kurdan digihêje heta Sêwas û li jorê jî lê dizivire bo bajarê Erzeromê û başûrê Araratê. Mirov dikare wekî Erzingan, Erzerom, Qers, Meletî, Dêrsim, Xarpêt, Çewlig, Mûş, Amed, Agirî, Batman, Colemêrg, Mêrdîn, Riha, Wan, Bidlîs, Sêrt, Îdir, Entab, Xetay, Şirnex û navçeyên wan dîyar bike. Li Îranê jî li rojhelata eyaleta Azerbaycanê, li jora Gola Urmîyeyê wekî Makû, Kotur, Şahpor, Mahabad, Şino, Sine û li eyaleta Erdelanê Bokan, Saqiz, Serdeşt, Bane, Bicar, Merîwan, Hewreman, li Kirmanşanê Qesra Şirîn û Xorasanê mirov dikare wekî erdnîgarîya kurdan bi nav bike. Li Îraqê ku mirov dikare wekî başûrê Kurdistanê bi nav bike. Li bakurê Îraqê bajarên Duhok, Zaxo, Amêdî, Akrê, Silêmanî, Kerkûk, Şengal, Hewlêr Helebçe, Xaneqîn, Dîyala û cihên din warên kurdan e. Li rojavayê Kurdistanê û bakurê Sûriyeyê axa kurdan di xeta sînor re dirêj dibe. Bajarên Resûlayn, Amûda, Qamişlo, Eyn Dîwar, Dêrik, Kobanê, Efrîn û cihên din cihên kurdnişîn in. Herwiha ji xeynî axa kurdan, kurd li gelek bajarên Tirkîyeyê yên mezin, li Azerbaycan û Ermenîstanê, li Rûsyayê, Têhranê û Helebçeyê û cihên din yên wekî Ewrûpayê xwedî hejmarên mezin nin.⁸⁹

Wek hatî diyarkirin axa kurdan gelekî berfireh e, bi taybetî vê yekê jî bi xwe re hindek xusûsiyet anîne holê. Ev yek jî veqetîn û dabeşbûna herêman di nav xwe de ye. Li ser vê erdnîgarîya fireh herêmên cur bi cur hatine holê û li gor van herêman jî çand û hunerên cuda... Bêguman yek ji sedemên vê yekê jî nebûna dewletekê ye bi sedan salan. Di vê biwarê de bi nebûna otorîteyê avaker, hevgyrtinek derneketîye

⁸⁹ Vladimir Fyodoroviç Minorski & Th. Bois & D.N. Mac Kenzie, **Kürtler ve Kürdistan**, Wer: Kamuran Fıratlı, Weşanên Doz, Stenbol, 2004, r. 9-15.

meydanê û bûye sedema veqetîn û cudabûnê. Lewma herêmên cuda hatine meydanê û di encama van herêman de çand, huner û kultûrên cuda cuda derketine holê. Herwiha li gor van herêman zimanê kurdî jî rengo rengo guherîye.

Herêmên kurdan li gor dewletên serdest gelek caran hatine meydanê. Bo nimûne di serdema Dewleta Osmanîyan de herêmên kurdan li gor mîrektîyan dihatin dîyar kirin, herêma Mîrektîya Botanê, herêma Mîrektîya Colemêrgê, herêma Mîrektîya Bazîdê... Li gel vê yekê îro jî di bin sîbera çar dewletan de van herêman reng vedaye.

Heger em bi çavên îroyîn lê binêrin, herêma Serhedê, herêma Xerzanê, herêma Botanê, herêma Xorasanê, herêma Colemêrgê, herêma Badînanê, herêma Erdelanê, herêma Kirmanşanê, herêma Koçgirî, herêma Cezîrê, herêma Mukrîyan û herêmên din derdikevin pêşberî me.

Heger wek esasek mirov li vê erdnîgarîyê binêre mirov dikare di çarçoveya zimên de van herêman dabeş bike ku her yek herêmek xwedîyê çand û esasekê ye û li gor van çand û esasan zimanê kurdî rengên cuda ji xwe afirandîye. Bo vê yekê pêdivî heye mirov zarava û devokên kurdî baş binase.

2.2. Zimanê Kurdî

Ziman ew hêmana peywendîyê ye ku di navbera mirovan de hest û hizir û fikarên mirovan digihîne hev û di navbera wan de têkilîyê daydine. Bi vî awayî di navbera mirovan de danûstandineke xurttir û hêsantir derdikeve.

Li ser rûyê cîhanê bi hezaran ziman hene û di nav van zimanan de jî dîyalektên cuda hene. Lê belê gelek ji van zimanan dişibin hev û xalên hevpar henin. Lewra zanayan di encama lêkolînên xwe de gihîştine wê encamê ku bingeha gelek zimanan yek e û ji heman malbatê derketine.

Zimanê kurdî jî zimaneki kevn û qedîm e ji malbata zimanên Hind-Ewrûpî ye ku mezintirîn malbata zimanên cîhanê ye. Kurdî jî dikeve nav vê malbatê ji beşa Hindî-Îranî û bin beşa zimanên Îranî. Lewra kurdî gelek nêzikî zimanên farisî, belûcî, peştûyî ye. Lewma têkilîya kurdî û zimanên Hind-Ewropî bêhtir sedemek malbatî û

zimanî ye; lê têkilîya kurdî li gel erebî û tirkî hwd bêhtir sedem polîtîk, aborî û çandî hwd e.⁹⁰

Zimanê kurdî ji ber nebûna otorîte û yekgirtinê wekî herêm bi herêm ji hev qut bûye û fonksiyên cuda li xwe bar kirîye ku ji hêla dengsazî, hevoksazî û peyvsazî ve guherînên mezin li xwe bar kirîye. Hetta gelek caran kesên ji zaravayên cuda ji hev fam nakin. Di encama vê yekê de çend zarava derketine holê, lê belê li gor lêkolîneran hejmara van zaravayan diguhere. Jaffer Seyhoislami ji bo zaravayên kurmancî wiha dibêje:

Li gor krîtera fêmkirina hevdu (mutual intelligibility) û îsbatên zimannasîyê, zaravayên Kurdî dikarin di bin pênc gruban de bîn dabeşkirin: Bakur (Kurmancî), Navend (Sorani), Başûr (Kirmansanî), Zazakî û Goranî/Hewramî. Gelek zimannasên zimannasîya teorîk di wê bawerîyê de ne ku her du grubên dawî ne Kurdî ne, lewra ew ji hêla zimannasîyê ve gelek ji Kurdîya rast (her sê grubên din) dûr in. Lê pîranî axêverên Zazakî û Goranî/Hewramî ji xwe re dibêjin Kurd. Ew herdu grub xwedîyê gelek bêje û hin taybetîyên rêzimanî ne ku bi grubên din yê Kurdî re hevpar in.⁹¹

Abdurrahman Adak jî li gorî ku ji Merûf Xeznedar vediguhêze zaravayên kurdî wiha dabeş dike: “kurdîya kurmancî (kurmancîya jorê û kurmancîya jêrê: soranî), kurdîya goranî-kurdîya zazakî û kurdîya lorî”.⁹²

Herwekî din li Kurdistanê li gor texmînan ji %68 kurmancî (kurdîya bakur û kurdîya jorîn), %16 lûrî (kurdîya başûr û kurdîya jêrîn), %12 soranî (kurdîya navîn û kurdîya rojhilatê) %4 jî zazakî û goranî dihê axaftin. Zaravaya ku herî zêde di Kurdistanê de dihê axaftin kurmancî ye. Di wêje û nivîsê de zaravayên kurmancî û soranî xurt û geş bûne û pêş ketine.⁹³

Li gel vê yekê ev zarava jî di nav xwe de gelek devokên cîyawaz dihewînin. Her devokek di nav xwe xwedî hêmanên cuda yê dengsazî, peyvsazî hevoksazî hene. Di nav hev de di gelek xalan de digihêjine hev û ji hev cuda dibin. Ji ber vê yekê mirov dikare bi şabloneke wiha dîyar bike:

⁹⁰ Hewa Salam Khalid, “Zimanê Kurdî, Malbat û Zarên Wî”, **Kovara Kurdîname**, j.1, 2019, r. 5-8.

⁹¹ Jaffer Seyhoislami, “Zimanê Kurdî”, Wer: Mehmeh Yonat, **Nûbihar Akademî**, j.14, 2020, r. 86.

⁹² Abdurrahman Adak, **Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk**, Nûbihar, Stenbol, 2015, r. 114.

⁹³ Nasir Kemaloglu, “Zaravayên Kurdî”, Basnews-Nûçe, j.92, Stenbol, 29 Sibat-09 Adar, 2016, r. 15.

Zimanê Kurdî

- a) Kurdîya Bakurî (Kurmancî)
 - 1. Behdînî
 - 2. Torî
 - 3. Serhedî
 - 4. Botî
 - 5. Rojavayî
 - 6. Qoçgirî
 - 7. Xorasanî
 - 8. Xerzanî
- b) Kurdîya Navendî (Sorani)
 - 1. Mukiryani
 - 2. Silêmanî
 - 3. Soranî
 - 4. Erdelanî
 - 5. Germîyanî
- c) Kurdîya Başûrî (Lorî)
 - 1. Kirmanşanî
 - 2. Lekî
 - 3. Kelhurî
 - 4. Lûrî
- d) Kurdîya Zazakî-Goranî
 - 1. Zazakîya Bakurî
 - 2. Zazakîya Başûrî
 - 3. Goranî
 - 4. Becelanî
 - 5. Hewramanî⁹⁴


Bêguman ji bilî van jî gelek devok û dîyalekt hene, lê belê ji ber ku hindêk zêde nêzîkî hev in neketine nav vê kategorîyê.

⁹⁴ Hewa Salam Khalid, g.n.b., r. 10.

2.3. Herêm û Devoka Serhedê

Peyva “*Serhed*”ê, ji peyvên kurdî/farsî : *ser* û bi erebî : *heddê* (حد) pêk dihê ku ev jî dihê maneya “*sersînor*”. Ev sînor jî herwekî Michael L. Chyetî di ferhenga xwe ya bi navê *Kurdish-English Dictionary* de dîyar kiriye ku sînore Îran û Tirkîye û Sovyêtê ye.⁹⁵ Devera Serhedê, bajarên Qers, Erzirom, Mûş, Agirî, Erdexan, Îdir û hwd. di xwe de dihewîne.⁹⁶ Michael L. Chyet, bi tevî van deveran, deverên wekî Ermenistana Sovyêtê û Ezirbeycanê jî di vê hînterlandê de dihesibîne.⁹⁷

Wek dihêzanîn axa kurdan li gor herêman bi awayekê tebiî dabeş bûye. Yek ji van herêman jî herêma Serhedê ye. Herêma Serhedê li bakurê Kurdistanê ye û ji çend bajaran pêk dihê. Mirov dikare bajarê Mûşê, Agirîyê, Bilîsê, Îdirê, Erzeromê, Erzînganê, Qersê, rojhilatê Çewligê û bakurê Wanê wekî herêma Serhedê bi nav bike. Li gel vê yekê kurdên Kafkasyayê jî bi devoka Serhedê diaxivin lewma mirov dikare ji aliyê devokê ve wan jî wekî Serhedî bihesibîne.⁹⁸ Herêma Serhedê hem ji aliyê çandî û kultûrî û hêmanên erdnîgarîk ve hem jî ji hêla zimên ve ji herêmên din cuda ye. Opengîn û Haig, sînoren devoka herêma Serhedê bi kurtenavê NKyê nîşan didin û herêma Serhedê wek “Northern Dialect Region”(Herêma Dîyalekta Bakurî) bi nav dikin.⁹⁹



Nexşe 1: Nexşeya zaraveyên herêmî yên sereke di kurmançî de¹⁰⁰

⁹⁵ Michael L. Chyet, *Kurdish-English Dictionary*, Yale University Press, London, 2003, r. xxix.

⁹⁶ “Serhat”, <http://aksozluk.org/serhat> (Di 20.04.2022)

⁹⁷ Michael L. Chyet, h.b., r. xiii.

⁹⁸ Mehmet Yonat, “Di Devokên Kurdîya Kurmançî de Rewşên Morfolojîk (Mînakên Devokên Bakur, Başûrê Rojhelatê û Başûrê Rojavayê)”, *Mukaddime*, 2020, r. 416.

⁹⁹ Ergin Öpengin & Geoffrey Haig, “Regional Variation in Kurmanji: A Preliminary Classification of Dialects”, *Kurdish Studies*, Volume: 2, 2014, r. 147.

¹⁰⁰ Ergin Öpengin & Geoffrey Haig, h.g., r. 148.

Serhed ew herêm e ku dikeve bakurê Kurdistanê. Yek ji wan herêmên kurmancîaxêv ya giring e. Di vê çarçoyekê de ji ber şert û mercên sîyasî û aborî û civakî di kurmancî de jî devokek cuda lê tê bikaranîn. Bêguman yek ji sedemên vê guherîna hewayê wê ye, hewayê Serhedê ya cemidî bandoreke çandî jî li wan kirîye. Çanda cuda bi xwe re kiryarên cuda û zimanê cuda diîne. Herwiha bi taybetî bandorên din yê civakî, aborî û polîtîk jî hene.

Di devoka Serhedê de wekî devokên din gelek nimûneyên xweser hene. Gelek peyvên resen ên kevn heta îro xwe parastine û di heman demê de jî gelek peyv ji aliyê peyvsazîyê (morfolojî) ve guherîn lê çêbûne. Hin caran tîp lê hatine zêdekirin û hin caran tîp jê ketine. Vê yekê jî rê li ber devokekê vekirîye ku her devok jixwe bi vî awayî derdikeve holê.

Bo nimûne; wisa bûye isa, wext bûye axt, meriv: merî, herdu: herd, ew: ewana, nabêjim: nawêjim, were: worê, xebat: xewat, bibîne: bivîne, siwar: siyar, winda: inda hwd.¹⁰¹ Di encamê de ev rewşên wiha tiştên tebîî ne ku ziman her tim di nav guherînekê de ye. Herwiha sedemên vê yekê yê erdnîgarî, civakî, sîyasî, perwerdehî û hwd jî hene.

Li ser devoka Serhedê bandora zimanê tirkî gelek caranxwe nîşan dide. Li gor gotara Kenan Subaşi ya bi navê *Tesîra Zimanê Tirkî Li Ser Devoka Serhedê*, bandora tirkî ya li ser devoka Serhedê zêdetir di qada leksîkal de pêk hatiye.¹⁰²

Herwiha tesîra zimanê ermenîkî jî wekî tirkî di qada leksîkal de li ser devoka Serhedê bandor kiriye û cihê xwe girtiye. Bo mînak peyvên *Anîsaz, antêx, axpîn(axpeyn), bibik, poşe(cîngene), çortan, horîg, kêran, kartû(kartî), merek, pûrt, boçik, savar, tixa, axçik û gizik* hwd. ketine vê devokê.¹⁰³

Ji ber erdnîgarîya nêzik û pêwendîyên kurdan û rûsan de vera Serhedê gelek salan ketiye bin desthilata rûsan û ji zimanên wan jî hin peyv ketine devoka Serhedê.

¹⁰¹ Mûrad Celalî, “Kurmancîya Serhedê û Devoka Gundê Taxilka”, **Kovara Nûbiharê**, j.145, 2018, r.42-45.

¹⁰² Kenan Subaşi, “Tesîra Zimanê Tirkî Li Ser Devoka Serhedê: Wekî Nimûne Milazgirta Mûşê”, **Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi**, j.8, Mûş, 2020, r. 61.

¹⁰³ Têmûrê Xelîl, “Pêwendîyên Ermenîkî û Kurdî yê Zimên”, **Kovara Kurmancî**, j.41, 2007, r. 5.

Bo mînak: *akûşke, îskan, kanfêt, kinîşke, potîn, rêzîn, zavod, kartol*¹⁰⁴, *fîrxûn(vîrxûn), fayke, kapîk(qurîşê rûsî), manat(pereyê rûsî), nesilqe/nesirge(teşgere), spîçke, taçke(erebeya destan) kaşke(erebeya hespan), matoşke(matrûşka), vazgal, vêdrok/bêdrok. kinyaz(mîrza) hwd...*¹⁰⁵

Devoka Serhedê ji xêncî van taybetîyên leksîkal û bandorgirtina zimanên cînanan, bi taybetîyên xwe yên wekî fonolojîk, morfolojîk û sentaksî jî mexsûsê xwe ye.

2.4. Taybetîyên Devoka Serhedê ji Alîyê Fonolojîk û Morfolojîk ve

2.4.1. Ji alîyê dengsazîyê (fononolojîk) ve

Dengsazî (fonolojî), ew zanist e ku dengên zimên ji alîyê guherîn, dariştin, ketin, racivîn û kewînê û hwd. lê dikole.¹⁰⁶ Di vê binbeşê de em dê hewil bidin ku hin taybetîyên devoka Serhedê yên fonolojîk yên wekî guherîn, dariştin, ketin, racivîn û kewînê bi hin mînakên peyvan ve bidin.

Guherînen dengê /û/yê bi dengê /î/yê

Di devoka Serhedê de gelek caran dengê /û/ diguhere dibe dengê /î/. Di mînakên jêrîn de ev bi eşkere xuya dike:

| | | |
|--------------|--------------------|---|
| kartû | > kartî | <i>Nanê me kartî bîye.</i> |
| pembû | > pembî | <i>Me pembî top dikir.</i> |
| histû | > histî/stî | <i>Nîr davîtime se stîyê ga.</i> ¹⁰⁷ |
| bûye | > bîye | <i>Eşîreke mezin bîye.</i> ¹⁰⁸ |
| xwîşk | > xûşk | <i>Her di xûşkê hev bûn.</i> ¹⁰⁹ |

¹⁰⁴ Rohat Alakom, **Torin: Arîstokratên Serhedê**, Stenbol, Avesta, 2009, r. 39-40.

¹⁰⁵ Têmûrê Xelîl, "Gotînen Rûsî Ku Derbasî Kurmancî Bûne", **Kovara Kurmancî**, j.43, 2008, r. 1-2.

¹⁰⁶ Zafer Açar, "Dengsazîya Kurmancî û Pirsyara Nîşankirina Dengên Derî Alfabeza Standart a Latînî", **II. Uluslararası Sosyal Bilimler Kongresi**, Dêrsim, 2020, r. 15.

¹⁰⁷ Zafer Açar, "**Devoka Devera Filistanê**", Teza Lîsansa Bilind a Çapnekirî, Zanîngeha Bîngolê Enstîtûya Zimanên Jîndar, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Bîngol, 2015, r. 48.

¹⁰⁸ Zafer Açar, h.b., r. 70.

Guherînên dengê /ê/yê bi dengê /î/yê

Dîsa em dibînin ku di devoka Serhedê de dengê /ê/yê cihê xwe dide dengê /î/yê.

pê > **pî** *Bûkek ser pîya bisekinîya.*

dê > **dî** *Dîya min go porkurê...¹¹⁰*

kîngê > **kengî** *Go hema em kîngê herin diwe.¹¹¹*

avêtin > **avîtin** *Xurceke zêra avîte terka xu.¹¹²*

nêzik > **nîzik** *Hat nîzikê min rûnişt.¹¹³ (Divê bihê gotin ku li Serhedê awayê berbelavtir *nêzik* e, lê kêmek be jî awayê *nîzik* jî heye.)*

Guherînên dengê /u/yê bi dengê /i/yê

tu > **ti** *Ti li ber perda kurê xu rûnê.¹¹⁴*

usa > **isa** *Eyşê usa bedew bû.¹¹⁵*

du > **di** *Di caran didotin.¹¹⁶*

tune > **tine** *Li malê kes tine.*

şukir > **şikir** *Şikir tiştê ha qîzê me da tine nin.¹¹⁷*

Guherînên dengê /e/yê bi dengê /a/yê

Di devoka Serhedê de ev guherîn zêdetir di paşdaçekan de xwe dide der. Bo mînak: Di devoka Serhedê de paşdaçek wekî paşdaçekên di metnên klasîk ên kurdî de ne.

...de > **...da** *Dîya min anî mala me da daxist.*

¹⁰⁹ Çetin Taş, b.n.b., r. 78.

¹¹⁰ Zafer Açar, b.n.b., 2015, r. 85.

¹¹¹ Hüseyin Koçuk, *Deşîfresyona Çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê*, Xebata Çapnekirî, Mêrdîn, 2019, r. 4.

¹¹² Hüseyin Koçuk, h.b., r. 4.

¹¹³ Çetin Taş, b.n.b., r. 26.

¹¹⁴ Çetin Taş, b.n.b., r. 26.

¹¹⁵ Hecîyê Cindî, *Memê û Eyşê*, Înstîtûta Kurdzanîyê, Wien, 2012, r. 5.

¹¹⁶ Hecîyê Cindî h.b., r. 26.

¹¹⁷ Zafer Açar, b.n.b., 2015, r. 85.

...re >...ra *Mi xinamîya xu ra yek çêkirîye.*¹¹⁸

...ve >...va *Pêşîya wê ya qîçik davîtine para va.*¹¹⁹

Guherînên dengê /b/yê bi dengên /v/ û /w/yê

Dengê zaravayên din ê /b/yê di devoka Serhedê de û li aliyê Êrmenistanê diguhere bo dengê /v/ yan jî /w/yê.¹²⁰ Ev /b/ya ku dibe /v/ an jî /w/, di bêjeyê de /b/ya dawî ye. Ev li mînakên jêr de eşkere ye:

cewab >cewav *Te çima cewava min neda?*

xirab >xiraw *Wî xirawî li me kir.*

kebok >kevok *Kevok li ser banî firîn.*

sibe >siwe *Ew siwe zû hat vir. .*

xebitîn > xewitîn *Em gelekî xewitîn.*¹²¹

Guherînên dengê /s/ bi dengê /z/yê

Di devoka Serhedê û devera Ermenistanê de hin caran dengê /s/ bo /z/yê diguhere.¹²² Bo mînak:

bibihîse > bibihîze *Kesî navê wî nedibihîzt.*

desgirtî > dezgirtî *Tu wek dev û lêvên dezgirtî û perîyan sor î.*

derbas > derbaz *Dixwezin derbazî ser alifbaê latînî bin.*¹²³

Osman > Ozman *Ozman, tu nizanî hinek begên me xayîn in.*¹²⁴

xelas > xilaz *Heta salekî xilaz nedibû.*¹²⁵

Ketina Dengan

Di vê binbeşê de em dê bûyerên dengî yên wekî *ketin*, *racivîn* û *kewînê* bi hin mînakên peyvan nîşan bidin. Di devoka Serhedê de ketina hin dengan di hin peyvên jêrîn de wiha ne:

¹¹⁸ Zafer Açar, b.n.b., 2015, r. 84.

¹¹⁹ Zafer Açar, b.n.b., 2015, r. 86.

¹²⁰ Celadet Ali Bedirxan, Roger Lescot, **Kürtçe Gramer**, Avesta, Stenbol, 2004, r. 18.

¹²¹ Celadet Ali Bedirxan, Roger Lescot, h.b., r. 18.

¹²² Celadet Ali Bedirxan, Roger Lescot, h.b., r. 23.

¹²³ Qanadê Kurdo, b.n.b., r. 24.

¹²⁴ Erebe Şemo, **Jîyana Bextewar**, Weşanên Lîs, Dîyarbekir, 2015, r. 27.

¹²⁵ Zafer Açar, b.n.b., 2015, r. 46.

| | | |
|-------------------|------------|---|
| min | > mi | <i>Mi dî dibû reqereqa zirzê dêrîya.</i> ¹²⁶ |
| got | > go | <i>Go ez gazî dikim dengê mi naçe.</i> ¹²⁷ |
| cihekî | > cîhkî | <i>Em bêjin cîhkî mîna Qerekilîsê da</i> ¹²⁸ |
| dibêje | > dibê | <i>Şîrin-şîrin min ra dibê: "Kalko..."</i> ¹²⁹ |
| bidimê | > bidmê | <i>Ça dixwezim nan bidmê.</i> ¹³⁰ |
| belekîyekê | > belekîkê | <i>Herim, herim hevraz bim, belekîkê</i> ¹³¹ |
| winda | > unda | <i>Unda nakim kubira te.</i> ¹³² (Di vir de dengê /w/yê ketiye û dengê /i/yê bi dengê /u/yê hatiye guherîn) |
| hespê min | > hespê | <i>Hespê çû ber ko sekinî.</i> (Di vir de kewîn û racivîn çêbûye.) |
| dilê min | > dilê | <i>Dilê dibe şeweq.</i> ¹³³ (Di vir de jî kewîn û racivîn pêk hatiye.) |
| ji | > xuj | <i>Dibê Xelo xatirê xuj Xelîl Begê xast.</i> ¹³⁴ (Pêşdaçeka "ji"yê bi cînavka "xwe"yê re kewîyaye ye û ev cînavk di kurdîya Serhedê de bi awayê "xu"ye). |
| xwe | > xu | (Di devoka Serhedê de gelek caran dengê piştî "x"yê dikeve.) |
| çi awayekî | > çakî | (Di vir de racivîn çêbûye.) <i>Xelîl Begê çakî kir?</i> ¹³⁵ |
| bayekî | > bakî | (Di vir de dengên y+e ketine û pê re jî racivîn pêk hatiye.) <i>Bakî teze ber dixê.</i> ¹³⁶ |
| guneh | > gune | (Di vir de ketina dengî çêbûye.) <i>Êdî gune histîyê Şeytan be.</i> |

¹²⁶ Hüseyin Koçuk, b.n.b., r. 10.

¹²⁷ Hüseyin Koçuk, b.n.b., r. 9.

¹²⁸ Hüseyin Koçuk b.n.b., r. 2.

¹²⁹ Fêrikê Êsiv, **Bijare**, Weşanxana Lêgal Plyûs, Yêrêvan, 2010, r. 122.

¹³⁰ Fêrikê Êsiv, **Pampa Min**, Weşanxana Lîmûş, Yêrêvan, 2009, r. 34.

¹³¹ Fêrikê Êsiv, h.b., r. 14.

¹³² Fêrikê Êsiv, b.n.b., 2010, r. 10.

¹³³ Fêrikê Êsiv, b.n.b., 2009, r. 40.

¹³⁴ Hüseyin Koçuk, b.n.b., r. 3.

¹³⁵ Hüseyin Koçuk, b.n.b., r. 2.

¹³⁶ Fêrikê Êsiv, b.n.b., 2009, r. 76.

- ewên ku > ewêk (Di vir de hem ketina dengî pêk hatiye hem jî racivîn pêk hatiye.) *Ewêk ew dibêjin jî kêfa min jê ra nayê.*
- roj > ro (Di vir de dengê /j/yê ketiye.) *Eyşê her ro dereqa Memêda pirs û hewal dikir.*¹³⁷
- mih > mî (Di vir de dengê /h/ ketiye û cihderka dengê /i/yê guherîye bûye dengê “î”.) *Mî giş mexel hatibûn.*¹³⁸
- cih > cî (Di vir de jî dengê /h/yê ketiye û cihderka dengê /i/yê guherîye bûye /î/.) *Li wê derê hê berf cî da heye.*¹³⁹
- gişt > giş (Di vir de dengê /t/yê ketiye.) *Kolxozvan giş şa bûn.*¹⁴⁰.
Hin caran dengê /ş/yê ya vê peyvê jî dikeve û peyv dibe awayê “gi”.)
- qet > qe (Di vir de dengê /t/yê ketiye.) *Qe bûye wekî mêvan malên me da nênxwin?*¹⁴¹

2.4.2. Ji alîyê morfolojîyê ve

Morfolojî, ew zanist e ku bikaranîn, fonksiyon û binyada yekeyên zimanî yên herî biçûk û watedar yên wekî gire û bêjeyan lê dikole.¹⁴² Morfolojî, bi giştî li ser van mijaran radiweste:

- Lêkolîn û dîyarkirina rêzikên dariştina bêjeyan,
- Lêkolîn û dîyarkirina rêzikên kêşana bêjeyan,
- Dîyarkirina cureyên peyvan û pîvanên morfolojîyê yên ku bo dîyarkirina cureyên peyvan,
- Rêzikên hevedudanîya bêjeyan.

Di vê binbeşê de jî em dê ji alîyê morfolojîk ve hin bêjeyên aîdê devoka Serhedê ne lê bikolin. Zanista morfolojîyê, çêkirina bêjeyan bi van rêbazan ve dike:¹⁴³

¹³⁷ Hecîyê Cindî, b.n.b., r. 13.

¹³⁸ Erebe Şemo, **Hopo**, Lîs, Stenbol, 2007, r. 21.

¹³⁹ Erebe Şemo, b.n.b., 2007, r. 23.

¹⁴⁰ Erebe Şemo, b.n.b., 2007, r. 39.

¹⁴¹ Erebe Şemo, b.n.b., 2007, r. 105.

¹⁴² Hülya Pilancı, **Türkçe Biçim Bilgisi**, Anadolu Üniversitesi, Eskişehir, 2018, r. 3.

¹⁴³ Günay Karaağaç, **Dil Bilimi Terimleri Sözlüğü**, TDK, Ankara, 2018, r. 194-196.

Bi Rêbaza Pêvekirina Gireyên Çêker û Kêşanê ve

Hin morfem bi dariştina gireyên çêker, dibin morfemeke din ango bêjeyeke xwedî wateyeke dîtir. Hin morfem jî gireyên kêşanê digirin ser xwe lê di wateyên wan ên bingehîn de guherînên mezin nabin. Bo mînak:

...ek > virrek *Kuro lawo tu Xeloyê qehwecîyê virrek nîn î?*¹⁴⁴ (Di vir de morfema **ekê** wek gireyeke çêker hatiye bikaranîn û wateya *kesê ku karê viran û derewan dike* daye morfema “**virr**”ê)¹⁴⁵

...ik > dînik *Êh, go, şayîrê dînik î gêj î.*¹⁴⁶ (Di vir de morfema **ikê** wek gireyeke kêşanê hatiye bikaranîn û di wateya morfema **dîn** de guherîneke radîkal nekiriye.)

...î > nexaşi *Dibê rojekê Xelo xu avîte nexaşîyê.*¹⁴⁷ (Di vir de morfema **îyê** wek gireyeke çêker hatiye bikaranîn û di wateya morfema *nexaşîyê* de guherîneke berbiçav çêkiriye.)¹⁴⁸

...an > şivan *Dixwest saltira din bibûya şivan.*¹⁴⁹ (Di vir de morfema **anê** wek gireyeke çêker hatiye bikaranîn û di wateya morfema **şivê** de guherîn çêkirîye.)

Bi rêbaza tewangê ve

Di kurdîya devoka Serhedê de tevî ku tewang wekî tewanga *Kurdîya Standart* e, her weha navdêrên nêr kêrî caran be jî dihên tewandin. Û navdêrên nêr gelek caran di orta pêyvê de bi gireyên tewangê yên “**î**” û “**ê**” ve dihên tewandin.

...î... *Ozmîn giha diçînî.*

...ê... *Osmên giha diçînî.*

...î... *Nîn bide şivîn.*

...ê... *Nên/xwarinê bide şivên.*

...î... *Xulîm(xulamî) pez av dida.*

...ê... *Xulêm(xulamî) pez av dida.*¹⁵⁰

¹⁴⁴ Hüseyin Koçuk, b.n.b., r. 4.

¹⁴⁵ Hüseyin Koçuk b.n.b., r. 4.

¹⁴⁶ Fêrîkê Ûsiv, b.n.b., 2010, r. 107.

¹⁴⁷ Hüseyin Koçuk, b.n.b., r. 7.

¹⁴⁸ Hüseyin Koçuk, b.n.b., r. 7.

¹⁴⁹ Fêrîkê Ûsiv, b.n.b., 2010, r. 331.

Bi rêbaza dubarekirinê ve

Hin morfem jî bi dubarekirinê, wateyên xwe xurttir dikin yan jî wateyên nû digirin ser xwe. Bo mînak:

| | |
|------------|--|
| hero hero | > <i>Qedrê wî hero hero zêde bû</i> ¹⁵¹ |
| car-car | > <i>Şîn û şaya me car -car betsar bû.</i> ¹⁵² |
| kuşekuş | > <i>Avên zozana kuşekuş bû jor da dihatin.</i> ¹⁵³ |
| gale-gal | > <i>Ez heyrana wê galegalê.</i> ¹⁵⁴ |
| zûke-zûk | > <i>Şev û mişev zuke-zuk kir</i> ¹⁵⁵ |
| kalekal | > <i>Îşev dîsa kalekala berxa bû</i> ¹⁵⁶ |
| reşebelek | > <i>Dibê çavê reşebelek kilê Siphane kil dan</i> ¹⁵⁷ |
| qinge-qing | > <i>Paşê dike qinge-qing ser hêka xwe</i> ¹⁵⁸ |
| gaze-gaz | > <i>Pûpû distirê, dike gaze-gaz.</i> |
| fîte-fît | > <i>Fîte - fîte şivana şa.</i> |
| lîqe-lîq | > <i>Bikin lîqe-lîq.</i> ¹⁵⁹ |
| tele-tel | > <i>Tele-tel çû li teldê lodê.</i> ¹⁶⁰ |
| hele-hel | > <i>Hele-hel ketibû berfê.</i> ¹⁶¹ |
| wîtewît | > <i>Çivîkan kirine wîtewît</i> ¹⁶² |
| saxesax | > <i>Kalê belengaz saxesax birine.</i> ¹⁶³ |

Bi rêbaza hevedudanîyê ve

¹⁵⁰ Omîdê Mistefayê Celalî, “Taybetmendiye Devoka Celaliyan”, **Kovara Kurmancî**, 2013, j. 52, r. 7.

¹⁵¹ Hüseyin Koçuk, b.n.b., r. 3.

¹⁵² Fêrikê Ûsiv, b.n.b., 2010, r. 140.

¹⁵³ Hüseyin Koçuk, b.n.b., r. 3.

¹⁵⁴ Fêrikê Ûsiv, **Bijare**, Weşanxana Lêgal Plyûs, Yêrêvan, 2010, r. 10.

¹⁵⁵ Fêrikê Ûsiv, h.b., r. 91.

¹⁵⁶ Fêrikê Ûsiv, h.b., r. 25.

¹⁵⁷ Hüseyin Koçuk, b.n.b., r. 6.

¹⁵⁸ Fêrikê Ûsiv, b.n.b., 2010, r. 57.

¹⁵⁹ Fêrikê Ûsiv, b.n.b., 2010, r. 169.

¹⁶⁰ Fêrikê Ûsiv, b.n.b., 2009, r. 82.

¹⁶¹ Fêrikê Ûsiv b.n.b., 2009, r. 87.

¹⁶² Erebe Şemo, b.n.b., 2007, r. 29.

¹⁶³ Erebe Şemo, b.n.b., 2007, r. 35.

Bi vê rêbazê ve du morfem dihên ba hevdu û dibin morfemeke hevedudanî ya nû. Bo mînak:

- dûajo > *Şivan zivirî ser dûajo* ¹⁶⁴
- bindarûk > *Qîz û xort diçûn bindarûkê.* ¹⁶⁵
- çevkanî > *Wekî çevêd te çevkanî bi hêşirkî îsaf dizên.* ¹⁶⁶
- nandirûn > *Li kolxoza gundê Darebîyê nandirûn gumreh diçû.* ¹⁶⁷
- malmîrato > *Kuro go malmîrato tu mi tiştêkî xerab gotîye.* ¹⁶⁸
- gulîbirê > *Digo Saedetê gulîbirê mi bala xu dayê.* ¹⁶⁹
- nexaş > *Xelo nexaş e.*
- çêlekdoş > *Çêlekdoşekê got...* ¹⁷⁰
- kerrelal > *Zinê her gav kerrelal bû.* ¹⁷¹
- Kêlendîkêş > *Kêlendîkêş çî qas li ber xwe ketin.* ¹⁷²

Bi rêbaza pergala îzafeyê ve

Di devoka Serhedê de bi tevî gireyên îzafeyê yên kurdîya standart, hin gireyên îzafeyên cuda yên din jî di vê devokê de hene ku morfem pê dihên çêkirin.

...e > *Pampa mine baş, Pampa min kubar.* (Di kurdîya standart de beramberê vê gireya îzafeyê, **a** dihê bikaranîn. *Pampa min a kubar...*)

...e > *Bave mi (bave'm) îşev nehat malê.* ¹⁷³ (*Bavê min îşev nehat malê.*)

...ye > *Porr û guliyê te ye zêrîn...* (*Por û guliyên te yê zêrîn*)

¹⁶⁴ Fêrikê Ûsiv, b.n.b., 2009, r. 76.

¹⁶⁵ Erebe Şemo, b.n.b., 2015, r. 12.

¹⁶⁶ Fêrikê Ûsiv, b.n.b., 2010, r. 87.

¹⁶⁷ Erebe Şemo, b.n.b., 2007, r. 137.

¹⁶⁸ Hüseyin Koçuk, b.n.b., r. 5.

¹⁶⁹ Hüseyin Koçuk, b.n.b., r. 10.

¹⁷⁰ Erebe Şemo, b.n.b., 2007, r. 110.

¹⁷¹ Erebe Şemo, b.n.b., 2007, r. 114.

¹⁷² Erebe Şemo, b.n.b., 2007, r. 144.

¹⁷³ Omîdê Mistefayê Celalî, b.n.b., r. 7.

...ingê > *Mêrkingê min kuştin.*¹⁷⁴ (*Mêrikê min kuştin.*)

...ngê > *Go: - Rûvîngê minî çûk...*¹⁷⁵ (*Go: -Rûvîyê min ê çûk.*)

Bi rêbaza daçek û gîhanekan ve

Morfem dema daçek û gîhanekan bi xwe ve digirin wateyên dîtir digirin li ser xwe. Hin daçek û gîhanekên devoka Serhedê bi vî awayî li bêjeyan zêde dibin:

... **va** > *Ewî, Xelîl Begî va êwar êwar j'xwe ra kişik dilîstin.* (Di vir de fonksiyona morfema **vayê** wateya *pêrebûnê* dide bêjeya berîya xwe.)

... **ra** > *Heçiyê te dît ji me ra bêje.* (Di vir de fonksiyona morfema **rayê** *arastebûn û berpêbûn*(yönelme) e.)

... **da** > *Zarotîya Fêrik Pampê da derbaz bûye.*¹⁷⁶ (Di vir de fonksiyona morfema **dayê** *têdebûn û lêbûn* e ango wê gavê *mevcûdbûn* e.)

Di devoka Serhedê de daçekên **va**, **ra** û **dayê** wekî yên di metnên klasîk ên kurdî de ne. Herwiha di devoka Serhedê de gelek caran pêşdaçekên **bi**, **ji** û **di** nahên bikaranîn. Paşdaçekên **va**, **ra** û **da** bi tena serê xwe fonksiyonên pêşdaçekên **bi**, **ji** û **diyê** jî bi cih dihînin.

2.5. Xebatên Ferhengî û Akademîk yên li ser Devoka Serhedê

Bi qasî ku em dizanin cara pêşîn bi awayeke dîyar xebata ferhengî ya li ser devoka Serhedê xebata Mela Mehmûdê Bazîdî ya Ferhenga Hekarî û Rewendî ye. Devoka Rewendî yan Bayezîdî yan jî Serhedî li erdnîgarîya bakurê Wanê dihê axaftinê. Hinterlanda vê devokê ji herêma eşîra Şîkak dest pê dike heta deverên Çemê Eres, Qers, Agirî, Erzirom, Wan, Mûş û Erzinganê dewam dike.¹⁷⁷ Herwiha li gor Mela Mehmûdê Bazîdî ku di pêşgotina pirtûka xwe ya bi navê *Tewarîxî Cedîdî Kurdistanê* de behs dike, li herêma Serhed û Hekariyê jî ev devok dihên axaftin. Li ser vê ferhengê dihê nivîsîn ku “Eva risaleyêke di behsa hinek ferq û cudayî di nav

¹⁷⁴ Fêrikê Ûsiv, **Bijare**, Weşanxana Lêgal Plyûs, Yêrêvan, 2010, r. 322.

¹⁷⁵ Fêrikê Ûsiv, b.n.b., 2009, r. 54.

¹⁷⁶ Fêrikê Ûsiv b.n.b., 2009, r. 329.

¹⁷⁷ Mûrad Ciwan, **Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dil Bilgisi**, Jîna Nû, Balinge, 1992, r. 27; Nasır Kemaloğlu, Zaravayên Kurdî, <http://www.zazaki.net/haber/zaravayn-kurd-1986.htm> (24.04.2022)

lûxatêd ekradan hindî beyanî be'zî qewa'idî 'umûmî yêd lazim e".¹⁷⁸ Ango ev ferheng li ser agahîyên lazim yên cudahîyên devokên kurdan e ku devokên Hekarî û Rewendî (Serhedî) jî di xwe de dihevine, radiweste. Ev destnivîsa wî ji aliyê Merûf Xeznedar ve di sala 1984an de ji bo çapê hatiye amadekirin. Di vê ferhengê de peyvên devoka Hekarî û Rewendî li gel wateyên wan ên frensî hatine dayîn. Qebareya vê berhemê ji 49 rûpelan pêk dihe. ¹⁷⁹

Zimannasê ermenî Hiraçya Açaryan di sala 1911an de bi navê *Recueil De Mots Kurdes en Dialecte De Novo-Bayazet* (Berhevkirina Peyvên Devoka Bazîda Nû) berhemek nivîsiye ku tê de cih daye ferhengoke bi navê *Lexique Kurde-Français* (Ferhenga Kurdî-Frensî). Ev ferhengok, dora 1500 û 36 rûpel e.¹⁸⁰ Di vê ferhengokê de peyvên aîde herêma Serhedê bi taybetî ya devoka Bazîde hene.

Li gor agahîyên me bi destxistine xebata pêşîn a ku wekî gotareke zanistî ya roja îroyîn li ser devoka Serhedê hatiye nivîsîn ya Ely Bannister Soane (1881–1923) ye. Ely Bannister Soane ê îngiliz, serdarekî leşkerî, zimannas û şewirmendê îstixbaratê bû. Wî li ser rêziman û fonolojîya zimanê kurdî gelek berhem nivîsiye. Herwiha gotara bi navê "*Notes on a Kurdish dialect: The Shadi Branch of Kermanji (Not Li Ser Zaraveyeke Kurdî: Kurmancîya Şaxa Şadî)*" li ser devoka Serhedê nivîsiye. E.B. Soane di vê gotara xwe de ji aliyê fonolojîk û morfolojîk ve li ser devoka Serhedê rawestiyaye. Herwiha ev xebata wî li ser bingeha ferhengoka peyvên vê devokê, farsî û îngilizî ye. Ango evgotara wî ya ferhengî ji peyvên devoka Serhedê, farsî û îngilizî bi awayeke berawirdkî pêk dihe.

Herwekî dihe zanîn kurdên Sovyêta Berê di berhemên xwe yên edebî de devoka Serhedê bi kar diînin. Herwiha di berhemên wan ê derveyî edebî de jî ev devok serdest e. Bo mînak ferhenga bi navê *Xebernama Têrmînologîya Ermenî-Kurmancî* ya ku Hecîyê Cindî, Emînê Evdal û Cerdoyê Gêncî amade kirine dikare wek mînak bihe dayîn.

¹⁷⁸ Murat Çelik, "Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiyeya Mela Mehmûdê Bazîdî", Teza Lîsansa Bilînd a Çapnekirî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstûtîya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2015, r. 81.

¹⁷⁹ Murat Çelik, h.b, r. 55.

¹⁸⁰ H. Adjarian, "Lexique Kurde-Français", Recueil de Mots Kurdes en Dialecte de Novo-Bayazet, *Memoires de la Société Linguistique*, Paris, 1911, r. 349-383.

Herwiha ferhenga Çerkes Xudoyêvîç Bakayêv a bi navê *Xebernama Kurmancî-Rûsî* ku di sala 1957an de çap kiriye dikare wekî mînak bihê dayîn. Hema ji salekê piştî wê ango di sala 1958an de jî Emînê Evdal *Xebernama Kurdîyê ya Rastnivîsandinê* (Ferhenga Kurdî ya Rastnivîsandinê) çap kir. ¹⁸¹

Li gor Qanatê Kurdo, peyvên ferhenga Prof. Îvanê Omer Farîzov a Kurdî-Rûsî ku ji 30.000 gotinê pêk dihê, li ser bingeha peyvên kurdîya kurdên Êrmenistanê (devoka Serhedê) ye. Ev ferhenga ji 781 rûpelî pêk dihê, cara pêşîn bi tîpên kurdî yên kirilî di sala 1957an de li Moskooyê hatiye çapkirin. ¹⁸²

Ji xêncî van xebatan hin xebatên akademîk ên din jî hene ku li dorhêla devoka Serhedê de hatine kirin. Bo mînak:

1. Zafer Açar, *Devoka Devera Filistanê*. Açar, di vê teza xwe ya lîsansa bilind de li ser taybetîyên giştî yên devokê û bûyerên fonetîkî yên devoka devera Filistanê radiweste, Herwiha cudahî û taybetîyên giştî yên fonolojîk yên vê devokêbi kurdîya standart re berawird dîke. ¹⁸³

2. Çetin Taş, *Dengsazîya Devoka Çaldiranê*. Taş, di vê teza xwe ya lîsansa bilind de li ser taybetîyên fonetîkî yên devera Çaldiranê rawestîyaye, Herwiha di vê xebata xwe de bi temamî li ser *guherîn, racivîn, kewîn, dubarekirin* û *ketina dangan* rawestîyaye. ¹⁸⁴

3. Mûrad Celalî, *Kurmancîya Serhedê û Devoka Gundê Taxilka*. Celalî, di vê nivîsa xwe de li ser hin cudahî û taybetîyên devoka gundê Taxilka û Serhedê

¹⁸¹ Husein Muhammed, “Okyanûsa Giştgir Anku Derbarê Navlêkirinên Ferhengê”

<https://zimannas.wordpress.com/category/ferheng/> (29.04.2022)

¹⁸² Qanatê Kurdo, **Ferhenga Kurdî-Rûsî**, Akadêmîya Zanistîyê ya Sovêtîstanê Înstîtota Rohilatnasîyê, Neşîrxana Dewletê ya Ferhengêd Zimanê Milletêd Dereve û yê Sovêtîstanê, Moskova, 1960, r. 22 ; Umit Işık, “Lêkolînek Li Ser Ferhengên Kurdî (1655 -1990)”, **Anemon MAUN Sosyal Bilimler Dergisi**. c.3, j.1, Mûş, 2015, r. 161.

¹⁸³ Zafer Açar, “**Devoka Devera Filistanê**” Teza Masterê a Çapnekirî, Zanîngeha Bîngolê Enstîtûya Zimanên Jîndar, Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Bîngol, 2015.

¹⁸⁴ Çetin Taş, “**Dengsazîya Devoka Çaldiranê**”, Teza Masterê a Çapnekirî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2015.

rawestîyaye. Her wiha di vê nivîsa xwe deli ser guherîn, bilêvkirin, kurtkirin û dirêjkirina dengên aîdê gundê xwe rawestiyaye.¹⁸⁵

4. Omîdê Mistefayê Celalî, *Taybetmendiyên Devoka Celalîyan*. Celalî, di vê nivîsa xwe de bi awayekî giştî li ser hin taybetmendiyên devoka eşîra Celalîyan rawestiyaye ku ev devoka Celalîyan jî beşek ji devoka Serhedê ye. Di vê nivîsarê de nimûneyên hin peyvan hatiye dayîn ku li ser bilêvkirin, kurtkirin, dirêjkirin û guherîna foneman hatiye rawestîn.¹⁸⁶

5. Orhan Agirî, *Kurmancîya Herêma Agirîyê*. Agirî, di vê nivîsa xwe de ji aliyê gramerê ve li ser kurmancîya devera Agirîyê nixandînan dike, Herwiha di vê nivîsarê de hin peyvên aîdê devera Agirî ne hatine dayîn¹⁸⁷

6. Oruç Sural, *Devoka Xoçvanê (Erdexanê)*. Sural, di vê nivîsa xwe de li ser cureyên peyvên vê deverê û fonetîka wê radiweste. Herwiha di vê nivîsarê de hin peyvên aîdê vê deverê ne hatiye dayîn.¹⁸⁸

7. Têngîz Siyabendî, *Kurmancîya Ermenistanê*. Siyabendî, di vê nivîsa xwe de li ser taybetmendiyên fonetîkî û cureyên peyvên aîdê devoka Ermenistanê (Serhedê) ne radiweste.¹⁸⁹

8. Kamîz Şeddadî, *Kurmancîya Laçînê (Kurdîstana Sor)*. Şeddadî, di vê nivîsa xwe de bi awayeke giştî li ser rêziman û cureyên peyvên vê devokê radiweste. Her wiha di vê nivîsarê de hin peyvên aîdê herêma Laçînê ne hatine dayîn.¹⁹⁰

¹⁸⁵ Mûrad Celalî, “Kurmancîya Serhedê û Devoka Gundê Taxilka”, **Kovara Nûbihar**, j.145, Stenbol, 2018.

¹⁸⁶ Omîdê Mistefayê Celalî, “Taybetmendiyên Devoka Celalîyan”. **Kovara Kurmancî**, j.52, Parîs, 2013.

¹⁸⁷ Orhan Agirî, “Kurmancîya Herêma Agirîyê”, <https://zimannas.wordpress.com/2020/03/06/kurmanciya-herema-agiri/> (04.05.2022)

¹⁸⁸ Oruç Sural, “Devoka Xoçvanê (Erdexanê)”, <https://zimannas.wordpress.com/2020/03/11/devoka-xocvane-erdexan/> (05.05.2022)

¹⁸⁹ Têngîz Siyabendî, “Kurmancîya Ermenistanê”, <https://zimannas.wordpress.com/2020/03/13/kurmanciya-ermenistane/> (06.05.2022)

¹⁹⁰ Kamîz Şeddadî, “Kurmancîya Laçînê (Kurdîstana Sor)”, <https://zimannas.wordpress.com/2020/03/21/kurmanciya-lacine-kurdistana-sor/> (11.05.2022)

Bi tevî van xebatan hin xebatên ferhengokî, yên qebarebiçûk ên curbicur û hin jî yên ku li ser berhemên kurdên Kafkasyayê hatine kirin dikare ji bo xebatên devoka Serhedê wek mînak bihê dayîn:

1. **Elîşêr, *Hinek Ji Xwarinên Serhedê***. Ev nivîsar hin xwarinên ji herêma Serhedê wek ferhengokekê dide, Herwiha çêkirin ûnaveroka van xwarina jî hatiye dayîn.¹⁹¹

2. **Têmûrê Xelîl, *Devoka Kurdên Qefqasyayê***. Di vê nivîsarê de peyvên aîdê devera Kafkasya/Serhedê bi tirkî, fransî û îngilizî awayeke berawirdkî hatine dayîn.¹⁹²

3. **Têmûrê Xelîl, *Peyvên Romana Gundê Mêrxasan***. Ji wê romanê hin peyv wekî ferhengokekê hatine dayîn. Bo mînak *bêteşe, eglekirin, kewrekkirin, pirpişîn, milmilîn* hwd.¹⁹³ Peyvên kêmnas ku ji vê romanê hatine girtin, aîdê devera Serhedê ne.

4. **Mustafa Aydogan, *Peyvên Romana Şivanê Kurmanca***. Aydogan, di vê nivîsa xwe de peyvên kêmnas ên devoka Serhedê ji vê romanê wek ferhengokekê daye. Bo mînak *alûrke, midas, berodan, birûsî, çirûsî û givrik* hwd.¹⁹⁴

5. **Elîşêr, *Peyvên Ji Hêla Bidlîs û Wanê***. Di vir de jî peyvên kêmnas wekî ferhengokekê hatine dayîn. Bo mînak *adek, amol, alûk, banaxî, çapîk, dêz û fexçe* hwd.¹⁹⁵

6. **Reşo Zîlan, *Hikyatêd Cimaeta Kurdîyê ya Heciyê Cindî***. Zîlan, di vê nivîsa xwe de li ser peyvên kêmnas ên devoka Serhedê ku di van berhemên de ne radiweste. Bo mînak *nimûş, şimşat, redkirin, qaqicîn, kokbûn û tirêq* hwd.¹⁹⁶

7. **Omîdê Mistefayê Celalî, *Erd, Av û Hewa Di Devoka Celalîyên Bazîdê De I-***. Celalî, di vê nivîsarê de ferhengokeke ji peyvên devoka eşîra Celalîyan ku bi

¹⁹¹ Elîşêr, “Hinek Ji Xwarinên Serhedê”, **Kovara Kurmancî**, j.26, 1999, r. 4-5.

¹⁹² Têmûrê Xelîl, “Devoka Kurdên Qefqasyayê”, **Kovara Kurmancî**, j.29, 2001, r. 1-2.

¹⁹³ Têmûrê Xelîl, “Peyvên Romana Gundê Mêrxasan”, **Kovara Kurmancî**, j.55, 2014, r. 1.

¹⁹⁴ Mustafa Aydogan, “Peyvên Romana Şivanê Kurmanca”, **Kovara Kurmancî**, j. 45, 2009, r. 1-2.

¹⁹⁵ Elîşêr, “Peyvên ji Hêla Bidlîs û Wanê”, **Kovara Kurmancî**, j. 45, 2009, r. 2.

¹⁹⁶ Reşo Zîlan, “Hikyatêd Cimaeta Kurdîyê ya Heciyê Cindî”, **Kovara Kurmancî**, j.45, 2009, r. 4.

erdnigarîyê re eleqedar in daye. Bo mînak *kirr, tele, cew, kêrt, qûç, best, serger* hwd.¹⁹⁷

¹⁹⁷ Omîdê Mistefayê Celalî, “Erd, Av û Hewa Di Devoka Celalîyên Bazîdê De I”, **Kovara Kurmancî**, j. 62, 2018, r. 5.

3. FERHENGGA DEVOKA HERÊMA SERHEDÊ

A

Adan: /a:dan/ nd/m **1.** bereket, tişta bi hasilat/berhemdar. **2.** qida û xurek. *Warekî adan î, şên î bi bereket bû ew guhêr.* HW, r. 91.

Agîtasî birin: /a:gi:t^hasi: bîrîn/ l **1.** şîretkirin. **2.** wesandin, îkaz kirin. **3.** agahdarkirin. Ev peyveke ji zimanê rûsî ye ku ketiye devoka Serhedê.¹⁹⁸ *Gelle cîya dest merî-wekîl diçûne gunda, agîtasî dibirin.* ŞK, r. 129.

Ahiltî: /a:hilti:/ nd/m **1.** tecrûbe. **2.** kesê ne ciwan ango temen mezin û xwedî tecrûbe. *Cahiltî mala xwe ji bar kir ez û ahiltî man.* HW, r. 123.

Alav: /a:la:v/ nd/m **1.** alev. **2.** pê. **3.** rivîn, agirê ku ji tiştên dişewite hildikişê. *Ew lozûngê ku firqa me dida dibû mîna meriv agirekî meriv bide bin sapekî hişk alav bide ussa nav esker bela dibû.* ŞK, r. 109.

Alûrke: /a:lu:rke/ nd/m Cureyek alifê sewalan e û wekî lepeyê ye, ji kapeka ardî(êr,ar) û kayê dihê çêkirin. *Wekî min alûrke ji kapeka êr û kayê ga ra û hespê ra çêkira.* ŞK, r. 35.

Aminî tamin: /a:mîni: t^ha:mîn/ rd **1.** am û tam, bêsûc û bêguneh. **2.** emîn. *Qamçiyê Ehmed çend cara dinêjî ser şivanê aminî tamin da dawêşyan.* KR, r. 18.

Antêx: /a:nt^he:x/ nd/m **1.** agirê tendûrê yê sincirî. **2.** kûre, bermayîyên agirê tendûrê. Ev peyv ji zimanê ermenîkî ketiye devoka Serhedê.¹⁹⁹ *Ew çawa antêxeke tendûrê ma di nava dilê min da.* HW, r. 122.

Apincî: /a:p^hinci:/ nd/n **1.** potikê çêrminî yê bipûrt. **2.** konkê zivistanê. *Wexta Hemîd Begê apinciyê reş î biskîn davîte nvmila xwe.* KR, r. 20.

Aqil jê birrîn: /a:qil ze: bîri:n/ bwj. **1.** jêbawerkirin. **2.** jêfehmkirin. **3.** jêhezkin. *Here, çika ew çi dibêje, lê aqilê min tişteki nabire.* ŞK, r. 73.

¹⁹⁸ Qanatê Kurdo, **Ferhenga Kurdî-Rûsî**, Neşîrxana Dewletê ya Ferhengêd Zimanê Miletêd Dereve û yê Sovêtîstanê, Moskova, 1960, r. 707.

¹⁹⁹ Têmûrê Xelîl, g.n.b., r. 5.

Arîk: /a:ri:k / nd/m **1.** arîg, beşa jorîn ya xanî ku ji max, merteg û kêranan pêk dihê, dijawateya zemîn. **2.** tawan. **3.** banê xanî. **4.** asraq, tawanê xanî, mertegên xanî. *Ewî ser textekî hişk paldabû, li niqitkeke arîkê dinhêrî.* KR, r. 50.

Arkolk: /a:rko:lk/ nd/m **1.** darkolk, kosevêr. **2.** bist, maşe. amûra pê ar/agir kolandin û tevdanê. *Lêdane kalê hizhizî, şindokê mêran, arkolkê ber tendûrê...* HW, r. 365.

Arxayînkirî: /a:rxa:ji:nkiri:/ rd **1.** arxênkirî, arxanîkirî, aramîkirî, **2.** pêbawerî, **3.** rewşa emnî. **4.** rewşa bêtelaşîyê. *Bi formeke arxayînkirî vegeerîyan malên xwe.* HW, r. 389.

Aşirme: /aşirme/ nd/m **1.** rext, xelîtik, kemera fişekan ya ku mirov li dor xwe dialîne. **2.** sînebend, sîlebend. *Aşirmeya fişeka wî alî-wî alî li piştta xwe girêdabûn.* ŞK, r. 95.

Aşkela: /aşkela:/ h **1.** eşkere, aşkere, aşkira, kifş. **2.** dîhar, berçav. **3.** averû. **4.** penî. *Nerazîlixîya esker ussa zaf bibû, esker aşkela çi bêjî digot.* ŞK, r. 109.

Aşqorkî: /aşqo:rki:/ rd **1.** zeîf, qels. **2.** ler, qirûdî, kesê zêde zeîf. *Her carana xortekî aşqorkî, destê xwe dida ber devê xwe.* KR, r. 62.

Aşkîrin: /aştkırin/ l **1.** aşkîrin, avaşkîrin, dilrihetkîrin. **2.** girîna yekî dan sekinandin. **3.** aramkîrin. **4.** teskînkîrin. *Ew gele cara ber dilê kurik da dihat û ew aş dikir.* KR, r. 25.

Atar: /a:t^ha:r/ nd/m **1.** bextê reş, aqûbet. **2.** binemal, malbat, bingeh, bineçe. *Wê atara Ozmanê Cezo bê serê wan !*HW, r. 82.

Av hestûyê yekî da xarin: /a:v hest^hu:je: jeki: da: xa:rın/ bwj. **1.** av bi hestî xwarin, av di hestûyê yekî da gerandin, ezîyet kirin, di bin zor û zextê de hîştin. **2.** çavsorî li yekî kirin. *Evê Zeytûnê av hestûyê me da xariye.* KR, r. 182.

Avzelalkîrin: /a:vzela:lkırin/ bwj. **1.** rewş ronî kirin. **2.** aşkere kirin. **3.** çareser kirin. *Sibê were cem min ez û tu hev ra xeber din, em ê avekê te ra zelal kin.* ŞK, r. 126.

Avî: /a:vi:/ nd/m **1.** xunav. **2.** şebnem. *Avî ji mijê diniqitî ser hêşnayê dima.* KR, r.40.

Avrênc: /a:vre:nd̥ʒ/ nd/m **1.** palêv, parzûn, tojen: torbe, **2.** gend û gemar, ava qirêj, şujî, şûjî. **3.** ‘eyar, meşk. **4.** çerm. *Tenê avrênc û ‘eyarê derê malê raxistî...* KR, r.92.

Avrû dan: /a:vru: da:n/ bwj. **1.** avir, awir lê dan. **2.** nêrîn, bi awayeke cuda lê nêrîn. *Ewê avrû dane Mîrzo û xeberdana xwe dirêj kir.* KR, r. 68.

Axlêve: /a:xle:ve/ nd/m **1.** nûbihar, bihara zû. **2.** roj û meha biharê ya pêşîn, meha Adarê. *Axlêve bû, pencê tavê nû avêtibûn serê çîyayên bilind, tebîet jîyan hişyar dibûn.* DD, r. 29.

Axzar: /a:xza:t/ nd/m **1.** arezar. **2.** zarîn. *Kolosê qilêr û dezmaleke qîmer e rengîrî destê wî da ketibûne axzarê.* KR, r. 21.

Ayk: /ajk/ nd/m **1.** ayîk. **2.** heyf. **3.** nifir. **4.** mezlûmîyet. *Xwedê aykê min belengazî ji wî ra nehêle!* ŞK, r. 22.

B

Babaxî: /ba:ba:xi:/ nd/m **1.** quretî. **2.** kuşpenetî. **3.** nefsmezinî. **4.** pozbilindî. **5.** fizayî. *Gundîyên me yên berê niha babaxîya nakin, merdane dibêjin wekî qatix em xweyî kirine.* KR, r. 15.

Baristan: /ba:rîsta:n/ nd/m **1.** hedar. **2.** sebir, tehamûl. *Dilê Karê ji vê yekê baristan dibû.* DD, r. 56.

Barketî: /ba:rk^het^hi:/ nd/rd **1.** belengaz, **2.** hejar, feqîr. **3.** derdmend, xemgîn. *Ûris, li alîyê belengazan e, ê barketî ye.* HW, r. 116.

Başewal: /ba:fewa:l/rd **1.** başewala, kesê bêderpî yan jî bêşal. **2.** başheval, başewal, bêşerwal. *Birrek zarokên başewal î birçî stûxwar î çav li rê...* HW, r. 366.

Batrak: /ba:t^hra:k/ rd **1.** rencber. **2.** xebatkar. *Keleşê cînarê me jî merîkî batrak e.* ŞK, r. 160.

Bawîşk: /ba:wi:fşk/ nd/m **1.** palûşk, nîşaneyên xewê. **2.** givîşk, bizava ku mirov ji egera xewê an jî westanê xwe radikêşe. *Pîr, tivanc didane xwe, bawîşk dihatinê.* KR, r. 76.

Bayîs: /baji:s/ nd/m **1.** bawîs, di maneya neyînî de bûn sebeb û bûn sedem. **2.** sebebkar. *Belkî mala bayîs xirav be.* KR, r. 32.

Be'lgî: /be'lgî:/ nd/n **1.** balgî. **2.** balîf. **3.** balgeh. *Be'lgîyê qûştûkî danîbûne ser.* KR, r. 19.

Bêfesal: /be:fesa:l/ rd **1.** bêteşe. **2.** bêserûber. **3.** bêagah, bêfikir. **4.** bêpîvan. **5.** neguncan. *Gulle li ranê min ketibû, birîne cîkî bêfasal bû, ez nikaribûm pê re biçûma.* ŞK, r. 136.

Bêftiya: /be:fti:ya:/ h **1.** bêfitîya, bêkêr, kêrnehatî, bêxêr, belaş, bêpere, beyhûd. **2.** badîhewa, mufte, mifte: belaş. *Ewî qirar kir bêftiya çend lawikê dinê jî bide hev.* KR, r. 85.

Behr bi devê kelbekî heram nave: /behr bî devê: k^helbekî: hera:m na:be/ gp. **1.** behr bi devê kûçika naherime. **2.** behr bi devê kûçika nalewite. *Dilê xwe xirav neke, behr bi devê kelbekî heram nave.* KR, r. 84.

Bêjing: /be:ʒɪŋ/ nd/m **1.** bêjîng. **2.** mîfsik. **3.** moxil, serad. *Heykel qulqulî, te digot bû bêjîngêk.* HW, r. 383.

Belapêjgarî: /belap^he:ʒgari:/ rd **1.** belaxwazî. **2.** karê kesê bela xwe digere. **3.** şerxwazî, êrîşkarî, holîgantî. *Te digot agir belapêjgarî ovê bûye, wê dişewitîne.* KR, r. 27.

Beleban: /beleba:n/ nd/n **1.** kevirê gulover, mezin ê ku ji quntar yan jî berwarekî hot dibe ango digindire. **2.** gome, kevirê mezin. *Ew mîna belebanekî rû av tirsana dilerzizî.* KR, r. 170.

Beliqandin: /beliqa:ndɪn/ l **1.** dapelandin, destê xwe birin ber guhê xwe. **2.** guh bel kirin. *Jina wî ya feqîr guhê xwe beliqandibû, ci ka nehat.* HW, r. 278.

Bênder: /be:ndɛr/ nd/m **1.** cihê dexlûdan ji kayê dihê cudakirin. **2.** xermane, xermangeh. *Apê Moskov, gihîşt bêndera kolxoza gund.* KR, r. 45.

Bênijîn: /be:nɪʒi:n/ l **1.** bêhnijîn, pişkîn, pênişîn. **2.** hilpişkîn, hilperişîn, ji ber alerjî yan jî tişteke din cureyekî dengê ji devî der tê. *Her kes dixebitî wekî nebênije an jî wisa bibênije wekî xeberdan bi wê demê re bê girêdan çawa îsbat “Ew qas jî rast”.* HW, r. 298.

Ber dil da hatin: /ber dıl da: ha:t^hın/ *bwj*. **1.** aştkirin. **2.** amoşkirin. *Ez ber dil da hatim, min nehîşt bigirî.* ŞK, r. 24.

Ber pesnan xebardan: /ber p^hesna:n xəberda:n/ *bwj*. **1.** jibesta xebardan: ji ber nexweşî yan jî ji bandoreke din ve bêhemdî xwe axaftin. *Morof, ber pesnan ve xeber dida.* MR, r. 29.

Ber: /ber/ *nd/n* **1.** merş. **2.** feraş, cureyek mefûr. **3.** cureyek rayex. *Bereke ritîlî, têreke kelêşka, du sê dest nivînê betreng, tencereke kevne çemilkirî malê da hebûn.* KR, r. 45.

Berate: /bera:t^he/ *nd/m* **1.** cendek, kelax, bermayîya heywana mirarbûyî. **2.** cinyaze, laş, meyt. *Lê çiqasî ew li Morof û li berateyê wî gerîyan tişteş nedîtîn.* MR, r. 16.

Berbirî bûn: /berbiri: bu:n/ *l* **1.** rast hatin, qelibîn, laqa bûn, pêrgî bûn, tûş bûn. **2.** çav hev ketin, **3.** çûn pêşîyê, pêşwazî kirin. *Bergîzar xanim, mîna xwe ya caran berbirî wê bû destê wê yî qirêj qepece kirin ramûsa.* KR, r. 102.

Bercênik: /berce:nık/ *nd/m* **1.** gerdenbend. **2.** ristik: rêzeyên durr, morî, zîv û zêran, xîşira gerdenê, kolye. **3.** gerdenî. *Bercênik, morî-mircanê stuyê wan da meriv heyran hijmekar bû lê binihêrîya.* ŞK, r. 57.

Bêrdange: /be:rda:ngɛ/ *nd/m* **1.** cureyek tivinga bi lûle a kin. **2.** qerebîne. *Bêrdange avête stuyê xwe.* HW, r. 382.

Berdestî: /berdesti:/ *nd/m* **1.** xizmetkar. **2.** ewlad, kesê/a ji zaroktîyê de di mala yekî de hatiye xwedîkirin. *Berdestîya wan yeke qaline sûret sore tijî-tarêlka sûpê tijî kir.* ŞK, r. 39.

Berdilkî: /berdilki:/ *nd/m* **1.** bertîl. **2.** rişwet. *Hemû cara berdilkî didane xanimê, wekî ew şuxulê ese bê sêrî.* KR, r. 102.

Berdîr: /berdi:c/ *nd/m* **1.** berindîr, mîyên ku nû(cara pêşîn) dizên. **2.** peza mê ya ya di navbera 1 û du salî. *Qelenê Zeytûnê bû heftê berdîrî.* KR, r. 119.

Berek: /berɛk/ *nd/m* **1.** alî. **2.** hêl. **3.** enî, cephe. *Şevê jî min xwe dida berekêd zinara.* ŞK, r. 86.

Berg: /bɛrg/ nd/m **1.** bergind. **2.** berdêl. *Elî mala beg da şivantî dikir wekî berga pezê ku gura xwaribû bigire.* KR, r. 24.

Berk: /berk/ rd **1.**hişk. **2.** pehêt, peyt. **3.** qewîn. *Min dest wan da sondeke berk xwar.* ŞK, r. 96.

Berra: /bɛra/ nd/m **1.** bira, rastî, heqîqat. **2.** Ev gotin di axaftinê de ji bo piştrastkirinê dihê bikaranîn. *Erê, erê berra çend meh ji pêş de min yeke wisa standibû.* HW, r. 29.

Berstû: /berstu:/ nd/m **1.** berstûk. **2.** pastî. **3.** serê gomlek û kincên wekî wê. *Xorta ji cêva xwe derdixist dezmalê ser desta neqîşandî, zendik û berstû.* ŞK, r. 68.

Berşivk: /berʃivk/ nd/m **1.** şiv. **2.** çîv. **3.** ço. **4.** qilifê şivê, şivdank. *Şivdara xwe berşivka kulêv ra kiribû.* ŞK, r. 56.

Berwar: /berwa:r/ nd/m **1.** bernal. **2.** dibûr. **3.** erazîyê meyildar. *Berwara çîyakî da em diçûn hespa serî kutabû ser hevdu.* ŞK, r. 100.

Berzeq: /berzeq/ rd **1.** lewçe, geweze. **2.** zimandirêj. *Kuro tu çiqasî berzeqî!* DD, r. 57.

Besîbûn: /besi:bu:n/ nd/n **1.** têrîkirin. **2.** kafîbûn. *Royê pe'ri nan jî heve besî me ye.* KR, r. 38.

Best: /best/ nd/m **1.** deşt. **2.** berî. **3.** cihê rast, meydan. *Xecê binîyê da li bestê nihêrî.* ŞK,r. 97.

Beşer: /beʃɛr/ nd/m **1.** kêf, dilgeşî. **2.** mirûz, mahd, moral **5.** rû. *Beşera wî timî xweş bû.* KR, r. 47.

Betave bûn: /bet^ha:ve bu:n/ l **1.** beto vebûn, ji nişkê ve winda bûn. **2.** inda bûn, berze bûn. *Qeretûyê sîyara nava gund da betave bûn.* KR, r. 189.

Betreng: /betreng/ rd **1.**spîçolkî. **2.** zerik, zerhimî. **3.** kesa yan tiştê rengê wê guherîye yan jî xerab bûye. *Du sê nivîne betreng malê da hebûn.* KR, r. 45.

Bexîre: /bexi:re/ nd/m **1.** bixêrî, kuçik. **2.** dûkêşk, qulika ku dû û dûxêla êgir jê derdikeve. *Bavêje nava agirê bexîreya hê gurr.* HW, r. 395.

Beyar: /bəya:t/ nd/m **1.** erdê nehatiye çandin. erdê betal û vala, **2.** erdê zîya û hişk. *Kerî û suriyê pêz li beyara usa diqemitîn.* KR, r. 86.

Bezîn: /bezi:n/ l **1.** di ser kesekî de kirin qîrîn, bi kesekî hêrsbûn, pevçûn, bi hevketin şerkirin. **2.** revîn. *Ez jî hatime evana rastî min hatin wa dibezin.* ŞK, r. 35.

Bi darekî du kew anîn xarê: /bı dareki: du kew ani:n xare:/ bwj. **1.** bi keviyekî du qûç wergerandin **2.** bi keviyekî du teyr kuştin. **3.** pê berekê sê kêl êxistin. *Ewî bi darekî du kew anî xarê.* KR, r. 50.

Bi dê û bav bûyîn: /bı de: u: bav bu:ji:n/ bwj. **1.** bi dê û bav mezin bûn. **2.** bi awayekî asahî û serfiraz mezin bûn. *Perîşanê, navika wî birî, destê xwe hêdî li piştê xist û got “Bi dê û bav bî lao”.* KR, r. 84.

Bi sidqê qenc: /bı sidqe: qenc/ bwj. **1.** bi sidqê safî, bi dilê safî, bi dilê pak. **2.** ji dil û can. *Ermeniyê xwende hebûn û timê jî bi sidqê qenc dixastin komek bidana kurmanca.* KR, r. 30.

Bi tehn gotin: /bı tehn go:tın/ bwj. **1.** îmakirin. **2.** tiwanc, wexta mirov bêyî ku yekser navê wî tiştî bibêje tişteke bi sergirtî danzanîn. **3.** niçlêdan, îşaretê kesî kirin. **4.** kesek bi sergirtî tometbarkirin. *Wê xebera axa bi tehn got “Xwişka xwe nade”.* HW, r. 64.

Bidestanînî: /bidesta:ni:ni:/ nd/m **1.** destkeftî, destxistin, serkeftin, serketin. **2.** pêşdaçûn, pêşvaçûn. *Pale û gundîyên ûris, eferim ji we re bidestanînên teze di wî şuxulî de ji we re!* MR, r. 63.

Bihur: /bihor/ nd/m **1.** derbaz, têper, ji nav ra çûyîn. **2.** derbend, derteng, derbasok, cihê devteng ku tê re derbas dibin. **3.** gêdûk, newal. *Ez ê wana bihurê kerê hasê kim.* KR, r. 80.

Bijiqîn: /bıziqi:n/ l **1.** beloqbûn. **2.** jê derketin. **3.** perçifîn. *Çe’vê wê kort da çûbûn, hestüyê sûretê wê bijiqî bûn.* KR, r. 201.

Bilandin: /bila:ndın/ l **1.** bilîn. **2.** lûbîn. **3.** bavobavokirin. **4.** nêwirandin. Zurbe digot, dibiland. KR, r. 36.

Bilqîn: /bilqi:n/ l **1.** bilqe bilq kirin, qulpîn, xulexul kirin, dengê derketina avê ji kanîyekê. **2.** qilpe-qilp kirin. ... *Çawa ku kanîyek bilqînî bi wan ketibû...* HW, r. 164.

Bindarûk: /bɪndaru:k/ nd/m **1.** seyran. **2.** seyрана ku di bin daran de dihê kirin. *Zarêd bega masî digirtin, pincar diçînîn, bindarûk digirtin.* ŞK, r. 62.

Binetar: /bɪnɛt^ha:r/ nd/m **1.** jêr, bin, bintar. **2.** qûntar. **3.** di erdnîgariyê de aliyê başûr. *Binetara cimha mêra da Sûrên û Zurbe xeber didan.* KR, r. 122.

Bir: /bɪɪ/ nd/m **1.** kerî, cêrge-cêrge, col. **2.** kom, qefil, qefle, tof bi tof. *Birên berxikan û golikan diçûne ber bi gund.* HW, r. 40.

Birîn: /bɪrɪ:n/ l **1.** birandin, dawî bûn, xelas bûn, neman, qiriyar, kuta bûn. **2.** îmha bûn, tune bûn. **3.** binevat bûn, cûmî cêla bûn. *Wexta Perîşan îdî ji hêsa birîya ewê dest pê kir, nivat.* KR, r. 192.

Birûsîn: /bɪru:si:n/ l **1.** birîqîn. **2.** ronahî jê çûn. *Pencereyê hevsê mîna çevê merivê merûm dibirûsîn.* KR, r. 50.

Bîso: /bi:so/ nd/m **1.** pîso, qumaşê şewitî. **2.** arîya pîneyên şewitî. *Bîso anîn, danîn ser tilî û pêçiyên wê yên xwîna sor sor hildayî da.* HW, r. 388.

Bistî: /bisti:/ nd/n **1.** destî, destik, ji bo girtina alav yan jî derîyan alava pê girtinê. **2.** navnêrî, di çêreyê de beşa ku bejn diavêje û tov digire, şaxa pincarê ya ku tov tê dê ye, aj, zîl, zîlik, terh. **3.** sing, darê qalind ê ji bo girêdana tiştan. **4.** samî, kulabe, qulabe, hesinê ku dikeve nîr. *Dike ku bistî hilde li eskerê zulmê wer bike.* HW, r. 391.

Bişirîn: /bɪʃɪrɪ:n/ l **1.** vebişirîn, beşevêhatin. **2.** girrnişîn. **3.** mizicîn. **4.** bişkurrîn. **5.** beşîşîn. **6.** besimîn. *Pîr, bişirî simêlê wî ye mîna jîjûya ji lêva jêrîn dîr ketin.* KR, r. 57.

Bîterbûn: /bi:t^hɛrbu:n/ l **1.** bidestxistin. **2.** bidestketin. **3.** peydabûn. *Li ber derê gele mala qet bizineke gurî jî bûter nedibû.* KR, r. 20.

Buhurî: /bøhøri:/ rd **1.** bihurî, borî. **2.** temirî, vetemirî. **3.** tiştê derbasbûyî. *Bi dilekî şewitî gilîyê derheqa 'emrê bihurî da dibihêm.* KR, r. 16

Bûn baîs: /bu:n bai:s/ l **1.** bûn sedem. **2.** bûn mehne/manî. *Ewê nifirî li wana dikirin ê bona girtina Hemze bûne baîs.* KR, r. 73.

Bûsat: /bu:sa:t/ nd/m **1.** teng û qûş: taximên hespê yên lê siwarbûnê. **2.** mûsat, pûsat, posat, rişme, gamezîn. *Zîn û bûsatên wan lê kirin.* HW, r. 317.

Buxs: /boxs/ nd/m **1.** cureyeke bêhnê. **2.** bûx, dûxan. **3.** hilm. *Her kes ji bîn û buxsa wê serxweş dibû.* KR, r. 17.

C

Cacîm: /d̥ʒa:i:m/ nd/n **1.** carcîm, hesîr, merşa ji gîhayekê wekî qamûşan hatiye çêkirî. **2.** xesîl, qesîl, barye. **3.** xalîçeya neqîşandî. **4.** çarşeva/perdeya nivînan. *Textek ser kursî cacîmê betreng raxistî bûn.* KR, r. 160.

Cahil: /d̥ʒa:d̥ʒi:m/ rd **1.** ciwan, genc. **2.** xişîm. **3.** nezan. *Cahilekî de'f da hundurê goza Hemze.* KR, r. 50.

Cax: /d̥ʒa:ɣ/ nd/n **1.** kupeşte, parapet. **2.** şîş û hesinên li dor tiştêkî bo parastinê, çeper. *Qerewil li pencerê biçûk e caxkirî dinihêrin.* KR, r. 72.

Ce'nî: /d̥ʒe˞ni:/ nd/nt **1.** canî, canû, kurîk, cehnî, cehnîk. **2.** kurî, dewarên wekî hesp ku hêj biçûk in û mezin nebûne. *Wê coteke ga bike qurban û cenîyekî bide Têmûr.* HW, r. 300.

Cebirîn: /d̥ʒebiri:n/ l **1.** kewîn, kewîna tiştên wekî hestî ku şikestî be. **2.** kelijîn. *Dilê wê yê şikestî nediceribî.* KR, r. 74.

Cênîk: /d̥ʒe:nɪk/ nd/n **1.** cênîg. **2.** bisk. *Tilîya xwe ya nîşanê dida ser cênîka xwe.* KR, r. 22.

Cerd: /d̥ʒerd/ nd/m **1.** cerde, çete. **2.** korsan, eşqîya. **3.** bandîd, keleş. *Rojekê jî cerdê dada ser mala Zurbe.* KR, r. 32.

Cêrge: /d̥ʒe:rgɛ/ nd/m **1.** ref, gêş. **2.** qefîle, kom. **3.** komesker, alay. **4.** sef, rêzik. *Cêrga eskerda qumandarê mezin hukum kiribû.* ŞK, r. 144.

Cetirî: /d̥ʒetiri:/ nd/m **1.** ce'tûlî, cetolî, cehtirî, cahtir, cehtir, cehter, cahtirî, cantirî, cetir, catir. **2.** awîşen, kekîk. Ev gîha wekî "çaya kurdî" jî dihê binavkirin.²⁰⁰ *Qîz û bûk diçûne Gelîyê Kevokan dianîn pincarên wekî pêqask û qenzîl,*

²⁰⁰ Qanatê Kurdo, b.n.b., r. 132.

so û mendik, xîtik û sîrmî, qencelîsk û silmask, siping, û tirşo, pûng û cetirî, xîlok...
HW, r. 241.

Cî da: /d̥zi: da:/ h **1.** di cî de, taviî, destxwe da. **2.** hemen, gavê de. **3.** yekser, hema pêra. **4.** demildest. *Bîna xwe zû zû kişand, pirçûyê xwe kirin, cî da sekinî.* KR, r. 68.

Colan: /d̥zo:la:n/ nd/m **1.** colane, colang, colank. **2.** hêlecane, hêlekan. **3.** hêlûçk. **4.** çincîrik. **5.** landik, dolîdang. *Wana kurê xwe ye sava colanê da hişt.* KR, r. 52.

Coltî: /d̥zo:thi:/ h **1.** col, birrên pêz. **2.** bi tevahîya kerîyek pez, bi kerîtî. *Serê çîya pîgar kivş bûn, kesîba jî pezê xwe coltî da dewletîya.* ŞK, r. 55.

Culhet kirin: /d̥zohet kırım/ l **1.** curetkirin, cule'tkirin, wêrîn. **2.** turişkirin. **3.** çavsorîkirin, cesaretkirin. *Ji şivan û gavanan kesekî culhet nedikir herine cem Morof.* MR, r. 17.

Cûm: /d̥zu:m/ h/n **1.** puran, mîqdarek benîşt ji bo cûtinê. **2.** loq, loqek benîşt. *Cûme benîştê gîrê kiribû devê xwe.* KR, r. 171.

Ç

Çarmêrekî: /t̥ha:rme:reki:/ h **1.** çarmêrkî. **2.** awayekerûniştinê. *Hemîd Beg û Pîr Mîrzo çarmêrekî rûniştibûn.* KR, r. 31.

Çarniqalî: /t̥ha:rniqa:li:/ h **1.** bi çar dorhêlan. **2.** ji her alîyî ve. *Min çavê xwe yê mezin vî alî-wî alî digerland, çarniqalî xwe dinêrî.* ŞK, r. 38.

Çast girtin: /t̥ha:st girtin/ l **1.** temenebûn, xwe xwar kirin ji bo rêzgirtinê. **2.** rêzgirtin. *Ez hatim nêzikî komêdat bûm, jê ra çast girt, destê xwe da ber enîya xwe mîna soldata.* ŞK, r. 88.

Çav quncirandin: /t̥ja:v qond̥zıra:ndın/ bwj. **1.** çav niqandin, çav niqandin, çav qirpandin. **2.** çav şikandin, çav kirin. *Zînê çe've xwe li Belgîzarê ra bi delkbazî quncirand.* KR, r. 102.

Çavronî dayîn: /t̥ja:vro:ni: da:yi:n/ bwj. **1.** çavronahî dayîn, çevrenkahî dayîn, pîrozkirin, kêfxweşîya xwe dîyarkirin. **2.** şakirin, bextewarkirin. *Her kes bi dilekî şa çavronîyê dide xwîşkê.* HW, r. 27.

Çavsût: /tʃa:vsu:t/ rd **1.** kesê/a çavşîn, çavhêşîn. **2.** kesê/a çavbelek. *Wî tîfalê porzerîn î çavsût ji nişkê va dengê xwe birî.* DD, r. 10.

Çe've yekî kort da çûn: /tʃe've: jeki: kʰo:rt da: çu:n/ bwj. **1.** çavên yekî di kortê da çûn. **2.** jar û lawazbûn, zeîfbûna çavan. *Çe've wê kort da çûbûn, hestüyê sûretê wê bijiqî bûn.* KR, r. 201.

Çerçirîn: /tʃertʃiri:n/ l **1.** rencîn, zehmet kişandin. **2.** êşîn, kewgirîn, xemxwarin. **3.** pêdeketin, hewildan. **4.** qilqilîn. **5.** koşîn, têkoşîn, cehd kirin. *Ew borcê wî ye ku ber mirîda va xeber de halê wan de biçerçire.* KR, r. 76.

Çi qarneqisî ye: /tʃi qa:rneqisi: je/ bwj. **1.** Ev gotin, ji zimanê tirkî ketiye devoka Serhedê kuji gotina “karın ağrısı” hatiye çêbûn.²⁰¹ **2.** ev biwêj wekî gazinc, lome û xeberekê(sixêf) ye. **3.** çî kureder/qureder e, çî quzulqurt e. *Ew Hemze ye çî qarneqisî ye !*

Çîdar: /tʃi:da:t/ nd/m **1.** girêbend, merbend. **2.** pabend, girêdanka pêyan. **3.** sindif, sindûf, pranga. *Dest û pê we jî mîna ê me qeyd û çîdarkirî nîn in.* KR, r. 74.

Çigûn: /tʃi:gu:n/ nd/m **1.** mencil, qazana avgermkirinê ya sîstema kalorîferan. **2.** qazan. **3.** tebaxa kûr. **4.** biroş, beroş. *Dewsa me palê zavoda çigûn hatin.* KR, r. 134.

Çik sekinîn: /tʃik sekʰini:n/ l **1.** tîk sekinîn. **2.** kîp sekinîn, kîp li ser pîyan sekinîn. *Min lezand û çend deqeyên din çik li ber sekinîm.* HW, r. 68.

Çilk: /tʃilk/ nd/n **1.** dilop, niqîtk. **2.** çir, çirk, pejk, peşkên avê. *Hêsrê wî dibûne çilkê baranê.* KR, r. 65.

Çincirûk: /tʃinciru:k/ nd/m **1.** pencrûk, pencirk, pencirrik, pencirûk, pencik. **2.** neperîşk. *Pencirûk davîtine ser çê've hev.* KR, r. 86.

Çingdayîn: /tʃingdayi:n/ l **1.** çirtik avêtin, ji kêfxweşiyê lotik avêtin. **2.** firqas bûn, quloz bûn. *Çi qas qeşeng dilîzin, çawa çing didin eynî karên xezalan.* HW, r. 270.

²⁰¹ Oruç Sural, “Devoka Xoçvanê (Erdexan)”, <https://zimannas.wordpress.com/2020/03/11/devoka-xocvane-erdexan/> (18.12.2022).

Çirikandin: /tʃi:rɪka:ndɪn/ l 1. çirikandin, diran le hev guvaştin û deng jê derxistin. 2. sîqandin, zîqandin. *Kulma xwe qewîn digirt, diranê xwe diçirikand.* KR, r. 144.

Çirpî: /tʃɪrpi:/ nd/m 1. çilpî. 2. şiva ter a zirav. *Wan lawika çirpî û şivdara dixist.* ŞK, r. 57.

Çirtik dane xwe: /tʃirtik da:ne xwe/ bwj. 1. lotik avêtin. 2. şad bûn, kêfxweş bûn. *Zînê ji şabûna êirtik dane xwe.* KR, r. 69.

Çirûk: /tʃɪru:k/ rd 1. şerker. 2. çikûs, tima. 3. nemer. 4. çil, çilek. *Keleşê rîspî merivekî çirûk î tima yî, bêfesal e.* KR, r. 20

Çirûsîn: /tʃɪru:si:n / l 1. çirisîn, zeriqîn, biriqîn. 2. şemaldayîn. 3. teyîsîn. 5. birisîn, birûsîn. 7. şewq vedan. *Çe've wî diçirûsin.* KR, r. 57.

Çitî: /tʃɪti:/ h 1. tîke. 2. çênî: parçeyek goşt. *Pîr devgîlk li ser sîtilê hildida, çitî goşt jê derdixist.* KR, r. 82.

Çitî-çitî kirin: /tʃɪti: tʃɪti: kɪrɪn/ l 1. tîke-tîke kirin, lîme lîme kirin. 2. zêl-zêlikirin. *Kerr be, yanê na ez ê ravim te çitî-çitî bikim!* KR, r. 42.

Çovandin: /tʃo:va:ndɪn/ l 1. bi darê zorê tişteke standin. 2. bi çov kirin. *Ewî lingê xwe qewîn didane erdê, belkê ruşetê ji wana biçovîne.* KR, r. 21.

Çox: /tʃo:y/ nd/n 1. êleg. 2. qutikên huçik kin ku ji hirîyê ye. *Çoxê wî yê pînekirîyî ku meriva nizanibû ji çî pirtî ye.* KR, r. 21.

Çûn rûyê (yekî): /tʃu:n ru:je: jeki:/ bwj. 1. maçkirin. 2. paçkirin. 3. ramûsan. *Ew hembêz kiribû, çûbû rûyê wî.* KR, r. 50.

Çûn ser gulên sor: /tʃu:n ser gole:n so:t/ bwj. 1. çûn nav rewşeke baştir. 2. di maneya “Ma vê dera xerab re ew der alternatîf e?” de ye. *De bira here, wê here ser gulê sor?* KR, r. 66.

Çûr: /tʃu:r/ rd 1. zerve, zerîn. 2. kej, rengê hinekî berev spî lê ne spî, zêdetir rengê zerîn. *Dev û lêvê wî li bin qevşa simêlê çûr da telîya bûn.* KR, r. 18.

D

Dabe: /da:be/ *nd* **1.** dehbe, heywanên hov û dirinde. **2.** wehşî. *Dabe yê xwe bavê nava pez û golika.* ŞK, r. 72.

Dagêr: /da:ge:r/ *nd/m* **1.** wexta daketin û vegera ji zozanan. **2.** dijwateya hilgêrê ye ku hilgêr jî dihê maneya derketin û hilperîna cihê bilind ên wekî zozanan. **3.**veger, bi paş de hatin. *Fîtefîta şivana bû, lê hore-hora koça îdî derheqa dagêrê da xeber dida.* KR, r. 86.

Dapalîn: /da:pa:li:n/ *l* **1.** palîn. **2.** raparzîn, parzinîn. **3.** dawerivîn, werivîn. *Paçî wan cîyê xwe li erdê danîn û dapalîyane nava xewa şîrîn.* KR, r. 51.

Daxarbûn: /da:xa:rbu:n/ *l* **1.** daxwarin,xwe dan alîyekî. **2.** ser tewandin. *Konî mezin bû, wê ovê da temamîya kona ji wî dadixwar.* KR, r. 19.

De'fandin: /de^sfa:ndın/ *l* **1.** te'fandin, dehf dan, likumandin. **2.**qewirandin, **3.**tewişandin. *Derî bi lez de'fand çû hundur.* KR, r. 98.

Debirandin: /debrırandın/ *l* **1.** debara xwe kirin, îdara xwe kirin. **2.** xwedî kirin,ê m kirin, alif dan. **3.** hêwirîn. *Belkê vê zivistana tê di gundê wan da bidebirim.* HW, r. 203.

Degme: /degmε/ *h* **1.** terwende, tiştên ku kê m caran peyda dibin. **2.** kê m caran, ti caran, hîç. *Pîr Qaso degme xebereke wisa dida.* HW, r. 271.

Delk: /delk/ *nd* **1.** dekûdolab. **2.** fênûfût, **3.** findûfêl. *A bi van delka ez destê wan derketim.* ŞK, r. 112.

Dêm: /de:m/ *nd/m* **1.** zêm, nemayî, şilahî, şilayî. **2.** av, avî, xunav, hezek, erdê ku nem, şilahî û avî ye. *Xwelîyeke dême-dêmistan bû.* KR, r. 94.

Dêmistan: /de:mısta:n/ *nd/m* **1.** erdê şil û nemdar. **2.** erdê û zevîyên ter û xunavî, berevajî hişkavîyê. *Xwelîyeke dême-dêmistan bû.* KR, r. 94.

Demxatirî ji yekî xwestin: /demxat^hıri: ʒı jeki: xwestın/ *bwj.* **1.** xatir xwestin, xatirê xwe ji yekî xwestin. **2.** malavayî ji yekî kirin. *Demxatirê xwe ji neferên malê bixwazin herin.* HW, r. 74.

Derabe: /dɛra:bɛ/ nd/m **1.** derave, pergala girtinê ya derîyên firoşgehan ango kepeng. **2.** veser. **3.** pêveka li ser xanîyekî. **4.** textêyê pehn ku dikeve navbera beşên xanî yan jî tewleyê. *Cîyê min tewlê da derabek ji texta çê kirin.* ŞK, r. 35.

Derzkirin: /dɛrzkırın/ l **1.**têgihîştin. **2.** fehmkirin. *Te niha derz kir? -Belê.* HW, r. 46.

Destanîn xwestin: /dɛsta:ni:n xwestın/ bwj. **1.** ji yekî re serkeftin xwestin. **2.** ji yekî re pêşdaçûn xwestin. *Ûmnov îdî xeberdana xwe xitim kir û hazirbûya ra destanîn xwestin.* KR, r. 157.

Destlihevxistin: /dɛstlıhevıstın/ l **1.**çepik. **2.** destqutan. *Seraya êtîmxaneyê kimkimî, ji destlihevxistinên gumreh dikire girm girm.* HW, r. 49.

Destnîgar: /dɛstni:ga:r/ nd/m **1.** rêûresma nîşanîkirinê. **2.** gustîla zewacê. **3.**kesa nîşanîkirî. *Ev destnîgar e, hela kanê dawet?* HW, r. 56.

Destxweda: /dɛstxwɛda:/ h **1.** hemen. **2.** yekser. **3.** di cî de. **4.** gavê de. *Ez çawa ku hatme alîyê vagzalê, destxweda min kûça wan dît.* ŞK, r. 38.

Devê bavê kesî neketin: /dɛve: ba:ve: k^hesi: nek^hetın/ bwj. **1.**Ya devê te ye! **2.**Ne hedê te ye! **3.** Ne tayê te de ye! *Devê bavê Kerem ketiye tiştêkî bêje!* KR, r. 57.

Devê te li çi bigere: /dɛve: te li tʃ^hı bıgere/ bwj. **1.** Tu her çi bixwazî. **2.** heya ku hêza te hebe ji bo gotinê. *Annayê textekî bi gotina te amade kir, êdî çi bibêjî li ser tunebû :goşt, kalbas, penêr, rûnê nivîşkî, totikên şêrîn, kanfêtên rengrengî, devê te li çi bigere.* HW, r. 323.

Deverû: /dɛvɛru:/ h **1.** li ser devî. **2.** berev devî. **3.** vajî, berovajî(deverûkirina tiştên wekî kinc). *Defeke wisa da wî ku ew deverûyî erdê bû.* KR, r. 43.

Devgerm: /dɛvgɛrm/ rd **1.** dilrehm. **2.** qoçax, merd. **3.** sohbetxweş. *Dîwanê rojheqê wan zêde kir, ji wê rojê şunda pale idî devgerm bûn.* ŞK, r. 106.

Devgîlk: /dɛvgi:lk/ nd/n **1.** devgîrk, devrû. **2.** derxwîn: qalpaxên ku ji dar yan jî ji axê çêkirî. *Pîr devgîlk li ser sîtilê hildida, çitî goşt jê derdixist.* KR, r. 82.

Dewisandî: /dɛwisandi:/ rd **1.** tepisandî. **2.** pêlêkirî. **3.**givaştî. **4.** pestandî. *Ewê 'eyarê rûn û toraqê ya dewisandî dinihêrî.* KR, r. 58.

Deykirin: /dejkırın/ l 1. gazîkirin, deng lê kirin. 2. bangkirin. 3. lêvkirin. *Zurbe kuxîya û dey li Meyanê kir.* KR, r. 84.

Di heyra yekî da bûn: /dî hejra: jeki: da: bu:n/ bwj. 1. ketin heyra keyî, ketin meraqa kesekî. 2. xema yekî xwarin, ji bo kesekî endîşedar bûn. *Em tefekurîya wî dikişînin, em di heyra wî da ne.* HW, r. 298.

Dil ber hev nedayîn: /dıl ber hev neda:ji:n/ bwj. 1. teyax nekirin. 2. tamîş nedan. 3. tehamûl nekirin. 4. li ber xwe nedan. *Dilê min diqicqicî min jî dixwast xeber da, dilê min ber hev neda, ez jî rabûm min xeber da.* ŞK, r. 110.

Dîndar: /dî:nda:r/ nd/m 1. dîdar, dêm û rû, xweşrû. 2. reng û bengz. 3. bejnbal. 4. xuyan. *Ez ji dîndara te têr nabim.* KR, r. 63.

Dirb: /dîrb/ nd/m 1. gelîtang. 2. gelî, newal, geboz. *Usa muxdarekî beta vedibû, paşê wan cî û dirba dihate xanêkirin...* KR, r. 153.

Dirozge: /dîro:zge/ nd/m 1. dua. 2. lava, nîyaz. *Nedixwast guh bida ser du'e û dirozge Perîşana reben.* KR, r. 52.

Dirûnge: /dîru:ngê/ nd/m 1. dirûngeh, durûnge, dange. 2. li dervaci hê alifkirina pêz, bi taybetî. *Dirûnge fire dikirin.* KR, r. 161.

Divek: /dîvek/ h 1. diwek, dibek, dibe ku. 2. belkê. 3. îxtimal e ku. 4. yan – *Xecê, çima tu digirî? Divek tu poşman bûyî?* ŞK, r. 98.

Dîz: /dî:z/ nd/m 1. kûp, kûz. 2. derdankên ji herîyê hatine çêkirin. *Wana her sibe dîzê qatix avîtine ser pişta merkeva birine bajarê Îdirê fîrotine.* KR, r. 15.

Dîzik: /dî:zık/ nd/m 1. dîz, beroj yan jî qoşxaneyê ji axê hatîye çêkirin ku tê de xwarin tê pijandin. 2. kûz, cêr. *Dîzikeke biçûk ku Perîşanê arê xwe dikirê...* KR, r. 151.

Dolge: /do:lge/ nd/m 1. dol. 2. newal. *Çewa ku bihar hat û serê pêz ketê, me kerê pezê xwe top kir, em çûne dolga.* ŞK, r. 54.

Dûajo: /du:a:zo:/ nd/nt 1. çona, alîkarê şivên. 2. şopînerê bizaveke edebî yan hunerî, pêgir. *Bavê min îzna min da ez bûme dûajo.* ŞK, r. 15.

Dûrêze: /du: re:ze/ h **1.** li dû hevdu. **2.** li pey hevdu. **3.** gelbaze, rêzîn, bi rêzkî, bi dor. *Wexta dûrêze ketibû koça Kerem û Sebrî dûr va dîtibûn.* KR, r. 87.

Duşirmîşbûn: /duşirmi:şbu:n/ l **1.** ketin mitalan. **2.** fikirîn, fikarkirin, Ev peyv ji peyva zimanê tirkî “düşünmek” ketiye devoka Serhedê²⁰². *Ez ketme mitalan duşirmîş dibûm.* ŞK, r. 12.

E

E’lewatî: /e’lewa:ti:/ rd **1.** gûdeleyî, tişt û kesê lewitî û qilêr. **2.** hetikahî, rewşa şermezariyê, sosretî, gosirmetî. **3.** rewşa pêkenîna li kesekî/tiştêkî. *Ji vê elewatîyî xelas bibe!* HW, r. 355.

E’ne’ne kirin: /e’sne’sε kîrîn/ l **1.** kawbûn, quretî kirin. **2.** xingirîn, xingilîn. **3.** hejîn, veweşîn. **4.** nîqaş kirin. *Wî bi cureyekî enekirinê pirsî.* HW, r. 289.

Êgin: /e:gin/ rd **1.** hêgin. **2.** jêhatî. **3.** zîrek. *Serê wî çiyayî digeriya xortekî zafî bedew û êgin.* ŞK, r. 96.

Eglebûn: /εglebu:n/ l **1.** derengmayîn. **2.** xurcilîn, **3.** xerîkî bûn, mijûlbûn. **4.** rawestan. *Tu gerek egle nebî, wexta me derbas dibe.* MR, r. 20.

Êm: e:m/ h **1.** êman, demek kurt. **2.** bîsk, kêlî, kêlik. **3.** bîskek, gavek. **4.** heyam, dem. **5.** mîqdar. *Ew êmê nîv sehetê hebû nedihîşt kesek nêzikî min bibe.* ŞK, r. 103.

Emenî: /emeni:/ nd/m **1.** xalîçe. **2.** berrîk. **3.** mehfûr. *Emenî û xalîçe hatibû cidanê.* KR, r. 19.

Enterî: /enteri:/ nd/n **1.** dêre. **2.** kiras. **3.** kirasê derveyî yê jinan. *Qîz bûkê wan jî xwe pak xemilandibûn: dêre, xirxal û enterîyê rind.* ŞK, r. 57.

Erhede: /εrhede/ h **1.** teqez. **2.** miheqeq. **3.** bêguman. **4.** cureyek sond. **5.** herhalde. *Rast e ewî çil salî bû lê meriva tirê erhede pêncî sal li ser navmîla wî bûne bargiranîyek.* KR, r. 30.

²⁰² Qanatê Kurdo, **Ferhenga Kurdî-Rûsî**, Neşîrxana Dewletê ya Ferhengêd Zimanê Miletêd Dereve û yê Sovêtîstanê, Moskova, 1960, r. 229 ; <https://sozluk.gov.tr/> (03.05.2023)

Ersewil: /ɛrsɛwɪl/ nd/nt **1.** leşker, serbaz, şerbaz, esker. **2.** nefer, peya. **3.** nobedar, notirvan. *Ersewilên wî li mala Emerîk zikek nan têr warin.* HW, r. 257.

Evsene: /ɛvsɛnɛ/ rd **1.** ehmeq, fehmkor, kêmaqil. **2.** serhevde û beradayî. **3.** hurûm, kesê bêteşe û bêserûber. *Wexta qîzeke evsene, yan jî xortekî sewdaser lingê xwe...* KR, r. 26.

F

Fêz: /fɛ:z/ nd/m **1.** alîyê jorîn. **2.** jor. *Roja yekê gulanê fêza vagzala Sarîqamîşê bû mîtîngeke mezin.* ŞK, r. 110.

Fîno: /fɪ:no:/ nd/n **1.** fes, komê sor. **2.** cureyeke kofîyan. *Qîz û bûka serê xwe jî xemilandibûn: kofî, kitan, fînoyê qotikkirî, serê fîno û kofîyê wan jî tijî dirav bûn.* ŞK, r. 57.

Fir: /fir/ h **1.** gulm yan jî qurtek ji tiştên avî. **2.** firîn. *Hesreta wan kirtolek nanê reş, firek ava sar bû.* HW, r. 41.

Fircik: /fircɪk/ nd/n **1.** firnik. **2.** bêvil, difin, finc. **3.** kep, kepû. *Belkê nanê te firckê wî êtîmokî ra bê.* KR, r. 41.

Firê xistin: /fire: xɪstɪn/ bwj. **1.** bi firêxistin, mezinkirina zarok yan jî çêleyên heywanan. **2.** gîhandin, gîhandin. *Cewrê xwe xweyî ke û firê xe.* KR, r. 86.

Firêqet: /fire:qɛt/ nd/m **1.** aza, azad. **2.** firehî, aramî, asûde, rihet, hêsan. *Sûrênê ermenî dihat alî wî û hemû tişt firêqet pêş da diçû.* KR, r. 156.

Firêqetîyê ketin: /fire:qɛti:jɛ: ketɪn/ bwj **1.** derketin firêqetîyê. **2.** ji zorî û zehmetîyê xelasbûn. *Gava ku pez idî jî zîyana firêqetîyê ket, ewana her yekê vegeşîyan, çûne malê xwe.* ŞK, r. 59.

Firnaqbûn: /firna:qbu:n/ l **1.** firnaxbûn. **2.** serbilindbûn. **3.** şanazbûn. *Ew bi timî bi xala ser sûretê xwe ra firnaq dibû.* KR, r. 22.

Firqaskirin: /firqa:skɪrɪn/ l **1.** qulozbûn. **2.** qevzdan. **3.** hilpekîn. **4.** banzdan. **5.** çindik avêtin. *Çend xulama firqas kirin, xwe li sîyara ra gîhandin.* KR, r. 46.

Firxûn: /firxu:n/ nd/m **1.** virxûn. **2.** gerdûm, erebeya gayî. **3.** kaşke. Ev peyv ji zimanê rûskî ketiye devoka Serhedê.²⁰³ *Meriv nikarbû hêsa kûçê da biçûya ji dest faîtona, firxûn, ereba, îsanet.* ŞK, r. 79.

G

Gebol: /gebo:l/ nd/m **1.** xwarineke ku ji ard û savarî tê çêkirin. **2.** xwarineke wek savar. *Zîna qîza pîr Mîrzo mîna darika gebolê li nava gund digeriya.* KR, r. 181.

Gede gûde: /gedê gu:de/ nd/n **1.** naşî, xişîm, cahil. **2.** beradayî, eware, sergerde. *Zeytûn ne ya devê gede gûdeyan e.* KR, r. 68.

Gede: /gedê/ nd/n **1.** kesê reben, perîşan. **2.** kesê beredayî. **3.** zarok, kur, xulam, xulamok. *Êdî neçûm malê, gedeyê min çû nan berhev bike.* HW, r. 299.

Gêjgerîng: /ge:zgeri:ng/ nd/m **1.** gêjgerînk, ziviroka bayî; bablîsok. **2.** gêjgerînek. **3.** avger. **4.** gerînek. *Jîyana wan ya dijwar di gêjgerînga qewimandinên serê qirna 20an de tê ber çavan.* KR, r. 9.

Gengez: /gengez/ nd/m **1.** gêhayeke kulîlkên wê zer û dirêj e û pîjên wê hene. **2.** navê wê yê bi latînî solanum rostratum e. *Bavê çêrê gengezê ji hemîşka çêtir e.* ŞK, r. 16.

Ger: /ger/ nd/m **1.** qad, meydan, best, cihê rast û dûz. **2.** govek, daîre. **3.** gerîn, meş. **4.** eger heke. *Got ew guhêr jî di gereke mezin de bû.* HW, r. 91.

Gevegiçkî: /gevegit̪ki:/ rd **1.** gevegij, qijavij, porê neşekirî û tevlihev. **2.** gijikî. *Destê xwe danî ser milê Zîne, porê wî yê gevegiçkî tîmar kir.* KR, r. 59.

Gevez: /gevez/ rd **1.** rengê mor ê soretangî, rengê nêzikî sor. **2.** soreşîn, binefşî, mor, erxewanî. *Xûna gevez, ji sûretê wane sortir dibezîya.* KR, r. 86.

Gewlaz: /gewla:z/ nd/m **1.** gîha û pincarên hişkirî yên wekî mendik, gûlik û spîdak. **2.** gelbaze, gulokên pincarajî bo zivistanê hişkirî. **3.** Mêr yan jî jina pir zewicî. **4.** hevsar. *Dîya me jî ew temiz dikir, dikire gewlaz, hişk dikir hildida bona zivistanê.* ŞK, r. 16.

²⁰³ Têmûrê Xelîl, "Gotinên Rûsî Ku Derbasî Kurmancî Bûne", **Kovara Kurmancî**, j.43, 2008, r. 12.

Gezgezk: /gezgezk/ nd/m **1.** kevgezk, kevgez. **2.** gezgezok, gezgezik, gezgezînk, gezek, gezik, gezende, giyagezk. **3.** durzik, dêrzînik. *Ê gezgezkê diçine, destê wî tê geztinê.* KR, r. 81.:

Gêzî: /ge:zi:/ nd/m **1.** gêzîk, sivnik, sizing, sizik, malkêz, melkes, kinûşk, malîş, havlek, şicing, şijing. **2.** siqavêl, siqayîl: cureyek gêzî ye ku ji çilpîyên daran dihê çêkirin û pê durûnge, tewle, gom û derûdor tê paqijkirin. *Gêzî hildida, ber ve axilê, binya gund diçû.* KR, r. 93.

Gezo: /gezo:/ nd/m **1.** mûrabe, ava gûza hindî. **2.** cureyeke şirînîya ku dinişe ser belgên daran; selwa. *Çiqasî şirîn bû, te digot cî bi cî gezo ye.* HW, r. 110.

Gilavî: /gila:vi/ nd/nt **1.** giregir. **2.** pêşeng. **3.** parêzgar. Ev peyv ji zimanê ermenî ye.²⁰⁴*Ew xwe jî gilavî bû.* ŞK, r. 22.

Gilî ji dev hev revandin: /gili: jî dev: hev rava:ndin/ bwj. **1.** xeyba yekî kirin. **2.** gelacî kirin. *Hineka qest gilîyê netê pey min gilî dikirin, hineka jî ji nezanîya xwe gilî ji dev hev direvandi, ser da zêde dikir, digotin.* ŞK, r. 119.

Gilî: /gili:/ nd/n **1.** gotin, peyv. **2.** hîkaye, çîrok. **3.** pirs. **4.** pêşnîyaz. **5.** qazın, şîkat. *Bi gilîyeke kin, mêrikan rind dest pê kirine û ew yek jî çawa agir gîhê bikeve.* MR, r64.

Gilorbûn: /gilo:rbu:n/ l **1.** tilolbûn, gulolbûn, totbûn, hotbûn, walgerîn. **2.** gindirîn, gundirîn. **3.** guloverbûn. *Roj hatin gilorbûn, ew bihar bû hatin Eqîd Beg birin havîn jî derbas bû.* HW, r. 300.

Girbûn: /girbu:n/ l **1.** mezinbûn. **2.** geşbûn. *Zeytûn jî hatibû guhastinê û girbûbû.* KR, r. 26.

Gire-gir: /gire gir/ nd/nt **1.** mezin, rûspî, xweynav, xudannav, navdar, navgiran. **2.** birêz, hêja, eşraf, kesên maqûl. *Gire-girê gund, êvara dihatine vir rûdiniştin.* KR, r. 94.

²⁰⁴ Garnik Asatrian, **Ferhenga Kurdî-Êrmenî Êrmenî-Kurdî**, Republic ya Armenianê Mînistirtî ya Diyasporanê, Yêrevan, 2016, r. 148.

Gîrobûn: /gi:ro:bu:n/ l 1. desto-pirçkî bûn, kaşokêş bûn. 2. pêmijûlbûn, jêfikirîn. *Ez di gilîyeke din de gîro bûm, “Ev çawa ye”, ez di dilê xwe de sêwirîm...* HW, r. 56.

Gişk: /gɯʃk/ rd 1. gi, giş, gişt. 2. tev, tevda. 3. hemû, hemîsan. *Ji gişka zeftir kapê Mîrzo çivt sekinîbû.* KR, r. 40.

Givirîn: /gıvırı:n/ l 1. helîna xwarina di mîdeyî de, hezmbûn, hatin mahîn, mehîn, gewiran, gewirîn. 2. xunifandin, herisandin, dehandin. *De xwarina çolê başqe ye filankes, li merivan rûdinê, digivire.* HW, r. 99.

Givrikbûn: /gıvrıkbı:n/ l 1. Gihîştin û mezinbûn. 2. mezinbûn. *Birêd mingivrik bibûn, bihar bihar bavê min ra diçûne çolê.* ŞK, r. 14.

Golegenî: /go:lɛgeni:/ nd/m 1. gola ku ava wê pîs e. 2. hezek, hezge. 3. zekav, avgenî. *Nêzikî 70 kîlomêtrî dirêjeya wê hezekê-golegenîya hebû.* ŞK, r. 148.

Golikê malê ji gayê malê natirse: /go:like: male: ʒı gaje: na:tırse/ gp. 1. mirovên ku xizmên hevdu bin, ji hevdu natirsin. *Usa ne, wekî golikê malê ji gayê malê natirse.* KR, r. 95.

Gotî: /goti:/ l 1. divê, divêtî. 2. gerek. 3. hewcedarî. *Eger yekî bixasta nameyek binivîsîya gotî êpêce menzîl biçûya.* KR, r. 29.

Govek: /go:vɛk/ nd/m 1. çarmedor. 2. daîre, çember. 3. giloverok, gupik. *Ussa bikî, wekî kazirmê qazaxa têkevne govekê.* ŞK, r. 131.

Guh bel kirin: /gɯh bɛl kırı:n/ bwj. 1. guhbeliqandin, bi baldan guharîya tiştêkî kirin. 2. dapelandin. destê xwe birin ber guhê xwe. *Guhên xwe bel kiribûn, çi ka deng nayê.* HW, r. 387.

Guhêr: /gɯhɛr/ nd/m 1. guhêr guhir, li çiya devara ku heywan lê mexel dibin û dimînin. 2. cîyê pez û dewar şevê lê kom dibe, newala ku pez lê diçêre û lê mexel dihê. *Şemo û hevalên wî texmîn kirin ku wext e pêz ji guherê rakine şevînê.* MR, r. 12.

Gujme: /gɯʒmɛ/ nd/m 1. serê çîyayî, lûtke. 2. tap, tepe, gir. *Me cîyê xwe guhast, cîkî gujme yî bilind.* ŞK, r. 145.

Gulavtûn: /gola:vtu:n/ nd/m **1.** ava ji gulan, bêhna gulê. *Hemîd Begê qotika gulavtûnê ser sînga xwe da berdida.* KR, r. 20. **2.** qeytan, cilên bi sîm. **3.** tiştê di rengê gulê da ye. *Qiravî dibiriqî meriva tirê bereke gulavtûnkirî ye mezin li temamiya zozanê raxistîye.* KR, r. 48.

Guleş: /guleş/ rd **1.** gulgeş, rûgeş. **2.** kêfxweş. *Dû van xebera ra guleş bû, kire tîqetîq keniya.* KR, r. 59.

Gûlik: /gu:lik/ nd/m gîhayeke xwerbar e, bi pijandî dihê xwarin. *Ew pincar spîdak, gûlik, mendik û yê dinê bûn.* ŞK, r. 16.

Gulle kevçika dilê yekî da vala kirin: /gulle kevçika: dile: jeki: da: va:la: kirin/ bwj. **1.** gulle li ser kevçika dil xistin. **2.** di kevçika dil da lêxistin, da ku neks biçike di sersîngê da lê xistin, bi derbeke xedar lêxistin. *Ez ê sê gulla kevçika dilê wî da vala kim.* KR, r. 174.

Gulmast: /golmast/ nd/m **1.** vexwarineke ji mast û şîrî çêkirî. **2.** xundor, xelindor, xilindor, xîç, şîrê pêşîn ê pez û dewarên zayî. *Ez bixwazim ez ê ji nêrî gulmastê çê bikim.* KR, r. 80.

Gulok: /gulo:k/ nd/m **1.** gilok. **2.** gizîk, gaj, giloka ta û rîs. **3.** kulî: guloka hirîyê ya ku ji şeh derbas kirî û amade ye bo hûnandinê. *Dilê Meyanê tijî bû, kela wê rabû mîna gulokekê li gewrîya wê hasê bû.* KR, r. 84.

Gumreh: /gumreh/ h **1.** gelek, zêde. **2.** gurr. **3.** bihêz, qayîm, qewî, mehkem. **4.** hişk. *Wextê qerewilê wan î guhastinê dihat îcar gumreh dihat gellek bûn.* ŞK, r. 132.

Gundor dan milê yekî: /gundo:r da:n mîn mîle: jeki:/ bwj. **1.** kal dan binçenga kesekî, ji bo armançekî yek nepixandin. **2.** ne ji dil pesindan. *Gelo ewe ewqasî baş e, yan Belgîzar Xanim gundora dide bin milê wê.* KR, r. 103.

Gura (yekî) kirin: /gura: jeki: kirin/ bwj. **1.** gotina yekî kirin. **2.** îtaet kirin. *Gelleka gura qumandarê xwe nedikir.* ŞK, r. 110.

Gurî: /guri:/ rd **1.** gir, girû, gewrik cureyeke nexweşîyê. **2.** kotî, keçel. *Bizineke gurî ber derê wî tune bû.* KR, r. 93.

Gur: /gor/ rd **1.** Ev peyv ji tirkî ketîye kurdîya Serhedê ku dihê maneya xurt û bihêz û zêde. **2.** geş. **3.** pîrr. *Ew li bin konê reş î erebî da li ber kuçkê gurr rûdinên.* KR, r. 16.

Gûşî: /gu:şî:/ nd/n **1.** goşî, hêşû, harsem. **2.** rîşî. *Xwelîya deşta Yêrêvanê, bi xebatkarên xwe yên teze re gul vedide, dixemile bi gûşîyên tirîyan.* HW, r. 34.

H

Hace tişteki nebûn: /ha:dʒε tɪʃteki/ l **1.** hay ji tişteki nebûn. **2.** bêagah bûn. *Pîr Mîrzo usa xeber dida meriva tirê hace tişteki tune.* KR, r. 38.

Haf: /ha:f/ nd/m **1.** lûtke, jor. **2.** qad, meydan. **3.** qerax, kêlek, tenişt, tang, rex, hind, nik, cem. **4.** pêşber. **5.** berpâl, beroj, dibûr. **6.** quntar. *Kela mîna pepûkekê li ser hafa gêlî melisî bû.* KR, r. 96.

Ha-hanga: /ha:ha:nga:/ h **1.** hahanka, aniha, hanka, zûzika, **2.** hema pê re, wê qîtê. *Elî Axa ha-hanga pirsî.* HW, r. 202.

Hasilkirin: /ha:silkırın/ l **1.** strandina tiştên wekî herî(çamûr) û hevîr. **2.** satin, anîn ser bi serê(tişteki amade kirin, anîn wê rewşa ku tê xwestin). *Bi wî peynî xwelîya xwe didine hasilkirinê.* KR, r. 49.

Hatin xanêkirin: /ha:tin xane:kırın/ l **1.** hatin xuyakirin, xuyabûn, hatin xewankirin. **2.** xwenîn, eyankirin. **3.** xwe kivşkirin: xwe dan nîşanê. *Fêza gund va Sûrên û Zurbe hatine xanêkirinê.* KR, r. 145.

Hatina ser hişê xwe: /ha:tına: ser hɪʃe: xwe/ bwj. **1.** aqilê xwe da serê xwe. **2.** aqilbûn, ser de ponijîn. *Cahilê mîna me neyêne ser hişê xwe ew hevîr ê hila gele av bikişîne.* KR, r. 96.

Havêjîya bi yekî anîn: /ha:ve:zi:ja: bi jeki: a:ni:n/ bwj. **1.** xwezîya xwe bi yekî anîn. **2.** dilê xwe avêtin yekî. *Ew û Cemal yê maleka usa bi tavayî çêkin ku gişt havêjîya xwe bi wan bînin.* DD, r. 36.

Havîj: /ha:vi:ʒ/ nd/m **1.** bijîn, bijîyan. **3.** dilbijîn. *Dilê meriv xwe-xwe havîj dibîyêda.* ŞK, r. 21.

Hêca: /he:ca:/ h **1.** hêja, hêšta, êsta, niha. **2.** gavê din, demek berê. *Hêca jinên li ser kanîyê digotin; wekî Sîsê ji malê xeyîdiye.* DD, r. 74.

Hêçxem: /he:tʰxem/ rd **1.** xemsar, sersar. **2.** bêxem, xemnexur. *Mîna merivekî hêçxem, ber dilê min da tê lê seva xwe lêva jorîn nayne ser lêva jêrîn.* KR, r. 100.

Hedimandin: /hedıma:ndın/ l **1.** hilşandin, hilweşandin, hilweşîn. **2.** rûxandin, wêrandin. **3.** kavilkirin. *Barana wan rojan êdî her der hedimand, star nehîşt.* HW, r. 389.

Hedimîn: /hedımi:n/ l **1.** hilşîn, hilweşîn. **2.** rûxîn, wêranbûn. **3.** nijdebûn. **4.** piçikîn, raweşîn. *Em pêra-pêra hedimîn vagona, tijî bûn.* ŞK, r. 143.

Hêle: /he:lɛ/ rd **1.** lihevhatî. **2.** lêkdayî. **3.** birûkûpêk. *Veğerandinê orta şeher mîfîngeke hêle bû.* ŞK, r. 125.

Hem ne'lê û hem bizmêr xistin: /hem ne'le: u: hem bızme:r xıstın/ bwj. **1.** hem li defê hem li zirneyê xistin. **2.** durûtî kirin. *Belgîzarê got tu hem nelê dixî hem bizmêr.* KR, r. 69.

Hemankî: /hemanki:/ h **1.** hemangî, hemangê. **2.** hinekî, hevki, hebekî, piçekî. *Îvo, hemankî çevên xwe vekir.* HW, r. 289.

Hemîn: /hemi:n/ g **1.** hemî, hemin, hemîne, mademku. **2.** madem, mafîr. *Eynî niha wext e hemîn eme vala ne.* HW, r. 75.

Hemûşk: /hemu:ʃk/ nd/nt **1.** hemûşk, hemû, hemî. **2.** giş, gişk, gişt. **3.** hemîsan, hemîkan, tev, tevda. *Li mehîna kumêt şîyar bû, berîya hemûşkan çû.* HW, r. 57.

Hênijîn: /he:nızi:n/ l **1.** hunijîn, honijîn, pîrnijîn, dapîrnijîn, bawîşkîn. **2.** xewokîbûn, xewarîbûn, ji ber zordayîna xewê di nav şîyarbûn û xewê de çûn û hatin. **3.** temijîn, xilmaş bûn, li ser xwe xeweke kurt kirin. *Kopê çe've Hemze giran bûn ew hênijî.* KR, r. 74.

Heqî: /heqi:/ nd/m **1.** cureyekçente, tûrik. **2.** xurcîk. *Apo devê çemedanê xwe vekir û ji heqîyê jî kitêb derxistin.* HW, r. 48.

Heqkirin: /heqkırın/ l **1.** binaxkirin, raspartin xakê. **2.** çalkirin, mirî definkirin. *Cinyaze li cîyekî dûr heq kirin.* HW, r. 72.

Her: /hɛr/ d **1.** bi tenê, tenê, bes. **2.** her tim. **3.** gelek. **4.** hemî. *Her carana xortekî aşqorkî, dest dida ber devê xwe.* KR, r. 62.

Hêratî: /he: ra:ti:/ nd/m **1.** destmala ku jin di ser mêzerê de didine ser enîyên xwe. **2.** şarpe, cureyek serpoşî ye. *Dûmana sibehê nolî hêratîya gewr li serê çiyê alîyaye.* MR, r. 15.

Herêkirin: /hɛre:kırın/ l **1.** erêkirin, pesend kirin, misogerkirin. **2.** pejirandin. **3.** di dema xwezinîyê de birîna qelenê bûkê, yan jî qebûlkirina xwezinîyan. *Qelenê Zeytûnê bû heftê berdîrî, herê kirin deh zêrê mecîtî.* KR, r. 119.

Herkê: /hɛrke:/ g **1.** herke, heke, ku. **2.** heger, eger, ger. **3.** herçendî. *Herkê hinek kurmanc ekin diçinîn lê dîsa ekênê wan ji dêwêr hindiktir e.* ŞK, r. 53.

Hêsbûn: /he:sa:bu:n/ l **1.** bêhnvedan, arambûn. **2.** arambûn, sakinbûn. *Ji me re lazim e hêsbûn û em ê sibehê dîsa rêwîtîyê bikin, riya me dirêj e.* MR, r. 40.

Hesêbanî: /hɛse:ba:ni:/ bwj. **1.** hesêbankî, hesab bike ku... **2.** ferz bike ku... *Em ê zarên xwe bi tev Şaşa mezin bikin, hesêbanî ew nuxurîyê me ye.* DD, r. 37.

Hêsi: /he:si:/ nd/m **1.** hêsû, girê bilind ê hênîk, terazin, erdê dûz î hêşinahî lê ye. **2.** gir, kelle, serkelle, tepe. **3.** berfa ku bi bandora bayî kom bûye. *Wî serê xwe bilind kir dît ku êdî gihîştîye hêsîya fêza malan.* MR, r. 48.

Hêşî: /he:ʃi:/nd/m **1.** hewşa li ber konan. **2.** devera kon lê tê vegirtin. **3.** doranê qumaş. *Ew li hêşîya konê beg sekinîbû.* KR, r. 28.

Hêşka: /he:ʃka:/ h **1.** hêşta. **2.** hêja, hêna, hema niha, qasek berê. **3.** niha. *Hêşka gakûvîkî, yeke gakûvîya rind dabû pêşîya xwe dibir.* ŞK, r. 98

Heta kurê kura: /heta: kore: kora:/ h **1.** ji kurên kuran, nifş bi nifş. **2.** heta hetayê, ebedî. *Ez têxime xurê gullekî xelq ê heta kurê kura bêje.* KR, r. 56.

Hevalkiras: /heva:lkıra:s/ nd/n **1.** derpîyên ku jin di bin kirasên xwe de li xwe dikin, derpê, tûman, **2.** mîtan. mîntan, cilên yek parçeyî yên şevê. *Qe na kincên me li xwe bike: kofî, kiras, hevalkiras...* HW, r. 339.

Hevîr ê hila gele av bikişîne: /hevi:r e: hila: gele a:v bık^hʃi:nɛ/ bwj. **1.** Ew hevîr hela dê gelek av bikişîne. **2.** Ev biwêja hevokî, dihê maneya ev pirsgirêk dê hê

gelekî bidome. *Cahilê mîna me neyêne ser hişê xwe ew hevîr ê hila gele av bikişîne.* KR, r. 96.

Hevirmiş: /hevırmıʃ/ *nd/n* **1.** hevrişim, ebrîşim, evrişim, ermûş, armûş. **2.** herîr. *Min qîz xwe nava hevurmiş da xwey kiriye.* KR, r. 26.

Hêvîşîn: /he:vıʃi:n/ *l* **1.** teksîrkirin, jê mehrûm kirin, nedayîn, stirîn. **2.** miqatî lê kirin. **3.** xwedî kirin. *Hûn gotî sehet, qeweta xwe nehêvîşînin.* KR, r. 91.

Hevka (yekî/ê) birin: /hevka: jeki: bırı:n/ *bwj.* **1.** hetika yekî birin, hetikandin. **2.** erza yekî birin û dan şermê. *Her qalmeqaleke usa dikare hevka Meyanê bive.* KR, r. 44.

Hevraz tû kim simêl in, berjêr tû kim rû ne: /hevra:z tʰu: kım sıme:l in berze: r tʰu: kım ru: ne/ *bwj.* **1.** hevraz tû dikim simbêl e, berjêr tû dikim rih e. **2.** di nav du derîyan de man, di nav du bijarteyên berevajî de man. *Çewa bikim, hevraz tû kim simêl in, berjêr tû kim rû ne.* KR, r. 96.

Hevrîşk: /hevri:ʃk/ *nd/n* **1.** xwarineke ji nanê tendûr ê germ û bi rûn ve dihê çêkirin. **2.** xwarineke wekî jajerûnê lê ne tam wekî wê. *Zînê hevrişkeke rind loşî canê xwe kir.* KR, r. 59.

Hevsar: /hevsa:r/ *nd/n* **1.** hefsar. **2.** dizgîn. **3.** bendê hesp yan jî ker pê tê zeftkirin. *Li ber derê malê hevsarê kerê hebû.* KR, r. 19.

Hevsûdî: /hevsu:di:/ *nd/m* **1.** hesûdî, dexesî. **2.** pexîlî, çavnebarî, zikreşî, **3.** kumreşî. *Zînê, wexta Kerem û Zeytûn bal hev dîtin hevşûdîyê mîna marrekî reş dilê wê kot.* KR, r. 58.

Hevsur: /hevso:r/ *nd/nt* **1.** hevsir, hemsir. **2.** hevraz, hemraz. *Wê rojê jî qawe nedabû hevşurê xwe.* KR, r. 41.

Hêwirîn: /he:wıri:n/ *l* **1.** bicihbûn, rûniştin. **2.** sitarbûn. **3.** hewîn, vehewîn. **4.** civîn. *Li wê derê eskerê me hêwirî bû.* ŞK, r. 99.

Hêwirze: /he:wırze/ *nd/m* **1.** heytehol, heydade, şemate, hengame. **2.** qalmeqalm, xileport, qerepere. **3.** qerebalix. *Axe-ax bû qîrîn bû û hêwirze bû.* ŞK, r. 133.

Heybûn: /heybu:n/ l 1. ji mala xweyê xwe kovîbûn, dûr ketin. 2. cureyek newanîbûnê ye, wekî bîyanîbûn. *Maka wan e heywan ji mala xweyê xwe hey bûbû.* KR, r. 86.

Hezek: /hezək/ nd/m 1. avzê. 2. avzêl. 3. cimcime, lîtav, zong, çêrme, lîl, herîya serî bi çîmenan girtî. 4. dêm, erdê şil û avî. *Wî çaxî dora gole-geñiya cîyê hezek û cîyê qamûş lê şîn dibe heye.* ŞK, r. 16.

Hezing: /hezıng/ nd/m 1. hêzing, nefes. 2. axîn. 3. intinî. *Şivên, teze sefetê xwe berda û hezingeke kûr rahişt.* KR, r. 18.

Hil jê çûyîn: /hıl ze: tʃu:ji:n/ bwj. 1. hîl jê çûyîn. 2. ji yekî nefret kirin. 3. rik jê çûyîn. 4. det jê çûyîn. *Ew mîna me'rekî reş e, hîlê min li wî çûye.* KR, r. 88.

Hilçînîn: /hılçîni:n/ l 1. hilçîn, ji nav avê derxistin, vebijartin, hildêrand. 2. pêçan, tiştêk lê alandin, niximîn, 3. bîter kirin, peyda kirin, dozîn. 4. mêjîna tiştên wekî axê ya ku bo avê. *Lê derva te'erîyê erd hilçînî bû.* KR, r. 97.

Hilgêr: /hılge:r/ nd/m 1. waxtê derketina zozanan. 2. derketin û hilperîna dever yan jî tiştên ên bilind wekî zozanan. 3. meş,geşt û gera deverên bilind. *Belkî dager bi şîn û girî ser mala wan da bê, hilgêra wan jî tune be!* KR, r. 47.

Hilparkîkirin: /hıl^harki:kırın/ l 1. hilperikîn, li tiştêkî siwarbûn yan jî berve jor hilketin, qulozbûn, pervazbûn, 2. hilavêjî. 3. hilfirîn, pervazbûn. *Carinan hindik dimîne xwe hilparkî esmanan bike.* HW, r. 216.

Hilqoşandin: /hılqo:şa:ndın/ l 1. holdan. 2. pengizîn. 3. xwe hilavêtin. *Xwe hildiqoşandin, dibirin û dianîn.* ŞK, r. 21.

Hilşîn: /hılşî:n/ l 1. hilweşîn, rûxîn, hedimîn, xopanbûn. 2. kavilbûn, wêranbûn, 3. mecazî: kombûn. *Temamîya gund hilşîyan ser xanîyan.* HW, r. 129.

Hincirandin: /hındçıra:ndın/ l 1. hûr kirin, hûrxaş kirin, parçe parçe kirin, pirtî pirtî kirin, 2. pincirandin, vepincirandin. perçiqandin, pirçiqandin. *Ûmnov, ji alîyê hukumetê da hatibû hincirandinê.* KR, r. 199.

Hind: /hind/ nd/m 1. tang, kêlek. 2. rex. 3. hind, hinder. 4. cem, ba, bal. 5. nik, def, tenişt. 6. alî. *Hinda mala Qubatê Emo, du jina pistepista wan bû hevra digotin...* ŞK, r. 118.

Hingavtin: /hɪŋa:vɪn/ l **1.** hingaftin. **2.** lêdan, lêxistin. **3.** lêketin. *Brûskê dihingavt.* KR, r. 65.

Hingil: /hɪŋɪl/ nd/m **1.** memik, çiçik. **2.** bistan, girêş, guhan. *Paşo zaro danî, çay germ kir, nîv stekan şîrîn kir û pê hingil da wî tîfalî.* DD, r. 11.

Hingor: /hɪŋo:r/ nd/m **1.** hingûr. **2.** wextê qulibîn yan jî derketina rojê/tavê. **3.** qereberbang. **4.** spêde. *Me xewa hingorê da dest pê kir.* ŞK, r. 132.

Hişkî-hola: /hɪʃkʰi: hɔ:la:/ rd **1.** hişkûhola, hişkohana, **2.** zipzîya, zipzuha. *Çar alîyê gund qamûş bû, lê hinekî wê da qirekî hişkî-hola hebû.* KR, r. 94.

Hîvêskirin: /hi:ve:skɪrɪn/ l **1.** hîvastin, hîvastin, hîzvatin, hîvistin, hîwisîn, hîwisandin, hîwistin, hîwastin, **2.** refandin, raçîn, veçinandin. *Te digot tenterîyê Sînekê yî gewr ritilîye û şîna bi rîsê qer hîvêskirine.* KR, r. 201.

Hîz: /hi:z/ nd/n **1.** meşk, ‘eyar. **2.** bîdonê mezin ê tiştên wekî avê. *De got îçke kirîbûn, ez bêjim bîst hîz tu bibêje çil hîz.* HW, r. 51.

Hîzhîzî: /hɪzhɪzi:/ rd **1.** peritî. **2.** rizîyayî. **3.** zîtolzîtolî. **4.** gincirî. **5.** lete-lete. *Bereke kevne hizhîzî ew stêra nixamtibû.* KR, r. 38.

Hogeç: /ho:gɛtʃ/ nd/n **1.** havir, beranê du salî. **2.** xamberdîr. *Hogeç î kurîkel ji nava pêz veqetîne bîne.* HW, r. 151.

Holik: /hɔ:lɪk/ nd/m **1.** kolik, kox, kolît. **2.** qulûbe. *Qerewilê hûrqalin, ji holika xwe derdiket.* KR, r. 96.

Horik: /ho:rɪk/ nd/m **1.** horîg. **2.** horîk, xorîk. Di zimanê ermenkî de ev peyv dihê maneya cot. Ev peyv, di kurmancî de ji bo herdu gayên pêşîn yên kotanê dihê gotin.²⁰⁵ Ev ga pêşîya gayê din diçin ji bo alîkarîyê. *Alî, horika kesîb kusîban dajot.* HW, r. 61.

Hotax: /ho:tʰa:x/ nd/nt **1.** rencber, rênçber, kedkar û karker. **2.** gundîyên li ber heywanan. *Bi rê ve rastî hin hotaxan hatin.* HW, r. 283.

Hoz: /ho:z/ nd/m **1.** koza pêz. **2.** axilê pêz. **3.** kom. **4.** eşîr. *Wexta ro dihate nîvrohoza mîya li derê mala beg top dibû.* KR, r. 20.

²⁰⁵ Têmûrê Xelîl, “Pêwendiyên Ermenkî û Kurdî yên Zimên”, *Kovara Kurmancî*, j. 41, 2007, r. 5.

Hubirdank: /hobirda:nk/ nd/m **1.** hubirdang. **2.** hibirdank, ciyê hibrê. *Gilîyên diya min tamam nivîsî, paşê hubirdank danî.* HW, r. 139.

Hûkî kirin mûkî: /hu:ki: kırın mu:ki:/ bwj. **1.** Mêş kirin gamêş (biwêj). **2.** Gûzek kirin dîzekê, bi derew û rastnegotinê va mezinkirina tişt û bûyeran. *Xelk, hûkî dike mûkî !* KR, r. 41.

Hupiz: /hopız/ rd **1.** hûrpiz, mirovê qelew. **2.** hûrmezî, hûrtirş. *Carekê ûrisekî hupiz î terikî nêzikî wan bû.* HW, r. 320.

Hûr: /hu:r/ nd/n **1.** ûr,zik. **2.** made, mede, mîde. *Qerewîlê hûr qalîn î pirpişî qeme tezî ser Hemze ra digirt.* KR, r. 73.

Hurbûn: /hõrbu:n/ l **1.** harbûn, azirîn, nesekinîna kesekî. **2.** netebitîn, zilm li kesekî kirin. *Te digot di toyê te da ye an jî di kêfeke wisa hurbûnê de wekî hiş û aqilê xwe wînda kiriye...* HW, r. 385.

Hûrdexweşî kirin: /hu:rdexweşî: kırın/ l **1.** hûrxaş kirin, xurdexaş kirin, **2.** lete-letekirin, parçe parçe kirin. *Rabîn hev ra bivîne pişt qeyd û çîdara hûrdexweşî bikin.* KR, r. 90.

Hurmata yekî pêpes kirin: /hõrmeta: jeki: pʰe:pʰes kırın/ bwj. **1.** bi hurmeta yekî ra lîstin, bêhurmet kirin, ji yekî re bêrêzî kirin. **2.** gotina yekî pêpes kirin, gotina yekî li erdê xistin. *Zeytûnê ew sekesiz kiribû, nava xelkê da hurmeta wî pêpes kiribû.* KR, r. 171.

Hûrmûr: /hu:rmu:r/ nd/n **1.** kelmel, kel û pel, **2.** tişt mişt, pese-pûse, eşya meşya, tiştên biçûk. *Gotî ji malê ra hûrmûran bikirim.* HW, r. 326.

Hurpuzî: /hõrpozi:/ rd **1.** hupizî. **2.** qelew. *Merikî tijî hurpuzî, bejneke dirêje lê, qasî ejdehakî hate hundirê merêkê.* ŞK, r. 12.

Hurum: /hõrom/ nd/m **1.** milletê rûm. *Hetta hat, derkete welatê Qersê gundê huruma, Azatê.* ŞK, r. 11.

I

Inê: /ine:/ nd/m **1.** dayê. **2.** ev gotin ji peyva tirkî ya “anne”yê deforme bûye ketiye devoka Serhedê. *–Inê, mala bavê şewitîyê!* HW, r. 241.

Intîn: /i^{nt}hi:n/ l **1.** dengek ji ber ji êşkişandinê ye. **2.** hilkehilk kirin. Ew çiqasî berjêr dibû, ew qasî intîn nêzik dihate bihîstin. MR, r. 13.

Î

Îlik birandin: /i:lîk bîra:ndîn/ bwj. **1.** peyva îlik ji tirkî ye ku dihê maneya mox û mêjîyê di nava hestî de û birandin jî dihê maneya dawî lê anîn û qedandina tiştêkî. bwj. **2.** hestîyê yekî xwarin. *Xercê dewletê ew îlik dibirandin.* KR, r. 60.

Încûz: /i:nd^zu:z/ nd/m **1.** rîwekeke bîyanî ya ku hatiye kizirîn û hişkkirin. **2.** orkestra, muzîk. *Ew Kubara ku lehzeyekê berê wekî te digot heyvê derneyê, bû incûzek.* HW, r. 384.

Îske-îsk: /i:s ke i:sk/ h **1.** zarîn, girîna bi hilkehilk. **2.** girîna bi kizî û zelûlî. *Bû îske-îska wî, xwe avîte pêsîra daykê.* KR, r. 43.

Îstekan: /is:têka:n/ nd/m **1.** îskan. **2.** perdax, bardax, qedeh, badîn. *Loqek du loq li birinc xist, yek îstekan çay vexwarin.* HW, r. 62. Ev peyva îstekan(îskan) jî zimanê rûskî ketiye devoka Serhedê.²⁰⁶

Îstintaqkirin: /i:st^hnt^haqkîrîn/ l **1.** pirsyarî. **2.** jêpîrsîn. **3.** tehqîq. *Polkovnik Bênlavskî û çend zabîta va hatin, îstintaq kin.* ŞK, r. 95.

J

Jajerûn: /za:zêru:n/ nd/m **1.** jejerûn, şîrînahîyeke bi rûn, şeker û hevîr ve dihê çê kirin. **2.** xwarineke ji jajî û rûn pêk dihê. *Wê here ser gulê sor, yanê na ser kodka jajerûnê?* KR, r. 66.

Ji (yekî) birin: /z¹ jêki: bîrîn/ bwj. **1.** serkeftin. **2.** têkbirin. *Me zêzê dilîst, kesek min ra nedigihîst- min jî teva dibir.* ŞK, r. 64.

Ji vir hada: /z¹ vîr ha:da:/ h **1.** ji vê şunda. **2.** êdî, îdî. **3.** ji vê pêve, pêva, ji niha pêva, ji niha şûn ve/va. *Ewê ad û qirar dikir vira hada dengê xwe li ber mêrê xwe neke.* KR, r. 43.

²⁰⁶ Têmûrê Xelîl, g.n.b., 2008, r. 1-2.

Jitutarketî: /ʒɪtʰotʰa:rketi:/ rd **1.** jitaqetketî, jiqudûmketî, jiqinyatketî. **2.** kesê hêz û taqeta wî nemaye. Ew jineke bilind bû çavên wê tas, bi zend û bend lê westîyayî jituraketî bû. HW, r. 400.

K

Kaka: /ka:ka:/ nd/m **1.** di zimanê zarokan da ji bo tiştên wek şeker, şekirok û çikolate dihê gotin. *Her cara ku bê gund, wê cêba xwe tijî kaka, fêkî, kanfêt bike.* HW, r. 349.

Kambax: /kʰa:mba:x/ rd **1.** kembax, rewşa wêranbûnê. **2.** xopan, pir xerabbûyî. *Kambaxa tunnebûna mala me kete bîra min, kela girî da qirika min.* ŞK, r. 137.

Kamçokirin: /kʰa:mtʃʰo:kırın:/ l **1.** kamûşkî kirin, kamsojkî kirin, delandin, li bendê hîştin, dil kirkirandin, bie'candin. **2.** nefstengîyê kirin, bîntengî kirin, hêrs kirin *Wî mîna zaroka ez kamço kirim.* HW, r. 30.

Kanfêt: /ka:nfe:t/ nd/m **1.** şekerê di nava kaxizên birqonek da. **2.** cureyeke şeker. Ev peyv ji zimanê rûskî ketiye devoka Serhedê.²⁰⁷ *Annayê textekî bi gotina te amade kir, êdî çi bibêjî li ser tunebû: goşt, kalbas, penêr, rûnê nivîşkî, totikên şêrîn, kanfêtên rengrengî...* HW, r. 323.

Kap: /kʰa:p/ nd/n **1.** lîstikek ku bi gûzekên dewaran tê lîstin. **2.** gozînk, gozing, gûzek, girêka li rexê derve yê pîyên mirovî. *Me bi hev re kap dilîstin.* HW, r. 299.

Kapavêtin: /kʰa:pave:tin/ l bwj. **1.** li hember hev ketin pêşwazîyê. **2.** bi yekî re serederî kirin. **3.** rik kutan yekî. *Kes nikare bi Hemîd Begê ra kapan biavêje.* KR, r. 21.

Karêt: /ka:re:t/ nd/m **1.** taşke, kaşke, firxûna ku hesp dibin. **2.** fayton. Ev peyv ji zimanê rûskî ye. *Li cîyekî paqij karêta xwe da sekinandin.* HW, r. 117.

Kastîni: /kastini:/ nd/m **1.** ewtîni. **2.** kazekaz. **3.** rewîna seyan bi dengê zirav û bi zelûlî. *Gur, ji binda usa dev kiribû xeneqa Qafreş kastîniya heywên bû.* ŞK, r. 29.

Kate: /kʰa:thɛ/ nd/m **1.** kade, cureyekî kekan. **2.** cureyekî nanê ku bi rûn û şeker tê pehtin. *Elî Axa bi xwe kêr hilda, ew kate kerkerî kir.* HW, r. 301.

²⁰⁷ Têmûrê Xelîl, g.n.b., 2008, r. 1-2.

Kavir: /ka:vır/ /nd/n **1.** berxê ji yek heta sê salî. **2.** hogeç. *Salê 10-12 kavir heqê xwe distand, şivanekî zafî rind bû.* ŞK, r. 104.

Kawbûn: /k^{ha}:wbu:n/ l **1.** şanzbûn. **2.** serbilindbûn. **3.** qurebûn. *Ez zaf kaw dibûm, min tirê –ez idî şivanekî tam im.* ŞK, r. 15.

Kaxtegan: /k^{ha}:xtega:n/ rd **1.** gagtakan, revek, qaçax, firar. **2.** penaber, penahende. **3.** miltecî. Ev peyv ji zimanê ermenîkî ketiye devoka Serhedê.²⁰⁸ *We kaxtegana dunîya xerab kir, niha hatne vira.* ŞK, r. 124.

Kêfa xwe kok xwey kirin: /k^{he}:fa: xwe k^{ho}:k xwey kırın/ bwj. **1.** xem nekirin. **2.** li kêfa xwe nêrîn. *Bira kêfa xwe kok xwey kin, netirsîn.* ŞK, r. 134.

Kefgurî: /k^{he}fçuri:/ rd **1.** gurbûn û coşbûna ava zêde ya çem û royan. **2.** halê merivê bi heytehol û bi hêrs.(mec.). *Roja îro dilê min mîna çemekî kefgurî ku singê Elegezê da dadibire rabûye.* KR, r. 16.

Kejî: /kɛzi:/ nd/m **1.** bendê pehn ê hûnandi. **2.** rewşa kejbûnê ango reng û porê çûr. *Ji bo xemla hespan kejî, rexe û rişmeyên wan anîbû.* HW, r. 353.

Kelefe: /k^{he}lefe/ nd/m **1.** mala kavihbûyî. **2.** kenefe, avahîya kewîşî. *Wekî yekî ji me biçûya gundekî xirabe-kelefeke da...* ŞK, r. 158.

Kelem: /kelem/ nd/n **1.** strî, pîj, dirî, dirrik. **2.** asteng, berbend. *Ew xeberdana mîna kelemekî tûj dilê wî ra çûbûn.* KR, r. 77.

Kêlendî: /ke:lendi:/ nd/m **1.** tirpan. **2.** tilwar, şalok, qirim, alava gêhaçînînê. *Çend xebatkarên gund kêlendî li ser milan ji mêergên jorîn ber bi kanîyê dihatin.* DD, r.57.

Kelêşk: /keleʃk^h/ rd **1.** kevn. **2.** lastîk. **3.** kelêjk, heywana ku ji jarîyê çerm û post maye, gelekî zeîf. *Bereke ritîlî, tereke kelêşka, du sê dest nivînê betreng, tencereke kevnê çemilkirî malê da hebûn.* KR, r. 45.

Kelimîn: /k^{he}lumi:n/ l **1.** kelimîn, axivîn. **2.** hatin zimên, vegotin. **3.** xeberdan. *Simêlê xwe ji ser lêva dane alîkî bi hêrs kêlimî.* KR, r. 66.

²⁰⁸ Garnik Asatrian, **Ferhenga Kurdî-Êrmenî Êrmenî-Kurdî**, Republic ya Armenianê Mînistirtî ya Dîyasporanê, Yêrevan, 2016, r. 243.

Kenehû: /k^henɛhu:/ h **1.** keneho, qaşo. **2.** Xwedêgiravî. *Taxa jêrîn dereng bihîstibûn, gotin kenehû Sîsê çûye ser Îskender da rûniştiye.* DD, r. 76.

Kepenekî: /k^hepeneki:/ rd **1.** gêjokî. **2.** ehmeq. **3.** kêmaqilî. **4.** kesê ku bi nexweşîya pişikreşîyê ketiye. *Wekî we pez lê çêrand, pezê we tevî kepenekî bibe.* ŞK, r. 16.

Kerdî: /k^herdi:/ nd/n **1.** kerdû, şov, herq. **2.** şax û xetên di nav zevîyekê de ji bo avdayînê hatiye çêkirin. *Got û rusqet xwest wekî biçe kerdîyan av de û çû.* HW, r. 110.

Kerevat: /k^hereva:t/ nd/m **1.** cîyê rûniştinê. **2.** doşeg û kanepeya razan û bêhvedanê. *Karê elba avê danî ber sobê û piştosan ser Kerevatê pal da.* DD, r. 5.

Kerre-kerr: /k^herɛ ker/ h **1.** bi bêdengî. **2.** bi awayeke bêdeng û bêhis. **3.** bi bêxeberî. *Mêvanê Sûrên kerre-kerr ji malê derketin.* KR, r. 62.

Kesirîn: /k^hesiri:n/ l **1.** tîbûna zêde, têhnî bûn, tînoşî bûn. **2.** westîn. **3.** keribîn, kedirîn, xemgîn bûn. *Me dilezand, west, kesirîn ji bîr kir.* HW, r. 116.

Kesse: /k^hesse/ rd **1.** rasterast. **2.** kurt, tîk, dûz. **3.** kurterê. Ev peyv dibe ku ji zimanê tirkî peyva kese ketibe devoka Serhedê. *Min hema kesse got : Gerekê em dîwana miweqetî qir kin !* ŞK, r. 110.

Ketin çe'vê yekî: /k^het^hin tʃɛ^sve: jeki:/ bwj. **1.** ji aliyê kesekî ve hatin ecibandin. **2.** xwe kirin çavên yekî. *Him dikete çe'vê beg him jî bal Keleşê rîspî nanê xwe genimî dikir.* KR, r. 80.

Ketinaserêpêz: /k^het^hina: sere: pe:z/ bwj. **1.** avisbûna pêz. *Wexta serê pêz diketê, her kurmancekî zadê serê pêzê xwe çê dikir.* ŞK, r. 54.

Kevî: /kevi:/ nd/n **1.** goşe. **2.** kuj, kuje, kujî. **3.** berav. *Kevîyê kolosguhê min û stukura min dikutan.* ŞK, r. 62.

Kewgirîn: /k^hewgiri:n/ l **1.** xemxwarin, keribîn. **2.** xemgînbûn. *Ew gele cara halê kurda da dikewgirî.* KR, r. 36.

Kewşen: /k^hewʃen/ nd/n **1.** beyar, erdê ku nehatiye çandin û vala yên li dora gundekî **2.** sînor. **3.** zevî. **4.** bejî, best. *Rençberê berê, bûn xweyîyê gund, kewşen.* HW, r. 34.

Kezelik: /k^hezelik/ h **1.** wê gavê, nêşkêva. **2.** pêra, heman wextî. **3.** yekcar, yekser. Ev peyv, ji peyvya “kez” a zimanê tirkî ye. *Min zembîl danî ber şêmikê û wê kezelikê peya bûm jêrê.* HW, r. 26.

Kibîr: /k^hibi:r/ rd **1.** kûr. **2.** giran. *Destxweda gundîyê kurmanç çewa ji xeweke kibîr radibe.* ŞK, r. 54.

Kilandin: /k^hıla:ndın/ l **1.** kilkirin û kilîn, tiştên wekî dew û şîr di meşkê de hejandin. **2.** keyandin, kêyandin, kêyîn, kayîn, kan; meşk şilqandin ta ku nîvişk ji şîrî çê bibe. **3.** şilqandin, çelqandin. *Jina hirî dirêst, dişûşt, şe dikir, kincê wan dişûştin, dew dikilan.* ŞK, r. 61.

Kimkimî: /k^hımkımi:/ rd **1.** gelekî tijî. **2.** mişt. *Wexta cimaet tijî odayê bûbû, ode kimkimî bû.* HW, r. 295.

Kinêz: /k^hıne:z/ nd/nt **1.** heval, dost. **2.** hogir. **3.** xatirperwer. *Ew xortê kinêz î delal ketiye wî halî.* MR, r. 13.

Kinêzayî: /k^hıne:za:ji:/ rd **1.** maqûlî, bi awayê hevalî û dostane, bi merhemet, merdane. **2.** daxwaz û nîyeta baş a ji bo nêzîkbûna li gel kesekî, mihabet, sosyalîtebûn. *Qanat kete tefekurîya wê û xebereke kinêzayî got.* HW, r. 324.

Kîp: /k^hi:p/ rd **1.** tîk, rast û qayîm, şidandî, **2.** saxlem, pêt, xurt. *Wê demê eskerekî kurmanç kîp bi milê wî girt, tiving ji dest girt.* HW, r. 387.

Kirçom: /k^hır̥t̥^ho:m/ nd/n **1.** qircom. **2.** qircîm, bermahîyên alifên dewaran ku ji qirş û gîhayên hişk pêk dihê. Ev peyv ji zimanê ermenîkî ketiye devoka Serhedê.²⁰⁹ *Nehêlin gîha yan kirçom têkeve nav dest-pê dewaran.* ŞK, r. 14.

Kirkirk: /k^hır̥k^hır̥k/ nd/m **1.** tovê riweka zegerekê, zegerek. **2.** kitan. *Movê tirîya zer bûbûn, belgê wane mîna kirkirka dixeriqîn.* KR, r. 89.

²⁰⁹ Têmûrê Xelîl, g.n.b., r. 5.

Kişmîş: /k^hɪʃmi:s/ nd/m **1.** mehûj, mewuj, mewûj, mewûc, **2.** tirîyên hişkkirî. *Bi heft tehman kateyên xwe hazir kir: ar, xwê, av, şekir, rûn, kişmîş, qeysî.* HW, r. 301.

Kit: /kɪt/ nd/m **1.** parçeyek. **2.** tek, ferek. **3.** hece. *Kitek ji me çî ye, ew jî wê jî rûyê dinyayê biqele.* HW, r. 99.

Kitan: /kɪtan/ nd/m **1.** zegerek. **2.** keten. **3.** cawê ji keten çêkirî. **4.** cureyek serpoşî. *Qîz û bûka serê xwe jî xemilandibûn: kofî, kitan, fînoyê qotikkirî, serê fîno û kofîyê wan jî tijî dirav bûn.* ŞK, r. 57.

Kito-kito: /kɪto: kɪto:/ h **1.** kitkitî. **2.** yek bi yek. **3.** fer. *Li quntara çîyayê Sînekê pez kito-kito bûbû, diçêrîya.* KR, r. 17.

Kivşbûn: /k^hɪvʃbu:n/ l **1.** xûyabûn, **2.** dîyarbûn. **3.** teqezbûn. *Tê kivşê, tu ne qenc î Karê!* DD, r. 52.

Kizkizîn: /k^hɪzk^hɪzi:n/ l **1.** şewitîna dil ji ber xemgînî yan jî ji êşekê. **2.** sojîn. *Dilê wê dikizkizî, dibû xule xula hêsra li ser hinarê sûretê wê da dihatine xarê.* KR, r. 196.

Koçek: /k^ho:tʃ^hek/ nd/nt **1.** Di bawerîya êzdîtîyê de kesê bangeşeya dînî dike û seroktîya kesên ku parêzvanîya turbeya Şêx Adî dike. **2.** mêrên ku kincên jînan li xwe dikin û reqşê dikin. **3.** muneccîm: pîldar. *Koçek jê ra gotibû, wekî ew hersê pezê me Mîrzê Talo ji Sînekê dizîne, birine.* ŞK, r. 74.

Kodik: /ko:dɪk/ nd/m **1.** kod, tasa ji dar çêbûyî. **2.** perdax, pîyale. **3.** şerbik. *Neferê konê ova wî tefekûrê kodike dew bûn.* KR, r. 19.

Kofî: /k^ho:fi:/ nd/m **1.** kefî, cureyek serpoşîya jinan. **2.** hotoz. *Qîz û bûka serê xwe jî xemilandibûn: kofî, kitan, fînoyê qotikkirî, serê fîno û kofîyê waan jî tijî dirav bûn.* ŞK, r. 57.

Kokbûn: /k^ho:k^hbu:n/ l **1.** bezgirtin, pêve goştgirtin. **2.** qelewî, qelewbûn. *Dewar sibê heta êvarê diçêre, ji hênkayê û çêrê xweş kok dibe.* ŞK, r. 53.

Kol: /k^ho:l/ rd **1.** bêqoç, bêqloç. **2.** bêstireh, bêstrû. *Sefo eva sal-nîvekê min dixapîne, mîna bizna kol min didoşe.* ŞK, r. 91.

Kop: /ko:p^h/ rd/nd **1.** tišta ji alîyê derva ve tewandî, konveks, kov, kevané, qews. **2.** bijang, mijang, mijank, bijanik. *Kopê çe 'vé Hemze giran bûn.* KR, r. 74.

Korfelaqî: /ko:rfela:qi:/ nd **1.** korfeleqî, bi tesadûfî. **2.** telebextî, bextê kor, bêşansî. **3.** koreqederî. *Ewî dikir xêncî qerewîl hineke dinê jî bivîne lê korfelaqîyê ra kesek tune bû.* KR, r. 73.

Kotelgirêdan: /k^hothel gire:da:n/ l **1.** rêûresmeke mirî veşartinê ya kurdên êzdî ye. **2.** kurdên êzdî wexta mêrek dimire cil û bergên wî didin ser pišta hespî heta gorê dibin. *Dewsa şînê kotel girêdan.* HW, r. 78.

Kotin: /ko:tin/ l **1.** kojîn. **2.** kelotin. **3.** kirrandin. **4.** dan ber diranan. *Qijikeke reş, çok dabû ser qefesa sîngê wî, dilê wî dikot.* KR, r. 50.

Koz: /ko:z/ nd/m **1.** axil. **2.** gom, hevşî. *Hemze, ser kevirê kozê rûniştibû.* KR, r. 46.

Kûlak: /ku:la:k/ nd/nt Ev peyveke rûsî ye dihê maneya, cotyarê dewlemend. *Hetta dîya me dixebitî, wan kûlaka dikire ser me, wekî em miqatî afirê dewarê wan bin.* ŞK, r. 14.

Kulfet: /k^hulfet/ nd/m **1.** jin, stî, sitî, kewanî, xanima malê, hurmet, hîrmet, malî. **2.** zêç, zarûzêç, jin û zar, 'erz û 'eyal. **3.** mal, malbat. **4.** berbirşyarî. *Yekî aşqurkî qamçî ber bi kulfeta Sûrên çû.* KR, r. 144.

Kulîk: /k^holi:k/ nd/n **1.** serkolk, koma çopê, cihê çop û gemarê. **2.** li ber malan cihê ku çop lê tê danîn, zibilxane. *Dora bajêr tijî kulîk bûn, sayîl hatibûn ser, vedijandin.* HW, r. 283.

Kulîmek: /koli:mek/ nd/m **1.** kulêmek. **2.** teşk, hêt, ran, qalçe. **3.** hestî û goştê ji movika piştê heta noqê. *Ewqas dane kêlek û kulîmekên min, min haşa nikaribû biça derva.* HW, r. 263.

Kulîn: /koli:n/ nd/m **1.** kîler. **2.** embara zad. **3.** mitbaxa li zozanan. Ev pev ji zimanê ermenî ketiye devoka Serhedê.²¹⁰ *Konê çarstûnî, kulîna tijî 'eyarê rûn û toraqê, çend semer pez, çêlek, hesp îdî çî bêjî ber derê wî tune bûn.* KR, r. 21.

²¹⁰Auguste Jaba; Ferdinand Justi, “كلين”, in *Dictionnaire Kurde-Français*, Imperial Academy of Sciences, Saint Petersburg, 1879, r. 342.

Kuloç: /kulo:tʃ/ nd/m **1.** kuloç, kilor(ermenîkî.) **2.** nanê kalind ê gilover. *Wexta serê pêz diketê, her kurmançekî zadê serê pêzê xwe çê dikir. mirtoxe û kuloç.* ŞK, r.54.

Kulzikî: /kolziki:/ h **1.** bê dilê xwe, bêhemelî, awayeke nexwestî. **2.** bi awayeke tehn û îma. *Wî bi kulzikî got dîsa dûyê cixareyê hecam kir!* HW, r. 271.

Kumreşî: /komreʃi:/ nd/m **1.** hesûdîya ku jin û mêr bo hevdu dikin. **2.** pexîlî, çavnebarî, dexesî. *Zanibû ku kes nikare li ser sîya Karê da here, pêra jî wî qey bêjî kumreşî kir.* DD, r. 14.

Kûrînîkirin: /ku:ri:ni: kırım/ l **1.** kûrekûr kirin, qarîn, qarandin, girîna bi deng û îske-îskî. **2.** zare-zar kirin. *Dibû kûrîna cim'etê tamam digirîyan.* KR, r. 193.

Kurişkî: /kuriʃki:/ rd **1.** porê xulekî. **2.** porê gijîkî. *Bejna w ya bilind, diranên sedefî, lêv e kaxizî, tilî ye mûmanî, po î kurişkî...* MR, r. 34.

Kurkem: /korkem/ bwj. **1.** ocaxkor, malmîrat mehrûm. **2.** perîşan reben, belengaz. *Bi mêranîya xwe hêsîrên kurkem ji destê esker xelas kir.* HW, r. 79.

Kurkvedan: /korkveda:n/ l **1.** kurk ketin, kurk vedan, rûniştina mirîskan a ser hêkan. **2.** qurp ketin, li cihekî zêde rûniştin. *Qijikekê kurk vedabû.* KR, r. 154.

Kurm: /korm/ nd/m **1.** kûre. **2.** kuçik. **3.** argûn. *Sergîn top dikir, kurma êgir lê dikir.* ŞK, r. 11.

Kutan: /kʰota:n/ l **1.** lêdan. **2.** lêxistin. *Merivek tunebû wekî Kerem nekuta.* KR, r. 25.

Kute-kut kirin: /kote kot kırım/ l **1.** axaftina zêde û ya nerazîne kirin. **2.** di ber xwe de himehim kirin. *Yê ku dikirne kute-kut destxwe da ker bûn.* ŞK, r. 143.

Kûvî: /kʰu:vi:/ rd **1.** kovî, kohî, çîyayî. **2.** hov, bîyanî(mec.) *Ji mal kovî bûye.* KR, r.66.

Kûxnî: /kʰu:xni:/ nd/n **1.** kuxnî, xanîyê malê, li gunda avahîya derveyî malê ya ku tê de tendûr û kuçik heye û xwarin tê de dihê pijîn, pêjgeh mitbex. **2.** xurekxane, aşxane. *Kûxnî dîsa tijî cînarê wan bibûn.* ŞK, r. 39.

Kûz: /k^hu:z/ nd/n **1.** kûp, cêr, misîn, dîz. **2.** xum, xumalîk: cêra mezin a li ser milan dihê danîn. *Bi dest xwe da ava kûz li ser rûyê wê direşîne.* HW, r. 31.

Kûzîn: /ku:zi:n/ l **1.** kûze-kûz kirin, zûkîn, zûke-zûk kirin. **2.** kastinî, kaste-kast kirin. **3.** kazîn, kazekaz kirin. **4.** ewtîn, kewtîn, rewitîn, reyîn. *Kelbekî kire kûzîn pêşîya wî da hat.* KR, r. 70.

L

Laçik: /la:tʃik/ nd/m **1.** serpoşîya spî ya serê jinan. **2.** temezî, cureyekşara serê jinan. *Cî bi cî laçikên xwe dikişînin ser rûyên xwe...* HW, r. 261.

Lalome: /la:lo:mə/ rd **1.** lalî. **2.** tatî, têkçûna şîyana axaftinê. *Lalome ser zimanê min da tê.* KR, r. 16.

Lape: /la:pə/ h **1.** lap. **2.** herî. **3.** gelekî. *Kinc li me lape peritî bûn.* ŞK, r. 62.

Lê çawa: /le:tʃ^ha:wa:/ h **1.** helbet. **2.** tabîkî. –*Dêmek ewên Çemê Firet re derbas bûne peyayên me bûne êdî?* –*Lê çawa.* HW, r. 73.

Lema: /ləma:/ g **1.** loma, lew, lewma, lewra. **2.** ji bo wê yekê, bona wê yekê, sa/seba wê yekê. *Ewê bext û mirazê Kerem û Zeytûnê pozmiş ke, lema jî beşera wê her cara xweş dibû.* KR, r. 103.

Lêmişt: /le:mɪʃt/ nd/m **1.** sêlavk, sêlav, seylav, lehî, avrabûn. **2.** lêken, lêkend, laser, lêser, lêmişt. *Bi baranên payîzê bûbû herrî, zix, av û lêmişt.* HW, r. 83.

Lengerî: /lengeri:/ nd/m **1.** derdana pehn a mezin, sinî. **2.** legan, tasa ku ji paxir çêbûyî ya birinc a mezin lê ne zêde kûr. *Mehrûman lepên xwe di nava lengerîyan da dikirin.* HW, r. 358.

Lêp: /le:p/ rd/nd **1.** dekûdolab, dolavî, dekbazî, xapînok. **2.** fen û fût, fendar. *Hey gidî, hey dinyaliga lêp- ev xeber di ber xwe de got û qelûna xwe gur kir.* HW, r. 112.

Lêpokî: /le:poki:/ nd/m **1.** oyînbazî, sextekarî, komêdî. **2.** henek, laqirdî, tirane, tinaz. ...*Tevî hevalan li malan bigerim laqirdîyan bikim, lêpokîyan bikim.* HW, r. 161.

Lexleme: /ləxləmə/ nd/m **1.** qelebalixîya zêde. **2.** cemawer, girse. *Heta nîvê şevê cim'et mala Perîşanê da bû lexleme.* KR, r. 193.

Lêzim: /le:zım/ nd/nt **1.** xizm, mirov, eqrebe. **2.** xêzan, malbat. Gundê wan, cînar, lêzim dihatine bîrê. KR, r. 85.

Li ber berê reş bûn: /lɪ bɛr bɛrɛ: rɛʃ bu:n/ bwj. **1.** li ber kevirê reşbûn, reben û perîşan bûn. **2.** gelekî feqîr û şepirze bûn. *Apê te yê 'ese ji xwe ra kinca bikire, ez î ne li ber berê reş im.* KR, r. 21.

Lilîn: /lɪlɪ:n/ l **1.** lîlan, lîlandin. **2.** bi tilîyan dengê tilîlî kirin. **3.** stirandin. **4.** lûbandin. **5.** lalijîn. *Wexta xeber dida te digot zengilek e ku xwe hala ra dililîne.* KR, r. 43.

Lingê gerê nayê bin berê: /lɪŋgɛ: gɛrɛ: na:jɛ: bɪn bɛrɛ:/ gp. **1.** Mirovên xebatkar, nikarin teralîyan bikin. **2.** xuya mirovî her çi be ew e, naguhere. *Eynî ên ku ji were gotine lingê gerê, nayê bin berê.* HW, r. 39.

Lingekî zûtir: /lɪŋgɛkʰi: zu:tʰɪɾ/ bwj. **1.** di demeke zûtir de. **2.** bi lez. *Me dajot ku bi lingekî zûtir bigihêjine qonaxa xwe.* HW, r. 57.

Lipitîn: /lɪpʰɪti:n/ l **1.** libitîn. **2.** livîn. **3.** perpitîn. *Ez dam nav xwe birim, qe nehîştin ez xeber bidim yan cîkî da bilipitim.* ŞK, r. 111.

Liv: /lɪv/ nd/nt **1.** lib, dane, heb, hew. **2.** dendik, tov, toxim. *Livê porê sêrek ancax li ser serê wî dihatine qîşirandinê.* KR, r. 7.

Lod: /lo:d/ nd/m **1.** kom û tûmên mezin tiştan, part, pilûr, kilûr, kulûr, ji piştî komkirinê tiştê ku hatiye serhevdu. **2.** dêz (loda gêha). **3.** qûç (loda keviran). **4.** delewan (loda sergînan: kelax). *Mîna lodeke gîhêye mezin saz dihate xanê.* KR, r. 177.

Loşî canê xwe kirin: /lo:ʃɪ dʒa:ne: xwɛ kɪrɪn/ bwj. **1.** Noşî canê xwe kirin. **2.** bi afiyet xwarin û vexwarin. *Mîrzo qawe loşî canê xwe dikir.* KR, r. 19.

Lotî: /lo:tʰi:/ rd **1.** qûnde, qûnder, nêrbaz. **2.** mitribên reqşvan. **3.** qeşmer. **4.** serserî, berdûş. *Me jî gotêda kî zane ew lotî kuda çû.* ŞK, r. 120.

Lûle: /lu:lɛ/ nd/m **1.** borî. **2.** amûra fûyî. *Nava şeva reş da lûleyê tivinga birq vedidan.* KR, r. 51.

M

Maç: /ma:tʃ/ *nd/m* **1.** paç, ramûsan. **2.** destikê ku cot pê dihê girtin, eleçek, elcek. **3.** destajo, dîreksiyon. *Me çetin maça cot digirt.* HW, r. 144.

Malê dinê qirêce destan e: /ma:le: dine: qire:ce desta:n ε/ *gp.* **1.** malê dinê qirêja destan e. **2.** qîmetê malê dinê tune. *Oro, malê dinê qirêce destan e.* KR, r. 80

Malîvan: /ma:liva:n/ *nd* **1.** bermalî, jina malê. **2.** endamên malbatê. *Malîvanê ovê havîna hirya xwe dibirne gola jêrîn.* KR, r. 34.

Maltenik: /ma:ltenik/ *rd* **1.** çikûs, kesê ku ji mal û pereyan gelekî hez dike. **2.** tima, desthişk, çavteng, destkurt. *Okiz, malê dinê da maltenik bû.* HW, r. 336.

Maşîn: /ma:ʃi:n/ *l* **1.** peritîn, helîn, pişirîn **2.** zîya bûn. *Belekîyê berfê maşîya bûn û xwe dabûne serê çiyayê lape bilind.* KR, r. 86.

Mefer: /mefɛr/ *nd/m* **1.** derfet. **2.** firsend. **3.** mecal. **4.** hêvî. *Ev se û kûçka meferê nadine min, wekî ez herim şeher.* KR, r. 21.

Meheskirin: /mehɛskirin/ *l* **1.** qeşab kirin, qeşawê kirin. **2.** qeşawî kirin, (mehes qeşawî: şeyê hespan e). *Hesp rind mehes kirin.* HW, r. 317.

Melisîn: /mɛlisi:n/ *l* **1.** wekî lîsînê ye lê ne lîsîn e. **2.** ji tirsêçokvedana balinde yan jî mirîşkan e. *Mîna mirîkeke nexweş melisî bû.* KR, r. 37.

Mêlîta: /me:li:ta/ *nd/m* **1.** melîde, molîde, alavên êgir, pêtên êgir. **2.** mêlede, meşale. *Mêlîta alavê davîte ezmîn û nava wê da.* KR, r. 184.

Menegî: /menegi:/ *nd/m* **1.** managî, mi'în. mehîn, mahîn, hespa mê, **2.** madyan, bergîr, hespa ji bo baran. *Tu dibêjî qey kihêl û menegî ye...* HW, r. 270.

Merek: /mɛrɛk/ *nd/m* **1.** kadîn. **2.** avahîya ku alifê sewalan tê de dihê parastin. Ev peyv ji zimanê ermenîkî ketiye devoka Serhedê.²¹¹ *Qulçekî merêkê gîha tê da hebû.* ŞK, r. 11.

Meriva tirê: /mɛriva: tɪrɛ:/ *bwj.* **1.** mirov her dizane ku... **2.** heçko, qey, te bêjî qey... *Meriva tirê, bereke gulavtûnkirî ye mezin li temamîya zozanê raxistiye.* KR, r. 48.

²¹¹ Têmûrê Xelîl, g.n.b., r. 5.

Merkev: /mɛrk^hɛv/ nd/m **1.** ker. **2.** merkeb, cureyek ji selikên mezin. *Wana her sibe dîzê qatix avîtine ser pişta merkeva birine bajarê Îdirê fîrotine.* KR, r. 15.

Mêşe: /me:ʃɛ/ nd/n **1.** rêl, rihêl, daristanên biçûk. **2.** dehlûdirr. *Yekî cab da me, wekî qazax ber bi mêşe direve.* ŞK, r. 132.

Meşk: /mɛʃk/ nd/m **1.** ‘eyarşîrk, derdanka ji postê sewalan tê çêkirin ku pê tiştên wekî şîr tîn kilîn. **2.** dewkil, amûra kilînê. **3.** sirsûma ji post. *Ber derê çend mala meşk li sêpîya va dardakirî bûn.* KR, r. 45.

Mêşok: /me:ʃo:k/ nd/m **1.** xurc. **2.** çente. **3.** têr, çewal, tûr. Ev peyv ji zimanê rûsî ketiye devoka Serhedê.²¹² *Seydayê gazî min kir, birme mala xwe, da min mêşokekî vala.* ŞK, r. 37.

Mewicîn: /mɛwɪdʒi:n/ l **1.** di xwînê de gevizîn. **2.** pêlvedean. **3.** pingirîn, gewinîna avê ango li cîhekê da kombûna avê. *Serbilind sekinî, li ber celadê xwe yê di xwîna mirov de mewicî.* HW, r. 394.

Midas: /mi:da:s/ nd/n **1.** cil û berg, kinc. **2.** sol, pêlav. *Midasê lingê wan qetîya bû, bê midas bûn.* ŞK, r. 109.

Milmilîn: /milmili:n/ l **1.** hejîn. **2.** pêldan. **3.** babûn. *Sala 1920 wexta Ûrisetê da beyraqa Oktyabirê dimilmilî...* KR, r. 15.

Milûk: /milu:k/ rd **1.** sernerm. **2.** kesê bi hêsanî bawer dike û qane dibe. *Kurê te berxekî Xwedê ye, milîk e. Meriv bêje here xwe zangê da bavêje na-na nake.* KR, r. 75.

Minabûn: /mɪna:bu:n/ l **1.** winî, undabûn, windabûn. **2.** xwe veşartin. *Ewrê li rû ezmîn mina bûbûn, stêyrk diçirûsîn.* KR, r. 39.

Minminîk: /mɪnmɪni:k/ nd/nt **1.** mînmînik, kerkene, perpereng, pîrpîrînk, perperik, perperînek, perperok, pepûle, pelatînk, belatînk, pelîtank, bilbilîtank, belbelîtank belatînk, belîtang, pinpinî, pinpinîk, pînpînik, perwane. **2.** baperrîk, îdîdok, papîk, pelpelîsk, pîlpilîng, pîtanok, mînik, pîrik, tîftolok, melmelok. *Minminîkê heywan xwe li ronayê girtine.* KR, r. 74.

²¹² Qanatê Kurdo, **Ferhenga Kurdî-Rûsî**, Neşîrxana Dewletê ya Ferhengêd Zimanê Miletêd Dereve û yê Sovêtîstanê, Moskova, 1960, r. 534.

Mirtoxe: /mirt^ho:xɛ/ nd/m **1.** cureyêke helawê, **2.** hewle, helaw. **3.** arxavk. **4.** ardole. *Wexta serê pêz diketê, her kurmançekî zadê serê pêzê xwe çê dikir. mirtoxe û kuloç.* ŞK, r. 54.

Misîn: /misi:n/ nd/n **1.** kûzê avê, cêrê avê. **2.** kûp. *Misînê avê û sawûn di dest de pêjgîr li ser milan...* HW, r. 68.

Miştik: /miştik/ nd/m **1.** pîpo, qelûn. **2.** devika ku dikeve serê cixareyê. *Palas avête alîyekî û qutîyek û miştikek deranî.* HW, r. 310.

Mitanebûn: /mita:nɛbu:n/ l **1.** temenebûn. **2.** li ser pîyan rawestîn. *Ber beg mitane dibûn, heta ew rûdinişt.* KR, r. 20.

Mitheyîrî: /mitheji:ri:/ h **1.** heyr û hijmekarî. **2.** matbûn, mitbûn. *Mitheyîrî li mêzanên xwe yên teze dinêrî.* HW, r. 270.

Miyaserbûn: /mija:sɛrbu:n/ l **1.** meyser bûn. **2.** serkeftin, gihîştin armancê. **3.** pêkhatin. *Mizginî da wî ku hemû tişt miyaser bû.* KR, r. 80.

Mufte: /mufte/ rd **1.** mifte, belaş. **2.** bêpere, bêheq, herwe. *Kerem mufte diçû ber pêz.* KR, r. 75.

Mukurîya yekî kirin: /mukori:ja: jeki: kırım/ bwj. **1.** bêrikirin. **2.** xema yekî xwarin. **3.** tefekurîya yekî kirin. *Niha ew çûye kur mukurîya wî dike.* HW, r. 329.

N

Nanê loş: /na:ne: lo:ʃ/ nd/m **1.** nanê lewaşe, cureyekî nan e. **2.** nanekî tendûrê yê tenik, zirav û nerm e. *Lengerî bi savêr çilk bi ser nanê loş da dirijîya.* HW, r. 68.

Nanê xwe genimî kirin: /na:ne: xwɛ genimi: kırım/ bwj. **1.** ji xwe re derfet çêkirin, karê xwe bi yekî dan kirin. **2.** pêkolîkirin: xwe zêde şîrîn kirin, şalûsî, çaplûsî, seypesanî kirin. **3.** kûtxurî, kûtxwerî. qûnalêsî. *Him dikete çêvê beg him jî bal Keleşê rîspî nanê xwe genimî dikir.* KR, r. 80.

Nanoziko: /na:no:ziko:/ h **1.** ne têr ne birçî. **2.** xebata ku tenê bi kêrî ziktêrîyê tê. *Elî bîst sal in bi nanoziko dixebite.* KR, r. 24.

Navmil: /na:vmil/ nd/m **1.** beşek ji laşê mirov ku dikeve nava milan û li pişt merivan e. **2.** pişt. *Hemîd beg apincîyê xwe davîte navmîla xwe.* KR, r. 20.

Navnêrî: /na:vne:ri:/ nd/n **1.** di çêreyê de beşa ku bejn diavêje û tov digire, şaxa pincarê ya ku tov tê dê ye. **2.** bistî, aj, zîl, zîlik, terh. *Mendikê, tirşo û pincara mayîn navnêrî dabû.* ŞK, r. 100.

Ne bi lezê, ne bi bezê kes nagihêje tu mirazê: /ne bî leze: ne bî beze: k^{hes} nagihê:ze t^ho mîra:ze:/ gp **1.** bwj. lezê dereng ketê. Hincaran mirov bi lezkirinê ve jî dereng dimîne. **2.** gp. Xudanê lezê her poşman e. Gotina gotîyan e: “*Ne bi lezê, ne bi bezê kes nagihêje tu mirazê*”. HW, r. 28.

Nedîr: /nedi:r/ nd/m **1.** şemal, **2.** ronahî. **3.** şewq. *Şems nedîr da.* KR, r. 84.

Nemam: /nema:m/ rd **1.** mirovê xaîn û nepak, bîyanî, **2.** sîxur, qumsî. *Ew mêrê mêrxas ji gulleya nemamekî hate xarê.* HW, r. 72.

Nemamî: /nema:mi:/ nd/m **1.** kosetî, hîlekarî. **2.** îxanetî. **3.** fen û fût, xap. *Hemze çî kiriye wekî wana nemamîya usa jê ra kir.* KR, r. 88.

Nemirnejî: /nemırnezi:/ rd **1.** nîvbirçî, nanoziko. **2.** halê rebentîyê. *Mîna pîreke nemirnejî pirçûyê xwe kiribû.* KR, r. 65.

Netê: /nete:/ rd **1.** betal. **2.** nerast. **3.** nederbasdar. *Gelle îçk dixwarin, qumbar dilîstin û şixulêd mayîne netê dikirin.* ŞK, r. 94.

Nevîçirk: /nevi:tʃrk/ nd/nt **1.** nevîyên zarokê kesekî. **2.** nevîçirçirik, nevîyên nevîyê kesekî. *Bila neví, nevîçirkên te bêne dewsa te.* HW, r. 39.

Niçandin: /nitʃ^{ha}:ndın/ l **1.** zextandin. **2.** pîzandin. **3.** dexşandin. **4.** Bi tilî yan jî çevan nuquçandin. *Perîşanê niçandîbû wî ku ew rabe.* KR, r. 24.

Nikisîn: /nik^hisi:n/ l **1.** ji bêtaqetîyê li ser çongan rûniştin. **2.** te‘isîn, likumîn, ji ber astengîyekî hevsengîya xwe winda kirin. *Telebext ra ser zinarekî nikisî.* KR, r. 190.

Nişkê va: /niʃke: va:/ h **1.** taviî. **2.** xirp, **3.** ji xafil da, xepe-xep. **4.** derbekê ra, **5.** bêwext. *Zurbe nişkê va banz da ser xwe.* KR, r. 84.

Nivatîn: /nıva:tın/ l **1.** nehvirandin. **2.** lobandin, lorandin. **3.** nalîn. *Ewê bilûrê kul û derdê kal bavê xort nivatibû.* KR, r. 25.

Nivîşk: /nıvi:ʃk/ nd/n **1.** cureyekî rûn. **2.** donê esîl. *Annayê textekî bi gotina te amade kir, êdî çî bibêjî li ser tunebû: goşt, kalbas, penêr, rûnê nivîşkî...* HW, r. 323.

Nolanî: /no:la:ni:/ d **1.** notlanî, notila, notla, nola. **2.** mîna. **3.** fena, weke, wekî. *Nolanî kareke xezelan çing dida.* HW, r. 51.

Notlanî: /not^hla:ni:/ d **1.** notila, notla, nola, nolanî. **2.** mîna. **3.** fena. *Kese notlanî kurmanca –mêl, dêwêr, xweyke tunne.* ŞK, r. 53.

O

Olam: /o:la:m/ nd/n **1.** karê ku bi zorê û bêpere dihê kirin. **2.** nokerî. **3.** xulamî. *Yê ku nedîçûne olama bega, ew merî dihatne kutanê.* ŞK, r. 60.

Ormix: /o:rmix/ nd/m **1.** çîm, çîman, çîmenge. **2.** pûş pelaş, gîha. **3.** pincar, şînkayî, heşînayî. **4.** çayr. *Wan dera cure-cure pincar, kulîlk, ormex û tiştên mayîn lê şîn dibe.* ŞK, r. 53.

Orxe: /o:rɣɛ/ h **1.** çargavî. **2.** bi lez revîna hespan. *Mehîna boz wisa orxe dimeşîya her Xudê bizanibe.* HW, r. 57.

Oxirme: /o:yırme/ rd **1.** rojên dijwar, zehmetî û tengasîyê. **2.** rê. **3.** rêgirtin, pêşîgirtin, pêşîgir, rêbir. *Di nava wan de mêtên oxirmeyên giran Keşîş Polo...* HW, r. 70.

P

Pa: /p^ha:/ nd/m **1.** qat. **2.** car. *Çewa malê wan ber bi zozana eşq-şayî diçe şaya wan du pa dikir.* ŞK, r. 57.

Padval: /p^ha:dva:l/ nd/m **1.** binmal, jêrmal. **2.** jêrxan. **3.** serdeb/serdab (tunel). *Ev peyv ji zimanê rûskî ketiye devoka Sehedê.²¹³Çiqas qerewîlêd wan hebûn me girtin, dest pê girêdan, avîtne padvala.* ŞK, r. 132.

Paldan: /p^ha:lɔ:n/ l **1.** raketin, razan. **2.** xwe spartin tiştêkî. **3.** xwe li ser tiştêkî dirêjkirin ji bo bêhnvedanê. *Ewî ser textekî hişk paldabû, li niqitkeke arîkê dinhêrî.* KR, r. 50.

²¹³ Qanatê Kurdo, b.n.b., r. 585.

Papax: /p^{ha}:p^{ha}:x/ nd/n **1.** cureyek kum. **2.** kumê gulover ku berê mezinan dida serê xwe. *Şibli papaxê qewacîxî kevn ji serê xwe êxistibû.* KR, r. 87.

Par ra: /pa:r ra:/ h **1.** paş va, ji paş va, ji şûnda, ji şûnva, ji şûva. **2.** li pişt, paşî, piş, ji pişt. *Wê ji serê wê parra dehf da û kir ku dê here.* HW, r. 148.

Paşil: /p^{ha}:şil/ nd/m **1.** paxil, hembêz, pêsîr, sîng. **2.** kûn, gonicik, cihê veşartinê. *Karê mektûba ku hanî kire paşila xwe, dîsa hate hundir.* DD, r. 47.

Payê yekî dayîn: /p^{ha}:je: yeki: da:jîn/ bwj. **1.** peyê yekî dayîn, pesandin, pesnê yekî dayîn. **2.** qenc dîtin. *–Hevalê Şbak her gav payê te dide.* ŞK, r. 137.

Pêberjêr: /p^{he}:berze:r/ h **1.** ber ve jêr. **2.** sereberjêr, serberjêr, nişîv. *Em pêberjêr bûn ber bi mala Apê Moskov.* HW, r. 45.

Pêçira: /pe:t^hira:/ nd/m **1.** çirapê, şemaldank, tasa ku çira û lembe tê de dihê danîn. **2.** mûmdank. *Diya min çiraya don vêxist û danî pêçirayê.* HW, r. 129.

Pêge: /p^{he}:ge/ nd/m **1.** pêgeh. **2.** destav. **3.** şiverê. *Gele rê û pêge pêşîya me derdiketin.* ŞK, r. 82.

Pêhevrazî: /p^{he}:hevra:zi:/ h **1.** bi pêyan ber ve hevraz(jorê) çûyîn. **2.** ber ve hevraz, ber ve jor. *Kerem mîna xwe her car pezê gundîya hêdî-hêdî pêhevrazî topê fêza gund dikir.* KR, r. 189.

Pêjek: /pe:zek/ nd/m **1.** gul û gîhayeke xwerbar e. **2.** hiso, so. *Çîyayên Sînekê xemilbûn bi gul û gîha, so û pêjekan, sosin û rihanana.* HW, r. 269.

Pekîn: /peki:n/ l **1.** hilpekîn. **2.** pengizîn. **3.** jêfirîn. *Solê hespan li keviran diketin, carna prîsk ji ber wan dipekîyan.* KR, r. 52.

Pêl: /pe:l/ nd/m **1.** heyam. **2.** dem. **3.** kêlik, bîsk. *Eskerekî pêla han min ra got wekî Bolşêvîk dibê em herin romê qir kin.* ŞK, r. 111.

Pel: /p^{he}l/ nd/n **1.** kevirê avêtênê bo kesekî wekî hît. **2.** xilxile, cihê zinar û kevir û kuç. **3.** belgên daran. *Ez dame ber qamçîyan, pihînan, pelan.* MR, r. 14.

Pelemîskî: /pelemiski:/ h **1.** bipêlemîsk, bi dilop, çilk, **2.** şirş, bi awayêpijîkîna tiştên wekî av û xwînê. *Xwîna sor pelemîskî avête ser çevên mêrkuj.* HW, r. 394.

Pelex: /p^hɛlɛx/ nd/m **1.** palax, bermayîyên dar, pûş û belgan. **2.** gîhayeke ku li cihê avî şîn dibe. *Me danî pelexa rinde nerm radixist.* ŞK, r. 17.

Pelikandin: /pɛlɪka:ndɪn/ l **1.** pelikîn, ji yekî yan jî ji tiştêkî tirsîn. **2.** dexisandin, beheçandin, rikê xwe kutan yekî. *Ji bavê dipelikand û ew çî ku dikir bi dizî ji bavê û apê dikir.* HW, r. 363.

Peltik: /p^hɛltɪk/ nd/m **1.** refa di dîwêr de, çavîya wekî paceyekî di dîwêr de bi taybetî xanîyên berê wisa bûn. **2.** di xanîyên berê de paceyeke biçûk a di navbera odeyan de. *Xwe bi lez davêje kîlerê wekî şeşxaneyê ji peltikê derxe.* HW, r. 107.

Pênze: /p^he:nzɛ/ nd/m **1.** ponze, ponza. **2.** kevirê kefik, kevirê mirî. *Min gerekê ew kevirê pênzê hûr top bikira.* ŞK, r. 80.

Pêpar: /p^he:p^ha:r/ rd **1.** saxlemî, şênayî, **2.** berxudarî, xêr û xweşî. **3.** pêpal, yom, qudûş, şans, bext. *Pêparê bûka min şukir bi xêr e.* HW, r. 149.

Pêpeling: /p^he:pɛlɪŋ/ nd/m **1.** nêrdevan. **2.** pêlekan. **3.** pêpelûk. *Ewî lingê xwe pêpelinga da avît.* ŞK, r. 12.

Pêpesbûn: /pe:pɛsbu:n/ l **1.** pelixîn, pelçiqîn, pirçiqîn. **2.** tepisîn. *Êlên me yên rengîn tamam pêpes dibûn.* HW, r. 41.

Pêqask: /p^he:qa:sk/ nd/m **1.** pîqazk. **2.** gîhayeke xwerbar e. *Qîz û bûk diçûne Gelîyê Kevokan dianîn pincarên wekî pêqask û qenzîl, so...* HW, r. 241.

Perekende: /p^hɛrɛkɛndɛ/ rd **1.** peregende, ne rûkûpêk, belawela. **2.** firotina parçeyî yan jî yeko yeko. *Erdê me tune bû, eme perekende bûn, me bi gavantîyê xwe ra derbas dikir.* ŞK, r. 72.

Pêrenc: /p^he:rɛndʒ/ nd/m **1.** pêrênc, zehmetîya pê. **2.** heqdest. **3.** pere û xwarina ji bo rêwîtiyê. *Min ji destê wê girt torbek, kaxizek û sê şeyî-pêrenca xwe.* ŞK, r. 37.

Peritîn: /p^hɛrɪti:n/ l **1.** çirrîn, piç û parî bûn. **2.** zîtolbûn. **3.** gincirîn, dirîn. **4.** ji ber kevnûn yan jî zextê qetîn. **5.** maşîn. *Laşê wan digirt davête Gelîyê Qetlê ku dehbe wan biperitînin.* MR, r. 13.

Pesarî: /p^hesa:ri:/ nd/m **1.** rêxa heywanan a li çolê û beyar hişkbûyî. **2.** sergîn, kerme, keşkûr. **3.** mirovên hov û prîmîtîf an jî nebajarî, tişta bîyanî. *Her du carîye pesarî didane hev û davîtine tûrê xwe.* KR, r. 78.

Pêşe: /p^he:ʃe/ nd/n **1.** pîşe, pisporî, hostekarî, sinhet. **2.** kar. *Tu bi xebata xwe bi şuxulê xwe, bi nehêvşandina xwe didî kivşê wekî şer tenê pêşê mêran nîn e.* DD, r. 34.

Pêşekzan: /p^he:ʃekza:n/ nd/nt **1.** pêşezan, pêşekar. **2.** kesê pispor. *Zarên bêdê û bav mezin bûne ber firê ketine, bûne pêşekzanên curbicur.* DD, r. 41.

Peşkeguro: /peʃkeɡuro:/ nd/m **1.** lîstikeke zarokan e ku temsîla şivan, pez û gur dike. **2.** Ev lîstik bi komeke pênc-şeş kesan ve dihê lîstin. *Zara, peşkeguro dilîstin.* KR, r. 59.

Pêwr û mêzîn: /pe:wɾ u: me:zi:n/ nd/m **1.** pêr û mêzîn, pêvir, stêrk. **2.** navê komeke stêrkan e. **3.** stêrbano. **4.** stêrkaqurixê, stêrka bakur, stêrka cemserê. *Stêyrk diçirûsîn, pewr û mêzîn û komika sêwîya gihîştibûne orta ezman.* KR, r. 39.

Pêyê xwe guhê xwe xistin: /p^he:je: xwe gohe: xwe xistin/ bwj. **1.** pê li guhê xwe kirin, ji maf û zerengîya xwe zêdetir pêş da çûyîn. **2.** ji heddê xwe derbaskirin. *Ûmnov pê xwe guhê xwe dixê, miqabilî qeyde qanûnê dewletê ye.* KR, r. 155.

Peyî: /peji:/ bş **1.** baneşaneke wekîmatmayînê ya pîl ye. **2.** heylo. *Peyî, tiştê wisa mekî!* HW, r. 56.

Peyn: /p^hejn/ nd/n **1.** zibil. **2.** bermayîyên hişkbûyî yên ji rêxa sewalan. Peyva “peyn” ji zimanê ermenîkî ketiye devoka Serhedê.²¹⁴ *Bin cîyê wan peyn û kurçom lê bireşanda.* ŞK, r. 35.

Pî: /pi:/ bş **1.** baneşanek e ji bo heyîrîn û matmayînê. *Pî, la porê min kurkurê, tu çi dibêjî?* DD, r. 89.

Pîçke: /pi:tʃke/ nd/m **1.** spîçke. **2.** kibrît. **3.** şixatik, şixat, çixatik, çixat, **4.** niftik, pêtik, pitik, bitik, şemçe, ezwaz, bitik, derbik. Peyva pîçke (spîçke) ji zimanê rûskî

²¹⁴ Garnik Asatrian, **Ferhenga Kurdî-Êrmenî Êrmenî-Kurdî**, Republic ya Armenianê Mînistirtî ya Diyasporanê, Yêrevan, 2016, r. 322.

ketiye devoka Serhedê.²¹⁵*Xelqê diçû Qersê nift, sabûn, pîçke û xwê dianî.* HW, r. 331.

Pifi serî kirin: /p^hifi: seri: kırım/ *bwj.* **1.** daxwaz û fikrên xwe pê dan bawerkirin. **2.** niçilandin, telqîn kirin, ranavîş, ranavtin, fikr bi yekî enjekte kirin. *Hineka pifi serê wî kiriye û ew gerekê wan jî bivînin.* KR, r. 101.

Pîgar: /pi:ga:t/ *nd/nt* **1.** komekdar, alîkar. **2.** hevpişk. **3.** kesê ku zozanek kirî be yan jî kirê kiribe yan jê berpirsyar e. *Serê çîya pîgar kivş bûn, kesîba jî pezê xwe coltî da dewletîya.* ŞK, r. 55.

Pîgartî: /pi:ga:rti:/ *nd/m* **1.** pîgarî, piştewanî, hevkarî, hevaltî, dostanî. **2.** hevpişeyî, hevkarîya hevpişeyan, hevkarîya heman çîna civakî û sîyasî. *Pîgartîya pale û gundiyan bigihîne kurdê xebatkar.* KR, r. 60.

Pîjîn: /pi:zi:n/ *rd* **1.** tiştê wekîpîj yan jî ji pîj. **2.** tîj, tûj. *Pozê pîjîn çe 'vê hêşîn va hev ra şer bûn.* KR, r. 43.

Pînc: /p^hi:ndz/ *nd/n* **1.** bîj, bîjî, bîje. pîç. **2.** heramzade. *Pîncê Hemîd Begê, pîr û rûspî îsafa wî daqurçandibûn.* KR, r. 43.

Pincar: /p^hindza:r/ *nd/m* **1.** hemû gihayên xwerbar. **2.** şînkayî ku mirov dixwin, bo mînak: siping, silq, kereng, mendik, qûlik. Ev peyv ji zimanê ermenîkî ketiye devoka Serhedê.²¹⁶*Ew û xûşka xwe çûne pincarê.* HW, r. 262.

Pirçûkirî: /pirtʃu:kiri:/ *rd* **1.** pirçî, pirçîkirî, mirûzkirî. **2.** mehdnexweş. *Ez êmê pênc deqa pirçûkirî mam.* ŞK, r. 127.

Pirpişî: /p^hirp^hiʃi:/ *rd* **1.** pişpişî, nepixî. **2.** kirkişî. **3.** perçifi, perçivî. *Qerewilê hûr qalin î pirpişî qeme tezî ser Hemze ra digirt.* KR, r. 73.

Pirpişîn: /p^hirp^hiʃi:n/ *l* **1.** hilatina tiştên wekî hevîr. **2.** ji ber tirşbûnê kirkişîna/kişkişîna qatix (mast). **3.** nepixîn, pimpişîn. **4.** hilpişîn, qepişîn, poxpoşîn. *Mîna qatixê tirş pişî bû.* KR, r. 180.

²¹⁵ Têmûrê Xelîl, “Gotinên Rûsî Ku Derbasî Kurmancî Bûne”, *Kovara Kurmancî*, j. 43, 2008, r. 1-2.

²¹⁶ Auguste Jaba; Ferdinand Justi, “پنجار”, in *Dictionnaire Kurde-Français*, Imperial Academy of Sciences, Saint Petersburg, 1879, r. 82.

Pirpitîn: /p^hɪrp^hɪti:n/ l **1.** leqîn, hejîn û livîn. **2.** lebitîn, hereket kirin. *Karê mîna kara xezala beyanî di hêza wî da dipirpitî.* DD, r. 31.

Pirsdayîn: /pɪrsda:ji:n/ l **1.** jêpirskirin. **2.** pirskirin. **3.** behskirin. *Min texmîn nedikir ku ew ê pirsê bide min.* HW, r. 26.

Pirtî: /p^hɪrti:/ nd/n **1.** pirtû, qumaş, pertal, manîfatûra. **2.** pate, parçeyek ji qumaşî. **3.** pîne. *Xelqê diçû Qersê nift, sabûn, pîçke, xwê û pîne dianî.* HW, r. 331.

Pişt jê histandin: /pɪʃt^h ʒe: hɪs t^ha:ndɪn/ bwj. **1.** li hemberî yekî firsend bi dest xistin. **2.** pişt lê şikandin, têk birin. *Min kûçeke din da pişt jê histand, da ber gulla.* ŞK, r. 134.

Pizî: /pɪzi:/ nd/m **1.** doxîn, navran. **2.** lastîka kincên wekî şal û derpî. *Hemze, kîskê titûnê yî pizîkirî ji cêva xwe derxist.* KR, r. 51.

Poça mişkekî malê da ar negirtin: /po:tʃa: mɪʃkɛki: ma:le: da: a:r nɛgɪrtɪn/ bwj. **1.** boçîka mişk di malê de bi arvan nebûn. **2.** boçê mişk di malê de bi ard nebûn, bîna bişkulekê li ber derê yekî nebûn, gelekî xizan û feqîr bûn. *Poça mişkekî mala we da ar nagire, bîna bişkulekê be derê we nayê !* KR, r. 152.

Polk: /p^ho:lk/ nd/m **1.** lîwa, alay û komika leşkerî. **2.** binkeya leşkerî. **3.** buxtan. *Polkeke qazax hat wê derê, danî nêzikî zavodê.* ŞK, r. 81.

Poperîşk: /p^ho:p^hɛri:tʃ^hk/ nd/m **1.** poperîşk, por, bisk. **2.** damûsk. **3.** bijî, dêlbijî. *Belgîzarê poperîşkê xwe verûbû.* KR, r. 40.

Pormijî: /p^ho:rmɪzi:/ rd **1.** posîde, xemgîn, **2.** zîz (hestiyar). **3.** dildax, dilxem, dilkovan, dilkul. *Karê li ser kursî ker-lal, pormijî rûniştibû.* DD, r. 35.

Posîde: /p^ho:si:dɛ/ rd **1.** xemgîn, poşman, pormijî, **2.** dilkovan. *Cimaeta xebatkar pê ra şad dibû lê ya miftexur posîde dibû.* MR, r. 74.

Poxîn: /p^ho:xi:n/ nd/m **1.** qawût, qawit, qawîtk. **2.** genimê qelandî û hêrandî. *Kubar torbeyê poxîn li piştê, kûpê avê di rex da...* HW, r. 387.

Prîsk: /p^hri:sk/ nd/n **1.** çirîsk, çirûsk. **2.** çikên agirî. **3.** qitîsk. *Solê hespan li keviran diketin, carna prîsk ji ber wan dipekîyan.* KR, r. 52.

Pûlêmyot: /p^hu:le:mjo:t/ *nd/m* **1.** pûlêmot. **2.** mîtralyoz, sîleha otomatîk û makîneyî. *Xirminîya pûlêmyota ew newal, çîya û best tev hilanî.* ŞK, r. 83.

Pûng: /pu:ng/ *nd/m* **1.** pûjan, pûjna, anix, tihtavik, gîhayeke zêdetir li ber devê cem û kanîyan şîn dibe. **2.** bi erebî ji vî gîhayî re “نعنع” ango nane. *Qîz û bûk diçûne Gelîyê Kevokan dianîn pincarên wekî pêqask û qenzîl... pûng û cetirî, xîlok...* HW, r. 241.

Pûrt: /p^hu:rt/ *nd/m* **1.** mû, pirç, por. **2.** tivtik, rîs, Ev peyv ji zimanê ermenî ketiye devoka Serhedê.²¹⁷. *Ji Gelî Pûrto birek siwar derketin.* HW, r. 152.

Q

Qalmeqalm: /qa:lmεqa:lm/ *nd/m* **1.** qîreqîr, qareqar, qîjeqîj, qûjinî. **2.** heytehol, **3.** hêwirze. **4.** lemelem, galegal. *Bûbû qalmeqaleke usa ku te digot çiqas şivanê wê zozanê hene...* KR, r. 27.

Qar: /qa:r/ *nd/m* **1.** qusûr, kêmasî, sûc. **2.** zîyandîtin. **3.** şerm, eyb. **4.** lome, gazin. *Ew qar qara min e jî.* MR, r. 26.

Qatix: /qa:tix/ *nd/n* **1.** mast. **2.** Ev peyv ji tirkî ketiye kurdî ku rastîya vê peyvê “katik” e. *Gundîyên me yên berê niha babaxîya nakin, merdane dibêjin wekî qatix em xweyî kirine.* KR, r. 15.

Qawût: /qa:wu:t/ *nd/n* **1.** qawit, qawîtk. **2.** poxîn. *Ew hebê genim min diqeland dikire qawût.* ŞK, r. 153.

Qelax: /qɛla:x/ *nd/m* **1.** lod û qûça ji kerme, sergîn û tepikan çêkirî. **2.** qubik, qubîdank, kêşa tarên sergînan. *Li kêleka qelaxê sergînen şil hebûn.* KR, r. 45.

Qemer: /qemɛr/ *rd* **1.** esmer, rengê eqîq. **2.** hîv. *Xortekî qemer ji binpîya odeyê de pirs kir.* HW, r. 50.

Qemitîn: /qemiti:n/ *l* **1.** bi cihekê ve zeliqîn. **2.** şewitîna cilan li ber tîna êgir. **3.** germiçîn, gijilîna tiştên wekî kaxiz û cilan. *Kerî û surîyê pêz li beyara usa diqemitîn.* KR, r. 86.

²¹⁷ Têmûrê Xelîl, g.n.b., 2007, r. 5.

Qenawiz: /qena:wız/ rd **1.** qenewiz, qinawiz. **2.** kedîfeyê sor. *Belgîzar xanimê, dêrê etlez, qenawize hevt rengî li xwe kiribûn.* KR, r. 82.

Qencelîsk: /qendʒeli:sk/ nd/m **1.** xencelîsk, xîlok, xîlong. **2.** sevsêvok, sêvaxînk, sêva binerdî ya hindî. *Qîz û bûk diçûne Gelîyê Kevokan dianîn pincarên wekî pêqask û qenzîl, so û mendik, xîtik û sîrmî, qencelîsk û silmask, siping, û tirşo, pûng û ...*HW, r. 241.

Qenzîl: /qenzi:l/ nd/m **1.** hêşinahîyeke xwerbar e û bîna wê nêzikî sîran e. **2.** bi vî gîhayî tirşîn jî tê çêkirin. *Qîz û bûk diçûne Gelîyê Kevokan dianîn pincarên wekî pêqask û qenzîl, so û mendik, xîtik û sîrmî, qencelîsk û silmask, siping, û tirşo, pûng û ...*HW, r. 241.

Qepecekirin: /qep^hedʒekırın/ l **1.** rapêçan. **2.** dorpêçkirin. **3.** zeftkirin. *Wan Hemze girtin, qepece kirin, destê wî piştê va girêdan.* KR, r. 47.

Qer: /qer/ rd **1.** reş, qemer. **2.** rengê reş ê tarî. *Mîna hirîya qer hatibû nixamtinê.* KR,r. 154.

Qerçimîn: /qertʃimi:n/ l **1.** qurmiçîn. **2.** çilmisîn. **3.** qijilîn. *Sifetê Perîşanê qerçimî bû.* KR, r. 25.

Qerefîska: /qerɛfi:ska/ h **1.** qulofîska, qulofisko, **2.** qelafîsk, qerefîsk cureyeke rûniştinê ye. *Zurbe derê malê qerefîska rûniştibû.* KR, r. 85.

Qeretû: /qeret^hu:/ nd/n **1.** ji ber tarîti yan jî şevê ne'eyanbûna kesekî, xeyal û reşatîya kesekî yan tiştêkî. Ev peyv ji peyva "karaltî"ya zimanê tirkî ketiye devoka Serhedê. **2.** şikil dîdar û dîmenê reş. *Û wextekê di pêîya xwe de qeratûyek dît.* HW, r. 400.

Qerewil: /qerewıl/ nd/nt **1.** qerewîl, qerewêl, qerawil. **2.** nobedarê cih û warekî. **3.** zêrevan, leşkerê pasevan ê ku pasevanîya birc û keleyan dike. *Qerewil jî wê wan bihese.* ŞK, r. 95.

Qerqaş: /qerqa:s/ rd **1.** çîl spî. **2.** kever. **3.** pezê spî ku dora çavên wê reş in. *Kolosê Girîdaxê yî qerqaş zêr kildabûn.* KR, r. 27.

Qesidîn: /qesîdî:n/ l 1. têcihbûn, rawestîn, mayîn. 2. aliqîn, melaqbûn, pêrgîn, birbirî bûn, rastî hev hatin. 3. arestebûn. 4. serîlêdan. *Dilê Zînê fire dibû, şabûnek dilê wê da diqesidî.* KR, r. 103.

Qesirîn: /qesîrî:n/ l 1. têdaçûn, têtetin, daxilbûn. 2. derbazbûn, daborîn, têperîn. *Sawek dilê wî da qesirî.* KR, r. 99.

Qestbende: /qestbendê/ h 1. qestana, qestîka, mexsûs. 2. qazîk, qazîka. *Kenehû me qestbende qîza wê Îskender hanîye mala xwe da gihandîye hev.* DD, r. 76.

Qestîka va: /qestîka: va/ h 1. bi henekî. 2. qestûka, bi zanebûn. 3. bi hemdî. *Qestîka va digot: Herin, herin ez çi bêjim, gura min nake.* ŞK, r. 153.

Qevş: /qevş/ nd/m 1. qefş, geft. 2. baq. 3. gurz. *Dev û lêvên wî li bin qevşa simêla çûrr da telîya bûn.* KR, r. 18.

Qewal: /qewa:l/ nd/nt 1. Wazîfedarê dînî yê êzdîyan ku diçe mala mirîdan. 2. di êzdîyatîyê de mela, xetîb. *Qewal, ji berîyê hatine gunda.* HW, r. 341.

Qewaz: /qewa:z/ nd/nt 1. qasid. 2. kesêxeberan yan jî emanetan diîne û digihîne bo kesekî din. *Qewaz tamam li derê malê top bûn.* KR, r. 189.

Qicqicîn: /qîd̠z̠qîd̠zi:n/ l 1. qacqicîn. 2. qijqijîn. 3. qilqilîn. 4. *bwj*, dil û hinav xwarin, di nava xwe de qicqicîn. *Dilê min diqicqicî, min jî dixwast xeber da.* ŞK, r. 110.

Qiç: /qîç/ h 1. qîç, lehze. 2. kêlî, deqîqek, wê gavê, wê derbê. *Bi wê qiçê siwarên silêman bi kewketina sibehê re vegeyîyan nava êla xwe.* HW, r. 78.

Qiç: /qîç/ nd/m 1. qîtik. 2. ling. 3. hêt. *Ew rabû ser her du qiçê paşîn.* KR, r. 46.

Qîçik: /qî:çik/ rd 1. rengê zer. 2. zerîn. *Zarên wî werimî, rengê wî qîçik bû.* ŞK, r. 158.

Qilêr: /qîlê:r/ rd 1. qirêj. 2. gemar. 3. ne paqij. *Kolosê qilêr û dezmaleke qimer e rengkirî destê wî da ketibûne axzarê.* KR, r. 21.

Qincilandin: /qindzılandın/ l 1. xwe hev pêçandin. 2. çivyan, xwe dan hev, qilincê xwe kirin. 3. xwe kirin qonc. 4. qincilîn. *Hineka jî xwe qincilandibûn, tiştekek nedigotin.* KR, r. 95.

Qincilîn: /qindzılı:n/ l 1. ji ber serma yan jî nexweşiyê xwe guvaştin hev. 2. çingizîn. 3. qilincîn. qincilandin, xwe hev pêçîn. 2. çivîn, xwe dan hev, qilincê xwe kirin. 3. xwe kirin qonc. 4. qincilîn. *Zeynê sar bûbû, qincilîbû ser hev.* HW, r. 280.

Qinîyat: /qini:ja:t/ nd/n 1. qudûm, hêz. 2. jêhatin, şîyan. *Ew gilîgotinêd seydayê, dîya min û xûşka min, min ra bû qinîyat.* ŞK, r. 47.

Qirik:/qırık/ nd/m 1. gewrî. 2. xeneq. 3. boxaz. *Wextê gilîyê du bira ji hev derbaz dibû yanê jî cînara qırka hev digirt, Kapê Keleşê rîspî çivt disekinîn.* KR, r. 21.

Qirinte: /qırınt^he/ rd 1. navsere. 2. navsale. 3. kesê ne ciwan ne jî pîr. *Min li derî xist, merîkê qirinte yî dirêj derket.* ŞK, r. 80.

Qirme: /qırme/nd/m 1. demançe. 2. tivinga biçûk a dikare têkeve cêva merivan. *Qirmeyekê û hespekê çê ji min re hazir bike...* MR, r. 68.

Qisîl: /qisi:l/ nd/n 1. xesîl, raxistina nava malên gundan a ku ji cîl û cegên çê dikin. 2. qamîş. *Nivînê me lihêfeke mezin bû, kulavekî peritokî, du heb qisîl bûn.* ŞK, r. 17.

Qişirandin: /qıfırandın/ l 1. qeşirandin, veqetandin, cuda kirin, cîya kirin. 2. jihevkiş kirin, cudahîya tişteki ji hev derxistin. *Meriva îdî ferih dikaribû biqişiranda wekî ew sîyar in ku hespê xwe zengû dikin.* KR, r. 186.

Qol: /qo:l/ nd/m 1. şanenav. 2. îmze. *Prîstavê nehîya Qizilçeçeqê(qol).* ŞK, r.4.

Qolkişandin: /qo:lkıfa:ndın/ l 1. Nivîsîna şanenavê. 2. îmzekirin. *Gotê wekî tilîya bike nava hubrê û li binê kaxizê dayne, li dewsa qolkişandinê.* HW, r. 139.

Qor: /qo:r/ rd 1. xwar, xûz, tewandî. 2. sewalên jar. *Xên ji golika gelle pezê qor dikirine nava golika.* ŞK, r. 71.

Qudûm: /qudu:m/ nd/n 1. taqet, hêz. 2. qinyat, tewan. 3. mecal. *Evan gilîyana qudûm ber çokê Kerem da anî.* KR, r. 38.

Qulap: /qula:p/ nd/m **1.** zirze, amûra ku derî pê dihê kilîdkirin. **2.** çengel. **3.** qulmek ji kêşana cixareyê. *Di ber xwe de got û qulapek duduli qelûna xwe xist.* HW, r. 50.

Qulozbûn: /qulo:bu:n/ l **1.** rabûna ji nişkê va. **2.** hilketin, hilqoşîn. **3.** bilindbûn, berzbûn. *Kerem ji cî quloz bû.* KR, r. 38.

Qûmax: /qu:ma:x/ nd/m **1.** qumax, sitar. **2.** mal, xaneban. *Ûsiv li ber qûmaxa Keleşê Rîspî sekînî.* KR, r. 186.

Qurf: /qurf/ nd/m **1.** qutif, saw, sehm, sem, sam. **2.** tirsax, xof. *Pirsax qelen bû ku qurf kiribû dilê rîspîyê gund.* KR, r. 81.

Qurifîn: /qurifi:n/ l **1.** tewîn, xwarbûn. **2.** lemisîn, çemîn, çivîn. *Bavê te yî feqîr qurifiye, bi ser hev da hatiye, nizane çî bike.* DD, r. 65.

Qurombûn: /quro:mbu:n/ l **1.** bêpêjn û bêtevger bûn; li hev piçikîn. **2.** qonc bûn, bûn gilê, di cîyê xwe de bêdeng û bêhereket man. *Pîr, xwe kire qurom, çawa nêçîra ku çe'v li nêçîrvan dikeve.* KR, r. 68.

Qurumcax: /qurumca:x/ rd **1.** qurumsax, qurimsax, qirimsax. **2.** nemerd, pîj, telaqreş. **3.** pêzeveng, qewad, qebrax, godoş. *Qîza Hemîd Begê ya devê te ye, lo qurumcax!* KR, r. 41.

Qusês: /quse:s/ nd/nt **1.** hevrîngvan, pezbirr. **2.** qilixvan. **3.** cewêz, cewbez, cewîn, qusêk. *Der mala qusêsa pez dibirîn.* KR, r. 59.

Quvî: /quvi:/ nd/m **1.** kevî, qerax, qirax, kenar, hidûd. **2.** ne'tik, enî, alî, teref, semt. *Ber bi quvîya gund diçûn.* KR, r. 93.

Qûzbûn: /qu:zbu:n/ l **1.** xûzbûn. **2.** xwarbûn. **3.** çemandin. **4.** tewandin. *Dîna xwe da dewsa lingê me, qûz bû ser da nihêrî.* ŞK, r. 13.

R

Raw: /ra:w/ nd/m **1.** nêçîrvanî, seydevanî, **2.** şikarî. *Egîd Beg, bi xulam û xizmetkarên xwe ve çûne raw û nêçîrê.* MR, r. 25.

Raweşandin: /ra:weş:andin/ l **1.** dawêşandin. **2.** rijandin. **3.** belavkirin. *Morof pezê xwe raweşand.* MR, 12.

Recû: /rɛdʒu:/ nd/m **1.** pereyê ji alîkarîyan hatiye berhevkerin, sedeqe. **2.** pars. *Her kes diqacqicî wekî recûya wan gelekî bide.* HW, r. 343.

Refes: /rɛfɛs/ nd/m **1.** çirtik. **2.** lêdana hespan a bi lingan, derbeya bi pîyên hespan. *Mihîna serok ew heftek-dudu bû xamtî dikir, disilikî gez dikir, refes dihavêtin.* DD, r. 39.

Rengawazî: /rɛnga:wa:zi:/ rd **1.** gulgulî, rengîn, rengareng, reng-rengî. **2.** heftreng, pîrerengî. **3.** gulgûnî. *Bûkê cahilê mîna minminîkê rengawazî zendê xwe vedikirin.* KR, r. 92.

Repandin: /rɛpa:ndɪn/ l **1.** dan ber şemeqan, şerpandin, derb lê xistin. **2.** lihevtin, jendin, kulm lê dan, kutan, lêxistin. *Qewata xwe berhev nîkin, sibetêrê car din birepînin hevdu.* HW, r. 72.

Reşêle: /rɛʃe:lɛ/ nd/nt **1.** reşhêle, reşhêlk, rîşole, cîqereş, çûkreş cureyek ji çivîkên reş. **2.** reşreşk, keşûşke, zertzûr. *Te digot refê reşêleyan li ser hêşnayê danîne.* KR, r.86.

Rewş: /rɛwʃ/ nd/m **1.** xeml. **2.** bedewî. **3.** hal. *Kerem rewşa xorta bû.* KR, r. 23.

Rexte û rişme: /rɛxt^h u: rɪʃmɛ/ nd/m **1.** xemla keç û bûkan ya ku di dewatan de, kemer û rêşîyên xemlê. **2.** gerdenî. *Ji bo xemla hespan kejî, rextê û rişmeyên wan anîbû.* HW, r. 353.

Rikêvkerin: /rɪke:vkɪrɪn/ l **1.** rikêfkerin. **2.** êrîş. **3.** pelamar. **4.** hicûm. *Sefo ji cî rikêvî min kir.* ŞK, r. 91.

Risas: /rɪsa:s/ nd/m **1.** zirîç, madenek nerm e. **2.** qerqêşûr. *Ez dixwazim ber dilê wê da bêm lê cî da dibime risas.* KR, r. 16.

Rîşî: /rɪ:ʃi:/ nd/n **1.** rêşî. **2.** rih, reh, beşên binerdî yên rîwekan... **3.** gufik. *Kolosî serî, rîşîyê şe'rê li ser enîya wî da dihatine xarê.* KR, r. 17.

Rişk: /rɪʃk/ nd/nt **1.** motik. **2.** nûtik, çêçika spîyan, hêkên spîyan. *Em birçîbûn, di nava rişk û spîyan da hedimîn.* HW, r. 328.

Ritilî: /rɪtɪli:/ rd **1.** rîtolî. **2.** gincirî, dirîyayî. **3.** qulqulî. **4.** kevnbûyî. *Bereke ritilî, têreke kelêşka, du sê dest nivînê betreng, tencereke kevnê çemilkirî malê da hebûn.* KR, r. 45.

Rizadil: /rɪza:dɪl/ rd **1.** xwebexş. **2.** kesê dilxwaz. *Got welleh Cangîr Axayê Xetîb Axa herçî tivîngçîyên rizadil berhev dike.* HW, r. 371.

Robot: /ro:bet/ rd **1.** rezîl û riswa, rûreş. **2.** sosret, gosirmet. *Lê Okizê çî bêbêje, em ê bibin robot!* HW, r. 327.

Roj mîna jimara gûzan hatin û çûn: /ro:ʒ mi:na: ʒɪma: ra: gu:za:n ha:tɪn u: tʃu:n/ bwj. **1.** rojên hesabî kêm in û zû derbas dibin. **2.** wext û zemanekî hindik. *Ew roj mîna jimara gûzan hatin û çûn.* HW, r. 51.

Rojbihêrî: /ro:ʒbihe:ri:/ nd/m **1.** roja xwe derbaskirin, **2.** bi bêhnvedanê yan jî bi kêfî roj bihurandin. *Me dor bi dor qeydê rind bilûrê dixist û bîna me pê derdiket, me rojbihêrîya xwe pê dikir.* ŞK, r. 64.

Rojheq: /ro:ʒheq/ nd/n **1.** yewmîye. **2.** meaşê rojekê. *Her gav dîya min diçû mala ra rojheq dixebitî.* ŞK, r. 14.

Rot kirin û pîvan: /ro:t kɪrɪn u: pi:va:n/ bwj. **1.** rokirin û pîvan. **2.** hilanîn û danîn, li cem xwe kar û zerar hesabkirin, dan ber hev û ser hev. *Hemîd Begê rot û pîva.* KR, r. 57.

Rûhatin: /ru:hatɪn/ bwj. **1.** rîyê/rihê (yekî) hatin. **2.** rû, serçav bi pirçbûn. *Rûyê wî hatibûn, lêvê wî zîya bûbûn.* KR, r. 50.

Ruhber: /røhbɛr/ nd/nt **1.** candar, gîyandar. **2.** jîndar. **3.** zindî, zêndî. *Her ruhberê rabû pîyan.* MR, r. 15.

Ruhmal: /røhma:l/ rd **1.** diltenik. **2.** kesê dilşewat. **3.** kesê xemxur. *Kerem î ruhmal bû, wexta pezek dikulîya dilê wî dişewitî.* KR, r. 27.

Rûnêrm: /ru:nɛrm/ rd **1.** rûgeş. **2.** sempatîk. *Kurê wê kurekî zaf aqil e û rûnêrm e.* ŞK, r. 47.

Rût: /ru:t/ rd **1.** tazî. **2.** bêcil. **3.** şilf. *Paizê eme rûte-tazî bûn, me zaf serma dikir.* ŞK, r. 17.

Rûyê (yekî/tiştêkî) da: /ru:je: yeki: da:/ bwj. **1.** ji ber yekî/tiştêkî, ji ber. **2.** ji bo, sa, seba, sewa, sawa. **3.** lema, loma. *Gele cara cînar rûyê kelba da xatirê hev diketin.* KR, r. 92.

S

Salixdan: /sa:lɪxda:n/ l **1.** saloxdan, agahkirin. **2.** bûn referans, pêşnîyarkirin. **3.** wesfdayîn. **4.** behskirin. –*Hevalê Şbak her gav payê te dide, salixa didin.* ŞK, r. 137.

Sap: /sa:p/ nd/n **1.** kuleş, genim yan jî cehê çinî yê serhevde komkirî. **2.** gidîş, dêza (loda) ji gurzên gênim. *Ew lozûngê ku firqa me dida, dibû mîna meriv agirekî meriv bide bin sapekî hişk alav bide ussa nav esker bela dibû.* ŞK, r. 109.

Sapok: /sa:po:k/ nd/m **1.** solên saqdirêj, botên lastîk. **2.** potîn, cîzme. Ev peyv ji zimanê rûskî ketiye devoka Serhedê.²¹⁸ *Herçî sapokê wane xurom in.* HW, r. 177.

Saskar: /sa:sk^ha:t/ rd **1.** sazkar. **2.** hevkêşî. **3.** lihevî. *Himangî pey dêwêr saskar dibûn, hinek ji wan dimirin.* ŞK, r. 22.

Sava: /sa:va:/ rd **1.** negihîştî, bêkermal, xam, hêj piçûk. **2.** biçûk, çûçik, çûk. *Wana kurê xwe ye sava colanê da hişt.* KR, r. 52.

Sawgirtin: /sa:wɡirtɪn/ l **1.** tirsîn **2.** xofin. **3.** bizdîn. *Te ku li wî dinêrî, saw jê digirt.* HW, r. 320.

Sehet li yekê çarîkek xebitîn: /sehet lɪ yeke: tʃ^hari:kək xebiti:n/ bwj. **1.** saet yek panzdeh deqîqe ye. **2.** çarîkek borîn, pîvaneke saetê ye. *Gava ku em gihîştin mala Şewêş, saet li yekê çarîkek xebitîbû.* HW, r. 68.

Sekesizkirin: /sekesɪzkɪrɪn/ l **1.** robetkirin, rûreşkirin. **2.** rezîl kirin, dan şermê, *Derdê sekisizkirina Meyanê dîsa kete bîra wî.* KR, r. 84.

Seking: /sek^hɪŋg/ nd/m **1.** rawestgeh, westgeh. **2.** rawestank, îstgeh. *Ji sekinga Hemamlîyê hespan bi paş da vegeşînin.* HW, r. 116.

Sel: /sɛl/ nd/n **1.** teht, kevirê meht, tat, kevirê pehn ê mezin. **2.** lat. **3.** hoçik, kevirê meht ê ku bi qasî destekî ye. *Dewsa çem û cewê(co) gur selê şimşat mabûn.* KR, r. 86.

²¹⁸ Qanatê Kurdo, b.n.b., r. 652.

Semer: /semɛr/ h **1.** kerîyek pez ku hejmara wê sed heb in. **2.** *mec.* bêjimar, bêpîvan, gelek, **3.** bermayî, berhem, hesilat. Ser *ewqas semerî da pezeke dinê jî lê zêde bû.* KR, r. 19.

Sepekirin: /sep^hekırım/ l **1.** telandin, vedizîn. **2.** starkirin. **3.** nixamtin, bincilkirin, xêvetkîrin. Sar *bû lê kurkê ku Ûsiv dabûyê ew zarok a biçûk rind sepe kiribûn.* DD, r. 13.

Seqirandin: /seqıra:ndın/ l **1.** dilrihetkîrin, rehakirin, dîlfirehkîrin. **2.** bêhnpevedan. **3.** deng jê dan biryandin. *Qelebalixê nikaribû dengê kilama Kerem bida seqirandinê.* KR, r. 27.

Seqirîn: /seqiri:n/ l **1.** dilrihetbûn. **2.** arambûn. **3.** xelasbûn. *Guhê min jî seqirîn ji dest girîya û zêwa-zêwa zara.* ŞK, r. 11.

Ser rûyê xwe kirin: /ser ru:je: xwe kırım/ bwj. **1.** bi awayekê yek şandin û xwe jê xelas kirin. **2.** bela yekî ji xwe vekirin. *Xwe min ew mezin nekiriye, wekî ser rûyê xwe bikim.* KR, r. 68.

Ser wî guhî razandin: /ser wi: gohi: ra:za:ndın/ bwj. **1.** ser guhekî razan/raketin, bêxem û xemsarî bûn. **2.** hay ji tiştêkî nebûn, bi rihetî hereket kirin. *Bira Serdar qet ser wî guhî ranezê.* KR, r. 68.

Serberate: /serbera:t^hɛ/ nd/m **1.** agahîya derbarê aqûbeta kesekî da, pejna kesekî, salix, pêhesandin, **2.** navnîşan, **3.** berate, îşaret û şopa kesekî yan tiştêkî. *Serberateyê wî û ya qîzika revandî tunebû, hikumet lê digerîya, bi pey qaçaxîya wî ketibû.* HW, r. 249.

Serdapê: /serda: p^he:/ h **1.** ji serî heta pîyan. **2.** seranpê. **3.** seraser, seranser. **4.** hemû. **5.** pêda-pêda. *Kerem serdapê lerizî.* KR, r. 29.

Sergîn: /sergi:n/ nd/n **1.** kerme. **2.** keşkûr. **3.** rêxa hişkbûyî. **4.** pesarî. *Li kêleka qelaxê sergînên şil hebûn.* KR, r. 45.

Serqot: /serqo:t/ rd **1.** jina bêdezmal, kesê/a ku kum yan jî desmal li serê wê nîn be. **2.** serkol, kesê bêşewqe, bêkum. *Elîyê bira tu serqot dîtî.* HW, r. 339.

Sersîçe: /sersi:t^hɛ/ nd/n **1.** sersîçe, reng û rûyê kesekî, serûçav. **2.** xûy û xeyset. *Beşereke qelp dihate sersîçeyê wî.* HW, r. 180.

Serwaxt: /serwa:xt/ rd **1.** serwext, têgihîstî. **2.** fama. **3.** zana. **4.** hişyar. *Kesekî ji wan zimanê ûrisî nizanbû, wana nikarbûhev serwaxt kira.* ŞK, r. 88.

Serwêrîkirin: /serwe:ri: kırın/ l **1.** serwerî kirin, gerandin, rêberî kirin, serkarî kirin, serektî kirin, dan pêşîyê, serkêşî kirin. *Ewî vê derê serwêrî li koma pala dikir.* KR, r. 183.

Serxurî: /serxori:/ nd/m **1.** bêyomî, bêtêparî, bêtêpalî. **2.** şunda, paşdamayî, paşdaçûyî, pêşneketî. *Cim'eta kurmançîya yî serxurî paşdamayî bêqusûr bimîne!* KR, r. 98.

Seva çi: /seva: t̂ĵ/ h **1.** seba çi, sawa çi, sa çi. **2.** ji bo çi. Ev peyv ji peyva erebî ya (سبب) sebebê dejenere bûye û pêk hatiye. *Tu seva çi hatî girtinê?* KR, r. 50.

Sewirîn: /sewiri:n/ l **1.** hişyarbûn. **2.** bangîn, bangkirin. **3.** helestebûn, amadebûn. **4.** pelaxbûn, belavbûn, berbelav bûn, pelaşbûn, pejalbûn. *Wextê royê teze nedîr dida, tîrêncê we ye şirîn li serê çîya disewirîn.* KR, r. 92.

Sexîr: /sexi: r/ rd **1.** sexer, mexlûb, têtçûyî. **2.** binkefî, zorbirî, xusirî. *Nava wê te'rîyê da cim'eta sexîr çoremîş dibe.* KR, r. 92

Silbûn: /silbu:n/ l **1.** xeyîdîn, tûrebûn. **2.** dilmayîn. *Xort ji pirsaxwe ya silbûyî zû xebera xwe anî cî.* HW, r. 238.

Silikîn: /siliki:n/ l **1.** hêrsbûn. **2.** xeyîdîn. **3.** tirsîn, saw girtin. **4.** paş va çûn, şûnda dan, şûva dan. *Pîr hinekî silikî, dest pê kir durûtî kirin.* KR, r. 38.

Silmask: /silma:sk/ nd/m **1.** silmastik, selmezk, selmask, selmesk. **2.** cureyek pincar e. *Qîz û bûk diçûne Gelîyê Kevokan dianîn pincarên wekî pêqask qencelîsk û silmask, siping, û tirşo, pûng û cetirî, xîlok...* HW, r. 241.

Siloq: /silo:q/ rd **1.** silok, bînteng, **2.** bihêrs. **3.** xeydok. *Serdor sor û siloq neke.* KR, r. 181.

Simila: /simila:/ nd/m **1.** bismila, bi navê Xwedê. **2.** gotina dema mirov dest bi karekî dike yan jî ji tiştêkî ditirse. *Xwedê tu xêr kî, simila simila ev çi 'ecêv e.* KR, r. 95.

Sipartin standin: /sipa:rtin sta:ndin/ l **1.** hat wazîfedarkirin. **2.** peywir girtin, vatinî girtin. **3.** tiştekek wekî emanet girtin. *Hazirbûya(kesên hazir), sipartin standin.* KR, r. 157.

Siping: /sɪpɪŋ/ nd/m **1.** sipling. **2.** hişping, sping, cureyek pincar e ku dihê xwarinê. *Qîz û bûk diçûne Gelîyê Kevokan dianîn pincarên wekî pêqask û qenzîl, so û mendik, xîtik û sîrmî, qencelîsk û silmask, siping...* HW, r. 241.

Sîqînî: /si:qi:ni:/ nd/m **1.** çirikîna diranan.**2.** wexta diran bi hevdu dihê giviştin ev deng denn derdikeve. *Sîqînîya diranên wan bû.* ŞK, r. 144.

Sîrmî: /si:rmi:/ nd/m **1.** sîrik, sîrê bîyanî. **2.** sîrim, sîrê ku li çolê ji xwe ber şîn dibe. *Qîz û bûk diçûne Gelîyê Kevokan dianîn pincarên wekî pêqask û qenzîl, so û mendik, xîtik û sîrmî, qencelîsk û silmask, siping, û tirşo, pûng û cetirî, xîlok...* HW, r. 241.

Sîs: /si:s/ rd **1.** spî. **2.** kever. **3.** sade. **4.** pakij. *Çe'vê wî ye belek û enîya sîs va hev ra şer dikirin.* KR, r. 23.

Sîtil: /si:tîl/ nd/m **1.** qoşxaneyên mezin. **2.** kanîster. **3.** satil. **4.** mencil. *Sîtilê toraqê ser kuçikê agir piçe-piça wan bû dikelîyan.* KR, r. 45.

Sivder: /sɪvdər/ nd/m **1.** bersifk, berderî, derazîng, şêmik, şêmûg. **2.** xada li ber xanî, hewş. **3.** dalan. *Kela usa kere-lal bû, sivderê we ye nemkêşkî usa te'rî(tarî) meriva tirê mezelek e.* KR, r. 73.

Sîyar: /si:ja:t/ nd/nt **1.** siwar. **2.** kesê li ser piştê hesp, ker yan jî di hundirê erebeyekî de ye. *Her du sîyar bi hemdê xwe gihîştine kerê pêz.* KR, r. 18.

So: /so:/ nd/m **1.** gîhayeke koka wê xwerbar e ku li dora co û çeman hêşîn dibe. Ev gîha dikeve nav penêr û tirşînê jî. **2.** soxîk, cureyek pincar. *Tê bîra wan ber tûmê soyê yan tûmê kulîlka çewa ew û dilketîyê xwe va cem heve rûniştibûn.* ŞK, r. 67.

Sosin: /so:sɪn/ nd/m **1.** zembeq. **2.** leylank, berfî. *Çîyayên Sînekê xemilîbûn bi bi gul û gîha, so û pêjekan, sosin û rihanan.* HW, r. 269.

Spî: /spʰi:/ nd/nt **1.** heywanokek biçûk e ji bêmerêzîyê peyda dibe û di nav porê meriv û pûrta heywanan da cih digire. **2.** kêç. *Em birçîbûn, di nava rişk û spîyan da hedimîn.* HW, r. 328.

Spîçal: /spi:tʃa:l/ nd/m **1.** sipîçal, belekîya berfê, tûmên berfê. **2.** çarşev, xêlî, rûxêlî. *Lekeke reş e mezin li ser spîçala berfa zivistanê dihatexanêkirinê.* KR, r. 176.

Steqirîn: /steqiri:n/ l **1.** hêwirîn, arambûn, hewîn **2.** bêhnvedan. *Li dor û beran her tişt steqirîye, ketine xewa şirîn.* MR, r. 12.

Stêr: /ste:r/ nd/n **1.** histêr, cihnivîna di dîwarên xanîyan de. **2.** malnivînk, malvînk, cihê stargeha nivîn û qafûqolan. *Çû ser kulavê ku li ber stêr danîbûn.* KR, r. 36.

Stewr: /stewr/ rd **1.** histewr. **2.** istewr, heywana ne avis. **3.** tiştê bê ber û berhem. *Ew diçû ber pezê stewr.* KR, r. 74.

Stukur: /stokor/ nd/m **1.** patik. **2.** past. **3.** paştû. *Kevîyê kolosguhê min û stukura min dikutan.* ŞK, r. 62.

Sûdkirin: /su:d kîrîn/ l **1.** sûd:dadgeh. **2.** mehkeme kirin. *Seba xatirê wî min ê hema niha sûd bikira, Egîd berda.* HW, r. 265.

Sur: /sor/ nd/m **1.** sarî, serma. **2.** seqem, hişkî. **3.** bayê sar. *Carinan têr carinan birçî li ber surr û sermayê, şilî û şoyê bû.* MR, r. 11.

Sût: /su:t/ rd **1.** rengê esmanî yê şîn. **2.** rengê keskayî. *Li esmanê sût stêrk ketine govendê.* MR, r. 12.

Suyarî: /soja:ri:/ nd/nt **1.** siyarî. **2.** siwarî. *Rokê sibê-şebeqê du eskerê suyarî hatin.* ŞK, r. 88.

Ş

Şahba: /ʃa:hba:/ nd/nt **1.** şebaz, balindeyeke ji cureyên bazan e. **2.** kesê mêrxas û dilêr. *Tilîyê destê wî ussa dirêj bûn meriv tirê tilîyê şahba ne.* ŞK, r. 44.

Şayîşkişandin: /ʃa:ji:ʃkʰiʃa:ndîn/ l **1.** talaşkişandin, ketin meraqan, endîşekirin, fikarkirin. **2.** xema tişteki xwarin. *Bila arxayîn here, ez ê saleke din havînê yeqîn bêm bibim, bila tu şayîşan neke.* MR, r. 70.

Şê: /ʃe:/ rd **1.** rengê sor ji bo hespan. **2.** heywanên ku serê wan sor e yê wêkî hesp. **3.** rengê zerînî. **4.** çûr. **5.** bisk, perçem. *Sîyarê hespê şê, serkarê qelfê bû.* KR, r. 46.

Şelbik: /ʃelbık/ nd/n **1.** şerbik, amûra pê av vexwarin yan jî guhastinê. **2.** cêrê avê. **3.** bade, badîn. **4.** perdax, pîyale. Şelbikê avê, tasa şorbê û pirtikê nanê garis dihatine xanê. KR, r. 72.

Şêmik: /ʃe:mık/ nd/m **1.** şêmik, şêmûk, şemûg, şêmûg, **2.** şîpande, şîpane, şîpandek, şîpanek, şîpander, şîpanak, sivder. **3.** derazîng, derazînk, derîzan, derazû, derizgeh, asîtan, pêpingeh, pêping. *Wir wa da pê te li şêmika min nekeve.* KR, r. 55.

Şer û şiltaq avêtin: /ʃer u: ʃiltʰa:q a:ve:tin/ bwj. **1.** şer û şiltaq tê da anîn. **2.** buxtan lê kirin, îftira li kesekî kirin. Ewê şer û şiltaq avêtine Kerem. KR, r. 59.

Şeva we bimîne xweş: /ʃeva: we bimi:nɛ xwɛʃ/ bwj. **1.** şevbaş. **2.** şevxweş. **3.** şevşad. **4.** Xwedê rihetîyê bide we. *Ji xwe ra gotin “Şeva we bimîne xweş.”*HW, r.116.

Şevîn: /ʃevi:n/ nd/m **1.** çêrandina heywanan bo şevê. **2.** *Şemo û hevalên wî texmîn kirin ku wext e pêz ji guherê rakine şevînê.* MR, r. 12.

Şewl: /ʃewl/ nd/m **1.** bêşe, devî, daristanên biçûk. **2.** erdê rast ê qirac. *Gelek jî diçûn xwe di nava şewl û şîqavên pêşber da vedişartin.* HW, r. 387.

Şexte: /ʃextɛ/ nd/m **1.** qiravî, qişavî, **2.** sehol, cemad, bûz, hişkîya sar. *Şexte li zevîyên wan nekeve...* HW, r. 343.

Şeyî: /ʃɛji:/ nd/n **1.** pereyê hûr, quriş. **2.** yekeyê pereyê hûr. **3.** tiştê kêrhatî. Ev peyv ji zimanê ermenîkî ketiye devoka Serhedê.²¹⁹ *Min ji destê wê girt torbek, kaxizek û sê şeyî-pêrenca xwe.* ŞK, r. 37.

Şihurîn: /ʃihori:n/ l **1.** şuhurîn, destdirêjî jin yan jî keçekê kirin. **2.** zurbetîkirin, zorbetîkirin. *Eskerê romê çil qîzên bejne takrihan î xama dikin ku hêsîr hildin, bişihurînin nav û namûsê.* HW, r. 71.

Şik firî dilê yekî: /ʃik firî: dîle: jeki:/ bwj. **1.** şik birin tiştêkî, şik çûyîn. **2.** gumankirin, endîşe kirin. *Şiblî, li Sebrî nihêrî dîsa şik firî dilê wî.* KR, r. 88.

Şikinandin: /ʃikina:ndın/ l **1.** şikîna por, şekirin. **2.** şekirin. *Ewê porê xwe şikinî.* KR, r. 34.

²¹⁹ Garnik Asatrian, **Ferhenga Kurdî-Êrmenî Êrmenî-Kurdî**, Republic ya Armenianê Mînistirtî ya Dîyasporanê, Yêrevan, 2016, r. 374.

Şikinîn: /ʃikini:n/ l **1.** şe kirin, şeh kirin, şikinandina por. **2.** zaxkirina tiştên wekî hirî, liva û mû. *Mîna hirîya şikinî hatibû nixamtin.* KR, r. 169.

Şilet: /ʃilet/ rd **1.** kesên di ola xwe de ne kurd in. *Te em kirin şilet malxerabo!* HW, r. 325.

Şimaqî: /ʃima:qi:/ nd/m **1.** cureyek serpoşî. **2.** şar, şal. *Kolosêd serê wan şar şimaqî bûn, rîşêd şar-şimaqîya dihat dikete ser çavê xorta.* ŞK, r. 57.

Şimşat: /ʃimʃa:t/ rd **1.** şemitok, şimitok, şimitokî. **2.** xişikînok, xişinde. **3.** şutî, dûz. **4.** hilû, bêzivirîya serçavê mirov. *Dewsa çem û cewê gur, selê şimşat mabûn.* KR, r. 86.

Şîna tevî dinê dewat e: /ʃîna: tevi: dîne: dewa:t ε/ gp **1.** Şîna tev hevalan şahî ye. **2.** Karesat yan jî bobelatên giştî, her kesekê dixê hevpişkê xemê, ji ber vê mirov xwe tenê hîs nake. *Şîna tevî dinê dewat e, wê bi dengê xwe got.* HW, r. 127.

Şindok: /ʃindo:k/ rd **1.** bêjin. **2.** reben, pepûk, berdîwar, bêmal. *Lêdane kalê hizhizî, şindokê mêran, arkolkê ber tendûrê...* HW, r. 365.

Şipê: /ʃip^he:/ h **1.** şipîya. **2.** serpêyî, li ser pîyan. *Ez û Babayan radibin şipê.* HW, r. 31.

Şiverê: /ʃivere:/ nd/m **1.** pêşûn. **2.** pêge, pêgeh. *Şiverê di nava zevîyên pembû re diçû.* HW, r. 36.

Şivîvî: /ʃivi:vi:/ nd/m **1.** Amûreke sazbandîyê ye ku êzdî di rêûresmên xwe de bi kar diînin. **2.** amûreke muzîkê. *Dengê şivîvîyê wisa xweş dihat.* HW, r. 342.

Şoreket: /ʃo:rəkət/ nd/m **1.** erd û zevîyên bi xaka şor. **2.** mir,ava şor yan jî tehlokî. *Ewlê biharê pezê qira diçêre, timê şoreketê dikeve.* ŞK, r. 16.

Şoşe: /ʃoʃe/ nd/m **1.** şose, rêya ji kevir yan jî xij(ş)ir çêbûye û bêyî asphalt e. **2.** axrêk. Ev peyv ji zimanê frensî ketiye devoka Serhedê. *Hetta em ji Qaqizmanê, derbaz bûn em rîya şoşê da dihatin.* ŞK, r. 82.

Şoyî: /ʃo:ji:/ nd/m **1.** lêmişt, sêlavk, sêlav, seylav, lehî, avrabûn. **2.** lêken, lêkend, laser, lêser. *Rojên biharê carinan tav, carinan şilî şoyî bûn.* HW, r. 388.

Ştab: /ʃta:b/ *h* **1.** lez. **2.** zû bi zû, zûzika. **3.** tabûr. **4.** navend. Ev peyveke ji zimanê ermenî ye ku ketiye devoka Serhedê.²²⁰*Wekî tu ştaba wan dîl bigirî yan qir kî.* ŞK, r. 131.

Şuhurandin: /ʃuhora:ndin/ *l* **1.** şihurandin, suhurandin, sivrîn, sivrandin. **2.** destdirêjî li jinekî kirin. **3.** tecawuzkirin. **4.** zurbetî li kesekî kirin. *Zabitê wan zor didane riayetê, talan dikirin, jin şuhurandin, merî kuştin.* ŞK, r. 92.

Şûna reş va çûyîn: /ʃu:na: reʃ va: tʃu:ji:n/ *bwj.* **1.** ketin qebrê, ketin axa reş. **2.** cehimîn û mirin. *Bira ew nan heram be bira tu şûna reş va herî* !KR, r. 54.

T

Tabkirin: /ta:bkirin/ *l* **1.** tehemûl kirin, hêdan, hedan kirin, bêhnfiheh bûn, sebir kirin. **2.** berxwedan. *Ez bê xebat tab nakim.* HW, r. 39.

Talaşa yekî nebûn: /tʰa:la:ʃa: jeki: nebu:n/ *bwj.* **1.** xema kesî nebûn, ji xwe re nekirin xem û derd. **2.** endîşe nekirin. *Bi tenê zarokên dergûş talaşa wan nîn bû.* HW, r. 385.

Tarêlk: /tʰa:re:lk/ *nd/m* **1.** tas. **2.** kaseya av yan jî xwarinê. *Berdestîya wan yeke qaline sûret sore tijî tarêlka sûpê tijî kir.* ŞK, r. 39.

Tarmetaxbûyî: /ta:rmetaxbu:ji:/ *rd* **1.** tarim-tax, ev peyv ji peyva “darmadağın”a tirkî ketiye devoka Serhedê. **2.** mal û milkê yekî şelandin, bela mela kirin, serobinno kirin. **3.** tarûmar bûn. *Bûbû qesabê qesabê gundê rengîn, gundê wê şevê tarmetaxbûyî...* HW, r. 395.

Tavî: / ta:vi:/ *nd/m* **1.** barana xurt û boş. **2.** rewşa tavbûnê. *Cara tavîya baranê dihat, alîkî tav bû alîkî jî baran dibarî.* ŞK, r. 140.

Tavkirin: /ta:vkirin/ *bwj* **1.** dan tavê, herwekî mirov tişteki bide ber tavê bihele bibihure tişteki jê nemîne, efûkirin. **2.** lêborîn, bexşandin. *De qezîya ye, gotî meriv tav bike.* KR, r. 88.

²²⁰ Garnik Asatrian, b.n.b., r. 379.

Te derzî bavîta nedikete erdê: /tɛ dɛrzi: ba:vi:ta: nedik^htɛtɛ ɛrde:/ bwj. **1.** Tu xwelîyê biavêjî nakeve erdê. **2.** gelekî qelobalix bûn. *Ku te derzî bavîta nedikete erdê.* KR, r. 81.

Te'l bûn: /tɛ^slbu:n/ l **1.** tehl bûn. **2.** ji ber nexweşîyê giranbûn û zêdebûna êşê. *Wexta dû "doxtirîya" Zînê ra hine zar diha te'l dibûn.* KR, r. 126.

Te'lebext ra: /tɛ^slɛbext ra:/ h **1.** ji bêşansîyê. **2.** bêtalihî. *Te'lebext ra şeveke Nîsanê ya reş xewê 'Elî alt kiribû.* KR, r. 24.

Te'me: /tɛ^smɛ/ nd/m **1.** dame, cureyeke listikê. **2.** tame. *Mîrzo qawe loşî canê xwe dikir, yan jî te'me dilîst.* KR, r. 19.

Tele: /tɛlɛ/ nd/m **1.** xefik. **2.** dav. **3.** kemîn. *Wana qîrar kiri mêrik bavêjne telekê.* KR, r. 32.

Teletel: /tɛlɛtɛl/ h **1.** bi dizîka va, dizînga, bêyî ku xebera yekî çêbe, bi xef, bi bêdengî, xepe-xep, **2.** teltelokî, neşkere. **3.** revedizî, şevêdizî. *Di binê çavan re teletelli axê nihêrî.* HW, r. 248.

Telîn: /tɛli:n/ l **1.** veşartin. **2.** nependin. **3.** berşêkirin. *Dev û lêvên wî li bin qevşa simêlê çûrr da telîya bûn.* KR, r. 18.

Telp: /t^hɛlp/ nd/m **1.** xilt, rewşa ji piştî dapalînê, dapisîn. **2.** komeke 'ewran, **3.** 'ewraw. **4.** tûm, kom, komik. *Dû li ser kona telp girtibû.* KR, r. 27.

Temezi: /t^hɛmezi:/ nd/m **1.** cureyek serpoşîya jinan a rengîn e. **2.** laçik. *Qîzêd cahil temezî ji serê xwe vedikin, davîtne serê berana.* ŞK, r. 69.

Temijîn: /tɛmizî:n/ l **1.** xilmaşbûn, xirmaşbûn, razana demkurt û li ser xwe. **2.** xilmişîn, rewşa xewarîbûnê, rewşa hewceyê nivistin û razanê. *Bi kerahîya şevê re xelqê wê derê jî wê bitemijin.* HW, r. 72.

Teng: /tɛng/ nd/n **1.** qûşber, berteng, qoş, kemera ku li navtenga hespan tê girêdan. **2.** rext. *Zîn û bûsatên wan lê kirin lê hema wisa kirin wekî tengê wan neşide.* HW, r. 317.

Teni: /tɛni:/ nd/m **1.** reşatîya dûmanê ya li ser aman û feraqan. **2.** darinc, dorinc. *Kêlekê sîtila tenîgirtî nava deqekê da qerqaş dibû.* KR, r. 45.

Tep: /thɛp/ nd/m **1.** lêdana bi kefa destan. **2.** dengê lêdana dest. **3.** şemaq, sîlle. *Hemîd Begê ew dabû ber tepa.* KR, r. 25.

Tepik: /thɛpɪk/ nd/m **1.** sergîn. **2.** rêxa bi destan qalib û şekil lê hatiye dayîn. *Dê û kur li ber stûna pêşmalê çend tepik dane ser hev.* KR, r. 38.

Teqil: /thɛqɪl/ h **1.** biderb. **2.** biwezn. **3.** bigiranî. **4.** usûl. **5.** kirp. *Ewî xebera “beg” usa qewîn usa teqil got ...* KR, r. 54.

Teqizîn: /thɛqɪzi:n/ l **1.** pengizîn, qulozbûn, rabûn û çûyîn. **2.** qeşitîn, cehimîn. **3.** bi lezî lêxist çûyîn. *Meyane jî hişyar bû û xewa wê jî teqizî.* KR, r. 83.

Têr: /thɛ:r/ nd/m **1.** xurc, xurcîn. **2.** heqîb. **3.** çenteyek mezin e ku tiştan dikin têde û li piştê dewaran dikin. *Hirî dikirne ber, têr, emenî.* KR, r. 34.

Terecan: /thɛrɛca:n/ rd **1.** ciwan, nazik. **2.** nû, taze, negihîştî. **3.** kesasaf û bêtecrûbe. *Wê şeva zivistanê ya sar her du terecana dirêj qise kirin.* DD, r. 7.

Terêq: /thɛrɛ:q/ nd/nt **1.** pîr û şêxên êzdîyan. **2.** şêx û meşayîx. **3.** mele û xetîb. **4.** manewîyat. *Mirîd, qîza terêqê ber tişteki hesab nake.* KR, r. 45.

Teribandin: /thɛrɪba:ndɪn/ l **1.** xerabkirin. **2.** herrimandin. **3.** lewitandin. **4.** tewşandin. *Şêwra xwe kiribûn kanê bi çi teherî bikin ku wê nêta Sûrên bidine teribandinê.* KR, r. 30.

Terikî: /thɛrɪki:/ rd **1.** pir mezin. **2.** qerase. *Ev ejdehayê terikî me nehese.* ŞK, r. 13.

Têrmaş: /thɛ:rma:ʃ/ rd **1.** bêxweyî. **2.** lenetî. *Hal nîn bû, têrmaşên spîyan jî ez hildabûm.* HW, r. 264.

Teselîkirin: /thɛsɛli:kɪrɪn/ l **1.** taselekirin, zîyaret kirin. **2.** kontrolkirin. *Caran diçû teselîya Seyrana dîya Cemal e nexweş dikir ku ji bo wê bûbû gumaneke mezin.* DD, r. 16.

Teşergirtin: /thɛʃɛrgɪrtɪn/ l **1.** mirek, neynîk girtin. **2.** îma, îşaretkirin. **3.** rexnegirtin. *Shehîdê Îbo li gor rewşa bûyeran û li gor edetên êlê bi curekî bin perda xêliyê teşer digire.* KR, r. 10.

Teşt: /thɛʃt/ nd/m **1.** teyşt alaveke servekirî ye ku ji bo serşûştinê dikevin nava wê de. Ji bo cilşîştinê jî dihê bikaranîn. **2.** şikev, qabeke dirêj an jî kûr ya ji bo hin cure karan. *Perîşanê, mîna xwe her car teşte xwelîya kuçik anî.* KR, r. 84.

Teterî: /thet^hɛri:/ nd/m **1.** cureyek cilên jinan. **2.** nûçegîhanî. **3.** zimanî xelkê teteran. *Qîz bûkê wan jî xwe pak xemilandibûn: dêre, xirxal, enterîyê rind û teterîyê Ezurmê.* ŞK, r. 57.

Tevgirêdan: /thevgîre:da:n/ l **1.** pevgirêdan, pêwendî, pêwendî danîn. **2.** eleqe. *Serê xwe hilde here bi ku de dixwazî here lê tevgirêdana xwe ji me nebire.* MR, r. 20.

Tevzik: /thevzîk/ nd/m **1.** tevizok, tevizok. **2.** tevizok. *Waxta meriva lê dinêri tevzik canê meriva da diçûn.* KR, r. 18

Tewaçekirin: /thewa:qekîrîn/ l **1.** tewaçekirin, tewaçekirin, tika kirin, rica kirin. **2.** jêpîrsîn, jêxwestin, daxwazlêkirin, xahêşkirin. **3.** lavahî, ûmêdkirin, hêvîkirin. *Min ji cimaeta berhevbûyî tewaqe kir wekî rusqetê bidin ez vegerim mala xwe.* HW, r. 187.

Teyamîşdan: /theya:mîʃda:n/ l **1.** tamîşbûn, ber xwe dayîn. **2.** xesirîn, zîyandîtin. **3.** xweragirtin, sebirkirin. Ev peyv ji zimanê tirkî ketiye devoka Serhedê ku ew jî ji peyva “dayanmak” a tirkî ye. ²²¹*De were li pey vê yekê teyamîş bide.* HW, r. 366.

Teyaxdan: /thɛja:xda:n/ l **1.** zexmbûn, qahîm, qewîn, pihêtî, berk, netewîn, bihêzbûn. **2.** dewamkirin. **3.** tebat û tehamulkirin. *Mêş-mor, moz vira teyax nadin, sur wan qir dikin.* ŞK, r. 54.

Tibistkirin: /thibîstkirîn/ l **1.** bi dengê tibist ve qewirandina kûçikan. **2.** bi dengê bilind ve berî segan dayîn. *Seyên kêrî hatine wî, wî xwe da ser zinarekî, şivên zû xwe pyê re gîhand, tibistî li kûçikan kir.* MR, r. 22.

Tifal: /thifa:l/ nd **1.** zarok. **2.** kesê tenê, belengaz, feqîr. **3.** vîrnî, biçûk. *Vî tîfalî stûkura min xwar kiriye.* DD, r. 7.

Tiher: /thihɛ:/ nd/n **1.** tehr. **2.** awa. **3.** şêwe. **4.** reng. **5.** çawanî. *A bi vî tiherî min wexteke emrê xwe li vira derbaz kir.* ŞK, r. 101.

²²¹ Michael L. Chyet, “And a Thornbush Sprang Up between Them”: **Studies on Mem u Zin**, Dissertation Information Service, r. 81.

Tilm: /t^hilm/ nd/n **1.** kevir û kûç. **2.** pel, cureyek kevir. *Ez bi rêya xwe da çûm û hema di devê rê da li ser tilmekî rûniştim.* HW, r. 126.

Tilolbûn: /t^hilo:lbu:n/ l **1.** gêrbûn. **2.** qulipîn. **3.** dagerrîn. *Roj tilol dibûn diçûn lê Hemîd Begê heqê şivên nedida.* KR, r. 27.

Tima: /t^hima:/ rd **1.** çikûs. **2.** çepel. *Keleşê rîspî merivekî çirûk î tima yî bêfasal e.* KR, r. 20.

Tîmarkirin: /t^hima:rk^hir^hn/ l **1.** mizdan. **2.** qeşaxê kirin, şehkirin, serearastkirin. **3.** xwedî kirin, sereguhî kirin. *Simêlê xwe tîmar kirin.* KR, r. 33.

Tîremer: /t^hiremeɾ/ nd/nt **1.** cureyeke maran e ku dişibe tîran. **2.** marê biçûk, dirêj û zirav. *Ji belekîya şevê zirav mîna tîremeran berjêr dilezandin.* KR, r. 17.

Tîrênc: /t^hire:ndʒ/ nd/nt **1.** tîrêj, tîrêjn. **2.** tîşk. **3.** tîr. **4.** şewq. *Ro hilhat, zeriqî, tîrêncê royê tebîyet xemilandin.* KR, r. 48.

Tirşo: /t^hirʃo:/ nd/m **1.** kerika berxê, tirşikê zerecan. **2.** sêxaşik, tirşoya nalik. Gelek cureyên tirşoyê hene. *Qîz û bûk diçûne Gelîyê Kevokan dianîn pincarên wekî pêqask û qenzîl, so û mendik, xîtik û sîrmî, qencelîsk û silmask, siping, û tirşo...* HW, r. 241.

Tivanc: /t^hiva:ndʒ/ nd/m **1.** firik, givîşk, rîqaço, şebk **2.** jan û êşa ku endamê zedegirtî diqurêfe, kramp. **3.** qolinc. *Pîr, doxîna xwe ber şalê xwe ra dikir, tivanc didane xwe.* KR, r. 76.

Tivdarek: /t^hivda:ræk/ nd/m **1.** tidark, tedbîr, tevdîr, plan. **2.** amadehî, bergirî. *Xanimê dîsa dest bi tivdarekên xwe kir.* HW, r. 54.

Tixa: /t^hixa:/ nd/n **1.** kurik, ev peyv ji zimanê ermenîkî ketiye devoka Serhedê²²² **2.** ev gotin li Serhedê ji bo kurikan bi awayeke tinazî û xweşîya xwe pê anîn ji bo kurikan dihê gotin. *-Tixa can, mala Manûkê Defçî li kê derê ye?* HW, r. 11.

Topayî: /to:paji:/ h **1.** dîyarên ku di dawetê de dihê dayîn. **2.** vexwendname, dawetîye. *Di vê şayîyê da gelek edetên miletîyê wê da danîn, topayî bela nekirin.* DD, r. 80.

²²² Têmûrê Xelîl, "Pêwendiyên Ermenîkî û Kurdî yên Zimên", *Kovara Kurmancî*, j. 41, 2007, r. 5.

Toraq: /tora:q/ nd/m **1.** çolik. **2.** cacî, jajî. **3.**lorik. *Konê çarstûnî, kulîna tijî 'eyarê rûn û toraqê, çend semer pez, çêlek, hesp îdî çi bêjî ber derê wî tune bûn.* KR, r. 21.

Totbûn: /totbu:n/ l **1.** gulolbûn, gundirbûn, gindirîn. **2.** tilolbûn, hotbûn. *Tu tişt nikare riya kevirê ku çiyê tot dibe, biguhêze.* DD, r. 38.

Toxavk: /toxavk/ nd/m **1.** tixavk, serşîr, şîrtûk, sertûk. **2.** toşîr, toyê li ser şîr. *Melhemê û toxavkê dayne ser.* KR, r. 127.

Trûbke: /tru:bkε/ nd/m **1.** ahîze. **2.** bihîstoka têlêfonê. *Ez hatme ber têlêfonê, min trûbke hilda got: -Alo, alo ew kî ye?* ŞK, r. 134.

Tu lela min kirîbî: /tu lela: min kîri:bi:/ bwj. **1.** bwj. *Te lela min kiribê. Lel di devoka Serhedê de dihê maneya dayîk. Ev gotin ji bo pesndayîna jin û keçan dihê gotin.* **2.** *Tu dayîka min î, ez te pîroz dikim, eferim! Tu lela min kirîbî, te rast got.* HW, r. 94.

Tûle: /t^hu:le/ nd/nt **1.** têtjikên seyan. **2.** cewr, cewrik. *-Lo tûlê kûçika!* KR, r. 54.

Tûm: /t^hu:m/ nd/m **1.** kom yan jîbaqeke gîhayî. **2.** pej, hejik, dirik. *Herdu bengî çûn ber tûmekî bilind rûniştin.* DD, r. 59.

Tûr: /tu:r/ nd/n **1.** mêtşok, xurc. **2.** çente. **3.** têt, çewal. *Her du carîye pesarî didane hev û davîtine tûrê xwe.* KR, r. 78.

Turuşkirin: /tuɾuʃkırın/ l **1.** turişkirin. **2.** cesaretkirin, wêrîn, culhet kirin. **3.** taqetkirin. *Dû vê yekê ra îdî kesekî turuş nedikir here şikiyat.* KR, r. 29.

Tutar: /tota:r/ nd/m **1.** mecal, quwet, qinyat, qudûm, taqet, hêz. **2.** tab, tehemûl. *Em behecîn, em kamço bûn, tutar di me da nema.* HW, r. 365.

Û

Û yên mayîn: /u: je:n ma:ji:n/ nd **1.** her wekî din. **2.** yên din jî wekî wan. **3.** wesaîre. *Wê rojê dîya min jî me ra hat, nîşanî me dida pincara çolê: siping, tirşo, mendik, û yên mayîn.* ŞK, r. 15.

Undabûn: /unda:bu:n/ l **1.** windabûn, berzebûn, berzabûn, minabûn, xalifîn, hêçbûn, **2.** bêhişbûn, gêjbûn. **3.** hêçbûn, dêrisbûn, dêrzbûn, berhewabûn. **4.** têdaçûn.

5. hulmbûn: bûxarbûn, li ber çavan windabûn. 6. kokhatin, koka tişteki qelîn, dawîlêhatin. *Hine şînayî unda dibin, dewsa wan hineke dinê şîn dibin.* ŞK, r. 53.

Usa: /usa/ h 1. wusa, isa, wisa, wisan, 2. wilo, werga. *Min ew usa jî nedît, rojên gelek giran bûn.* DD, r. 49.

V

Vagzal: /va:gza:l/ nd/m 1. rawestgeh. 2. îstasyon. Ev peyv ji zimanê rûskî ketiye devoka Serhedê.²²³*Vê kaxizê bibe aliyê vagzala maşînîyê bigerîne.* ŞK, r. 37.

Veciniqîn: /vedzîniqî:n/ l 1. terqilîn 2. varqilîn. 3. hilceniqîn. 4. qeliqîn. 5. vetirsîn, bizdîn. *Hemze ji cî veciniqî, selama xort vegirt.* KR, r. 50.

Vejandin: /veza:ndin/ l 1. vekolandin û tevdana mirîşkan a xwelîyê. 2. ji hev derxistin û belavkirin, piç û parî kirin. *Dora bajêr tijî kulîk bûn, sayîl hatibûn ser, vedijandin.* HW, r. 283.

Vepejinandin: /vepezîna:ndin/ l 1. vepejilandin. 2. ji hev kişandin. 3. pevjilîn. 4. vepejikîn. 5. vezîn. *Mîrzo xwe vepejinand, kuxîya, simêlê xwe tîmar kir û got...* KR, r. 33.

Veqepîçîn: /veqepitʃi:n/ l 1. pêçîn, lihevpeçîn. 2. defînûn. *Temamîya şevê ew veqepîçî ser vê kêlekê û ser wê kêlekê.* HW, r. 326.

Veqerpiçîn: /veqerpitʃi:n/ l 1. perpitîn, pelpitîn. 2. vegevîzîn, gevîzîn, kulkulîn. *Nêçîr di nava xwîne de vediqerpiçe.* HW, r. 258.

Veresîn: /veresi:n/ l 1. jihevberdan, jihevderketin. 2. vereşîn, jihevberdana tiştên hûnandî. 3. veçîrîn, ji hev kişandin û sistkirina tiştên wekî hirî û pempo asê û şidandî. *Wekî li hevdu alîya, çetin vedirese.* KR, r. 56.

Verûtîn: /veru:tʰin/ l 1. rûçikandin. 2. piçîrandin. 3. veçîrandin. *Belgîzarê poperîçkê xwe verûbû.* KR, r. 40.

Vêsandin: /ve:sa:ndin/ l 1. temirandin, damirandin, tefandin. 2. vekuştin, vemirandin. 3. zelandin. *Vêsandinê gelek vedisîninlê kuçeyên sere û îdareyên ku bi şev dixebitin, natemirînin.* HW, r. 289.

²²³ Têmûrê Xelîl, g.n.b., 2008, r. 1-2.

Vêsîn: /ve:sin:n/ l **1.** vewestan. **2.** vetemirîn. **3.** vemirîn. *Agirê min vêdisîya.* ŞK, r. 29.

Veşûştin: /veʃu:ʃtʰin/ l **1.** sivik şûştin, avlêkirin, dan ber avê. **2.** dîsa şûştin, dubare şûştin. *Kerem kincê wan dişûştin.* KR, r. 25.

Vilke: /vi:lke/ nd/m **1.** çetel. **2.** şen, şene, dirgan, milêv. *Kêleka mine sûpê danî kevçik, kêrek û vilkek.* ŞK, r. 39.

Virnî: /vırni:/ rd **1.** ajelên ku dereng ji dayîk bûne û ji ber vê qels û lawaz in, ango ne hilî. **2.** sava, berşîr, zarokên biçûk û berşîr. *Nav mala me bela kiribû her golkê virnî.* ŞK, r. 42.

W

Waqa: /wa:qa:/ h **1.** waqas. **2.** ewqas, ewqasî. **3.** haqas. *Li zozana hewa hênkayê ye, waqa ne germ e.* ŞK, r. 53.

Werîn: /weri:n/ l **1.** ketin xwarê, hatin xwarê. **2.** hilweşîn. *Te têlek jê bikişanda, sed pîne yê jê biwerîyana.* KR, r. 21.

Weynax: /wejna:x/ nd/m **1.** teşk, çîp, paq. **2.** ling. *Weynaxê Karapet Axa lerizîn.* KR, r. 123.

X

Xalifîn: /xalîfî:n/ l **1.** winda bûn. **2.** rê winda kirin, girtina rêyan, ji ber ba, bager û berfê rê li kesekî hat birîn. *Wê li nava ba û bagerê bixalifîya.* HW, r. 331.

Xama: rd /xa:ma:/ rd **1.** berzewac û negihîştî. **2.** duşîze, keça hê jî ti car têkilîyên cinsî nekirine. *Ez qîza xama bûm.* HW, r. 104.

Xamberdîr: /xa:mberdîr/ nd/nt **1.** berindîr, bendîr. **2.** kavir. **3.** bişaşîr. **4.** berga. *Kal û bava sê zêrê zer birîn, qelen jî bû çil xamberdîrî.* KR, r. 32.

Xatirceme: /xa:tʰırdʒemε/ bwj. **1.** hêvî û xwestek ji Xwedê kirin, amînî pê anîn. **2.** arxayîni, dilaramî. *Xatirceme, eva bi dilê wê jî bû lê xwe nade kivşê.* DD, r. 75.

Xatirê hev ketin: /xa:tʰıre: hev kʰetin/ bwj. **1.** rika xwe kutan hev, rik jê birin, kirê yekî jê çûn. **2.** qedirê hev negirtin, dilê hev hêlan, bêrêzî kirin. **3.** xeşm lê kirin, lê hilhatin, hêrsbûn. *Gele cara cînar rûyê kelba da xatirê hev diketin.* KR, r. 92.

Xêlî: /xe:li:/ nd/m **1.** serpoşeke ku di dewatan de li ser serê bûkê ye. **2.** rûbend, rûpoş û serpoşek. *Pilte 'ewrê reş mîna xêlikê rûyê royê girt.* KR, r. 84.

Xepe-xep: /xεpε xεp/ h **1.** tele-tel, bi dizîka va. **2.** kereker, bi awayeke bêdeng. **3.** ji nişkê va. *Çiqas qerewîlêd wan hebûn me girtin, dest pê girêdan, avîtnê padvala, me ussa xepe-xep girt.* ŞK, r. 132.

Xerboqe: /xεrbo:qe/ nd/m **1.** xelboqe, berboq, helqe, helboqe, bendboq, girêjene, gilê, girê, girêdan, fitrak. **2.** toq, axzûm, avzûnk, avzûnik, qulpa qayîşan ku li navê qayîş pê dihê girêdan. *Hevana nên bi hemdî xwe da hev devê wê xerboqe kir.* KR, r. 190.

Xew ji çe'van kûvî bûyîn: /xεw ʒɪ tʃε^sva:n ku:vi: bu:ji:n/ bwj. **1.** xew lê herimîn. **2.** nekarîn razan. *Heta sivê xew ji çe've wê kûvî dibû.* KR, r. 101.

Xikexalî: /xɪkɛxa:li:/ rd **1.** xikîxalî. **2.** vikîvala, vikûvala vipvala. *Çîyayên xikexalî tijî bûbûn.* HW, r. 268.

Xilmet: /xɪlmet/ rd **1.** tişteki kevn lê hîn nehatiye avêtin, dihê bikaranîn. **2.** kelepir. **3.** xilmet, bi tirkî "ikinci el" e. *Xortek jî wa ye tê, kincine xilmetî lê ne.* HW, r. 304.

Xîlok: /xi:lo:k/ nd/m **1.** xîlong, rîwekeke şîrîn a xwerbar e. **2.** cureyek sêva binerdî. *Qîz û bûk diçûne Gelîyê Kevokan dianîn pincarên wekî pêqask û qenzîl, xîlok...* HW, r. 241.

Xiloporte: /xɪlo:p^horte/ nd/m **1.** hêwirze, qelebalixî, bênizamî. **2.** mereq. *Di çasta Qersê da bû xiloporte, her kesî ji xwe ra dajot.* HW, r. 370.

Xiringêle: /xɪrɪŋge:lɛ/ nd/m **1.** bêntizamî, bêteherî, bêserûberî, hêwirze, geremol, alozî, tevlihevî. **2.** xirtol, xirtoçe, hevdedan, xawişte. *Nava gund da xiringêleke usa bû, ku dê ewledê xwe nas nedikir.* KR, r. 145.

Xirmaş: /xɪrma:ʃ/ rd **1.** xilmaş. **2.** rewşa hewceyê nivistin û razanê. **3.** xewar, xewarî. **4.** xewokî. *Bira xwe ra rihet bin yan hevekî xirmaş bin, bihênjin.* ŞK, 132.

Xirxal: /xɪrxa:l/ nd/m **1.** bazinên qeydikên pîyan. **2.** toterîk û tekerek. *Qîz bûkê wan jî xwe pak xemilandibûn: dêre, xirxal û enterîyê rind.* ŞK, r. 57.

Xîtik: /xítik/ nd/m **1.** gîhayeke xwerbar e. **2.** kilmûş, gemara ji pozê merivan dihê. *Qîz û bûk diçûne Gelîyê Kevokan dianîn pincarên wekî pêqask û qenzîl, so û mendik, xîtik û sîrmî, qencelîsk û silmask, siping, û tirşo, pûng û cetirî, xîlok...* HW, r. 241.

Xûç: /xu:tʃ/ nd/m **1.** xûşk, xwîşk, xwişk. **2.** xang, xweh, xwah. *Birê Efo, xûça Fatê, Evdokiyayê û Gênadî çî xizmet ji me re kirin, bi zar nikarim bêjim.* DD, r. 92.

Xûl: /xu:l/ rd **1.** piştwar, piştbot. **2.** piştûz. **3.** piştkov. *Pîr Mûrzo mêrekî navser û navmilê da hinekî xûz bû.* KR, r. 22.

Xumam: /xumam/ nd/m **1.** mij. **2.** kêmronehî. *Gund nava xumamê da wê rojê nedihate xanêkirinê.* KR, r. 161.

Xûnmîstin: /xonmi:tin/ bwj. **1.** xwîn mîztin, ziravqetîyayî bûn. **2.** gelekî tirsîn. *Gava ku dijmin navê wî dibihîst, xûn dimîst.* HW, r. 72.

Xur: /xor/ nd/n **1.** xurek, xureg, xwerek. **2.** êm. **3.** lîyaqet, hêjayî. *Bira birûskê mala min xista, her ew her du girê penêrê min nebûna xurê xelkê.* KR, r. 22.

Xurcilîn: /xorçîli:n/ l **1.** dereng mayîn, eglebûn. **2.** xwe pê mijûl kirin, mijûl bûn. *Ew jî mîna merivekî tişteki xwe windakirî li xurcilî.* HW, r. 177.

Xurî: /xuri:/ rd **1.** xwerû, tenê ji tişteki pêkhatî. **2.** bi temamî, tenê. *Gund xurî Sîpkî an Hesenî nîn e.* HW, r. 33.

Xurînî: /xuri:ni:/ nd/m **1.** birçîbûna sibê. **2.** danê xwarinê yî berîya taştê. *Xurîniya kesekî nedikete bîrê.* HW, r. 57.

Xurom: /xurom:/ nd/m **1.** gurzek gêha, koma gîhayî. **2.** qefş, xirom, baqeke gîhayê topkirî. *Cilê hespan havête ser, xuromek gîha havête ber wan.* DD, r. 28.

Xuşîyên xwe li hev kirin: /xuʃi:je:n xwe li hev kırım/ bwj. **1.** laqirdî bi hevdu kirin. **2.** henekên xwe bi hevdu kirin. *Xweşîyn xwe li hev dikirin, dikirine kakek.* HW, r. 117.

Xût: /xu:t/ nd/m **1.** eynî. **2.** hema, hema wê çaxê. *Xût wê salê Memo çend meriv şandin xwezgîniya Gulistanê.* MR, r. 24.

Xwazgînî: /xwa:zgîni:/ nd/nt **1.** xwezgînî, xazgînî, jinxwestin, navbeynkarîya malbatên keç û xortên berzewac. **2.** kesên ku ji bo xwestina jin yan jî keçekê diçin. **3.** destnîgarî, rêûresma nîşanîya keç û xort. *Xwazgînîyên wê rê nedidan hev.* HW, r.51.

Xwe dan hêçê: /xwε da:n he:tʃe:/ bwj. **1.** hêçandin, kesek ceribandin. **2.** testkirin. **3.** fehskirin, îmtihan kirin. *Ew teglîfî mal kirin lê sîyara xwe dane hêçê.* KR, r. 46.

Xwe kerreşivanî avêtin: /xwε kereşiva:ni: a:ve:tʰm/ bwj. **1.** li eynî xwe neanîn, xwe wekî bêxber nîşandan. **2.** gp. Kerr bi naxirê re ye, pirsê ji şivên dike. *We xwe kerreşivanî avêtîye, yoxse we hay ji bayê dinyayê tunene?* HW, r. 155.

Xwedê jê birrîn: /xwede: ʒe: biri:n/ bwj. **1.** Xwedê jê standin. **2.** çewtîyeke mezin kirin, xwe şaş kirin. *Xwedê jê birrîye da, de bira here!* KR, r. 66

Xwedê negiravî: /xwede: negira:vi:/ bwj. **1.** Xwedê giravî, goya, qaşo. **2.** şikra, bi mebesta..., bi nîyeta... *Çima piştî xwe didî min ne Xwedê negiravî ez terêqa te me.* KR, r. 103.

Xwezila: /xwezila:/ h **1.** xwezla, xwezila, xuzila, xuzil. **2.** xwezî, xuzî, xozge. *Xwezla xwe wê rojê da danî wextê nasîya xwe da Sûrênê ermenî.* KR, r. 124.

Xwezilîya xwe pê anîn: /xwezili:ja: xwε pe: a:ni:n/ bwj. **1.** xwezîya xwe pê anîn. **2.** dilê xwe avêtin tiştêkî yan kesekî. *Ewî xwezilîya xwe wan meriva da dianî.* KR, r. 22.

Y

Ya devê te ye !: /ja dεve: tε jε/ bwj. **1.** ne hedê te ye! **2.** ne tayê te de ye !*Qîza Hemîd Begê ya devê te ye, lo qurumcax!* KR, r. 41.

Yalî: /ja:li:/ nd/n **1.** alî, hêl. **2.** teref. **3.** alîkarî. *Yalîkî da bega, axa yalê din da cerd û xercê dewletê...* KR, r. 60.

Yanê na: /jane: na:/ g **1.** yan na. **2.** heke na. *Kerr be, yanê na ez ê ravim te çitî-çitî bikim!* KR, r. 42.

Z

Zang: /za:ng/ nd/m **1.** gêdûk, derbend. **2.** derence, kanyon. **3.** gelî, newal, geboz. **4.** zihor. *Dengê evê kilamê ber zang û zihorê Sînekê diket.* KR, r. 27.

Zavod: /za:vo:d/ nd/m **1.** fabrîke, fabrike. **2.** kargeh. Ev peyv ji zimanê rûsî ketiye devok Serhedê.²²⁴*Wê derê zavoda pênzê vebûye, xwe ra têkeve ser xebatê.* ŞK, r. 80.

Zax: /zax/nd/m **1.** şixeft, mixare, **2.** xet, xêz, şax. *Lawik çûne hundirê zaxê, selam dane Morof.* MR, r. 19.

Zelûfî: /zêlu:li:/ nd/m **1.** neçarî. **2.** melûlî, rewşa xemgînî û posîdeyîyê. **3.** zorî û zehmetî. *Wan gelle zulm û zelûlî dîtibû.* ŞK, r. 22.

Zende jê girtin: /zende ʒe: girt^hin/ bwj. **1.** heyret û heşmet mayîn, ecêb man, **2.** me'tel bûn, me'tel mayîn, şaş mayîn, mat mayîn. *Avahîyên wisa mezin î çend qatî tê hebûn, wekî meriv zende jê digirt.* HW, r. 117.

Zendik: /zendik/ nd/m **1.** zend. **2.** bazin. **3.** huçik, parçeyek caw e ku di dema xebatê de ji bo devmilên cilan qirêj nebin dihên bikaranîn. *Xorta ji cêva xwe derdixist dezmalê ser desta neqîşandî û zendik.* ŞK, r. 68.

Zengûkirin: /zengu:kırın/ l **1.** zengîkirin. **2.** heywanên sîyarbarîyê bo sîyarbûnê amadekirin. *Qamçîkî dest da, ewî hespa xwe hêdî hêdî zengû dikir.* KR, r. 17.

Zengûrî: /zengu:ri:/ rd **1.** zenggirtî, zengorî. **2.** zingarî, zengarî. **3.** jengdar, jengarî. *Diranê wî yên zengûrî dihatine xanê.* KR, r. 21.

Zêpkirî: /ze:pkırı:/ rd **1.** zepitî, zepitîn, zepitandî, mişt, tişt a heta dev tijîkirî. **2.** werimî, perçivî, dagirtî. *Ber her wergekê qelaxa sergîn ye zêpkirî sekinîbû.* KR, r. 86.

Zêrandin: /ze:ra:ndın/ l **1.** êşandin. **2.** azirandin. **3.** acizkirin, nerehetkirin. **4.** çerçirandin. *Ew dubare tê zêrandinê.* KR, r. 48.

Zêrçe: /ze:rtʃe/ nd/m **1.** çêreya biharê. **2.** çêraya nû şînbûyî. *Wan dera şînayîke bol şîn dibe, ew tev zêrçe ne.* ŞK, r. 16.

²²⁴ Qanatê Kurdo, **Ferhenga Kurdî-Rûsî**, Neşîrxana Dewletê ya Ferhengêd Zimanê Miletêd Dereve û yê Sovêtîstanê, Moskova, 1960, r. 800.

Zeriqîn: /zɛɾiqi:n/ l 1. biriqîn. 2. şemaldayîn. 3. hilhatina rojê/tavê. 4. teyîsîn. 5. çirûsîn. 6. birisîn, birûsîn. 7. şewq vedan. *Ro hilhat, zeriqî, tîrêncê royê tebîyet xemilandin.* KR, r. 48.

Zerz: /zɛɾz/ nd/m 1. zirze, rizde, çengela derî ji bo kilîdkirinê. 2. qilik, kilîda darînî ya derîyan. 3. eşk, zirzeyaya derî. *Zingezing li zerza ket, derî vebû.* KR, r. 50.

Zêwazêw: /ze:wa: ze:w/ nd/m 1. nalenal. 2. nalîn. 3. nûzinî. 4. zêwî. *Guhê min jî seqirîn ji dest girîya û zêwa-zêwa zara.* ŞK, r. 11.

Zeyandin: /zɛjɑ:ndɪn/ l 1. zeynîn. 2. dan zayîn. *Pezê xwe dizeynînin.* ŞK, r. 54.

Zeyî: /zɛji:/ nd/m 1. zîyareta ku jina nû ya zewicî bo mala bav û eqrebeyên xwe dike. 2. keça ku piştî mêrkirinê tê serdana malbavana xwe 3. diyarîyên ku di serdana pêşîn de didine keça mêrkirî. 4. eqrebe. *Egît Begê, jina xwe bi mêvanî şandibû mala bavê, [wekî] zeyî.* MR, 24.

Zihor: /zɪho: t/ nd/m 1. zixur, gelî, derbent. 2. kevirên hûrik û pirgoşe. *Piştî çîyayê Girîdaxê mezin nava gelî û zihora da...* KR, r. 15.

Ziman avîtin devê yekî: /zɪma:n avi:tin dɛvɛ: jɛkʰi:/ bwj. 1. kesek ji bo axaftinê wêrandin, cesaret dayîn kesekî. 2. zimanê yekî dirêj bûn, ji ber mafdarî û derfetan zêde bi pêş da çûyîn. 3. kesek xewle kirin: axaftina taybet a bi kesekî re ku wî teşvîkî karekî bike, kişkişandin, belapêjgarî kirin. *Zurbe û Hemze ziman avîtine devê te.* KR, r. 95.

Zimêr: /zɪmɛ:r/ nd/m 1. zimhêr, dextlê ku ji bo hêranê diçe aş yê zivistanê. 2. genim. 3. budçe. 4. rezerv. *Bavê min şa bû, çimku kapêke pere mala me da tunne bû, zimêrê me jî qet tune bû.* ŞK, r. 103.

Zîtolzîtolî: /zi:to:lzi:to:li:/ rd 1. rîtol. 2. gincirî, gincirokî... 3. zêlzêlî. 4. dirîyayî. *Nava ovê da çadireke zîtol-zîtolî dihat xanê.* KR, r. 37.

Zivir: /zɪvɪr/ rd 1. girûz, girmijî, nenerm û girtik girtikî, 2. dijawateya bêjeya şayîk. 3. hişk. *Erd û esman cemidî bûn, hewa usa zivir bû ku meriv sermana ji dest xwe diçû.* KR, r. 169.

Zix: /zɪx/ nd/m 1. şilegemara heywanana ku tepisîye hev. 2. zirmix, zirnix. *Bi baranên payîzê bûbû herrî, zix, av û lêmişt.* HW, r. 83.

Zîyan: /zi:ja:n/ nd/m **1.** debr. **2.** zevîyên çandî. **3.** dexplûdan. *Em ku ji cîyê zîyan, mêrg û çîman zevîyan dîr ketin.* ŞK, r. 57.

Zom: /zo:m/ nd/m **1.** eşîr. **2.** zome,com, war, wargeh, zozan. **3.** cihê konê koçeran. *Qeretûyê sîyara rikêft ser zomê kirin.* KR, r. 52.

Zuhum: /zohum/ nd/m **1.** zom, zon, don, rûn. **2.** bêhna xerab ya rûn. *Di malê da êdî çilkek zuhum jî tunebû.* HW, r. 366.

Zûrbûn: /zu:rbu:n/ l **1.** nêrîna bi baldarî û heyîrînî. **2.** lê man heyîrîn. **3.** lê zik bûn. *Mêrik wa zûr bû, li min nihêrî, li kincê min, çarixê min nihêrî.* ŞK, r. 80.

Zûrî: /zu:ri:/ nd/nt **1.** marmij, cureyek kurm. **2.** zelû, zerû. *Dinyayek usa wekî tê da zûrî tune bin.* KR, r. 90.

ENCAM

Me di vê teza xwe de ji -destpêka ferhengnûsîya kurdî heta roja îroyîn-bîblîyografyaya ferhengên kurdî dan û li ser dîroka ferhengnûsîya kurdî rawestîyan. Herwiha em li ser cudahîya du binbeşên zimannasîyê ya ferhengnûsî û ferhengnasîyê jî rawestîyan.

Li ser devoka Serhedê bandora zimanê tirkî hin caran xwe nîşan dide. Li gor gotara Kenan Subaşi ya bi navê *Tesîra Zimanê Tirkî li Ser Devoka Serhedê*, bandora tirkî ya li ser devoka Serhedê zêdetir di qada leksîkal de pêk hatiye. Di vê xebata me de jî bo mînak: *gurr, inê, îlik, kesse, qatix, qarneqîsî, qeratû, kezelik, duşirmîşbûn, tarmetaxbûn...* ev peyvên bi eslê xwe tirkî ne derketin pêşberî me.

Herwiha tesîra zimanê ermenîkî jî wekî tirkî di qada leksîkal de li ser devoka Serhedê bandor kiriye û cihê xwe girtiye. Bo mînak peyvên *kulîn, gilavî, kirçom(qircûm), peyn, tixa, kaxtegan, anîsaz, antêx, axpîn (axpeyn), bibik, poşe(cîngene), çortan, horîg, kêran, kartû, merek, pûrt, boçik, savar, tixa, axçik û gizîk* hwd... ketine vê devokê.

Ji ber erdnîgarîya nêzik û pêwendîyên kurdan û rûsan de vera Serhedê gelek salan ketiye bin desthilata rûsan û ji zimanên wan jî hin peyv ketine devoka Serhedê. Bo mînak: *akûşke, sapok, îstekan, îskan, kanfêt, kinîşke, potîn, rêzîn, zavod, kartol, firxûn(virxûn), fayke, kapik (qurîşê rûsî), manat(pereyê rûsî), nesilqe/nesirge(teşgere), spîçke (pîçke), taçke (erebeya destan) kaşke (erebeya hespan), matoşke (matrûşka), vazgal, vêdrok/bêdrok, kinyaz(mîrza)* hwd...

Devoka Serhedê ji xêncî van taybetîyên xwe yên leksîkal û bandorgirtina zimanên cînarên, bi taybetîyên xwe yên wekî fonolojîk, morfolojîk û sentaksî jî mexsûsê xwe xuya dike. Hin caran deng ji peyvên dikevin, hin caran deng lê zêde dibin yan jî hin caran dengên peyvên diguherin. Herweha devoka Serhedê bi peyv, biwêj û gotinên pêşîyan yên mexsûsê xwe jî derdikeve pêşberî me.

Bi qasî ku me bi dest xistiye di qada ferhengên devokan de berhevkarîya ferhengên devokan kêr in. Xebatên devok û ferhengnasîyê di warê zimannasîyê de yek ji wan mijarên bingeşîn in lê di warê zimannasîya kurdî de li ser ferhengnûsîya

devokan xebatên serbixwe û xweser kêr in. Em di wê bawerîyê de ne ku ev xebata me dê di ferhengnûsîya kurdî de zêdebarîyekê bike.

ÇAVKANÎ

- AÇAR, Zafer, “**Devoka Devera Filistanê**” Teza Masterê a Çapnekirî, Zanîngeha Bîngolê Enstîtûya Zimanên Jîndar, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Bîngol, 2015.
- AÇAR, Zafer, “Dengsazîya Kurmancî û Pirsyara Nîşankirina Dengên Derî Alfabeya Standart a Latîni”, **II. Uluslararası Sosyal Bilimler Kongresi**, Dêrsim, 2020.
- ADAK, Abdurrahman, **Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk**, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2015.
- ADJARIAN, H, “Lexique Kurde-Français”, Recueil de Mots Kurdes en Dialecte de Novo-Bayazet, **Memoires de la Société Linguistique**, Paris, r. 349-383, 1911.
- AHMEDI, Sina & HASSANI, Hossein & MCCRAE, John P, “Towards Electronic Lexicography for the Kurdish Language”, **Proceedings of eLex 2019 Conference**, Electronic lexicography in the 21st Century, Sintra-Portugal, 2019.
- AKALIN, Şükrü Haluk, “Sözcük Bilimi ve Sözlükçülük”, **Türk Dili ve Edebiyat Dergisi**, 2009.
- AKÇA, Hakan, “Ağız Çalışmalarında Derleme Konuları ve Kaynak Kişilere Yöneltilen Sorular”, **Hacettepe Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Dergisi**, 2017.
- AKÇAY, Yusuf, “Doğuda ve Batıda Sözlükçülüğün Gelişimi ve Osmanlı Dönemi Sözlük Metinlerine Genel Bir Bakış”, **Dil ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi**, 2011.
- AKIN, Salih, “Nivîskarîya Ferhengê ya Kurdî (Ferhengnûsîya Kurdî)”, **Lêkolînên Zimannasîya Kurdî**, Avesta, Stenbol, 2013.
- ALAKOM, Rohat, **Torin: Arîstokratên Serhedê**, Avesta, Stenbol, 2009.
- ALSANCAKLI, Sacha, “The Early History of Kurdish Studies (1787–1901)”, **Die Welt des Islams**, Brill, Vol. 56, Issue 1 (2016), pp. 55-88, Paris, 2016.
- ALTUN, Oktay, “**Hawar Dergisinin Yazarları ve Kürt Edebiyatındaki Yerleri**”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnekirî, Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, Diyarbakir, 2020.
- ASATRIAN, Garnik, **Ferhenga Kurdî-Êrmenî Êrmenî-Kurdî**, Republic ya Armenianê Mînistirtî ya Diyasporanê, Yêrevan, 2016.
- AYDOĞAN, Mustafa, “Peyvên Romana Şivanê Kurmanca”, **Kovara Kurmancî**, j. 45, 2009.

- AYKAÇ, Seyfettin, “**Mela Mehmûdê Tîruwayî û Ferhenga Wî Ya Menzûm**”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnekirî, Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Zindî, Makezanista Ziman û Edebîyata Kurdî, Çewlik, 2016.
- BAŞARAN, Cahit, “**Kürt Dilinde Sözlükler**”, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Bingöl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Bingöl, 2014.
- BEDIRXAN, Celadet Ali, Roger Lescot, **Kürtçe Gramer**, Avesta, Stenbol, 2004.
- BİNGÖL, Zekeriya, “Sözlük ve Sözlükçülük Üzerine Bir Araştırma”, **Akademik Bakış Dergisi**, 2007.
- BOLELLİ, Nusrettin & ERTEKİN, Nurettin, Ferhengên Menzûm Di Edebîyata Kurdî De, **Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi**, Yıl:3, Cilt:3, Sayı:5, Haziran 2017.
- BRUINESSEN, Martin Van, “Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebi’nin Notları”, **Studia Kurdica**, 1985.
- CELALÎ, Murad, “Kurmançîya Serhedê û Devoka Gundê Taxilka”, **Kovara Nûiharê**, j.145, 2018.
- CELALÎ, Omîdê Mistefayê, “Taybetmendiyên Devoka Celalîyan”. **Kovara Kurmançî**, j.52, Parîs, 2013.
- CELALÎYAN, Abbas, **Ferhengî Başûr: Taybet be Nawçekanî Kirmaşan û Îlam û Luristan**, Întişaratê Porseman, Tehran, 1385/2006.
- CELALYAN(AKO) Ebbas, **Ferhengî Başûr**, Enstîtîw Kelepûrî Kurdî, Sine, 2006.
- CHYET, Michael L, **Kurdish Lexicography: A Survey And Discussion**, Brill, Vol. 2, pp. 109-118, 1998.
- CHYET, Michael L., **Kurdish-English Dictionary**, Yale University Press, London, 2003.
- CINDÎ, Hecîyê, **Hewarî**, Weşanên Lîs, Amed, 2019.
- CINDÎ, HECÎYÊ, **Memê û Eysê**, Înstîtûta Kurdzanîyê, Wîen, 2012.
- CIWAN, Mûrad, **Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dil Bilgisi**, Jîna Nû, Balinge, 1992.
- CLÉMENT, A, “Vocabulaire Kourde“, **Le Globe**, Société de Géographie de Genève, tome:5, pp. 279-295, Genève, 1866.
- COQ, Albert Von Le, **Kurdische Texte**, Gedruckt in der Reichsdruckerei, Berlin, 1903.

- ÇELİK, Murat, “**Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiyeya Mela Mehmûdê Bazîdî**”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnekirî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstûtîya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2015.
- DEMİR, Nurettin, “Ağz Terimi Üzerine”, **Türkbilig Dergisi**, 2002.
- ELİŞÊR, “Hinek Ji Xwarinên Serhedê”, **Kovara Kurmancî**, j. 26, Paris, 1999.
- ELİŞÊR, “Peyvên Ji Hêla Bidlîs û Wanê”, **Kovara Kurmancî**, j. 45, Paris, 2009.
- ERİKLİ, Fırat, “Leksikografi Nedir? Terimin Uygulama ve Kuram Temelli Türkçe Karşılıkları ve Bu Karşılıkların Kapsamları”, **Hacettepe Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Dergisi**, 2019.
- EVDILREHMAN, Eliyê, **Morof**, Weşanên Lîs, Amed, 2012.
- IŞIK, Ümit, “Lêkolînek Li Ser Ferhengên Kurdî (1655 -1990)”, **Anemon MAUN Sosyal Bilimler Dergisi**. c.3, j.1, Mûş, 2015.
- IŞIK, Ümit, “**Xebatek Li Ser Ferhengên Kurdî**”, Teza Lîsansa Bilind a Çapbûyî, Zanîngeha Mûş Alparslan Enstîtûya Zanistên Civakî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mûş, 2017.
- İBO, Sehîdê, **Kurdê Rêwî**, Weşanên Avesta, Stenbol, 2009.
- İLHAN, Nadir, “Sözlük Hazırlama İlkeleri, Çeşitleri ve Özellikleri”, **International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic**, 2019.
- İZOLÎ, Delîlo, **Ferhenga Kurdî-Tirkî**, Deng Yayınları, Köln, 1992.
- JABA, Auguste & JUSTI, Ferdinand, **Dictionnaire Kurde-Français**, Imperial Academy of Sciences, Saint Petersburg, 1879.
- JUSTI, Ferdinand, “Les Noms d'animaux en Kurde”, **Revue de Linguistique, et de Philologie Comparee**, Imprimerie Nationale, tome: 9, Paris, 1878.
- JUSTI, Ferdinand, “Verzeichnis der Kurdischen Verba” **Kurdische Grammatik**, Commissionare der Kaiserlichen Akademie der Wissenschaften, St. Petersburg, 1880.
- KAHRAMAN, Mehmet, “Sözlükbilim Kuram, İlke ve Yöntemleri Üzerine”, **İnsan ve Toplum Bilimleri Araştırmaları Dergisi**, Cilt: 5, Sayı: 8, 2016.
- KARAAĞAÇ, Günay, **Dil Bilimi Terimleri Sözlüğü**, TDK, Ankara, 2018.
- KARÇIĞA, Servet, “Görsel Sözlükler ve Kelime Ağları”, **IBAD Uluslararası Bilimsel Araştırmalar Dergisi**, 2016.

- KEMALOĞLU, Nasir, **Zaravayên Kurdî**, Basnews-Nûçe, j. 92, Stenbol, 29 Sibat-09 Adar, 2016.
- KHALID, Hewa Salam, “Zimanê Kurdî, Malbat û Zarên Wî”, **Kovara Kurdîname**, j.1, 2019.
- KIRKAN, Ahmet “Ferhengnasîye û Ferhengnasîya M. Malmîsanijî”, **Wêje û Rexne**, j.5, 2015.
- KOCAPINAR, Pelin, “Sözlüklerin Ortaya Çıkışıyla İlgili Teoriler Üzerine Bir Değerlendirme”, **Gazi Türkiyat Dergisi**, 2015, r. 130.
- KOÇUK, Hüseyin, **Deşîfresyona Çîroka Xelîl Beg û Perîşan Xanimê**, Xebata Çapnekirî, Mêrdîn, 2019.
- Komxebata Kurmancîyê, **Rêbera Rastnivîsînê**, Weşanên Weqfa Mezopotamyayê, Stenbol, 2019.
- KÖKTEKİN Kazım, “Doğubeyazıt Ağzının Ses Özellikleri”, **A.Ü. Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi**, j. 33, Erzurum, 2007.
- KURDO, Qanatê, **Ferhenga Kurdî-Rûsî**, Akadêmîya Zanistîyê ya Sovêtîstanê Înstitota Rohilatnasîyê, Neşîrxana Dewletê ya Ferhengêd Zimanê Milletêd Dereve û yê Sovêtîstanê, Moskova, 1960.
- KURDO, Qanatê, **Tarîxa Nivîsandin û Çapkirina Ferhengê Kurdî**, **Kovara Ronahî**, j. 7-10, Bexda, 1961.
- KURDO, Qanatê, “Tarîxa Nivîsandin û Çapkirina Ferhengê Kurdî”, **Ronahî**, j. 8-9, Bexda, 1961.
- LEEZENBERG, Michiel, “Soviet Kurdology and Kurdish Orientalism”, **The Heritage of Soviet Oriental Studies**, Roudledge, London, 2011.
- MAKAS, Hugo, **Kurdische Texte im Kurmanji-Dialekte aus der Gegend von Mardin**, Imperial Academy of Sciences, St. Ptersburg, r. 107-134, 1897.
- MARIF, Abdurrehman Hacî, **Dîroka Ferhengnûsîya Kurdî û Rêbazên Berhevkarîya Ferhengên Rûsî-Kurdî**, Akademîya Zanistan ya Rûsî: Nauk, Lenîngrad, 1972. (Абдуррахман Хаджи Маруф, **История курдской лексикографии и принципы составления русско-курдского словаря**, Автореф, дис, канд филол.наук, Л, 1972).
- MARIF, Evdirehmanî Hacî, **Lêksîkolojî Zimanî Kurdî**, Çapxaney Korî Zanyarî Kurd, Bexda, 1974.
- MARIF, Ewrehmanî Hacî, **Le Biwarî Ferhengnûsîy Kurdî Da**, Neçapkirawekanî Emîndarîyetî Giştî Ruşinbîrî û Lawanî Nawçey Kurdistan, Bexda, 1987.

- MEHMÛDZADE, Rehber, “Nerîtekî Nwê Le Ferhengnûsîy Kurdî Da”, **Kovara Kanîzar**, j.14, 2017.
- MINORSKI, Vladimir Fyodoroviç, BOIS, Thomas, D.N. Mac Kenzie, **Kürtler ve Kürdistan**, Wer: Kamuran Firatli, Weşanên Doz, Stenbol, 2004.
- MÜLLER, Friederich, “Kurdisches und Syrisches Wörterverzeichnis” **Orient und Occident**, Verlag der Dieterichschen Buchhandlung, Göttingen, 1864, r. 104-107.
- MÜLLER, Friedrich, **Beiträge zur Kenntniss der Neupersischen Dialekte - Kurmângi Dialekt der Kdensprache**, In Commision Bei Karl Gerol’s Sohn Buchhändler Der Kaiserlichen Akademie Der Wissenschaften, Wien, 1864.
- MÜLLER, Friedrich, **Beiträge zur Kenntniss der Neupersischen Dialekte - Zaza Dialekt der Kurdensprache**, In Commision Bei Karl Gerol’s Sohn Buchhändler Der Kaiserlichen Akademie Der Wissenschaften, Wien, 1865.
- ÖPENGİN, Ergin & HAIG, Geoffrey, “Regional Variation in Kurmanji: A Preliminary Classification of Dialects”, **Kurdish Studies**, Volume: 2, No: 2, pp. 143 – 176, 2014.
- ÖZCAN, Emrah, “Sözlükbilim ve Sözlükçülük Terimlerinin Kullanımı Üzerine”, **YILDIZ Journal of Educational Research**, 2018.
- ÖZDEMİR, Burcu & ARSLAN, Ayna Askeroğlu, “Rusya’nın Kürdoloji Çalışmaları (1787-1947)”, **İnsan & İnsan**, Yıl/Year 5, Sayı/Issue 17, Yaz/Summer 2018, 194-213, r. 196.
- ÖZTÜRK, Mustafa, “Manzum Sözlüklerden Sübha-i Sıbyan İle Kürtçedeki İlk Manzum Sözlük Nubehera Biçukan Arasında Bir Karşılaştırma”, **The Journal of Mesopotamian Studies**, C:1/1, 2016.
- ÖZTÜRK, Mustafa, “Mela Mehmûdê Bazidî’nin Kürtçe-Türkçe Sözlüğü (İnceleme-Metin)”, **Doğu Araştırmaları Dergisi**, 2017.
- PILANCI, Hülya, **Türkçe Biçim Bilgisi**, Anadolu Üniversitesi, Eskişehir, 2018.
- PRYM, Eugen – SOCIN, Albert, **Kurdische Sammlungen : Erzählungen und Lieder in den Dialekten des Tûr ‘Abdîn und von Bohtan**, Commissionare der Kaiserlichen Akademie der Wissenschaften, St. Petersburg, 1890.
- QEZAZ, Şefîq, **Ferhengî Şarezûr**(İngilizî-Kurdî), Dezgey Aras, Erbil, 2000.
- SEYOISLAMI, Jaffer, “Zimanê Kurdî”, Wergêr. Mehmed Yonat, **Nûbihar Akademî**, j.14, 2020.

- SOANE, Ely Bannister, “Notes on Kurdish dialects: The Shadi branch of Kermanji”, **Journal of the Royal Asiatic Society**, Volume 41, Issue 4, October 1909.
- SUBAŞI, Kenan, “Tesîra Zimanê Tirkî Li Ser Devoka Serhedê: Wekî Nimûne Milazgirta Mûşê”, **Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi**, j. 8, Mûş, 2020.
- ŞEMO, Erebe, **Şivanê Kurmanca**, Weşanên Lîs, Amed, 2019.
- ŞEMO, Erebe, **Jîyana Bextewar**, Weşanên Lîs, Dîyarbekir, 2015.
- ŞEMO, Erebe, **Hopo**, Weşanên Lîs, Stenbol, 2007.
- TAŞ, Çetin, “**Dengsaziya Devoka Çaldiranê**”, Teza Masterê a Çapnekirî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2015.
- TAŞTAN, Yusuf, “**Dîroka Wergerê û Xebatên Wergera Kurdî**”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnekirî, Zanîngeha Van Yuzuncu Yilê Enstîtûya Zimanên Zindî, Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Wan, 2019.
- ÛSIV, Fêrikê, **Bijare**, Weşanxana Lêgal Plyûs, Yêrêvan, 2010.
- ÛSIV, Fêrikê, **Pampa Min**, Weşanxana Lîmûş, Yêrêvan, 2009.
- XELÎL, Têmûrê, “Peyvên Romana Gundê Mêrxasan”, **Kovara Kurmancî**, j.55, 2014.
- XELÎL, Têmûrê “Devoka Kurdên Qefqasyayê”, **Kovara Kurmancî**, j.29, 2001.
- XELÎL, Têmûrê, “Gotinên Rûsî Ku Derbasî Kurmancî Bûne”, **Kovara Kurmancî**, j. 43, 2008.
- XELÎL, Têmûrê, “Pêwendiyên Ermenkî û Kurdî yên Zimên”, **Kovara Kurmancî**, j.41, 2007.
- XUDO, Egîdê, **Dê û Dêmarî**, Nûbihar, Stenbol, 2016.
- YILDIRIM, Kadri, **Ehmedê Xanî Külliyyatı IV- Dîwan**, Avesta, İstanbul, 2014.
- YILDIZ, Ayhan, “Lîteratura Manaşî ya Rêzimanîya Kurmancî û Zazakî û Rista Wê”, **Kurdiyat Dergisi**, Hejmar/Issue: 4, 2021.
- YONAT, Mehmet, “Di Devokên Kurdîya Kurmancî de Rewşên Morfolojîk (Mînakên Devokên Bakur, Başûrê Rojhelatê û Başûrê Rojavayê)”, **Mukaddime**, 2020.

YUSUPOVA, Zare Aliyevna, “Li Ser Dîroka Ferhengnûsîya Kurdî: Berhevkin û Weşandina Wan”, **Bîranîna Nivîskî ya Rojhilatê**, Akademîya Zanistan ya Rûsî, Enstîtuya Destxetên Rojhilat, St Petersburg, 2015. (З.А. Юсупова, “К истории курдской лексикографии: составление и публикация словарей”, **письменного наследия Востока**, Российской академии наук, Санкт-Петербург, 2015).

ZEYTİNKAYA, Dilber, “**Sözlük Kullanımının Yabancı Dilde Sözcük Öğrenimine Etkisi**”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnekirî, Marmara Üniversitesi Eğitim Bilimleri Enstitüsü, Yabancı Diller Anabilim Dalı Fransız Dili Eğitimi Bilim Dalı, İstanbul, 2014.

ZÎLAN, Reşo, “Hikyatêd Cimaeta Kurdîyê ya Heciyê Cindî”, **Kovara Kurmancî**, j.45, 2009.

С. А. Егизаров, Краткий курманджийско-русский словарь, “**Записки Кавказского отдела Императорского русского географического общества**”, Кн. 13. Вып. 2, 1891; <https://elib.rgo.ru/safe-view/123456789/213550/1/UnVQUkxJQjEyMDQ3OTAwLnBkZg==> (05.06.2023)

Çavkanîyên Dijîtal

AGIRÎ, Orhan, “Kurmancîya Herêma Agirîyê”, <https://zimannas.wordpress.com/2020/03/06/kurmanciya-herema-agiri> (04.05.2022)

ALKAÇ, Nurullah, “Kürtçe Gökten mi İndi? 2”, <https://www.indyturk.com/node/92386/türkiyeden-sesler/kürtçe-gökten-mi-indi-2> (02.06.2023)

GÜLDENSTÄDT, Johann Anton, **Reisen durch Russland und im Caucasischen Gebürge**, <http://elib.shpl.ru/ru/nodes/25532-bd-2-1791#mode/inspect/page/552/zoom/4> (11.06.2023)

<http://aksozluk.org/serhat> (20.04..2022)

<http://www.zazaki.net/haber/zaravayn-kurd-1986.htm> (24.04.2022)

<https://abadis.ir/fatofa/فرهنگ/> (13.07.2021)

https://acikders.ankara.edu.tr/pluginfile.php/18170/mod_resource/content/0/sozlukbilim_izlek06.pdf (24.12.2021)

https://ckb.wikipedia.org/wiki/پێرسنی_فهرههنگه_کوردییهکان (05.05.2023)

<https://www.kurdipedia.org/default.aspx?q=2013091521342688775&lng=1> (27.05.2023)

<https://www.kurdonline.ru>

<https://zimannas.wordpress.com/2020/03/21/kurmanciya-lacine-kurdistana-sor/>
(11.05.2022)

<https://zimannas.wordpress.com/category/ferheng/> (29.04.2022)

MUHAMMED, Husein, “Ferhengeke Kurdî-Almanî ji Sala 1884”,
<https://zimannas.wordpress.com/2017/04/03/ferhengeke-kurdi-ji-sala-188/>
(08.01.2022)

MUHAMMED, Husein, “Okyanûsa Giştgir Anku Derbarê Navlêkirinên Ferhengê”,
<https://zimannas.wordpress.com/category/ferhengsazi/><https://zimannas.wordpress.com/category/ferhengsazi/> (10.07.2021)

SIYABENDÎ, Têngiz, “Kurmançîya Ermenistanê”,
<https://zimannas.wordpress.com/2020/03/13/kurmanciya-ermenistane/> (06.05.2022)

SURAL, Oruç, “Devoka Xoçvanê (Erdexanê)”,
<https://zimannas.wordpress.com/2020/03/11/devoka-xocvane-erdexan/>
(05.05.2022)

ŞEDDADÎ, Kamîz, “Kurmançîya Laçînê (Kurdistana Sor)”,
<https://zimannas.wordpress.com/2020/03/21/kurmanciya-lacine-kurdistana-sor/>
(05.05.2022)

www.sozluk.gov.tr

(14.11.2022)



T.C

**MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

Yüksek Lisans Tezi

**SERHAT YÖRESİ AĞZI DERLEME SÖZLÜĞÜ
(Kafkasya Kürtlerine Ait 5 Eserde)**

Hüseyin KOÇUK

20711006

Danışman

Prof. Dr. Hayrullah ACAR

MARDİN-2023